**Nivîsarên Programên Radyoya Mizgîniyê**

# Serhatiyên ji Peymana Kevin

(Tewrat, Zebûr û Nivîsarên Pêxemberan)

www.erf.de/kurmanci
mizgini@aol.de

© 2007
ERF, International Projects, 35573 Wetzlar, Almanya

Mizgînî, P.O. Box 1125, 35441 Biebertal, Almanya

Hemû maf parastî ne

# Afirandina Erd û Ezmên

(Destpêkirin 1)

Di destpêkê de Xwedê erd û ezman afirandin.
Di wê demê de erd virt û vala bû û li ser erdê tiştek nebû; bi tenê taristanî hebû.

Hingê Xwedê got: «Bila ronahî çêbe.» Û di cih de ronahî çêbû. Hingê Xwedê dît ku ronahî qenc e. Wî ronahî ji taristaniyê veqetand û navê ronahiyê ‹roj› û yê taristaniyê ‹şev› danî. Bû êvar û bû sibeh, ev roja yekê bû.

Hingê Xwedê got: «Bila di navbera avan de qubeyek çêbe, da ku wan ji hev veqetîne.» Xwedê qubek çêkir û ava di bin qubê de, ji ava li ser qubê veqetand. Û ev weha çêbû.
Xwedê navê qubê ‹ezman› danî. Bû êvar û bû sibeh, ev roja diduyan bû.

Hingê Xwedê got: «Bila ava di bin ezmên de li cihekî bicive û axa zuwa bê dîtin.» Û ev weha çêbû.
Xwedê navê axa zuwa ‹erd› û navê ava civiyayî ‹derya› danî. Û Xwedê dît ku ev qenc e.
Wî got: «Bila erd giya û şînayiyê bide û bila darên ku li gor cûreyên xwe fêkî didin, derxe.»
Û ev weha çêbû: Erdê giyayên şîn û darên ku li gor cûreyên xwe fêkî didin, deranîn.
Xwedê dît ku ev qenc e. Bû êvar û bû sibeh, ev roja sisiyan bû.

Hingê Xwedê got: «Bila li ezmên ronahî çêbin û bila rojê ji şevê veqetînin, ronahiyê bidin erdê û ji bo roj, demsal û salan bibin nîşan.»
Û ev weha çêbû: Xwedê du ronahiyên mezin çêkirin: Ya mezin ji bo rojê û ya biçûk ji bo şevê.
Wî stêr jî çêkirin û ew li ezmên bi cih kirin, da ku ronahiyê bidin erdê, serweriyê li şevê û li rojê bikin û ronahiyê ji taristaniyê veqetînin.
Xwedê dît ku ev qenc e. Bû êvar û bû sibeh, ev roja çaran bû.

Hingê Xwedê got: «Bila av bi masiyan tije bibe û bila li jor, li ezmên, teyr bifirin.» Wî hûtên mezin ên deryayê û hemû afirînên jîndar ên ku av bi wan tije ye û her cûreyên teyran afirandin.
Xwedê dît ku ev qenc e. Wî ew hemû bereket kirin û got: «Berdar bin, zêde bibin û ava deryayan dagirin û bila teyr jî zêde bibin.» Bû êvar û bû sibeh, ev roja pêncan bû.

Hingê Xwedê got: «Bila erd her cûreyên afirînên jîndar derxe: heywanên kedî, heywanên kûvî û heywanên ku li ser axê dişêlin.» Û ev weha çêbû. Xwedê heywanên kûvî, heywanên kedî û hemû heywanên ku li ser axê dişêlin, çêkirin.
Û Xwedê dît ku ev qenc e.
Îcar Xwedê got: «Niha em di sûretê xwe de, wek ku mîna me be, mirovan çêkin. Bila ew bibin serwerê hemû erdê û serwerê masiyên avê, teyrên ezmên, heywanên kedî û hemû heywanên ku li ser rûyê erdê ne.»

Xwedê mirov di sûretê xwe de afirand,
wî ew di sûretê Xwedê de afirandin,
wî ew nêr û mê afirandin.
Xwedê mirov ji axa erdê çêkir û bîhna jiyanê pif kir pozê wî. Û mirov bû canê jîndar.

Xwedê ew bereket kirin û ji wan re got: «Berdar bin û zêde bibin. Erdê tije bikin û wê bixin bin destê xwe. Bibin serwerê masiyên deryayê, teyrên ezmên û hemû heywanên ku li ser rûyê erdê ne.»

Piştre Xwedê got: «Ez hemû şînayiyên li ser erdê û her dara fêkî didim we. Ev wê ji we re bibin xwarin.

Û ez giyayê şîn didim heywanên erdê û hemû teyrên ezmên, da ku ji wan re bibe xwarin.» Û ev weha çêbû.

Xwedê hemû tiştên ku çêkiribûn dîtin û bi rastî ew gelek qenc bûn. Bû êvar û bû sibeh, ev roja şeşan bû.

Weha erd û ezman û her tiştên tê de temam bûn.

Xwedê ew karê ku dikir di roja heftan de xilas kir û bîhna xwe vekir.

Wî roja heftan pîroz kir û ew bi pîrozî cihê kir. Çimkî wî di wê rojê de ji hemû karê afirandinê bîhna xwe vekir.

Di **Zebûra 8**'an de Dawid weha pesnê Afirandar dide:

Ya Xudanê me Xwedê,
Li ser tevahiya dinyayê navê te çiqas bilind e!

Çaxê ku ez ezmanên te,
Karên destên te
Û heyv û stêrên ku te danîne, dibînim,
Ez dibêjim:
Mirov çi ye ku tu wî bînî bîra xwe
Û kurê mirov çi ye ku tu xema wî bixwî?
Te ew ji milyaketan piçekê nizimtir kir,
Te taca rûmet û siyanetê da serê wî.
Te li ser karên destên xwe hukumdarî da wî.
Te her tişt xistin bin lingên wî:
Hemû mî û dewar
Û heywanên çolê jî,
Teyrên ezmanan û masiyên deryayê,
Hemûyên ku di riyên deryayan de digerin.

Ya Xudanê me Xwedê,
Li ser tevahiya dinyayê navê te çiqas bilind e!

# Baxçê Êdenê

(Destpêkirin 2)

Xudan ji bo mirov li Rojhilat, li Êdenê baxçeyekî spehî çand. Di baxçe de darên cûr bi cûr ên ku dîtina wan spehî û xwarina wan qenc hebûn. Çemek jî hebû ku baxçe av dida; ew çem ji Êdenê derdiket, ji hev vediqetiya û dabeşî çar milan dibû.

Navê çemê pêşî Pîşon e; ew li nav hemû herêma Hewîla ya ku zêr lê heye, digere. Navê çemê diduyan Gîhon e; ew li nav hemû herêma Kûşê digere. Navê yê sisiyan Dîcle ye; ew bi rojhilata Aşûrê ve diherike. Çemê çaran jî Firat e.

Xwedê mirov bir û danî baxçê Êdenê, da ku wî biçîne û lê bibe xweyî. Ew baxçe cihekî pirr xweş û bedew bû; her tiştê ku ji bo mirov qenc e bi zêdehî tê de hebû.

* * *

Di navenda baxçe de du darên taybetî hebûn: Yek dara jiyanê bû û ya din dara zanîna qencî û xerabiyê bû. Li ser vê darê Xwedê li mirov emir kir û got: «Tu dikarî ji her dara baxçe bixwî, lê ji dara zanîna qencî û xerabiyê, nexwe. Çimkî gava ku tu ji wê bixwî, eseh tê bimirî.»

Xwedê mirov û hemû tiştên din ên ku afirandibûn dît, lê belê yek li gor mirov nebû. Hingê Xwedê got: «Ne baş e ku mirov bimîne tenê, ezê alîkareke li gor wî çêkim.»
Hingê Xwedê tevahiya heywanên erdê û teyrên ezmên anîn ba mirov, da ku mirov nav li wan bike. Mirov çi nav li wan kiribe, ew bû navê wan.

Lê ji bo Adem alîkareke li gor wî nehat dîtin. Ser dinê yek nebû ku wek mirov be an bibe dostê wî. Loma Xwedê wusa kir ku Adem ket xeweke giran. Çaxê ew radiza, Xwedê parsûyek ji parsûyên wî derxist û cihê wî bi goşt dagirt. Xwedê ji wî parsûyî jinek çêkir û ji Adem re anî.

Adem pirr şa bû û got:
«Niha ev ji hestiyên min hestî
Û ji goştê min goşt e.
Wê ji wê re ‹jin› bê gotin,
Çimkî ew ji mêr hat standin.»

Adem navê jina xwe ‹Hawa› (yanî ‹Jiyan›) danî. Çimkî ew bû diya hemû mirovan.

Êdî mirov nema tenê;
ji hingê ve jin û mêr bi hev re ne,
Xwedê ew herdu, jin û mêr, ji bo hev afirandin.

Ji ber vê yekê heta îro mêr dev ji dê û bavê xwe berdide û bi jina xwe re dibe yek û ew herdu dibin bedenek.

# Gunehê Mirov

(Destpêkirin 3)

Di nav hemû heywanên çolê de yên ku Xudan Xwedê çêkiribûn, yê herî hîlebaz mar bû.

Rojekê çaxê Adem û Hewa di baxçe de digeriyan, mar nêzîkî wan bû û ji Hewayê re got: «Ma bi rastî Xwedê gotiye: ‹Qet ji fêkiyê dareke baxçe nexwin?›»

Jinê ji mar re got: «Erê, em dikarin ji fêkiyê darên li baxçe bixwin, lê heçî fêkiyê dara ku di navenda baxçe de ye, Xwedê gotiye: ‹Jê nexwin û dest nedinê, an na hûnê bimirin.›»

Lê mar ji jinê re got: «Na, hûn qet namirin. Xwedê dizane gava ku hûn jê bixwin, hingê çavên we wê vebin û hûnê bibin wek Xwedê û hûnê qencî û xerabiyê bizanin. Loma wî got ku hûn jê nexwin.»

Jinê dît ku fêkiyê darê pirr xweş û spehî ye û ji bo şehrezabûnê dil diçe wî; wê destê xwe dirêj kir, hinek jêkir, xwar û da mêrê xwe jî yê ku pê re bû û wî jî xwar.
Di cih de çavên herduyan vebûn û wan dît ku ew tazî ne û wan ji hev şerm kir. Loma wan pelên dara hêjîrê dirûtin û ji xwe re kirin berkoşk.

Di hênikahiya rojê de, çaxê Xwedê di nav baxçe de digeriya, wan dengê lingên wî bihîst. Hingê Adem û Hewa tirsiyan û xwe di nav darên baxçe de ji ber wî veşartin.

Xwedê gazî Adem kir û got: «Tu li ku derê yî?»
Wî got: «Min li baxçe dengê te bihîst û ez tirsiyam, çimkî ez tazî bûm û min xwe veşart.»
Xwedê got: «Kê ji te re got ku tu tazî yî? Ma te ji wê dara ku min ji te re gotibû: ‹Jê nexwe!› xwar?»
Adem got: «Ew jina ku te ji min re anî, wê ji wê darê da min û min jî xwar.»

Hingê Xwedê ji Hewayê re got: «Eva ku te kir çi ye?»
Wê got: «Mar ez xapandim, loma min xwar.»

Hingê Xwedê ji mar re got:
«Ji ber ku te ev yek kir,
Di nav hemû heywanan de,
Yê nifirlêbûyî tu yî.
Tê li ser zikê xwe rêve herî
Û di hemû rojên jiyana xwe de axê bixwî.
Ezê dijminahiyê bixim
Navbera te û jinê,
Navbera dûndana te û dûndana wê.
Ewê serê te biperçiqîne
Û tê bi pehniya wî ve bidî.»

Û ji jinê re got:
«Ezê êşa te ya zarokanînê gelek zêde bikim
Û bi êşê tê zarokên xwe bînî.
Dilê te wê mêrê te bixwaze
Û ewê bibe serwerê te.»

Û ji Adem re got:
«Ji ber ku te guh da jina xwe û ji wê dara
Ku min ji te re gotibû, ‹Jê nexwe!› xwar,
Ax ji rûyê te ket bin nifirê;
Tê di hemû rojên jiyana xwe de bi zehmet jê bixwî.
Ax wê stirî û diriyan ji te re derxe.
Tê giyayên çolê bixwî.
Heta ku tu bizivirî wê axa ku tu jê hatiyî standin,
Tê nanê xwe bi xwihdana eniya xwe bixwî.
Çimkî tu ax î û tê bizivirî axê.»

Piştre Xwedê ji Adem û Hewayê re cilên çermîn çêkirin û li wan kir.
Wî got: «Va ye, mirov bû yekî mîna me, çimkî êdî qencî û xerabiyê dizane. Nebe ku destê xwe dirêjî fêkiyê dara jiyanê bike û jê bixwe û her û her bijî.»

Loma Xwedê mirov ji baxçê Êdenê derxist, da ku axa ku jê hatibû standin, biçîne. Piştî ku Xwedê mirov avêt, wî li aliyê rojhilata baxçe hin Kerûb (yanî milyaketên hêzdar) û şûrekî bi pêta êgir ku bi her aliyî ve dizivire bi cih kirin, da ku riya dara jiyanê biparêzin.

# Qayîn û Habîl: Mêrkujiya Pêşî
(Destpêkirin 4)

Adem çû ba jina xwe Hawayê û ew bizaro bû, Qayîn anî û got: «Bi alîkariya Xudan min mirovek qezenc kir.» (Bi zimanê Îbranî dengê peyvên ‹Qayîn› û ‹qezenckirin› nêzîkî hev in)

Hawa dîsa bizaro bû û kurekî din, Habîl anî. Habîl bû şivanê pêz û Qayîn bû cotkar. Piştî demekê Qayîn ji berê erdê anî û ji Xudan re pêşkêş kir. Habîl jî, ji nixuriyên pezê xwe, ji bezê wan, anî. Xudan bi Habîl û bi pêşkêşa wî şa bû, lê bi Qayîn û bi pêşkêşa wî şa nebû. Loma Qayîn pirr hêrs ket û rûyê xwe tirş kir. Xudan ji Qayîn re got: «Tu çima hêrs bûyî û te çima rûyê xwe tirş kiriye? Eger tu ya qenc bikî, ma ew nayê bilind kirin? Eger tu ya qenc nekî, guneh li ber dêrî di kemînê de letaye û daxwaza wî tu yî. Lê tu bibe serwerê wî.»

Qayîn bi birayê xwe Habîl re peyivî û çaxê ku li deştê bûn, Qayîn li hember birayê xwe Habîl rabû û ew kuşt.

Li ser vê yekê Xudan ji Qayîn re got: «Birayê te Habîl li ku derê ye?»
Qayîn got: «Ez nizanim. Ma ez nobedarê birayê xwe me?»
Xwedê got: «Te çi kir? Dengê xwîna birayê te ji axê gazî min dike. Tu niha ketî bin nifirê: Êdî çaxê ku tu axê biçînî, ew berê xwe nade te. Tê li ser erdê firar û gerok bî.»
Qayîn ji Xudan re got: «Cezayê min bi qasî ku neyê hilgirtin giran e. Tu îro min ji ser rûyê axê derdixî. Ezê ji rûyê te veşartî bimînim û li ser erdê bibim firar û gerok. Her kî min bibîne, wê min bikuje.»
Lê Xudan jê re got: «Na, her kî ku ji ber vê yekê Qayîn bikuje, heft caran heyf wê ji wî bê standin.» Û Xudan nîşanek danî ser Qayîn, da ku her kî wî bibîne, lê nexe.

Hingê Qayîn ji ba Xudan çû û li rojhilata Êdenê li herêmeke beredayî digeriya.

# SERHATIYA NUH

(Destpêkirin 6-9)

Çaxê ku Xwedê erd û ezman afirandin, her tişt gelekî qenc bû.
Wî erd, heywan û mirov afirandin, lê mirovên pêşî guhê xwe nedidan Xwedê û hê ji hingê ve dinya xerab bû.

Kuştina Habîl bi tenê destpêka zêdebûna xerabiyê bû. Mirov li ser gotinên Xwedê nedifikirîn û nêt û daxwazên dilê wan pîs bûn. Mirov xêrnexwaz bûn, şer dikirin û hevdû dikuştin. Wan qet guhê xwe nedida Xwedê. Wext derbas dibû û hal ewqas xerab bû, Xwedê poşman bû ku wî mirov çêkirin.

Lê mirovek hebû û ew bi dilê Xwedê bû. Navê wî Nuh bû. Nuh ji zuriyeta kurê Adem Sêt bû. Ev serhatiya wî ye:

Xwedê li erdê nêrî û dît ku çiqas xera bûye. Erd tije zordarî bûbû, çimkî hemû mirovên li ser erdê, riya xwe xera kiribûn.
Xwedê got: «Divê hemû mirovên ku guhê xwe nadin min, bên cezakirin. Ezê mirov, heywan û teyrên ezmên ji ser rûyê erdê xîş bikim.»

Di wan rojan de di hemû dinyayê de mirovek bi tenê hebû ku bi dilê Xwedê bû. Ew zilamek rast û qenc bû û ji Xwedê ditirsiya. Navê wî Nuh bû.
Xwedê ji Nuh re got: «Dawiya hemû mirovan hat. Çimkî ji rûyê wan erd tije zordarî bûye. Ezê wan ji rûyê erdê helak bikim.
Ji xwe re gemiyekê çêke. Di gemiyê de odeyan çêke û gemiyê ji derve û ji hundir ve zift bike. Divê gemî 133 metreyan dirêj be, 22 metreyan fireh be û 16 metreyan bilind be. Gemiyê sê qat çêke, banê wê jî çêke û deriyê gemiyê bixe tenişta wê.
Ezê tofaneke mezin rakim û her tiştê ku bîhna jiyanê di wî de heye, wê helak bibe. Yên li ser rûyê erdê, hemû wê bimirin. Lê ezê peymana xwe bi te re girê bidim. Tu û kurên te û jina te û bûkên te, hûnê bikevin gemiyê.»

Nuh li gor emrê Xwedê ji darên mezin gemî çêkir û zift lê xist, da ku av nekeve wê. Gelek odeyên wê hebûn û banê wê hebû, pencere û derî di tenişta gemiyê de bûn.

Hingê Xwedê ji Nuh re got: «Ji her cûreyê teyr, dewar û heywanan dido dido – nêr û mê – bibe gemiyê, da ku ew bi te re sax bimînin. Û ji hemû heywanên helal ji xwe re heft heft – nêr û mê – bistîne. Û ji her cûreyê xwarinê bi xwe re bibe, da ku ji bo we û wan bibe xwarin.
Piştî heft rojan ezê çil roj û çil şevan baranê bibarînim; ezê her tiştê jîndar ji ser rûyê erdê xîş bikim.»

Nuh jî her tişt wek ku Xwedê jê re gotibû kir.

Çaxê Nuh 600 salî bû, di meha 2'an de, di roja 17'ê mehê de, hemû kaniyên kûrahiyê derbûn û çaviyên ezmên vebûn û baran çil roj û çil şevan li ser erdê barî.

Çaxê tofanê dest pê kir, tam di wê rojê de, Nuh û kurên wî Sam, Ham û Yafet û jina Nuh û her sê bûkên wî ketin gemiyê. Piştre Xudan bi xwe derî girt. Û wek ku Xwedê li wî emir kiribû, ji her cûreyê heywan, dewar û teyr, dido dido li ba Nuh di gemiyê de bûn.

Hemû mirovên ku guhê xwe nedidan Xwedê li derve man.

* * *

Li ser erdê çil rojan tofan çêbû. Av zêde bû, gemî ji erdê rabû û li ser rûyê avê diçû.

Av li ser erdê zehf gelek bilind bû û hemû çiyayên bilind nixumandin. Av heft metre din jî bilind bû û çiya nixumandin.
Her tiştê ku li ser erdê diliviya – teyr, dewar û heywan û her tiştê ku li ser erdê dişêle – û hemû mirov helak bûn. Her tiştê jîndar ê ku li ser erdê bû, tev hatin xîş kirin.
Tenê Nuh û yên ku bi wî re di gemiyê de bûn, man.

Av sed û pêncî rojan li ser erdê bilind ma.
Hingê Xwedê Nuh û hemûyên ku pê re di gemiyê de bûn, anîn bîra xwe û ba li ser erdê rakir. Kaniyên kûrahiyê û çaviyên ezmên hatin girtin û baran sekinî. Hin bi hin av ji erdê kişiya û di roja 17'ê meha 7'an de gemî li ser çiyayên Araratê rûnişt.

Piştî çend rojan, Nuh pencera gemiyê vekir û qirik berda. Heta ku av li ser erdê zuwa bû, ew vir ve û wir ve firiya.
Hingê Nuh kevok jî şand, ku bibîne ka av ji ser rûyê erdê kişiyaye, an na. Lê kevokê cih ji xwe re peyda nekir û vegeriya ba Nuh, çimkî av hê jî li ser tevahiya erdê bû. Nuh destê xwe dirêj kir, ew girt û anî gemiyê ba xwe.

Piştî heft rojên din wî carek din kevok berda. Êvarê kevok zivirî ba Nuh û va ye, pelekî zeytûnê yê nû jêkirî di nikulê wê de bû. Hingê Nuh zanî ku av ji ser rûyê erdê kişiyaye.

Piştî heft rojên din wî cara sisiyan kevok şand, lê ew hew lê vegeriya.

* * *

Çaxê Nuh 601 salî bû, di roja bîst û heftê meha diduyan de, erd bi tevahî zuwa bû.
Hingê Xwedê ji Nuh re got: «Hûn hemû ji gemiyê derkevin.» Li ser vê yekê Nuh û her sê kurên wî û jina wî û bûkên wî derketin û hemû heywan û her teyr û her tiştê ku li ser erdê dilive, hemû jî ji gemiyê derketin.

Nuh ji Xudan re qurban pêşkêş kir. Wî ji keviran gorîgehek çêkir û çend heywanên helal û çend teyrên helal anî, serjêkirin û li ser gorîgehê şewitandin, kirin gorî.

Xudan ew gorî, yanî qurban, qebûl kirin û bi wan kêfxweş bû û ji xwe re got:
«Fikrên dilê mirov ji zaroktiya wî ve xerab in, lê dîsa jî ez ji rûyê mirov carek din erdê naxim bin nifirê. Êdî wek ku min kir, ez carek din li her tiştê jîndar naxim.

Heta ku erd bimîne,
Çandin û dirûtin,
Serma û germî,
Havîn û zivistan,
Roj û şev
Xilas nabin.»

Xwedê Nuh û kurên wî bimbarek kirin û ji wan re got: «Zêde bibin û rûyê erdê tije bikin. Tirs û heybeta we wê bikeve ser hemû heywanên erdê û hemû teyrên ezmên, hemûyên ku li ser axê dişêlin û ser hemû masiyên deryayê; ew ji we re hatin dayîn.
Ez her heywana ku dilive didim we ku ji bo we bibe xwarin; wek ku min giya û fêkî dane we, ez niha her tiştî didim we. Lê belê goşt bi xwîna wî ve nexwin. Çimkî jiyan di xwînê de ye. Bi rastî, kî xwîna we birijîne, ezê hesabê wê jê bixwazim; ezê wê ji her heywanê û ji her mirovî bixwazim.

Her kî xwîna mirov birijîne,
Xwîna wî wê bi destê mirov bê rijandin.
Çimkî Xwedê mirov di sûretê xwe de çêkir.

Hûn berdar bibin û zêde bibin; li ser erdê zêde bibin. Ez peymana xwe bi we û bi dûndana we re û bi hemû heywan, teyr û dewaran re, qayîm dikim. Êdî tofana ku erdê helak bike, hew çêdibe.»

Û Xwedê got: «Nîşana peymana ku ez dixim nav xwe û we û her afirînê jîndar ê ku bi we re ye, her û her ji bo hemû nifşan, ev e: Min keskesor xistiye ewran, ewê di nav min û erdê de bibe nîşana peymanê. Kengê ez ewran bînim ser erdê û keskesor di ewran de bê dîtin, ezê peymana di nav xwe û we û her cûreyê afirînên jîndar de, bînim bîra xwe. Êdî careke din av nabe tofan ku her tiştê jîndar helak bike. Kengê keskesor di ewran de hebe, ezê wê bibînim û ezê peymana herheyî ya di nav min û we û her cûreyê afirînên jîndar de, bînim bîra xwe.»

***

Kurên Nuh ên ku ji gemiyê derketin, Sam, Ham û Yafet bûn. Hemû mirovên ku li ser rûyê erdê belav bûn, ji wan çêbûn.

# Birca Babîlê

(Destpêkirin 11)

Piştî tofana Nuh, mirov ji zarokên Nuh dîsa li ser dinyayê zêde bûn.

Di wê demê de zimanê hemû mirovên dinyayê yek bû û peyivîna wan jî yek bû. Çaxê ku wan ber bi Rojhilat ve koç kir, li herêma Şînarê deştek dîtin û li wir cîwar bûn.

Wan ji hev re got: «Werin, em ji xwe re bajarekî û birceke ku serê wê bigihîje ezmên ava bikin, da ku em nav û dengê xwe derxin; nebe ku em li ser rûyê hemû erdê belav bibin. Werin, em kelpîçan çêkin û em wan baş biqelînin.»

Wan kelpîç çêkirin, ew baş qelandin û dest bi avakirinê kirin (di şûna keviran de kelpîçên wan û di şûna xercê de, zifta wan hebû).

Xwedê bi nêta wan dizanî û li wî bajarî û li wê birca ku mirovan çêdikirin, nêrî û got:
«Ew hemû yek nijad in û zimanê wan hemûyan yek e. Wan dest bi vê yekê kiriye û êdî tu tiştê ku bixwazin bikin ji wan re namîne zehmet. Werin, em dakevin jêr û zimanê wan tevlihev bikin, da ku ew zimanê hev fêm nekin.»

Xwedê weha kir, zimanê mirovan tevlihev kir û wan zimanê hev fêm nekir. Devjeniyeke dijwar ket nav wan û wan zû dev ji avakirina bajêr berda û li ba hev neman.

Bi wî awayî Xwedê mirov li ser rûyê hemû erdê belav kirin. Ji ber vê yekê ji bajêr re ‹Babîl› hat gotin, çimkî Xudan zimanê hemû mirovan li wir tevlihev kir û bû ‹bil bila› wan.

# Serhatiya Eyûb

Di diyarê Ûts de zilamek hebû, navê wî Eyûb bû. Eyûb zilamekî bêkêmahî û rast bû; ew ji Xwedê ditirsiya û xwe ji xirabiyê dida paş, yanî ji neqenciyê dûr diket. Ji wî re heft kur û sê keç çêbûn. Eyûb zilamekî dewlemend bû: heft hezar pez, sê hezar deve, pênc sed cot ga, pênc sed maker, yanî kerên mê û zehf gelek xulamên wî hebûn. Eyûb ji hemû kurên Rojhilatê biqedirtir bû.

Adeta kurên Eyûb ev bû: Wan bi dorê xuşk û birayên xwe vedixwendin mala xwe, ziyafet didan û hingê hemûyan bi hev re dixwar û vedixwar.

Çaxê ku dora ziyafetên wan xilas dibû, Eyûb sibê zû radibû, gazî zarokên xwe dikir û ji bo her yekî gorî pêşkêşî Xwedê dikir. Çimkî wî ji xwe re digot: «Dibe ku wan bê hemdî guneh kiribe.» Eyûb her gav weha dikir.

* * *

Rojekê milyaket li ber Xwedê civiyan; her kes li cihê xwe li ber Xwedê sekinî û Îblîs jî di nav wan de rawesta.

Xwedê jê re got: «Tu ji ku derê têyî?»

Îblîs got: «Ez ji gera dinyayê ya li vir û dera ha têm.»

Xwedê jê re got: «Ma te qenc li xulamê min Eyûb nêrî? Li dinyayê yekî din wek wî tune. Ew zilamekî bêkêmahî û rast e. Ew ji Xwedê ditirse û xwe ji xerabiyê dide paş.»

Îblîs jê re got: «Ma Eyûb badîhewa ji Xwedê ditirse? Ma te ew, mala wî û her tiştê wî neparastiye? Te karên destê wî bereket kirine û malê wî li welêt zêde bûye. Lê belê destê xwe dirêj bike û bavêje her tiştê wî; bi rastî, ewê li ber te nifiran li te bike.»

Xwedê ji Îblîs re got: «Va ye, her tiştê wî di destê te de ye. Bi tenê destê xwe dirêjî wî bi xwe neke.»

Li ser vê yekê Îblîs ji ba Xwedê derket.

* * *

Rojekê, çaxê kur û keçên Eyûb li mala birayê xwe yê mezin dixwarin û vedixwarin, qasid hat ba Eyûb û jê re got: «Me cot dikir û kerên te li ba ga diçêrîn. Ji nişkê ve Şebayiyan avêt ser wan û ew birin, çûn. Wan, xulamên te dan ber devê şûr, kuştin. Ez bi tenê reviyam, xilas bûm, da ku ez xeberê bidim te.»

Ev zilam hê dipeyivî, yekî din hat û got: «Agirê Xwedê ji ezmên ket û pez û xulam şewitandin, kuştin. Ez bi tenê reviyam, xilas bûm, da ku ez xeberê bidim te.»

Ev zilamî hê dipeyivî, yekî din jî hat û got: «Kildaniyan xwe kirin sê bir û êrîşî deveyên te kirin, ew standin û birin. Wan, xulamên te dan ber devê şûr, kuştin. Ez bi tenê reviyam, xilas bûm, da ku ez xeberê bidim te.»

Ev zilam hê dipeyivî, yekî din jî hat û got: «Kur û keçên te li mala birayê xwe yê mezin dixwarin û vedixwarin. Ji çolê wê ve bayekî mezin hat û li her çar riknên xênî da û xanî bi ser zarokên te de hilweşa. Ez bi tenê reviyam, xilas bûm, da ku ez xeberê bidim te.»

Li ser vê yekê Eyûb rabû, xiftanê xwe qetand, pora xwe qusand, ket erdê, perizî Xwedê û got:

«Ez ji zikê diya xwe tazî derketim
Û ezê tazî vegerim wê derê.
Xudan da û Xudan stand;
Navê Xudan pîroz be.»

Di van hemû tiştan de Eyûb guneh nekir û peyvek ne li ser rê li hember Xwedê negot.

* * *

Rojekê milyaket li ber Xwedê civiyan; her kes li cihê xwe li ber Xwedê sekinî û Îblîs jî di nav wan de rawesta.

Xwedê jê re got: «Tu ji ku derê têyî?»

Îblîs got: «Ez ji gera dinyayê ya li vir û dera ha têm.»

Xwedê jê re got: «Ma te qenc li xulamê min Eyûb nêrî? Li dinyayê yekî din wek wî tune. Ew zilamekî bêkêmahî û rast e. Ew ji Xwedê ditirse û xwe ji xerabiyê dide paş. Te ez tûj kirim ku ez bê sedem wî biqurtînim, lê wî dev ji rastdariya xwe bernadaye.»

Îblîs jê re got: «Her çiyê mirov hebe, ew ji bo canê xwe dide. Tenê destê xwe dirêj bedena wî bike, bi rastî, ewê li ber te nifiran li te bike.»

Xwedê ji Îblîs re got: «Va ye, ew di destê te de ye. Bi tenê destê xwe dirêjî canê wî neke.»

Li ser vê yekê Îblîs ji ba Xwedê derket û ji binê lingê wî û heta bi şilka serê wî bi kûnêrên xerab li Eyûb xist.

Eyûb rahişt kafikekê ku xwe pê bixwerîne û di nav xweliyê de rûnişt.

Hingê jina wî jê re got: «Ma tu hê jî bêkêmahiya xwe hişk digirî? Nifiran li Xwedê bike û bimire!»

Lê belê wî jê re got: «Ka jineke bêaqil çi dibêje, tu jî wusa dibêjî.

Ma em qenciyê ji Xwedê qebûl bikin û xerabiyê qebûl nekin?»

Di van hemû tiştan de Eyûb bi lêvên xwe guneh nekir.

* * *

Êlîfazê Temanî, Bîldadê Şûxî û Tsofarê Naematî sê dostên Eyûb bûn. Çaxê wan bihîst ku çi hatiye serê wî, her yek ji cihê xwe rabû û li hev civiyan; ew li hev hatin ku herin ba wî, da ku bi wî re êşên wî hilgirin û di ber dilê wî de bên.

Wan ji dûr ve çavên xwe hildan, lê belê wan ew nas nekir. Çaxê ew nêzîkî wî bûn û dîtin ku ev ew e, wan dengê xwe bilind kir û giriyan, her yekî xiftanê xwe çirand û xwelî li serê xwe kir. Heft roj û heft şevan ew li rex wî li erdê rûniştin; wan peyvek jê re negot, çimkî wan dît ku êşa wî gelek mezin e.

* * *

Piştî van heft rojan, Eyûb devê xwe vekir û nifir li roja bûyîna xwe kir û got:

Bila ew roja ku ez bûme, tune be!
Bila ew şeva ku got: «Kurek ket zikê diya xwe» tune be!
Ev roj bila bibe tarî!
Bila Xwedê ji jor lê negire
Û bila ronahî şewqê nade wê!
Bila tarî û taristan lê xweyî derkevin!
Bila ewr dakevin ser wê
Û tarîbûna rojê, wê bitirsîne! (3:1-5)
Çima ronahî ji mirovê xemgîn re
Û jiyan ji canê dil bil kul re tê dayîn?
Ew mirinê dixwazin, lê mirin nayê,
Ew ji xezîneyan zêdetir lê digerin, [lê nabînin].
Eger wan gor bidîta, wanê ji şahiyê xwe hilavêta û dilgeşî bidîtana.
Nalîna min ji beriya nanê min tê

Û hawar hawara min wek avê dirije.
Çimkî tiştê ku ez jê ditirsim, tê serê min.
Ez ne bê xem im, ne di aştiyê de me û ne rihet im; tenê tengahî tê. (3:20-22; 24-26, kinkirî)

* * *

Piştî van gotinên Eyûb, **Êlîfaz** dest pê kir û got:

«Va ye, te cesaret da gelekan û te destên ku sist bûne, xurt kirin.
Gotinên te, ewê ku li ber terpilînê bû, li ser piyan girtin,
Û te ew çokên ku sist bûne, qayîm kirin.
Lê belê, gava tê serê te, tu aciz dibî,
Dema rastî te tê, tu şaş dibî.
Ma ewledariya te, ne tirsa te ya ji Xwedê ye?
Ma hêviya te, ne bêkêmahiya riyên te ye?
Li ser vê yekê qenc bifikire:
Ma kengê yê bê sûc helak bûye?
Ma li ku derê yên rast qir bûne? (4:3-7)
Ma qet dibe ku bende di çavê Xwedê de rast be?
Qey dibe ku mirov li ber Afirandar paqij derkeve? (4:17)
Va ye, hêrs yê bêaqil dikuje û çavnebarî jî mirovê besît dimirîne. (5:2)
Ez bûma, ezê li Xwedê bigerama û niha minê bihişta bi hêviya Xwedê ve. (5:8)
Xwezî bi wî mirovê ku Xwedê wî terbiye dike.
Loma edebkirina Karîndarê her tiştî kêm nebîne!
Ew hem birîndar dike, hem jî ew dipêçe;
Ew diperçiqîne, lê destên wî qenc jî dikin.» (5:17+18)
Yanî wî got: «Eyûb, tu jî mirovek wek ên din î.
Eger yek bikeve tengahiyê, sedem ew e ku wî mirovî guneh kiriye.
Xwe li ber Xwedê nizim bike û Xwedê wê alîkariya te bike.»

* * *

Ma peyvên Êlîfaz rast bûn? Erê, rast e: Li ber Xwedê her mirov sûcdar e, yanî gunehkar e. Erê, rast e: Divê mirov her gav xwe bispêre Xwedê. Lê belê Êlîfaz fêm nekir ku sedema tecrûbeya Eyûb ne guneh bû. Loma handana wî gelek pûç bû û di çavên Eyûb de hişk bû.

* * *

**Eyûb** weha bersîva wî da û got:

«Tîrên Karîndarê her tiştî di bedena min de ne,
Ruhê min jehra wan vedixwe.
Ma kerê hov li mêrga şîn dizire?
Ma ga li ba alif diqûre? (6:4-5)
Xwezî daxwaza min bihata qebûlkirin
Û Xwedê li gor hêviya min bida min.
Xwezî li Xwedê xweş bihata ku ez biperçiqandam -
Hingê ev wê ji min re bibûya teselî ku
Min gotinên Yê Pîroz înkar nekirine.
Ma qeweta min çi ye ku ez hê bisekinim?

Dawiya min wê çawa be ku ez sebir bikim? (6:8-11)
Ma ne wusa ye ku ji min re qet alîkarî nemaye?
Ma ez ne bêçare me? (6:13)
Yê ku ji hevalê xwe re dilsoziyê nake,
Dev ji tirsa Xwedê dike. (6:14)

Hînî min bikin, ezê bêdeng bimînim!
Ji min re bêjin ku şaşîtiya min çi ye! (6:24)
Nerm bin, bila neheqî nebe!
Erê, bisekinin, doza min hê rast e.» (6:29)

* * *

Li ser vê yekê hevalê Eyûb ê din **Bîldad** bersîv da, got:

«Ma heta kengê tê weha bêjî?
Ma Xwedê edaletê xwehr dike?
Ma Karîndarê her tiştî dadperweriyê badide?
Madem ku zarokên te guneh kirin,
Wî ew dane destê cezayê xerabiya wan.
Eger tu ji dil û can li Xwedê bigerî
Û li ber Karîndarê her tiştî bigerî,
Eger tu rast û bêkêmahî bî,
Bi rastî ewê niha ji bo te rabe
Û ewê te vegerîne wî cihê ku te heq kiriye. (8:1-6)
Xwedê mirovê bêkêmahî ji ba xwe neavêje
Û destê xerabkaran nagire.» (8:20)

* * *

Peyvên Bîldad jî rast bûn:
Xwedê tu caran tiştekî xerab nake. Ew her gav rast û dilsoz e û ew ji mirovan hez dike. Lê dîsa jî carna mirov dikeve tengahiyê û nizane ku çima ew ketiye wê tecrûbeyê.
Bîldad fêm nekir ku fikrên Xwedê di ser fikrên mirovan re ne; wî fêm nekir ku hiş û aqilê me her gav nikare riyên Xwedê yên rast, qenc fêm bike.

* * *

**Eyûb** weha bersîva wî da û got:

«Bi rastî, ez dizanim ku weha ye,
Lê mirov çawa dikare li ber Xwedê rast derkeve?
Eger yek bixwaze li hember wî dozê veke,
Nikare ji hezar pirsan bersîva yekê bide wî.
Yê şehreza û yê bi qewet ew e;
Ma kî li hember wî rabû û ma parastî?
Kî dikare jê re bêje: Tu çi dikî? (9:1-4)
Ez bê sûc im, lê belê ez xema xwe ji xwe nakim;
Ez jiyana xwe kêm dibînim, ferq tune. (9:21)

Eger ez bêjim: Ka ez gazinên xwe ji bîr bikim,

Ez rûyê xwe yê xemgîn biguherim, geş bibim,
Dîsa jî ez ji ber hemû derdên xwe dilerizim.
Ez dizanim ku tu min bê ceza nahêlî;
Eger bivê ku ez bi sûc bim, çima ez badîhewa keda xwe bidim? (9:27-29)
Xwedê wek min ne mirov e ku ez bersîvê bidim wî û bi wî re herim dîwanê.
Di nav me de navbervan tune ku destê xwe deyne ser me herduyan.» (9:32-33)

* * *

Li ser vê yekê **Zofar** bersîva Eyûb da û got:

«Te got: ‹Ez di çavên Xwedê de paqij im›.
Xwezî Xwedê bipeyiviya û li hember te lêvên xwe vekirana
Û sirên şehrezayiyê bi te bidana zanîn!
Bizane ku Xwedê çavên xwe çiqas li sûcên te dineqîne.
Ma tu dikarî kûrahiya Xwedê derînî?
Ma tu dikarî bigihîjî mezinahiya Karîndarê her tiştî? (11:4-7, kinkirî)
Ew, mirovên bêkêr nas dike
Û bala xwe nedeyê jî, xerabiyê dibîne. (11:11)
Eger di destê te de xerabî hebe, wê dûr bixe
Û bila neheqî di çadirên te de rûnene.
Eger tu dilê xwe rast bikî
Û destên xwe jê re bilind bikî,
Hingê tê bikarî rûyê xwe bêfihêtkarî bilind bikî,
Tê nelebte bî û tu natirsî.» (11:13-15)

* * *

Zofar jî bi kurtvebirî ji Eyûb re got ku gunehê te veşartî be jî, te guneh kiriye, û bi rastî tu kes nikare bêje ku ew li ber Xwedê paqij e. Loma Xwedê hişt ku ev bela bê serê te.»

* * *

**Eyûb** weha bersîva Zofar da, got:

«Bê guman mirovên rast, hûn in û mixabin jî şehrezayî wê bi we re bimire!
Lê belê wek aqilê we yê min jî heye, ez ji we ne kêmtir im;
Ma kî tiştên weha nizane? (12:1-3)
Lê ez dixwazim ji Karîndarê her tiştî re bêjim
Û ez dixwazim li ber wî xwe biparêzim. (13:3)
Xwezî hûn tam bêdeng bimana!
Ev wê ji bo we şehrezayî bibûya! (13:5)
Ma hûn dixwazin aliyê Xwedê bigirin
An di cihê wî de dozê vekin?
Eger ew, we bikişîne pirsê, ma wê ji we re qenc be? (13:8-9)
Qenc guhê xwe bidin gotinên min
Û tiştê ku ez bêjim, bila bikeve guhê we.

Va ye, min doza xwe vekir
Û ez dizanim ku ezê rastdar derkevim.

Yê ku doza wî bi min re heye, kî ye?
Eger hebe, hingê ezê bêdeng bimînim
Û nefesa xwe ya dawî bidim.
Ya Xwedê, bi tenê van herdu tiştan li min neke
Hingê ez xwe li ber te venaşêrim:
Destê xwe ji ser min rake
Û bila tirsehêza te, min nebizdîne.
Hingê gazî min bike û ezê bersîvê bidim,
An jî ez bêjim û tu bersîvê bide min!»
Ma çiqas guneh û sûcên min hene?
Sûc û xerabiyên min, bi min bide zanîn.
Çima tu rûyê xwe ji min vedişêrî
Û min dijmin hesêb dikî? (13:17-24)
Xwezî te ez di diyarê miriyan de hilaniyam
Û heta ku hêrsa te derbas bibûya, te ez li wir veşartam! (14:13)

* * *

Rehmê li min bikin! Ya dostên min, rehmê li min bikin!
Çimkî destê Xwedê bi giranî ket ser min.
Xwezî gotinên min bihatana nivîsandin,
Xwezî di kitêbê de bihatana nivîsandin
Û ew bi qelema hesin û bi zirîçê di latê de bihatana kolandin, da ku ew her û her bimana.
Lê belê ez dizanim ku navbervanê min sax e û çavên min wê wî bibînin. (19: 21.23.25.27)

* * *

Demeke dirêj di nav wan de devjenî çêbûn û di dawiyê de Êlîfazê Temanî, Bildadê Şûxî û Tsofarê Naematî dev ji bersîvdanê berdan, çimkî Eyûb di çavên xwe de rast bû.

Hingê hevalekî din dest bi peyivînê kir. Ew kurê Baraxêlê Bûzî bû, navê wî **Êlîhu** bû. Hêrsa wî li hember Eyûb rabû, çimkî Eyûb ne Xwedê, lê xwe bi xwe rast derxist. Hêrsa wî li hember her sê hevalên din jî rabû, ji ber ku wan Eyûb sûcdar derxist, lê dîsa nikaribûn ku bersîva wî bidin.

Wî weha ji Eyûb re got:

«Ez ji we hemûyan ciwantir im,
Loma min newêrî tiştê ku ez dizanim, ji we re bêjim. (32:6)
Eger ji destê te bê, bersîva min bide,
Gotinên xwe bêje û li ber min bisekine. (33:5)
Min bi xwe bihîst ku te got:
‹Ez pak im û bê guneh im,
Ez paqij im û sûcê min tune.
Lê dîsa jî Xwedê sedeman dibîne û min dijmin hesêb dike.› (33:9+10)
Va ye, ez ji te re dibêjim: Di vê yekê de te ya rast negot.
Çimkî Xwedê ji mirovan meztir e. (33:12)
Çima tu bi wî re devjeniyê dikî û dibêjî ku ew bersîva gotinên mirovan nade?
Çimkî Xwedê dipeyive, carna bi vî awayî û carna bi awayekî din,
lê mirov pê nahese.

Di xewnê de, di dîtina şevê de, dema xewa giran mirovan digire
û ew di nav nivînan de diponijin, ew guhê mirov vedike û wan hişyar dike,

Da ku wan ji karên wan ên xerab vegerîne
Û canê wan ji goristanê biparêze. (33:13-18, kinkirî)
Eger ji hezaran milyaketek an navberkarek hebe
Yê ku ji bo rastdariya mirov bibe şahid
Û ji Xwedê re bêje:
‹Wî biparêze da ku ew danekeve diyarê miriyan, min berdêl dît›,
Hingê mirov wê li ber Xwedê dua bike
Û Xwedê wê rehmê lê bike û wî qebûl bike.
Ewê bi şahî rûyê Xwedê bibîne
Û Xwedê wê rastdariya wî li wî vegerîne.
Ewê li ber mirovan bistrîne û bêje:
‹Min guneh kir û rastî bada, lê li min nehat vegerandin.
Wî canê min ji daketina diyarê miriyan xilas kir
Û jiyana min ronahiyê dibîne.›
Xwedê du sê caran weha dike,
Da ku canê mirov ji diyarê miriyan vegerîne
Û ew ronahiya jiyanê bibîne. (33:25-30)
Erê, Xwedê ewqas mezin e ku em nikarin bizanin. (36:26)
Heçî Xwedayê karîndar e, em nikarin bigihîjin wî.
Ew di qudretê de mezin e û rastî û tevahiya rastdariyê banade.
Loma mirov jê ditirsin; ew li wan ên ku xwe şehreza hesêb dikin, nanêre.» (37:23-24)

* * *

Hingê **Xwedê** ji bahozê bersîva Eyûb da û jê re got:

«Yê ku bi gotinên ne bi zanastî biryar û daxwaza Xwedê reş dike, kî ye?
Rabe, ezê ji te bipirsim, tu jî bersîvê bide min!
Çaxê min erd damezrand, tu li ku derê bûyî? Eger tu bizanî, bêje!
Kê pîvana wê danî? (38:1-5)
Ma tu gihîştî kaniyên deryayê?
Ma dergehên diyarê miriyan ji te re eşkere bûn?
Ma te dergehên taristaniyê dîtin? (38:16-17)
Ma bavê baranê heye? An jî bavê xûnavê kî ye? (38:28)
Ma tu dikarî li ezmên, li gor wextê wan stêr û bircan derxî? (38:32)
Ma gakovî wê bixwaze xulamtiya te bike?
An ewê li rex afirê te, şeva xwe bibihûrîne? (39:9)
Ma tu, qewetê didî hêsp? (39:19)
Ma baz bi saya fêmdariya te dadihele
Û baskên xwe ji bo bayê başûrê fireh dike? (39:26)
Ma yê lomeker, bi Karîndar re devjeniyê dike? (40:2)
Yê ku dikare li ber min bisekine, kî ye?
Kê tiştek daye min ku ez li wî vegerînim?
Di bin tevahiya ezmên de çi hebe, ew yê min e.» (41:11+3)

* * *

Hingê **Eyûb** bersîv da Xwedê û got:

«Va ye, ez tiştekî nehêja me. Ma ez çi bersîvê bidim te?
Ez destê xwe datînim ser devê xwe.

Min carekê got, ez careke din dengê xwe bilind nakim,
Min du caran got, êdî ez hew dikim. (40:4-5)
Min fêm kir ku tu dikarî her tiştî bikî
Û tu mebesta te, neyê sekinandin.
Erê, min tiştên ku min fêm nekirin gotin,
Ew tiştên ecêb ji min bilindtir in, ez bi wan nizanim.
Min tenê ji vî û ji yê ha li ser te bihîstibû, lê niha çavê min tu dîtî.
Loma ez xwe nizim dikim û ez di nav xwelî û tozê de tobe dikim.» (42:2-6)

* * *

Piştî vê yekê **Xwedê** ji Êlîfazê Temanî re got:

«Hêrsa min li hember te û li hember herdu hevalên te rabûye, çimkî we, wek xulamê min Eyûb li ser min ya rast negot.

Niha ji bo xwe heft ga û heft beranan bistînin û herin ba xulamê min Eyûb û goriya şewitandinê pêşkêş bikin. Bila xulamê min Eyûb ji bo we dua bike. Bi tenê di ber wî de ez li gor bêaqiliya we li we nakim. Çimkî we, wek xulamê min Eyûb li ser min ya rast negot.»

Li ser vê yekê Êlîfazê Temanî, Bildadê Şûxî û Tsofarê Naematî çûn û wek ku Xwedê emir li wan kiribû, weha kirin. Û Xwedê duaya Eyûb qebûl kir.

Piştî ku Eyûb ji bo dostên xwe dua kir, Xwedê halê Eyûb guhert. Xwedê du qat li malê Eyûb yê berê da wî. Û hemû birayên wî û xwişkên wî û hemûyên ku berê ew nas dikirin, hatin ba wî û di mala wî de bi wî re nan xwarin. Wan ji ber hemû bela û tengahiyên ku Xwedê anîbûn serê wî, han dan wî û her yekî çend zîv û gustîlkeke zêr dan wî. Û Xwedê dawiya jiyana Eyûb ji destpêka wê bêtir bereket kir. Ew bû xwediyê çardeh hezar pez û sê hezar deve û hezar cot ga û hezar maker, yanî kerên mê. Ew careke din bû bavê heft kur û sê keçan.

Piştî van tiştan Eyûb sed û çil salan jiya û kur û neviyên xwe heta nifşê çaran dîtin. Ew pîr û kal bû û ji rojan têrbûyî mir.

# SERHATIYA BIRAHÎM

## Birahîm û Lût
(Destpêkirin 12-14)

Li Babîlê Xwedê zimanê mirovan tevlihev kir û hingê mirov ji wir derketin û li ser dinyayê belav bûn. Dem derbas bû û careke din Xwedê gazî mirovekî kir, ku bi wî plana xwe ya qenc pêş ve bibe. Em niha tên ser serhatiya Avram, yanî Birahîm.

Kurê Nuh Sam du salan piştî tofanê bû bavê Arpexşad, Arpexşad bû bavê Şalah, Şalah bû bavê Eber, Eber bû bavê Pêlêg, Pêlêg bû bavê Rêwo, Rêwo bû bavê Serûx, Serûx bû bavê Nehor, Nehor bû bavê Têrah û Têrah bû bavê Avram. Avram navê pêşî yê Birahîm bû.

Avram li bajarê Ûra Kildaniyan hat dinê. Ev bajarê kevin, li ber Çemê Firat bû û kavilên wî cihî hê îro li başûrê Îraqê tên dîtin.
Du birayên Avram hebûn, navên wan Nehor û Haran bûn. Her siyan ji xwe re jin anîn, lê jina Avram Sarayê zarok nedianîn.

Têrah bi kurê xwe Avram, bi neviyê xwe Lûtê kurê Haran û bi bûka xwe Sarayê, yanî bi jina kurê xwe Avram û bi xulam û xizmetkarên xwe, bi hemû pez û dewarên xwe ve ji bajarê Ûrê derket. Ew bi rexê Çemê Firat ve çûn û gihîştin heta bajarê Heranê. Heran îro gundekî bi nav û deng ê Rihayê ye. Di wê demê de li Heranê gelek riyên karwanan digihîştin hev.
Têrah bi hemû maliyên xwe ve li Heranê rûnişt û piştî demekê Têrah mir.

Xudan hê li Ûra Kildaniyan ji Avram re gotibû: «Ji welatê xwe, ji ba gelê xwe û ji mala bavê xwe derkeve û here welatê ku ezê nîşanî te bidim. Ezê te bikim miletekî mezin. Ezê te bereket bikim. Ezê navê te mezin bikim û tê pîroz bibî. Yên ku te pîroz bikin, ezê wan pîroz bikim. Û yên ku nifirê li te bikin, ezê nifirê li wan bikim. Hemû eşîrên li ser rûyê erdê wê bi te pîroz bibin.»

Avram wek ku Xudan jê re gotibû çû. Lût jî bi wî re çû.

Çaxê ku Avram ji Heranê derket, ew heftê û pênc salî bû. Wî bi xwe re jina xwe Saray, biraziyê xwe Lût û hemû malê xwe yê ku li Heranê bi dest xistibû û yên ku bûbûn xulamên wî, bi xwe re birin. Ew ber bi welatê Kenanê ve ketin rê û gihîştin wê derê. Di wê demê de Kenanî li wir dijiyan. Avram di welêt de heta bi darmaziya Morê ya ku nêzîkî Şexemê bû, çû.
Xudan li Avram xuya bû û got: «Ezê vî welatî bidim dûndana te.» Avram li wî cihê ku Xudan lê xuya bûbû, ji keviran gorîgehek çêkir.
Avram ji wir da rê û ber bi çiyayê rojhilata Beyt-Êlê ve çû û konê xwe danî. Li wir jî wî ji Xudan re gorîgehek çêkir û perizî Xudan.

* * *

Kon, pez û dewarên Avram û Lût zehf hebûn. Ji bo ku ew bi hev re rûnin, cih têra wan nedikir. Malê wan evqas pirr bû, êdî nikaribûn bi hev re rûnin.

Di nav şivanên Avram û yên Lût de devjenî çêbûn. Loma Avram ji Lût re got: «Bila di nav min û te de û di nav şivanên min û yên te de dilmayîn çênebe, çimkî em bira ne. Ma hemû welat ne li ber te ye? Qenc e ku em ji hev veqetin. Eger tu herî aliyê çepê, ezê herim aliyê rastê û eger tu herî aliyê rastê, ezê herim aliyê çepê.»

Lût serê xwe bilind kir û dît ku deşta Çemê Urdunê heta bi bajarê Soarê, wek baxçê Xudan, wek welatê Misrê şîn û bi av bû. Loma Lût hemû deşta Urdunê ji xwe re hilbijart û ber bi Rojhilat ve koç kir; bi wî awayî ew ji hevdû veqetiyan. Avram li welatê Kenanê û Lût li bajarên deştê rûnişt û ber bi bajarê Sodomê ve konê xwe vegirt. Heçî xelkê Sodomê bû, ew gelek xerab bûn û wan li hember Xudan pirr guneh dikirin.

Piştî ku Lût ji ba Avram veqetiya, Xudan ji Avram re got: «Serê xwe rake û ji cihê ku tu lê yî, li bakur û li başûr, li rojhilat û li rojava binêre. Ezê hemû vî welatê ku tu dibînî, ji bo her û her bidim te û dûndana te. Ezê dûndana te wek toza erdê zêde bikim. Wusa ku mirovek bikare toza erdê bijmêre, wê bikare dûndana te jî bijmêre. Rabe, li ser û binê welêt bigere. Çimkî ezê vî welatî bidim te.»

Hingê Avram konê xwe rakir û çû bajarê Hevronê û li darmaziyên Mamrê rûnişt û li wir gorîgehek ji Xudan re çêkir.

Di wê demê de çar padîşahên mezin li hember padîşahê Sodomê û padîşahê Gomorayê û li hember sê padîşahên din di geliyê Sîdîmê de ketin cengê.

Ew her çar padîşahên mezin bi ser ketin û wan rahişt hemû mal û zadê Sodom û Gomorayê û ew bi xwe re birin. Biraziyê Avram Lût jî li aliyê Sodomê rûdinişt; loma wan rahişt wî û maliyên wî jî û hemû malê wî jî birin.

Zilamekî ku ji wir reviyabû û xilas bûbû hat û xeber da Avram. Avram li darmaziyên Mamrê, yê Amoriyê ku birayê Anêr û Eşxol bû, rûdinişt. Peymana wan her siyan bi Avram re hebû.

Çaxê Avram bihîst ku biraziyê wî dîl hatiye standin, wî sê sed û hejdeh xulamên xwe yên çekdar yên ku di mala wî de çêbûbûn hildan û dan pey wan. Wî bi şev xulamên xwe kirin bir û bir, êrîşî wan kirin û li wan xistin.

Hingê Avram hemû malê ku hatibû talankirin, biraziyê xwe Lût û malê wî û jin û hemû xelkên din jî bi şûn ve anîn.

Piştî ku Avram ew her çar padîşah têk birin, padîşahê Sodomê hat pêşiya wî. Padîşahê Salêm Melkîsedek jî hat û nan û şerab anî. Ew kahînê Xwedayê Herî Bilind bû. Wî Avram pîroz kir û got: «Bila Xwedayê Herî Bilind ê ku erd û ezman afirandiye Avram bimbarek bike. Xwedayê Herî Bilind ê ku dijminên te dan destê te pîroz be.» Avram ji her tiştî dehyek da wî.

Padîşahê Sodomê ji Avram re got: «Mirovan bide min, mal ji xwe re bistîne.»

Lê Avram ji padîşahê Sodom re got: «Min destê xwe ji Xudan Xwedayê Herî Bilind ê ku erd û ezman afirandiye re bilind kir û sond xwar ku ez tiştekî ji yê te nestînim, ne benikekî û ne jî dûlikekî çaroxê. Nebe ku tu bêjî: ‹Min Avram dewlemend kir.› Ji tiştên ku xulamên min xwarine û ji para wan ên ku bi min re hatin pê ve, ez tiştekî din nastînim. Bila Anêr, Eşxol û Mamrê para xwe bistînin.»

## Soza li ser bûyîna Îshaq – Bûyîna Simayîl – Peymana Sinetê

(Destpêkirin 15 – 17)

Çaxê ku Avram bi mala xwe ve ji Heranê derket, ew heftê û pênc salî bû. Ew gihîşt welatê Kenaniyan û Xwedê li wê derê jê re got ku ew welat wê bibe mîrasa wî û mîrasa dûndana wî. Lê hê zarokên Avram û Sarayê nebûn.

Piştî wan tiştan, Xwedê di dîtinekê de ji Avram re weha got: «Netirse, Avram. Ez ji bo te mertal im, ez xelata te ya gelek mezin im.»

Avram got: «Ya Xudan Xweyiyê min, tê çi bidî min? Te dûndan neda min. Ez bê zarok diçim. Malê min wê ji vî Eliyezerê Şamî re bimîne, ewê bibe wêrisê min.»

Lê Xudan ji Avram re weha got: «Ew Eliyezer nabe wêrisê te. Lê yê ku wê ji pişta te be wê bibe wêrisê te.»

Xudan Avram deranî derve û got: «Li ezmên binêre. Eger tu bikarî stêran bijmêrî, wan bijmêre. Dûndana te wê ewqas be.

Vê yekê jî qenc bizane: Dûndana te wê li welatê xerîb bibe kole û çar sed salan zordarî wê li wan bê kirin. Lê ezê dîwana gelê ku wê tengahiyê bide wan, bikim û piştre ewê ji wî welatî pirr dewlemend derkevin.

Heçî tu yî, tê bi aştî herî ba bav û kalên xwe û di emrekî dirêj û qenc de bêyî veşartin. Û dûndana te wê di nifşê çaran de vegere vê derê. Ji ber ku hê gunehên miletên vî welatî temam nebûne.»

Avram ji Xudan bawer kir û Xwedê ev yek jê re rastdarî hesab kir.

* * *

Avram deh salan li welatê Kenanê rûnişt û Xudan jê re gotibû ku kurek wê jê re çêbe. Lê belê jina wî Sarayê jê re zarok neanîn. Ji ber vê yekê wê ji mêrê xwe re got: «Va ye, Xudan nehiştiye ku ez zarokan bînim. Loma here ba cêriya min. Belkî ji min re ji wê zarok çêbin.»

Navê cêriya wê Hacer bû û ew jineke Misrî bû.

Avram bi gotina jina xwe kir; Sarayê cêriya xwe Hacer anî û da mêrê xwe, da ku jê re bibe jin. Avram jî çû ba Hacer û ew bizaro bû. Çaxê wê dît ku bizaro ye, wê sitiya xwe biçûk dît.

Li ser vê yekê Sarayê ji Avram re got: «Ev neheqî bila bikeve stûyê te. Min cêriya xwe xist berê te û çaxê wê dît ku ew bizaro ye, ez di çavê wê de biçûk bûm. Bila Xudan di nav min û te de hakim be!»

Avram ji Sarayê re got: «Va ye, cêriya te di destê te de ye. Tu her çi bixwazî, bi wê bike.» Hingê Sarayê tengahî da wê û Hacer ji ba wê reviya, çû çolê.

Milyaketê Xudan ew li ser kaniyekê dît.

Milyaket jê re got: «Ey cêriya Sarayê Hacer, tu ji ku derê têyî û bi ku derê ve diçî?»

Wê got: «Ez ji ba sitiya xwe Sarayê direvim.»

Milyaketê Xudan jê re got: «Li sitiya xwe vegere û serî li ber wê deyne.»

Û milyaketê Xudan weha jî got: «Ezê dûndana te pirr û pirr zêde bikim, wusa ku ji pirrbûnê neyê hijmartin.

Va ye, tu bizaro yî
Û tê kurekî bînî.
Tê navê wî ‹Simayîl› (yanî ‹Xwedê dibihîze›) deynî.
Çimkî Xudan hawara te bihîst.
Ewê di nav mirovan de bibe mirovekî kûvî;
Destê wî wê li dijî her kesî
Û destê her kesî wê li dijî wî be.
Ewê li hember hemû birayên xwe derkeve.»

Hacer navê Xudanê ku bi wê re peyivîbû danî, got: «Tu yî ‹Êl Royî› (yanî ‹Xwedê dibîne›).» Çimkî wê got: «Ma min li vê derê ew ê ku min dibîne, dît?» Ji bo wê yekê ji bîrê re ‹Bîr-Lahay-Royî› (yanî ‹Bîra Yê Jîndar ê ku min dibîne›) hat gotin.

Wek ku milyaketê Xwedê gotibû, (wusa) çêbû: Hacer ji Avram re kurek anî û Avram navê kurê wê Simayîl danî. Hingê Avram heştê û şeş salî bû.

* * *

Çaxê ku Avram not û neh salî bû, Xudan xwe nîşanî Avram da û jê re got: «Ez ‹Êl Şeday› (yanî ‹Xwedayê karîndarê her tiştî›) me. Di riya min de here û bêkêmahî be. Ezê peymana xwe di nav xwe û te de çêkim û ezê te gelek zêde bikim.»

Avram deverû çû erdê û Xwedê jê re got: «Va ye, peymana min bi te re ye û tê bibî bavê gelek miletan. Êdî tu bi navê ‹Avram› (yanî ‹bavê mezin›) nayî gazî kirin. Lê navê te wê ‹Birahîm› be (yanî ‹bavê gelekan›), çimkî min tu kirî bavê gelek miletan. Ezê te gelek berdar bikim û milet û padîşah wê ji te derkevin.

Ezê peymana di nav xwe û te de û di nav xwe û dûndana te de, her û her qayîm bikim. Ezê bibim Xwedayê te û Xwedayê dûndana te. Ezê hemû welatê Kenanê ku tu niha bi xerîbî lê rûdinî, bidim te û dûndana te, da ku her û her bibe milkê wan û ezê Xwedayê wan bim.»

Û Xwedê ji Birahîm re got: «Divê ku tu û dûndana xwe û hemû nifşên wan, peymana min bigirin. Peymana min a di nav min û te de û din nav min û dûndana te de, ev e:

Divê her mêrê di nav we de sinet bibe. Divê hûn bên sinetkirin û ewê bibe nîşana peymana herheyî ya di nav min û we de. Di hemû nifşên we de, divê her kurê heşt rojî bê sinetkirin; hem yê ku li mala te çêbûye û hem jî yê ku bi perên te hatiye kirîn, eseh divê bê sinetkirin. Mêrê sinetnebûyî wê ji gelê xwe bê birîn, çimkî wî peymana min şkandiye.»

Hingê Xwedê ji Birahîm re got: «Heçî jina te Saray e, êdî bi navê ‹Saray› gazî wê neke. Lê wê navê wê ‹Sara› (yanî ‹mîrxatûn›) be. Ezê wê bimbarek bikim; erê, ezê ji wê kurekî bidim te û ewê bibe diya gelek miletan; padîşahên miletan wê ji wê çêbin.»

Birahîm deverû çû erdê, keniya û di dilê xwe de got: «Ma ji mêrekî sed salî re kurek çêdibe? Ma Sara ya ku not salî ye wê zarokan bîne?» Wî ji Xwedê re got: «Xwezî Simayîl bikariya li ber te kerem bidîta.»

Xwedê got: «Na. Lê jina te Sara wê ji te re kurekî bîne û tê navê wî ‹Îshaq› (yanî ‹Dikene›) deynî. Ezê bi wî û bi dûndana wî re peymana xwe ya herheyî berdewam bikim.

Û heçî Simayîl e, min tu bihîstî: Ezê wî bimbarek bikim, ezê wî berdar bikim û ezê wî gelek zêde bikim. Ewê bibe bavê diwanzdeh mîran û ezê wî bikim miletekî mezin.»

# Sodom û Gomora

(Destpêkirin 18-19)

Birahîm di germa rojê de li ber deriyê konê xwe rûniştî bû û dît ku sê zilam nêzîkî wî rawesta bûn. Ew çû pêşiya wan, xwe tewand û got: «Ya mîrzayê min, eger min li ber te kerem dîtibe, heta ku tu li ba xulamê xwe nemînî, derbas nebe. Lingên xwe bişon û li bin vê darê bîhna xwe vekin. Ez pariyek nan bînim û bidim ber dilê we, piştre li riya xwe herin.» Wan jî qebûl kir û ew rûniştin.

Çaxê wan dixwar, wan ji Birahîm re got: «Ka jina te Sara li ku derê ye?»

Wî got: «Ew li wir li kon e.»

Yek ji wan got: «Sala ku bê di vê demsalê de, ezê vegerim ba te û kurekî jina te Sara, wê hebe.»

Sarê li deriyê kon li pişt wî guhdarî dikir. Birahîm û Sara êdî pîr bûbûn. Loma Sara di dilê xwe de kenî û got: «Ma piştî vî emrî, ezê kêfê bikim? Bi ser de, malxwê min jî pîr bûye.»

Lê Xudan ji Birahîm re got: «Çima Sara keniya û weha got? Ma ji bo Xudan tiştekî zehmet heye? Sala ku bê ezê vegerim û kurekî Sarê wê hebe.»

Zilam rabûn û ber bi bajarê Sodomê ve çûn; Birahîm jî ji bo ku wan bi rê bixe, bi wan re diçû. Hingê Xudan jê re got: «Giliyê Sodom û Gomorayê pirr mezin e û gunehê wan gelek giran e. Ez herim jêr û bibînim ka tiştên ku kirine bi qasî ku ji min re hatiye gilîkirin xerab e, an na, da ku ez bizanim.»

Birahîm nêzîkî Xudan bû û got: «Ma tê yên rast bi yên xerab re tune bikî? Belkî di nav bajêr de pêncî kesên rast hene. Ma ji bo pêncî kesên rast ên tê de, tu li bajêr nabihûrî? Dûrî te be ku tu yê rast jî bi yê xerab re bikujî. Ma dadgerê hemû dinyayê edaletê nake?»
Xudan got: «Eger ez di Sodomê de pêncî kesên rast bibînim, ezê ji bo xatirê wan tevahiya wî cihî bihêlim.»
Birahîm got: «Ez toz û xweliya ber lingê te me; dîsa min ziravê xwe qayîm kir ku ez bi Xudan re bikevim peyivînê: Em bêjin, çil û pênc kesên rast hebin, ma ji ber pênc kesan tê tevahiya bajêr wêran bikî?»
Xwedê got: «Eger ez li wê derê çil û pênc kesan bibînim, ez wêran nakim.»

Birahîm sê carên din ji Xudan hêvî dikir, heta ku Xwedê jê re soz dabû ku ji bo xatirê bîst kesî jî ewê bajêr helak neke.
Lê Birahîm got: «Bila Xudan nexeyide, ezê bi tenê careke din bêjim. Belkî li wê derê tenê deh kes hene.»
Xwedê got: «Ji bo xatirê deh kesan ez wêran nakim.»
Piştî ku Xudan peyivîna xwe bi Birahîm re xilas kir, ew çû û Birahîm jî vegeriya cihê xwe.

Ew herdu milyaket jî êvarê gihîştin Sodomê. Lût di dergehê bajêr de rûdinişt. Gava wî ew dîtin, rabû ser lingan, çû pêşiya wan, xwe tewand û got: «Mîrzayên min, de kerem bikin mala xulamê xwe. Şeva xwe li ba min derbas bikin û sibê zû rabin, li riya xwe herin.»
Wan got: «Na, emê şeva xwe li meydanê derbas bikin.»
Lê Lût pirr li ber wan geriya, heta ketin mala wî. Wî ji wan re ziyafet çêkir û wan jî xwar.
Hingê wan jê re got: «Hê mirovên te yên din li vir hene? Emê vê derê wêran bikin çimkî giliyê wan li ba Xudan giran bûye. Zavayên xwe, kur û keçên xwe, her kesê xwe ji bajêr derxe, çimkî Xudan em ji bo wêrankirina wî şandin.»
Li ser vê yekê Lût derket, ji zavayên xwe re got. Lê wan guman kirin ku ew henekan bike.

Çaxê bû serê sibê, milyaketan ji Lût re got: «Bilezîne, rabe, jina xwe û herdu keçên xwe bibe. An na, tu jî, tê di nav cezayê bajêr de helak bibî.»
Lût bi giranî rabû, lê Xudan li wan rehm kir. Wan herdu zilaman bi destê wî, jina wî û herdu keçên wî girtin û ew deranîn derveyê bajêr û ji wan re gotin: «Ji bo canê xwe birevin. Li pey xwe nenêrin û li vê deştê nesekinin. Birevin çiyê. An na, hûnê helak bibin.»
Lê Lût got: «Mîrzayê min! Va ye, te kerem li min kir, lê ez nikarim birevim çiyê û felaket wê bigihîje min û ezê bimirim. Li wir bajarok heye, ew nêzîk û biçûk e. Bihêle ku em birevin wir û emê sax bimînin.»
Wî ji Lût re got: «Ez bajarê ku te li ser got, didim xatirê te, ez wî serûbinê hev nakim. Bilezîne, bireve wir. Çimkî heta tu bigihîjî bajêr, ez nikarim tiştekî bikim.»

Çaxê roj derket ser erdê, Lût gihîştibû Soarê.
Hingê Xudan ji ezmên bi ser Sodom û Gomorayê de agir û kewkurt barand. Wî ew bajar û hemû deşt û her kesê ku li wan bajaran rûdinişt û gul û giyayên wê axê serûbinê hev kir. Lê jina Lût li gor emrê Xwedê nekir, wê li paş xwe nêrî û bû stûneke xwê.
Birahîm serê sibê zû rabû û li aliyê Sodom û Gomorayê nêrî û dît ku dûyê erdê wek dûyê hêtûnê derdiket. Hingê wî fêm kir ku li Sodomê deh mirovên rast jî nebûn.

# Bûyîna Îshaq – Tinazên Simayîl

(Destpêkirin 21)

Xudan wek ku gotibû, kerem li Sarê kir û peyva xwe anî cih: Sara bizaro bû û di wî wextê ku Xwedê soz dabûyê de, ji Birahîm re kurek anî. Birahîm navê kurê xwe ‹Îshaq›, yanî ‹Dikene› danî. Çaxê Îshaq heşt rojî bû, Birahîm li gor emrê Xwedê ew sinet kir.

Dema ku kurê wî Îshaq jê re çêbû, Birahîm sed salî bû. Hingê Sarê got: «Xwedê rûyê min kenand; her kesê ku bibihîze, wê bi min re bikene. Ma kê wê ji Birahîm re bigota: ‹Sara zarokan dimêjîne›? Dîsa min di kalîtiya wî de, jê re kurek anî.»

Zarok mezin bû û roja ku Îshaq ji şîr hat vekirin, Birahîm ziyafeteke mezin çêkir û her kesî xwar û vexwar û şa bû. Lê çaxê Sarê dît ku kurê Hacera Misrî Simayîl tinazên xwe dike, wê ji Birahîm re got: «Vê cêriyê û kurê wê bavêje! Çimkî divê ku kurê cêriyê bi kurê min Îshaq re nebe wêris.»

Ev yek li Birahîm giran hat, ji ber ku Simayîl jî kurê wî bû. Lê Xwedê jê re got: «Bila ev yek ji sedemê kurik û cêriyê di çavê te de ne tiştekî xerab be! Guhê xwe bide her tiştê ku Sara ji te re dibêje. Çimkî dûndana te wê bi Îshaq bê gazîkirin. Û ezê kurê cêriyê jî bikim milet, çimkî ew jî dûndana te ye.»

Dotira rojê Birahîm serê sibê zû rabû, rahişt nên û kunikek av û danî ser milê Hacerê. Wî kurik jî dayê û ew rêkir. Hacer bi kurê xwe ve çû û li ber Bîrşêbayê li çol û çolistanan digeriya. Çaxê ava di kunikê wê de xilas bû, wê kurik danî bin deviyekê. Piştre ew bi qasî avêtina tîrekî dûr ket, li pêşber rûnişt û ji xwe re got: «Bila ez mirina kurik nebînim.» Ew li pêşberî kurê xwe rûdinişt, dengê xwe hilda û giriya.

Xwedê dengê kurik bihîst û milyaketê Xwedê ji ezmên gazî Hacerê kir û got: «Çi bi te hatiye, Hacerê? Netirse. Xwedê dengê kurik di halê wî de bihîst. Rabe, kurik rake û bi destê wî bigire. Xwedê wê wî bike miletekî mezin.»

Hingê Xwedê çavên Hacerê vekirin û wê bîreke avê dît. Çû û kunikê xwe ji avê tije kir û av da kurê xwe.

Xwedê Hacer û Simayîl xweyî kirin û bi kurik re bû; Simayîl mezin dibû, li çola Paranê rûnişt û bû tîravêj. Diya wî ji welatê Misrê jê re jinek anî.

Xwedê jî li gor soza xwe Simayîl bimbarek kir: Simayîl bû bavê diwanzdeh kuran û ew li gor eşîrên wan bûn diwanzdeh mîr.

Emrê Simayîl bû 137 sal û dûndana wî di herêmeke nêzîkî sînorê Misrê de rûnişt.

# Ceribandina Birahîm

(Destpêkirin 22)

Birahîm li welatê ku Xwedê jê re soz dabû geriya û bi pez û dewar û şivanên xwe ve ber bi başûr ve çû.

Di wê demê de, Xwedê ji Birahîm re got: «Ey Birahîm!»

Birahîm got: «Va me ez.»

Xwedê got: «Rahêje kurê xwe yê yekta, delalê xwe Îshaq û wî bibe herêma Moriyayê. Li wê derê li ser çiyayekî ku ez ji te re bêjim, wî wek qurbanekê, yanî wek goriyeke şewitandinê ji min re pêşkêş bike.»

Birahîm serê sibê zû rabû, êzingên ji bo qurbana şewitandinê qelaştin û kurtan li kerê xwe kir, du xulam û kurê xwe Îshaq bi xwe re birin û çûn cihê ku Xwedê jê re gotibû.

Ew qonaxa sê rojan bi rê ve çûn û di roja sisiyan de Birahîm serê xwe bilind kir û ew dera ku Xwedê jê re gotibû, ji dûr ve dît.
Wî ji xulamên xwe re got: «Hûn li vir li ba kerê bimînin. Ez û kurik emê herin, biperizin Xwedê û vegerin ba we.»

Birahîm êzingên ji bo goriya şewitandinê danîn ser pişta kurê xwe Îshaq; wî bi xwe rahişt êgir û kêrê û herdu bi hev re çûn.

Di rê de Îshaq ji bavê xwe re got: «Ya Bavo!»
Birahîm got: «Bêje, kurê min.»
Îshaq got: «Vane agir û êzing; lê berxê ji bo goriyê li ku derê ye?»
Birahîm got: «Kurê min, Xwedê bi xwe wê berxê goriyê peyda bike.»
Û herdu bi hev re hilkişiyan, çûn.

Çaxê ew gihîştin cihê ku Xwedê jê re gotibû, Birahîm ji kevirên mezin gorîgehek çêkir û êzing li ser nijilandin. Hingê wî kurê xwe Îshaq girêda û ew li ser gorîgehê danî ser êzingan.

Piştî vê yekê Birahîm destê xwe dirêj kir û rahişt kêrê, da ku kurê xwe serjêke.
Lê belê milyaketê Xudan ji ezmên gazî wî kir û got: «Birahîm, Birahîm!»
Wî got: «Va me ez.»
Milyaket jê re got: «Destê xwe dirêjî kurik neke û tiştekî bi wî neke. Niha ez dizanim ku tu ji Xwedê ditirsî. Te kurê xwe yê yekta ji ber min venegirt.»
Birahîm serê xwe bilind kir û dît ku li pişt wî di nav diriyan de beranek bi strûhên xwe hatibû girtin. Ew çû, beran anî û di cihê kurê xwe de ew kir gorî.

Milyaketê Xudan cara diduyan ji ezmên gazî Birahîm kir û got:
«Xudan dibêje: ‹Ez bi navê xwe sond dixwim: Ji ber ku te ev tişt kir û te kurê xwe yê yekta ji ber min venegirt, bi rastî ezê te bereket bikim; ezê dûndana te wek stêrên ezmên, wek seylaka ber lêva behrê gelek zêde bikim. Dûndana te wê bajarên dijminên xwe vegirin. Û bi dûndana te, hemû miletên dinê wê bên pîrozkirin. Çimkî te bi gotina min kir.›»

Birahîm navê wê derê ‹Yahwe Yîre› (yanî ‹Xudan wê peyda bike›) danî, çimkî Xwedê li wê derê jê re beranek peyda kir û wî ew ji dêl kurê xwe ve kir gorî.

Hingê Birahîm û kurê xwe bi şahiyeke mezin vegeriyan ba xulamên xwe û ew rabûn, bi hev re çûn Bîrşêbayê. Û Birahîm demekê li Bîrşêbayê ma.

# Rebeka

(Destpêkirin 24)

Birahîm pîr û kal bûbû û Xudan ew di her tiştî de bereket kiribû. Rojekê wî ji serxulamê xwe re got: «Ez te bi Xudan, Xwedayê erd û ezmên didim sondê ku tu ji keçên Kenaniyên ku ez li welatê wan rûdinim, jinê ji kurê min Îshaq re neyînî. Lê here welatê min, ba mirovên min û ji kurê min re jinekê bîne.»
Xulam jê re got: «Belkî keçik nexwaze bê vî welatî; ma hingê ez kurê te bibim wî welatê ku tu jê derketiyî?» Birahîm got: «Na, qet nabe ku tu kurê min bibî wê derê! Xudan Xwedayê ezmên ê ku ez ji mala bavê min, ji welatê ku ez lê çêbûbûm anîme, ji min re sond xwar û got: ‹Ezê vî welatî bidim dûndana te.› Ewê milyaketê xwe bişîne pêşiya te û tê ji wir jinekê ji kurê min re binî. Eger ew

nexwaze bi te re bê, tu ji vê sonda min azad î, tenê tu kurê min qet nebe wê derê.» Hingê xulam ji Birahîm re sond xwar.

Xulam deh deveyên mîrzayê xwe bar kirin û bi diyariyên herî qenc ket rê, çû bakurê Mezopotamyayê, bajarê ku Nehor lê bû. Ber êvarê, çaxê jin derdiketin ku avê bikişînin, wî li ber bîra derveyî bajêr deveyên xwe nîx kirin û got: «Ya Xudan, Xwedayê mîrzayê min Birahîm, ez hêvî ji te dikim, îro karê min rast bîne û keremê li mîrzayê min bike. Va ye, ez li ser kaniyê radiwestim û keçikên bajêr wê bên ku avê bikişînin. Ew keçika ku ez jê re bêjim: ‹Ji kerema xwe, cerê xwe deyne, da ku ez vexwim› û ew bêje: ‹Kerem ke, vexwe û ezê deveyên te jî av bidim›, bila ya ku te ji Îshaq re bijartiye, ew be.»

Beriya ku ew duaya xwe xilas bike, Rebeka cer li ser milê wê dihat. Ew keça Betûyêlê kurê Mîlkaya jina Nehorê birayê Birahîm bû. Ew pirr spehî bû û keçik bû; destê mêran lê neketibû. Wê xwe berda ser kaniyê, cerê xwe dagirt û derket.

Xulam bi lez çû pêşiya wê û got: «Ji kerema xwe, firek av bide min.»

Wê got: «Vexwe, ezxadim.» Û bi lez cerê xwe danî ser destên xwe û av dayê. Piştre jê re got: «Ez ji bo deveyên te jî avê bikişînim.» Ew bi lez çû ser bîrê û ji bo hemû deveyên wî av kişand.

Xulam, ji bo bizane ma Xudan rê li ber wî vekiriye, an na, bê deng li keçikê dinêrî. Çaxê deveyan têr av vexwar, wî xizêmeke zêr û du bazinên zêr derxistin û jê re got: «Ji kerema xwe, ji min re bêje, tu keça kê yî? Gelo cih heye ku em şeva xwe li mala bavê te derbas bikin?»

Wê got: «Ez keça Betûyêl im ê ku Mîlkayê ji Nehor re aniye. Li ba me, hem ka û hem jî alif pirr e û cihê ku tu lê şeva xwe derbas bikî, heye.»

Xulam serê xwe tewand, perizî Xudan û got: «Şikir ji Xudan, Xwedayê mîrzayê min Birahîm re ku dilovanî û dilsoziya xwe ji mîrzayê min nebirî. Xwedê rê li ber min vekir û ez hatim mala mirovên mîrzayê xwe.»

Keçik bezî, çû mal û li ser van tiştan xeber da mezela diya xwe.

Birayekî Rebeka hebû, navê wî Laban bû. Çaxê ku wî xizêm û bazinên di zendê Rebeka de dîtin û tiştê ku zilam gotibû ji wê bihîst, ew çû ba zilamê ku hê li ser kaniyê li ba deveyan disekinî. Laban jê re got: «Kerem bike malê, ey zilamê ku Xudan pîroz kiriye. Tu çima li derve radiwestî? Min mal û ji bo deveyan cih amade kiriye.»

Li ser vê yekê xulamê Birahîm ket hundir; wan barên deveyan danîn, alif û ka dan wan û ji bo ku ew û yên pê re lingên xwe bişon, av anîn.

Çaxê ku xwarin danîn ber wî, xulam got: «Heta ez nebêjim ku ez ji bo çi hatime, ez tiştekî naxwim.»

Laban jê re got: «Kerem ke, bêje.»

Wî got: «Ez xulamê Birahîm im. Xudan mîrzayê min gelek bimbarek kir û pez û dewar, zêr û zîv, xulam û cêrî, deve û ker dane wî. Jina wî Sarê di pîrîtiya xwe de kurek ji mîrzayê min re anî û wî jî hemû tiştên xwe dan kurê xwe.

Mîrzayê min sond bi min da xwarin û got: ‹Ji keçên Kenaniyan jinê ji kurê min re neyne. Lê here mala bavê min û ji nav mirovên min ji kurê min re jinekê bîne.›

Hingê min jê re got: ‹Belkî keçik nexwaze bi min re bê.› Wî got: ‹Ew Xudanê ku ez di riya wî de diçim, wê milyaketê xwe bi te re bişîne û rê li ber te veke. Tê jinekê ji nav mirovên min ji kurê min re bînî. Lê eger ew keçikê nedin te, tê ji sonda min azad bibî.›

Îro ez hatim ser kaniyê û min got: «Ya Xudan, Xwedayê mîrzayê min Birahîm, rê li ber min veke. Va ye, ez li ser kaniyê radiwestim. Çaxê keçikek derkeve ku avê bikişîne û ez jê re bêjim: ‹Ji kerema xwe, firek av bide min› û ew ji min re bêje: ‹Vexwe û ezê deveyên te jî av bidim›, bila ya ku Xudan ji kurê mîrzayê min re bijartiye ew be.

Beriya ku ez di dilê xwe de duaya xwe xilas bikim, Rebeka derket, xwe berda ser kaniyê û av kişand. Min jê re got: ‹Ji kerema xwe, avê bide min.› Wê bi lez cer ji ser milê xwe danî û got:

‹Kerem ke, vexwe; ezê deveyên te jî av bidim.› Min vexwar û wê deve jî avdan. Min jê pirsî: ‹Tu keça kê yî?› Wê got: ‹Ez keça Betûyêl im ê ku Mîlkayê ji Nehor re aniye.› Hingê min xizêm xist pozê wê û bazin xistin zendên wê. Min serê xwe tewand û min ji Xudan Xwedayê mîrzayê xwe Birahîm re şikir kir ku wî rê li ber min vekir ku ez ji kurê wî re neviya birayê wî bînim. Loma, eger hûn ji mîrzayê min re qencî û dilsoziyê bikin, ji min re bêjin; an naxwe ji min re bêjin ku ez herim cihekî din.»

Laban û Betûyêl jê re gotin: «Kifş e ku ev ji Xudan e. Va ye, Rebeka li ber te ye; bila wek ku Xudan gotiye, ew bibe jina kurê mîrzayê te.»

Çaxê xulamê Birahîm ev peyv bihîstin, xwe deverû avêt erdê û perizî Xudan. Hingê wî taximên zîv û zêr û cil derxistin, dan Rebeka û xelatên giranbiha dan dê û birayê wê. Piştre wan xwar û vexwar û şev li wir derbas kirin.

Serê sibê xulam got: «Êdî destûrê bidin, ez vegerim ba mîrzayê xwe.»

Lê wan got: «Bila keçik çend rojekê, qet nebe deh rojan li ba me bimîne û piştre bila bê.»

Wî got: «Xudan rê li ber min vekir, min bi derengî nexin, destûrê bidin, ez herim ba mîrzayê xwe.»

Wan got: «Emê gazî keçikê bikin û jê bipirsin.»

Wan gazî Rebeka kir û jê pirsîn: «Tu dixwazî herî?»

Wê got: «Erê.»

Li ser vê yekê wan xwişka xwe, dadika wê û xulamê Birahîm û zilamên wî bi rê kirin. Wan Rebeka pîroz kir û jê re gotin:

«Ey xwişka me, bibe diya hezar hezaran.
Bila dûndana te bajarên neyarên xwe vegerin.»

Rebeka bi cêriyên xwe ve rabû, li deveyan siwar bûn û li pey xulam çûn.

Ber êvarê Îshaq derketibû nav zeviyê û dît ku deve tên. Rebeka jî Îshaq dît; ew ji deveyê peya bû û ji xulam re got: «Ev mirovê ku di zeviyê de rastî me tê, kî ye?»

Xulam got: «Ew mîrzayê min e.»

Loma Rebeka rahişt xêliyê û rûyê xwe nixamt.

Hingê xulam her tiştê ku kiribû ji Îshaq re got. Îshaq Rebeka bir konê diya xwe Sarê û Rebeka bû jina wî (ji xwe diya Îshaq Sarê miribû). Îshaq ji Rebeka hez kir û piştî mirina diya xwe teselî dît.

# SERHATIYA ÛSIV

## Ûsiv tê firotin

(Destpêkirin 37)

Ji Îshaq û Rebekayê re du kurên cêwî çêbûn: Esaw û Aqûb. Ji wan herduyan, Xwedê Aqûb hilbijart, da ku bi wî plana xwe berdewam bike. Xwedê soz dabû Birahîm ku dûndana wî wê bibe netewekî mezin û navê Xwedê nas bike. Û Xwedê xwest ku soza xwe bi Aqûb bîne cih.

Aqûb ji bo ku mafê nixurîtiyê bistîne, birayê xwe û bavê xwe xapand û mecbûr bû ku ji ber birayê xwe bireve, here Heranê ba xalê xwe.

Piştî gelek salan ew vegeriya welatê Kenanê û wek bavê xwe bi xerîbî lê rûnişt. Xwedê diwanzdeh kur û keçek dan wî. Kurên wî bûn bavên diwanzdeh eşîrên Îsraêl, çimkî Xwedê navê ‹Aqûb› (yanî ‹xapînok›) guhert kir ‹Îsraêl› (yanî ‹yê ku bi Xwedê re gulaşê digire›) çimkî çaxê wî dua kir, tiştek ji Xwedê xwest, heta ku nestand, dev jê berneda.

Aqûb ji hemû kurên xwe zêdetir ji Ûsiv hez dikir, çimkî Ûsiv di pîrîtiya wî de ji pîreka wî ya ku wî ji ya din bêtir jê hez dikir, ji Rahêlê çêbûbû. Ji ber vê yekê wî ew di ser hemû kurên xwe re digirt û kirasekî pirr spehî jê re dabû çêkirin.

Ûsiv xortekî hevdeh salî bû û bi birabavên xwe re li ber pêz alîkar bû. Wî ji bavê xwe re peyvên xerab li ser wan digot. Dema birayên wî dîtin ku bavê wan bêtir ji Ûsiv hez dike, wan ji wî nefret kir û nedikarîn gotineke xweş jê re bêjin.

Carekê Ûsiv xewn dît û ew ji birayên xwe re got.
Got: «Ka guhê xwe bidin vê xewna ku min dîtiye: Me di zeviyê de melû girêdidan. Ji nişkê ve melûya min rabû û daçikilî. Melûyên we dora ya min girtin û xwe li ber tewandin.»
Birayên wî jê re gotin: «Ma çavê tê lê ye ku tu li ser me bibî padîşah? An ma bi rastî tê serweriyê li me bikî?» Û wan ji ber xewn û gotinên wî hê bêtir jê nefret kir.

Careke din Ûsiv xewn dît û ew jî ji birayên xwe re got.
Got: «Min xewnek din dît. Min dît ku roj û heyv û yanzdeh stêran xwe li ber min tewandin.»
Çaxê wî ev ji bav û birayên xwe re got, bavê wî li wî hilat û jê re got: «Ev çi xewn e ku te dît? Ma nexwe ez û diya te û birayên te emê bên, ku xwe li ber te heta bi erdê bitewînin?»
Û birayên wî çavnebarî birinê. Lê belê bavê wî ev tişt di dilê xwe de girt.

Piştî demekê birayên Ûsiv çûn, da ku keriyê bavê xwe li aliyê bajarê Şexemê biçêrînin. Aqûb ji Ûsiv re got: «Birayên te li Şexemê pêz diçêrînin. De were, ez te bişînim ba wan. Here, binêre ka birayên te baş in û pez baş e. Û ji min re xeberekê bîne.»
Û wî ew ji geliyê Hevronê şand. Ûsiv jî guhîşt Şexemê, lê birayên xwe nedîtin. Çaxê ku ew li çol û çolistanan digeriya, mirovekî ew dît û jê pirsî: «Tu li çi digerî?»
Ûsiv jê re got: «Ez li birayên xwe digerim. Ji kerema xwe, ji min re bêje ku ew li ku derê pezê xwe diçêrînin.»
Wî mirovî got: «Wan ji vir bar kirin; min bihîst ku wan digot: ‹Em herin aliyê Dotanê.›» Ûsiv li pey birayên xwe ket û ew li Dotanê dîtin.

Lê wan hê ji dûr ve Ûsiv dît û beriya ku ew bigihîje ba wan, şêwira kuştina wî kirin. Wan ji hevdû re got: «Va ye, xewndîtiyê me tê! De werin, em wî bikujin û bavêjin nav bîrek ji van bîran. Emê bêjin ku dehbeyekî xerab ew xwar. Hingê emê bibînin ka xewnên wî wê bibin çi.»

Rûbên, birayê wan ê mezin bû û çaxê ev bihîst, wî ji wan re got: «Em wî nekujin û xwînê nerijînin! Em wî bavêjin vê bîrê, lê destên xwe dirêjî wî nekin.»
Rûben weha got, da ku wî ji destên wan rizgar bike û li bavê wî vegerîne.

Çaxê Ûsiv hat ba wan, wan kirasê Ûsiv, ew kirasê pirr xweşik, jêkirin û derxistin, Ûsiv girtin û avêtin bîrê. Bîr vala bû, av tê de tune bû.

Hingê ew rûniştin û xwarina xwe xwarin. Çaxê wan serê xwe rakir, dîtin ku kerwanekî Simayîliyan ji aliyê Gîleadê ve dihat. Deveyên wan bi biharatê, bi belesan (yanî belzem) û bi bixûrê barkirî bûn û diçûn Misrê.

Cihûda ji birayên xwe re got: «Eger em birayê xwe bikujin û xwîna wî veşêrin, ma emê çi bi dest bixin? Werin, em wî bifiroşin Simayîliyan; bila destê me lê nekeve, çimkî ew birayê me ye, goştê me ye.»
Birayên wî guhê xwe dan wî: Wan Ûsiv ji bîrê kişand, derxistin û ew bi bîst zîvî firotin Simayîliyan û wan ew bi xwe re birin Misrê.

Çaxê Rûbên vegeriya ser bîrê û dît ku Ûsiv ne di bîrê de ye, ji qehran wî cilên xwe çirandin. Ew zivirî ba birayên xwe û got: «Kurik ne li wir e. We çi kir? Ezê niha çi bikim, ez bi ku ve herim?»

Hingê wan, nêriyek serjêkirin, rahiştin kirasê Ûsiv û li xwîna wî dan.
Wan kirasê Ûsiv ji bavê xwe Aqûb re bir û gotin: «Me ev dîtiye, binêre, ma kirasê kurê te ye, an na?» Aqûb ew naskir û got: «Kirasê kurê min e. Dehbeyekî xerab ew xwariye. Bêguman, Ûsiv hatiye parçe parçe kirin.»
Hingê Aqûb ji xemgîniyeke mezin cilên xwe çirandin, xirarî li pişta xwe girêda û gelek rojan şîna kurê xwe girt.
Hemû keç û kurên wî hatin û xwestin ku di ber dilê wî de bên, lê wî nexwest û got: «Ezê bi şînê serejêrî diyarê miriyan bibim, herim ba kurê xwe.» Û bavê wî ji bo wî giriya.

# Ûsiv li Misrê
(Destpêkirin 39)

Bazirganên Midyanî Ûsiv birin Misrê. Êdî ew ne nazdarê bavê xwe Aqûb bû, lê ew hatibû firotin û wê dîsa bi xulamtî bihata firotin.
Çaxê Midyanî gihîştin Misrê, karbidestekî Firewn Ûsiv ji destê wan kirrî û Ûsiv hat mala mîrzayê xwe Potîfar û li wê derê dixebitî.

Xudan bi Ûsiv re bû û ew serfiraz dikir. Piştî demekê Potîfar dît ku Xudan bi Ûsiv re ye û di her karê ku dike de, wî bi ser dixe. Loma Ûsiv di çavê mîrzayê xwe de qencî dît û bû xulamê ber destê wî. Potîfar ew danî ser mala xwe û her tiştê xwe da destê wî. Xudan jî bi saya Ûsiv mala Potîfarê Misrî bimbarek kir: Di nav malê de û di zeviyan de, di her tiştên wî de bereketa Xudan hebû û Potîfar her tiştê xwe bi hêviya Ûsiv ve hiştin. Ji nanê ku dixwar pê ve, xema xwe ji tiştekî din nedianî.

Heçî Ûsiv bû, bejin û bala wî berbiçav û dîtina wî spehî bû. Jina Potîfarê mîrzayê wî spehîtiya Ûsiv dît û çavê xwe avêt wî û jê re got: «Bi min re raze.»
Lê wî qet qebûl nekir û ji jina mîrzayê xwe re got: «Mîrzayê min xema tu tiştê ku di vê malê de ye naxwe. Wî her tiştê xwe bi hêviya min ve hiştiye. Di vê malê de ew ji min ne meztir e. Ji te pê ve,

tiştek ji ber min venegirtiye, ji ber ku tu jina wî yî. Ez çawa vê xerabiya mezin bikim û li hember Xwedê guneh bikim?»

Û bi ser ku wê her roj digot jî, Ûsiv guh nedida hêvîkirina wê ku li ba wê raze an pê re bimîne.

Rojekê Ûsiv ket hundirê malê, ku karê xwe bike. Ji xizmetkarên malê tu kes li hundir nebû.
Hingê jina Potîfar dîsa jê re got: «Bi min re raze» û ebayê wî girt. Lê wî ebayê xwe bi dest ve berda û reviya, derket derve.
Çaxê wê dît ku Ûsiv ebayê xwe hişt û reviya derve, gazî xizmetkarên mala xwe kir û ji wan re got: «Binêrin, mêrê min ev zilamê Îbranî anî ba me, da ku tinazên xwe bi me bike. Ew hat ba min ku bi min re raze, lê min bi dengekî bilind kir qîrîn. Gava wî bihîst ku min kir hawar, wî ebayê xwe hişt û reviya, derket derve.»
Wê ebayê wî li ba xwe hişt û çaxê Potîfar hat mal, wê jê re jî eynî tişt got. Got: «Ev koleyê Îbranî hat ba min û dixwest ku tinazên xwe bi min bike. Gava ez qîriyam û min hawar kir, wî ebayê xwe hişt û reviya derve.»

Çaxê mîrzayê wî ev tişt ji jina xwe bihîst, hêrsa wî rabû. Wî Ûsiv girt û ew xist zîndanê, wî cihê ku girtiyên Firewn lê girêdayî bûn. Li wê derê ew di zîndanê de ma.

Lê Ûsiv baweriya xwe ya bi Xwedê winda nekir.

# Ûsiv du xewnan şîrove dike

(Destpêkirin 40)

Wek berê Xudan bi Ûsiv re bû û qencî lê dikir, di çavê serkarê zîndanê de kerem da wî. Piştî demekê serkarê zîndanê hemû girtiyên zîndanê xistin bin destê Ûsiv. Berpirsyarê her tiştê ku li zîndanê dihat kirin, ew bû.

Rojekê serekmeygerê Firewn û sereknanpêjê Firewn ketin zîndana ku Ûsiv tê de bû.
Wan herduyan di şevekê de xewn dîtin, lê qet fêm nekirin ka mana xewna wan çi ye. Çaxê Ûsiv pê hesiya ku ew damayî û madekirî ne, ji wan pirsî. Wan jî xewna xwe jê re gotin û bi alîkariya Xwedê, Ûsiv xewn ji wan re şîrove kirin.

Wek ku wî xewn ji wan re got, (wusa) çêbû: Piştî sê rojan sereknanpêj hat kuştin û serekmeyger vegeriya ba Firewn, ser xebata xwe. Beriya ku serekmeyger derkeve, Ûsiv jê re gotibû: «Çaxê tu li ber Firewn bî, min bîne bîra xwe û qenciyê li min bike: Min ji Firewn re bêje û min ji vê qula reş derxe. Çimkî bi rastî ez ji welatê xwe hatim revandin û min li vir jî tiştek nekiriye ku min bavêjin zîndanê.»

# Ûsiv xewna Firewn şîrove dike

(Destpêkirin 41)

Piştî du salên sax Firewn jî xewnek dît û sibehî dilê wî reht, yanî ne rihet bû. Wî gazî hemû sêrbaz û şehrezayên xwe kir û xewna xwe ji wan re got, lê kesekî ku bikariya ew ji Firewn re şîrove bikira, peyda nebû.
Hingê serekmeyger Ûsiv anî bîra xwe û ji Firewn re got ku di zîndanê de yekî bi navê Ûsiv heye ku dikare xewnan şîrove bike. Firewn şand pey Ûsiv, wan ew ji girtîgehê derxist, anîn ber Firewn.
Wî ji Ûsiv re got: «Min xewn dît, lê kesek tune ku wê şîrove bike. Min bihîst ku kengê tu xewnan bibihîzî, tu dikarî şîrove bikî.» Ûsiv li Firewn vegerand û got: « Ez bi xwe nikarim, lê Xwedê wê bersîva xêrê bide Firewn.»

Hingê Firewn xewna xwe got.

Got: «Di xewnê de ez li ber keviya Çemê Nîlê sekinî bûm. Min dît ku ji çêm heft çêlekên xweşik û qelew derketin û di nav qamîşan de diçêriyan. Piştî wan, heft çêlekên jar, tehl û qor derketin û wan yên xweşik û qelew xwarin. Çaxê ew ketin zikê wan, nehat zanîn ku ew ketine zikê wan. Li ber çavan wek rewşa xwe ya berê pîsik bûn. Hingê ez hişyar bûm.

Lê min dîsa xewn dît: Di tayekî genim de, heft simbilên genim ên tije û xweşik derketin. Piştî wan, heft simbilên çilmisî, qels û kizirî zîldan. Simbilên qels her heft simbilên baş daqurtandin.

Sibê zû min xewnên xwe ji sêrbazan re gotin, lê kesekî ku şîrove bike derneket.»

Bi alîkariya Xwedê Ûsiv mana xewnan fêm kir û ji Firewn re got: «Li welatê Misrê heft salên firehiyê wê çêbin û piştre heft salên xelayê yên pirr giran wê bên, wusa ku ew heft salên firehiyê wê bên ji bîr kirin.»

Piştre Ûsiv ji Firewn re got ku çawa ew dikare ji bo salên xelayê amadekariyê bike.

Firewn dît ku Ruhê Xwedê di dilê Ûsiv de ye û jê re got: «Xwedê ev tiştên ha hemû ji te re gotin; bi rastî zilamê wek te şehreza û aqilmend tune. Tê li ser qesra min bî û hemû gelê min wê bi gotina devê te bike. Bi tenê heçî tac û text e, ew yên min in. Binêre, ez te datînim ser hemû welatê Misrê» û Firewn mora xwe ji tiliya xwe derxist û xist tiliya Ûsiv.

Bi vî awayî Firewn li Ûsiv ewle bû û ew danî ser welatê Misrê, da ku dexla salên firehiyê bicivîne ku bibe zadê hilandî.

Çaxê Ûsiv di Misrê de bû zilamê diduyan, ew sî salî bû. Wî cilên nû, zincîra zêr û gustîlka morê standin û li erebeya Firewn ya diduyan siwar bû.

Wî jineke qedirbilind ji xwe re anî û hê ji berî ku xela bê, Xwedê du kur dan wî.

Ev hemû li gor plana Xwedê ya ku ji bo mal û dûndana Birahîm bû, çêbûn. Ka çawa wî soz dabû Birahîm, wusa çêbû. Loma di salên xelayê de li welatê Misrê nan hebû. Û ji welatên hawirdor jî xelk dihatin, ku ji Misrê dexlê bikirrin.

Ûsiv li Misrê bû mirovekî girîng û tam wek ku wî xewna Firewn şîrove kiribû, (wusa) jî çêbû. Pêşî heft salên firehiyê hatin û piştî van heft salan xelayeke pirr dijwar hat.

Li welatên hawirdora Misrê, nan kêm bû.

# Birayên Ûsiv tên Misrê

(Destpêkirin 42-44)

Li welatê Kenanê jî birçîbûn hebû. Ji ber vê yekê rojekê Aqûb gazî kurên xwe kir, ew şandin Misrê ku dexlê bikirrin. Tenê kurê xwe yê herî biçûk Binyamîn bi wan re neşand, çimkî ew birayê Ûsiv bû û Aqûb nexwest ku tiştek bê serê wî.

Ew deh birayên Ûsiv hatin Misrê û xwe li ber wezîrê mezin tewandin. Ûsiv di cih de ew naskirin, lê wan nedizanî ku ew wezîr kî ye.

Ûsiv jî xwe bi wan neda naskirin, lê li hal û rewşa wan pirsî, pirsî ka bavê wan çawa ye û xwest ku birayên xwe biceribîne. Ji ber vê yekê di navbera wan de werger hebû û wî gelek pirs ji wan kirin. Û piştî van pirsan wî ew sûcdar kirin û ji wan re got: «Bi rastî hûn casûs in!» Lê wan got: «Ya mîrzayê me, em mirovên rast in. Em ji welatê Kenanê tên û em hatine ku dexlê bikirrin. Em hemû kurên bavekî ne, em diwanzdeh bira ne. Yek ji me namîne û yê biçûk jî niha li mal li ba bavê me ye.»

Lê Ûsiv bi hişkî ji wan re got: «Wek ku min got, hûn casûs in!» û sê rojan ew avêtin zîndanê û ji wan re got: «Heta ku birayê we yê biçûk neyê vir, hûn ji vir dernakevin.»

Di roja sisiyan de Ûsiv ji wan re got: «Eger hûn mirovên rast bin, bila birayekî ji we li vir girtî bimîne. Hûn ên din herin û ji mala xwe re genim bibin.»
Û wî birayê wan Şimûn di girtîgehê de hişt û li wan hişk emir kir ku dema ew dîsa bên, birayê xwe yê biçûk bi xwe re bînin.
Û perên ku ji bo dexlê dabûn, xistin devê têrrên wan.

Gava ku di rê de li qonaxê têrrên xwe vekirin, dîtin ku perê her yekî ji wan di devê têrra wî de bû û gelek tirsiyan. Wan ji hevdû re got: «Ev cezayê sûcê me ye, çimkî me birayê xwe firot Misriyan.» Û bi tirseke mezin ew vegeriyan ba bavê xwe.

Wan her tişt ji Aqûb re got, lê wî qet nexwest ku Binyamîn bi wan re bişîne. Lê belê xelayê zor li wan kir û diviya ku dîsa ew herin Misrê. Êdî Aqûb bi dilekî nexweş qebûl kir ku Binyamîn bi wan re here û bi wan re pirr diyarî û ji bo dexlê du qat pere şandin.

Bira dîsa çûn ba wezîr û xwe li ber wî tewandin. Îcar ew bi wan re nerm bû; xulamên wî hurmet ji wan re kirin. Birayê girtî Şimûn jî hat derxistin û hemû bi Ûsiv re li mala wî li ser sifrê rûniştin. Gava Ûsiv birayê xwe yê biçûk dît, ew çû odeyeke din, çimkî hêstir ji çavên wî hatin xwar.

Lê wî tiştek negot, çimkî wî dixwest ku hê birayên xwe biceribîne. Dotira rojê wî emir kir, ku dîsa têrrên wan tije bikin, lê piyana xwe ya zîv xist devê têrra Binyamîn.
Dema ku birayên wî çûn, wî karbidestê xwe li pey wan şand. Wî li têrrên hemûyan nêrî û piyan di têrra Binyamîn de derket. Hemû bira bizdiyan û di cih de vegeriyan ba wezîr, xwe li ber wî tewandin, xwestin ku keremê li wan bike û gotin: «Xwedê sûcê me derxist, em koleyên te ne».

Ûsiv bi hişkî bi wan re peyivî û got: «Na, tenê yê sûcdar wê li ba min bimîne û bibe xulamê min. Lê hûn bi xêr û silamet vegerin ba bavê xwe.»
Li ser vê yekê Cihûda çû pêş. Wî ji bo Binyamîn soz dabû bavê xwe, çimkî wî êşa dilê bavê xwe dizanî. Wî ji wezîr re got: «Bihêle ku ez di cihê kurik de ji mîrzayê xwe re bibim kole. Bila kurik bi birayên xwe re vegere. Eger kurik ne bi min re be, ezê çawa herim ba bavê xwe û ezê çawa êşa dilê bavê xwe bibînim?»

# Ûsiv xwe dide naskirin

(Destpêkirin 45 + 50)

Êdî Ûsiv nikaribû ku xwe bigire. Wî emir kir ku hemû xizmetkar derkevin derve û hingê xwe bi birayên xwe da naskirin û got: «Ez Ûsiv im, ez birayê we me. Ma bavê min hê jî sax e?» Lê birayên wî wusa heybetgirtî bûn ku nikaribûn tiştekî bêjin.

Lê Ûsiv ji wan re got: «Werin, nêzîkî min bibin! Xeman nexwin û bila li we zor neyê ku we ez firotim Misrê, çimkî Xwedê ji bo ku jiyanê biparêze, ez di pêşiya we de şandim. Û niha bilezînin û zû vegerin ba bavê min û jê re bêjin: ‹Kurê te Ûsiv sax e û Xwedê ew kiriye wezîrê Misrê.› Û ew ji te re dibêje: ‹Dakeve Misrê, tu û kurên xwe, hemû zarokên xwe û bi hemû pez û dewarên xwe ve werin Misrê. Ezê we xweyî bikim. Hûnê li herêma Goşenê rûnin, ji ber ku xela wê pênc salên din bikişîne.›»

Bi vî awayî Ûsiv birayên xwe afûkirin. Wî ew maç kirin û ew bi hev re giriyan.

Aqûb jî yê ku Xwedê navê wî kiribû ‹Îsraêl› bi hemû mala xwe ve daket Misrê, çimkî Xwedê ji wî re gotibû: «Netirse ku tu dakevî Misrê, çimkî ezê te li wê derê bikim miletekî mezin. Ezê bi te re dakevim Misrê û ezê dîsa te vegerînim vî welatî.»

Û Aqûb bi hemû mala xwe ve hat Misrê.

Piştî ku Aqûb 17 salan li ba kurê xwe Ûsiv li Misrê ma, ew mir. Wan demeke dirêj şîna wî girtin û piştre kurên wî ew birin welatê Kenanê û ew li Hevronê veşartin.

Piştî vê yekê birayên Ûsiv gelek tirsiyan, çimkî wan digot: «Belkî Ûsiv kîn ji me hilaniye û ew niha heyfa xwe hilîne.» Loma wan xeber ji Ûsiv re şand û ji wî re gotin: «Beriya ku bavê te bimire, ji me re gotibû: ‹Ji Ûsiv re bêjin ku ew neheqî û gunehên we bibexşîne!› Niha sûcê me yê ku me li hember te kiriye bibexşîne, çimkî em xulamên Xwedayê bavê te ne.»

Gava Ûsiv ev bihîst, ew giriya û ji wan re got: «Netirsin! Ma ez di cihê Xwedê de me? Nêta we ew bû ku hûn xerabiyê li min bikin, lê Xwedê ew kir qencî. Û çawa ku îro hûn dibînin, wî jiyana gelek mirovan parast. Netirsin, ezê we û zarokên we xweyî bikim.»

# SERHATIYA MÛSA

## Gelê Îsraêl li Misrê

(Derketin 1)

Aqûb bi hemû mirovên xwe ve, yanî bi 70 nefsan ve, hatibû Misrê. Ew bi hev re li Goşenê rûniştin; Goşen herêmeke berdar û avî bû, cihê ku çemê mezin Nîl tê re derbas dibe û diçe Behra Spî.

Aqûb hevdeh salan li Misrê ma û li wir mir. Kurên wî ew birin welatê Kenanê û ew li Hevronê, li rex bavê wî Birahîm veşartin.

Ûsiv piştî mirina bavê xwe Aqûb, hê 53 sal din li Misrê ma û emrê wî bû 110 sal û ew mir. Hemû birayên wî jî li Misrê mirin.

Xwedê gelek zarok dabûn wan; ew jî zêde dibûn û di çar sed salan de ew bûn miletekî mezin. Li gor navê bavê wan ‹Îsraêl›, ji wan re ‹gelê Îsraêl› hat gotin.

Gelê Îsraêl mezin dibû û tirsa wan ket ser Misriyan.

* * *

Hingê Firewnekî nû yê ku nizanibû Ûsiv kî bû, li ser Misrê rabû. Wî ji gelê xwe re got:

«Gelê Îsraêl ji me bêtir û ji me xurttir e. Werin, em bi aqilmendî biçin wan; nebe ku ew hê zêdetir bibin û rojekê bi dijminên me re bibin yek û bi me re şer bikin û ji welêt derkevin.»

Loma Misriyan cefaker danîn ser gelê Îsraêl û bi karên giran ew dan tengiyê. Wan ji bo Firewn du bajar, Pîtom û Ramses, çêkirin.

Lê belê çiqas cefa dan wan, ew ewqas bêtir zêde bûn û bêtir belav bûn û ji ber gelê Îsraêl tirs ket dilê Misriyan. Ji ber vê yekê Misriyan gelê Îsraêl bi awayekî dijwar xebitand. Di hemû karên wan ên giran de yên ku bi kotekî bi wan didan kirin û bi çêkirina xerc û kelpîçan, jiyana wan tehl kirin.

Û Firewn ji pîrikên gelê Îsraêl re, ji Şîfra û ji Pua re got: «Dema hûn bibînin ku jineke Îbranî, yanî jineke Îsraêlî, kurekî bîne, divê hûn wî bikujin; lê eger keç be, bila bijî.»

Lê belê ew herdu pîrik ji Xwedê ditirsiyan û li gor emrê Firewn nekirin û kur sax hiştin.

Loma Firewn careke din gazî wan kir û got: «Çima we ev tişt kir û çima we zarokên kur sax hiştin?»

Wan jê re got: «Jinên gelê me ne wek jinên Misriyan in; ji ber ku ew sivik in û ji berî ku pîrik bigihîjin ba wan, ew zarokên xwe tînin.»

Xwedê ev yek dît û wî qencî li pîrikan kir; wî ew kirin xweyî mal û xanî.

Loma gelê Îsraêl zêde bû û bi zêdehî xurt bû.

Hingê Firewn li hemû gelê xwe emir kir û got: «Her kurê Îbranî yê ku çêbe, bavêjin nav Çemê Nîlê û her keçikê sax bihêlin.»

# Bûyîna Mûsa
(Derketin 2)

Di wî çaxî de zilamekî Îbranî çû û keçikek ji xwe re anî; ew herdu ji malbata Lêwî bûn. Jinik bi zaro bû û kurek anî; wê dît ku ew spehî ye û sê mehan ew veşart. Lê dema ku wê hew karî ku wî veşêre, wê selikek ji çîtikan zift kir, zarok xist nav wê û danî nav çîtikên tenişta Çemê Nîlê. Û xwişka wî Miryam, ji dûr ve disekinî ku bibîne ka wê çi pê bê.

Wusa çêbû ku keça Firewn çû ser Çemê Nîlê da ku xwe bişo û cêriyên wê di tenişta çêm de digeriyan. Keça Firewn di nav çîtikan de selikek dît û navmaliya xwe şand, ku wê bîne. Wê ew vekir, zarok dît û va ye, zarok digiriya. Dilê keça Firewn pê şewitî û wê got: «Ev, yek ji zarokên Îbraniyan e.»

Hingê xwişka wî Miryamê ji keça Firewn re got: «Ma ez herim û ji nav Îbraniyan gazî jinikeke bi şîr bikim, ku ew ji bo te zarok bimêjîne?»
Keça Firewn got: «Erê, here!» û Miryam çû, gazî diya xwe kir.

Çaxê diya zarok hat, keça Firewn jê re got: «Rahêje vî zarokî û ji bo min wî bimêjîne; heqê te çi be, ezê bidim.»
Jinikê jî rahişt kurê xwe û şîr da wî.

Çaxê zarok mezin bû, wê ew ji keça Firewn re anî û ew bû kurê wê; wê navê wî ‹Mûsa› danî û got: «Ji ber ku min ew ji nav avê derxist.» (Bi zimanê Îbranî dengê peyvan ‹Mûsa› û ‹ji avê derxistin› nêzîkî hev in)
Bi vî awayî Mûsa di mala Firewn de mezin bû û di hemû şehrezayiya Misriyan de hat perwerdekirin.

# Mûsa zilamekî dikuje û direve
(Derketin 2)

Rojekê, çaxê Mûsa mezin bû, ew derket ba gelê xwe û barên wan dît û yekî Misrî dît ku li birayekî wî yê Îbranî dixist. Mûsa li dora xwe nêrî û çaxê dît kesek tune, wî yê Misrî kuşt û di nav seylakê de veşart.
Roja din dîsa ew derket û dît ku du Îbraniyan bi hev re şer dikirin. Wî ji yê ku xerabî dikir re got: «Çima tu li hevalê xwe dixî?»
Wî got: «Kê tu li ser me kiriyî serdar an hukumdar? Wek ku te yê Misrî kuşt, ma tu dixwazî min jî bikujî?»
Mûsa tirsiya û ji xwe re got: «Bi rastî ev yek hat zanîn.»

Çaxê Firewn ev yek bihîst, ew li kuştina Mûsa geriya. Lê Mûsa ji ber wî reviya çû welatê Midyanê û li wir li ser bîrekê rûnişt.

* * *

Di wê demê de li Midyanê kahînek hebû ku navê wî Yetro bû; heft keçên wî hebûn. Ew hatin ser bîrê, av derxistin û dixwestin keriyên bavê xwe av bidin. Lê hin şivan hatin û keçik dûr xistin. Mûsa ev dît, rabû, alî keçikan kir û keriyên wan av da.

Gava keçik hatin ba bavê xwe, wî got: «Çawa çêbû ku îro hûn zû hatin?»

Wan got: «Zilamekî Misrî em ji destê şivanan rizgar kirin û ji me re av jî derxist, kerî av da.»
Wî ji wan re got: «Ew zilam li ku derê ye? Çima we ew hişt? Gazî wî bikin, bila ew jî bê û nên bixwe.»

Bi vî awayî Mûsa hat mala Yetro û Mûsa razî bû ku li ba wî zilamî bimîne; Yetro jî keça xwe Sîpora da Mûsa. Wê kurek jê re anî û Mûsa navê wî ‹Gerşom› (yanî ‹Biyanî›) danî û got: «Ez di welatekî xerîb de bûm biyanî.»

Piştî gelek salan, ew Firewn mir; lê gelê Îsraêl ji ber koletiyê dinalî û hawar dikirin û zarîna wan gihîşt ba Xwedê. Xwedê nalîna wan bihîst û ew peymana ku bi Birahîm, Îshaq û Aqûb re girêdabû, anî bîra xwe. Wî gelê Îsraêl dît û halê wan zanî.

Mûsa jî hê li Midyanê bû, şivanê xezûrê xwe Yetro bû.

# Xudan ji Mûsa re xuya dibe

(Derketin 3)

Rojekê çaxê Mûsa pezê xezûrê xwe Yetro diçêrand, wî kerî dûr bir û di çolê de hat çiyayê Xwedê Horeb. Li wir milyaketê Xudan jê re xuya bû.
Pêşî Mûsa tenê dît ku li wir agir bi diriyekê ketibû, ew dişewitî, lê êgir ew nedixwar, xilas nedikir. Hingê Mûsa got: «Ez herim û li vê pêşdariya ecêb binêrim, dirî çima naşewite, xilas nabe.»

Xudan dît ku Mûsa ji bo dîtinê nêzîk bû û ji nav diriyê gazî wî kir, got: «Mûsa, Mûsa!» Û wî got: «Va me ez.»
Xwedê got: «Nêzîkî vir nebe; çaroxa xwe ji lingên xwe derxe, çimkî ew erdê ku tu li ser disekinî axa pîroz e.»
Û got: «Ez Xwedayê bavê te me, Xwedayê Birahîm, Xwedayê Îshaq û Xwedayê Aqûb im.»
Li ser vê yekê Mûsa rûyê xwe nixumand, çimkî ew ditirsiya ku li Xwedê binêre.

Xudan jê re got: «Bi rastî, min zehmet û cefayê gelê xwe dît û min hawara wan bihîst û ez êş û kederên wan dizanim. Ez hatim xwar, da ku ez wan ji destê Misriyan rizgar bikim. Ezê wan ji wî welatî bibim welatekî qenc û fireh, welatê ku şîr û hingiv jê diherike, cihê Kenanî, Hîtît, Amorî, Perîzî, Hîvî û Yebûsiyan.
Va ye, hawara zarokên Îsraêl gihîştiye ba min û min ew tengahiya ku Misriyan daye wan, dît.
Loma here, ezê te bişînim ba Firewn, da ku tu gelê min ji Misrê derînî.»

Lê Mûsa ji Xwedê re got: «Ez kî me ku ez herim ba Firewn û ezê çawa zarokên Îsraêl ji Misrê derînim?»
Xwedê got: «Ezê bi te re bim; û bi vê yekê tê bizanî ku min tu şandiyî: Çaxê tu gel ji Misrê derînî, hûnê li vî çiyayî ji min re xizmetê bikin.»

Lê Mûsa ji Xwedê re got: «Çaxê ez herim ba gelê Îsraêl û ez ji wan re bêjim: ‹Xwedayê bavên we ez şandime ba we› ewê ji min re bêjin: ‹Navê wî çi ye?› Hingê ez ji wan re çi bêjim?»
Xwedê jê re got: «Ez ew im ê ku EZ IM; weha ji zarokên Îsraêl re bêje: ‹EZ IM, ez şandim ba we›. Ji zarokên Îsraêl re bêje: ‹Xwedayê bav û kalên we, Xwedayê Birahîm, Xwedayê Îshaq û Xwedayê Aqûb Xudan ez şandime ba we.› Her û her navê min ev e û di hemû nifşan de ezê bi vî navî bêm bîranîn.

«Here û rihspiyên Îsraêl bicivîne û ji wan re bêje: ‹Xwedayê bav û kalên we, Xwedayê Birahîm, Îshaq û Aqûb xwe nîşanî min da û weha got: Bi rastî, ez hatim serdana we û min tiştê ku li Misrê hatiye serê we, dît. Ezê we ji tengahiya Misrê bibim welatê Kenanî, Hîtît, Amorî, Perîzî, Hîvî û Yebûsiyan, welatê ku şîr û hingiv jê diherike.›

«Ewê guhê xwe bidin gotina te. Hingê tu û rihspiyên Îsraêl, hûn herin ba padîşahê Misrê Firewn û jê re bêjin: ‹Xwedayê Îbraniyan Xudan ji me re xuya bû. Em hêvî ji te dikin, bihêle ku em riya sê rojan herin çolê û goriyan ji Xwedayê xwe Xudan re serjêkin.›
Lê belê ez dizanim eger ne bi destekî xurt be, Firewn wê destûra we nede ku hûn herin. Hingê ezê destê xwe dirêj bikim û ezê bi hemû karên xwe yên nedîtî li Misrê bixim; piştî vê yekê ewê we berde.
Û ezê vî gelî di çavê Misriyan de şêrîn bikim: Çaxê ku hûn derkevin, hûn destvala naçin, lê her jin wê ji cîrana xwe û ji mêvana di mala wê de tiştên zêr û zîv û cilan bixwaze û hûnê kur û keçên xwe bi wan bixemilînin. Bi vî awayî hûnê Misriyan talan bikin.»

Mûsa lê vegerand û got: «Eger ew ji min bawer nekin û guhê xwe nedin gotina min û bêjin: «Xudan xwe nîşanî te nedaye», hingê ez çi bikim?
Xudan jê re got: «Evê ku di destê te de ye çi ye?»
Wî got: «Şivdar e.»
Xudan got: «Wî bavêje ser erdê.»
Wî avêt û şivdar bû mar û Mûsa ji ber wî reviya.
Lê Xudan ji Mûsa re got: «Destê xwe dirêj bike û dûvê wî bigire.» Wî jî destê xwe dirêj kir, ew girt û di destê wî de bû şivdar.
Xudan got: «Vê yekê bike û ewê bawer bikin ku Xwedayê bav û kalên wan, Xwedayê Birahîm, Xwedayê Îshaq û Xwedayê Aqûb xwe nîşanî te daye.»

Piştî vê yekê Xudan jê re got: «Destê xwe bixe paşila xwe.» Wî destê xwe xist paşila xwe û çaxê ew derxist, va ye, destê wî kotî bûbû, wek berfê spî bûbû.
Xudan got: «Destê xwe dîsa bixe paşila xwe.» Wî destê xwe dîsa xist paşila xwe û çaxê ew derxist, va ye, dîsa sax bûbû.

Xwedê got: «Eger ji te bawer nekin û guhê xwe nedin nîşana pêşî, wê bi nîşana diduyan bawer bikin. Û eger bi van herdu nîşanan jî bawer nekin û guhê xwe nedin gotina te, ji ava Çemê Nîlê bistîne û birijîne ser bejê û ew av wê li ser bejê bibe xwîn.»

Lê Mûsa ji Xudan re got: «Ax, ya Xudan, ez ne mirovekî zanebêj im. Ne duh, ne pêr, ne jî ji hinga ku tu bi min re peyiviyî ve, ez ne mirovekî zanebêj im. Ez xulamê te mirovekî zimangiran im û nikarim xweş bipeyivim.»

Xudan jê re got: «Yê ku devê mirov çêkiriye, kî ye? Yê ku mirov lal an kerr, an bi çav an kor çêkiriye, kî ye? Ma ne ez Xudan im? Û niha here û ezê bi devê te re bim û tiştê ku tu bêjî ezê hînî te bikim.»

Lê Mûsa got: «Ax, ya Xudan, ez lavan ji te dikim, tu bixwazî kê bişînî, wî bişîne.»

Hingê Xudan li Mûsa hêrs ket û got: «Ma Harûn ne birayê te ye? Ez dizanim ku ew qenc dipeyive. Ew derketiye ku bê pêşiya te û dema ew te bibîne, dilê wî wê şa bibe. Ji wî re bêje û peyvan bixe devê wî. Ezê bi devê te û bi devê wî re bim û ezê tiştê ku hûnê bikin, hînî we bikim. Ewê ji bo te ji gel re bêje. Û niha vî şivdarê ku tê nîşanan pê bikî, bigire dest xwe.»

## Belayên mezin

(Derketin 5-11)

Wek ku Xwedê emir li wan kiribû, Mûsa û Harûn çûn ba Firewn û jê re gotin: «Xudan Xwedayê me weha dibêje: Destûra gelê me bide ku em herin çolê û ji Xwedayê xwe re goriyan pêşkêş bikin.»

Lê Firewn ji wan re got: «Xwedayê we Xudan kî ye ku ez guhê xwe bidim gotina wî? Ez Xudan nas nakim û ez destûra we jî nadim. Çima hûn gel ji karên wan dihêlin?»
Û ji wê rojê pê ve Firewn emir li cefaker û li karbidestên Misrî kir û ji wan re got ku ji bo çêkirina kelpîçan êdî kayê nedin gelê Îsraêl. Êdî diviya ku ew ji xwe re kayê berhev bikin; dîsa jî hijmara kelpîçan ji bo wan kêm nekirin û li wan xistin ku eynî hijmarê derxin.

Bi vî awayî halê gel hê xerabtir bû û Îsraêlî li hember Mûsa û Harûn rabûn.

Loma Mûsa ji Xwedê re got: «Te çima weha li gelê xwe kir? Zordariya Misriyan hê xerabtir bûye û te gelê xwe qet rizgar nekir.»
Lê Xwedê got: «Min axîna gelê xwe bihîst û peymana min a ku min bi Birahîm, Îshaq û Aqûb re girêdaye hat bîra min. Tê bibînî ku ezê çi li Firewn bikim. Ezê bi destê xwe yê hêzdar zorê li wî bikim û ewê we berde.»
Hingê Xwedê yek bi yek deh bela anîn ser welatê Misrê.

Xudan ji Mûsa re got: «Dilê Firewn hişk e, ew naxwaze we berde. Loma jê re bêje:
‹Xwedayê gelê Îsraêl Xudan ez şandim ba te û dibêje: Gelê min berde, da ku di çolê de ji min re xizmetê bike. Xudan dibêje: Tê bi vê yekê bizanî ku ez Xudan im. Va ye, li ser emrê wî, ezê bi vî şivdarî li ava Çemê Nîlê bixim û wê bibe xwîn. Masî wê bimirin û bîhn wê bikeve çêm û êdî hûn nikarin jê vexwin.›»
Mûsa û Harûn jî çûn ba Firewn û Harûn li ber çavê Firewn û li ber çavên xulamên wî şivdarê xwe bilind kir û li ava Çemê Nîlê xist û ava çêm hemû bû xwîn. Masî mirin, bîhn bi çêm ket û Misriyan nikaribûn avê jê vexwin.
Lê belê sêrbazên Misrê jî bi sêrbaziya xwe weha çêkirin; û wek ku Xudan gotibû, dilê Firewn hişk bû û guhê xwe neda wan. Ew çû mala xwe û ev ji xwe re nekir xem.

Piştî heft rojan, Xudan ji Mûsa re got: «Here û ji Firewn re bêje: ‹Xudan weha dibêje: Destûra gelê min bide, ku ji min re xizmetê bike. An ne, ezê bi beqan li hemû welatê te bixim; Çemê Nîlê wê bi beqan bikele, ewê derkevin û bên mala te û ser doşeka te û wê bikevin malên we û wê bikevin firnên we û nav teknên we yên hevîr. Û beq wê bên ser we hemûyan.›»

Harûn destê xwe bi şivdar ve li ser ava Misrê dirêj kir û beq jî derketin û welêt nixamtin. Lê sêrbazan jî bi sêrbaziya xwe weha çêkirin.

Hingê Firewn gazî Mûsa û Harûn kirin û ji wan re got: «Lavan ji Xudan bikin, bila beqan ji ser me rake; ezê destûra we bidim, ku hûn goriyan ji Xudan re serjêkin.»
Û Xudan li gor peyva Mûsa kir û beq di mal, hewş û di zeviyan de mirin û bîhn bi welêt ket. Lê belê çaxê Firewn ev yek dît, wî dilê xwe hişk kir û guhê xwe neda wan.

Hingê Xwedê pêşû şandin û wan xwîna xelkê û xwîna heywanan mêtin.
Di hemû welatê Misrê de hemû toza erdê bû pêşû. Û sêrbazan jî dixwest bi sêrbaziya xwe weha çêkin, lê belê nikaribûn. Hingê wan ji Firewn re got: «Ev karê Xwedê ye.» Lê belê wek ku Xudan gotibû, dilê Firewn hişk bû û wî guhê xwe neda wan.

Piştî vê yekê Xwedê mêşên hespan şandin; ew ketin mala Firewn û malên Misriyan û ji ber mêşên hespan hemû diyarê Misrê xera bû.
Lê belê di herêma Goşenê de, di herêma gelê Îsraêl de, qet mêşên hespan nebûn; dîsa jî Firewn ev nîşana Xwedê fêm nekir. Wî dilê xwe hişk kir û destûr neda wan ku herin.

Piştî mêşên hespan, bi qirbûneke giran hemû heywanên Misriyan mirin. Lê ji heywanên gelê Îsraêl yek jî nemir. Lê belê dilê Firewn rikdar bû û destûra gel neda.

Hingê Xudan ji Mûsa û Harûn re got: «Kulmên xwe tije xweliya tifikê bikin û bila Mûsa vê li ber çavê Firewn ber bi ezmên ve bireşîne. Û ewê bibe tozeke hûr û li hemû welatê Misrê li ser mirov û heywanan kûnêrên ku edabê derdixin wê çêbin.»

Wan weha kir û li ser hemû Misriyan û li ser heywanên wan kûnêrên pîs çêbûn. Sêrbazan nikaribû li ber Mûsa rawestin; çimkî li ser wan jî kûnêr hebûn.
Û Xudan dilê Firewn hişk kir û Firewn guhê xwe neda wan.

Û Xudan ji Mûsa re got: «Serê sibê zû rabe, li ber Firewn bisekine û jê re bêje: ‹Xudan weha dibêje: Destûra gelê min bide, da ku xizmetê ji min re bikin. Û ji bo ku tu bizanî ku yekî wek min tune, ezê sibe li dora vî wextî teyrokeke pirr giran bibarînim. Heywan û hemû tiştên xwe yên li çolê birevînin, çimkî teyrok wê bikeve ser hemû mirov û heywanên li çolê û ewê bimirin.›»
Yên ku ji peyva Xudan tirsiyan, xulamên xwe û heywanên xwe anîn malê.
Û Mûsa şivdarê xwe ber bi ezmên ve bilind kir û Xudan teyrok barand. Û teyrokê ji mirovan û heta heywanan her tiştê ku li çolê bû, li tevan xist; li hemû giyayê çolê xist û her dara ku li çolê bû şkand. Bi tenê li herêma Goşenê, li wê dera ku gelê Îsraêl lê disekinî, teyrok nebû.

Li ser vê yekê Firewn şand pey Mûsa û Harûn û got: «Vê carê min guneh kir: Xudan rast e, ez û gelê xwe, em xerab in. Lavan ji Xudan bikin! Ev xurexura ewran û teyrok bes e! Ezê destûra we bidim, êdî hûn nasekinin.»
Mûsa jê re got: «Dema ez ji bajêr derkevim, ezê destê xwe ji Xudan re bilind bikim û teyrok wê bisekine, da ku tu bizanî dinya ya Xudan e. Lê belê ez dizanim ku hûn hê ji Xudan Xwedê natirsin.»
Mûsa ji bajêr derket û destê xwe ji Xudan re dirêj kir û xurexura ewran û teyrok sekinîn. Lê çaxê Firewn ev dît, wî dîsa guneh kir: Wî bi xwe û xulamên wî jî dilê xwe hişk kirin.

Piştî vê belayê tiştên şîn ên ku mabûn, ji aliyê kuliyan ve hatin xwarin.
Kuliyan rûyê welêt nixumandin û hemû giyayê erdê û hemû fêkiyê wan darên ku ji ber teyrokê mabûn, xwarin. Li hemû welatê Misrê ji dar û giyayê çolê qet tiştekî şîn nema.

Hingê Xudan ji Mûsa re got: «Destê xwe ber bi ezmên ve dirêj bike, da ku li ser welatê Misrê bibe tariyeke wusa ku mirov bikare destê xwe lê bide.»
Mûsa destê xwe ber bi ezmên ve dirêj kir û li hemû welatê Misrê sê rojan bû tariya reş; wan hevdû nedît û tu kes sê rojan ji cihê xwe ranebû; lê di hemû cihên gelê Îsraêl de ronahî hebû.

Firewn gazî Mûsa kir û got: «Herin, xizmetê ji Xudan re bikin; bila zarokên we jî bi we re bên, bi tenê bila heywanên we li vir bimînin.»
Lê Mûsa got: «Emê heywanên xwe jî bi xwe re bibin; heta simikekê jî, tiştek nayê hiştin; çimkî divê em ji wan heywanan bistînin da ku em xizmetê ji Xwedayê xwe re bikin.»
Lê belê Firewn hêrs ket û got: «Here! Û hay ji xwe hebe, carek din rûyê min nebîne; an ne, tê bimirî.»

Xudan ji Mûsa re gotibû: «Firewn guhê xwe nade we, da ku karên min ên mezin di welatê Misrê de zehf bibin.»
Mûsa û Harûn ew hemû karên mezin li ber Firewn kirin; lê Xudan dilê Firewn hişk kir û wî gelê Îsraêl ji welatê xwe berneda.

Piştî van neh belayan Xudan ji Mûsa re got: «Ezê belayeke din bînim ser Firewn û ser Misrê û piştre ewê we ji vir berde; erê, ewê bi carekê we ji vir derxe.»

Hingê Mûsa çû ba Firewn û jê re got: «Xudan weha dibêje: ‹Li dor nîvê şevê ezê derkevim nav Misrê û di welatê Misrê de hemû nixurî wê bimirin, ji nixuriyê te heta nixuriyê cêriya ku li ser destar e û hemû nixuriyên heywanan jî wê bimirin. Û li hemû welatê Misrê wê hawareke wusa mezin çêbe ku yek wek wê çênebûye û tu caran jî çênabe.› Lê seyek jî devê xwe li hember zarokên Îsraêl venake – ne li hember mirovan û ne jî li hember heywanan; bi vê yekê hûnê bizanin ku Xudan cihêtiyê dixe nav Misrî û Îsraêliyan. Hingê ev hemû xulamên te wê bên ba min, wê xwe li ber min bitewînin û bêjin: ‹Tu û hemû gelê ku li pey te tê, derkevin!› Piştî wê yekê ezê derkevim.» Û Mûsa bi hêrsbûneke dijwar ji ba Firewn derket.

# Cejna Derbasbûnê û Derketin

(Derketin 11-13)

Xudan ji Mûsa û Harûn re got: «Divê ev heyva ha ji we re bibe heyva pêşî ya salê. Ji hemû civîna Îsraêl re bêjin: ‹Di roja dehê vê heyvê de, divê her mal ji xwe re berx an gîskekî bistîne; li gor bavikên xwe, ji her malê re yekî bistînin. Eger ji bo berx an gîskekî mal biçûk be, bila ew bi cîranê xwe re li gor nefsan, yekî bistînin.

Divê ew bêqusûr, nêr û yeksalî be; hûn dikarin wî ji mî an ji bizinan bistînin. Wî heta roja çardehê vê heyvê xweyî bikin û wê rojê ber êvarê hemû gelê Îsraêl divê wî serjêke. Divê ew ji xwînê bistînin û wê, li herdu rexderiyên xaniyên xwe, bidin û li serdera xênî jî bidin.

Divê hemû gel, wê şevê wî goştê ku li ser êgir bûye kebab, bi nanê şkeva û bi pincarên tehl bixwe. Ji wî goştî tu tiştê xav an bi avê kelandî qet nexwin, lê belê wî bi ser û pê û bi her tiştê wî ve li ser êgir bikin kebap û bixwin. Tu tiştî ji wî heta sibehî nehêlin; û eger tiştek heta sibehî jê bimîne, bi êgir bişewitînin.

Çaxê hûn wî berxî bixwin, divê pişta we girêdayî, çaroxên we di lingên we de û şivdarê we di destê we de be; û wî bi lez bixwin.

«Wê şevê ezê di welatê Misrê re bibihûrim û ezê ji mirovan û heta bi heywanan hemû nixuriyên Misrê bikujim; ezê dîwana hemû xwedayên Misrê bikim, çimkî Xudan ez im.

Û ew xwîna li ser xaniyên ku hûn tê de ne, wê ji we re bibe nîşan; çaxê ez xwînê bibînim, ezê ser we re bibihûrim û çaxê ez ji bo helakkirinê li Misriyan bixim, bela wê di nav we de nebe. Ew ‹Derbasbûna Xudan› e.

«Divê ev roj ji we re û ji bo hemû nifşên we bibe roja bîranînê; wê rojê ji Xudan re bikin cejin. Divê hûn heft rojan nanê şkeva bixwin; hê di roja yekê de hevîrtirşk ji malên xwe rakin; çimkî ji roja yekê û heta roja heftan, her kesê ku nanê tirş bixwe, divê ji nav Îsraêl bê birîn. Divê di roja yekê de, civîneke pîroz hebe û di roja heftan de jî civîneke pîroz hebe; ji bilî çêkirina xwarinê, divê di wan rojan de li ba we tu kar neyê kirin.

Vê cejna nanê şkeva bigirin, çimkî min lekên we, eynî di wê rojê de ji welatê Misrê deranîn.»

Hingê Mûsa gazî hemû rihspiyên Îsraêl kir û ji wan re got: «Herin, li gor malên xwe, ji xwe re pêz bibijêrin û ji bo şîva Cejna Derbasbûnê serjêkin. Baqek gûriz hildin û bixin nav xwînê û ji wê li serdera xênî û li herdu rexderiyan bireşînin; divê heta sibehî yek ji we ji deriyê xênî dernekeve. Bi şev Xudan wê bibihûre û li Misriyan bixe û çaxê ew li ser serdera xênî û li ser herdu rexderiyan xwînê bibîne, Xudan wê ser dêrî re derbas bibe û nahêle ku helakker bikeve malên we û li we bixe.

«Vê yekê ji bo xwe û ji bo zarokên xwe, bi qanûneke herheyî bigirin. Çaxê hûn li gor soza Xwedê bên wî welatê ku ewê bide we, vê ji xwe re rêz û tertîb bigirin. Û çaxê kurên we bipirsin: ‹Bêjin, mana vê adetê ji bo we çi ye?›, hingê bêjin: ‹Ev Goriya Derbasbûnê ya ji Xudan re ye. Çaxê wî li Misriyan xist, ew di ser malên Îsraêl re derbas bû û em rizgar kirin.›»

Gel xwe tewand û perizîn û her kes çû û wek ku Xudan li Mûsa û li Harûn emir kiribû, wan (wusa) kir.

Di nîvê wê şevê de Xudan li hemû nixuriyên di welatê Misrê de xist; ji nixuriyê Firewn û heta nixuriyê girtiyê di zîndanê de û li hemû nixuriyên heywanan jî, xist. Hingê Firewn û hemû xulamên wî û hemû Misrî rabûn û li her derê zarîneke mezin hebû, çimkî malek nebû ku mirî tê de nebûya.

Hê bi şev Firewn gazî Mûsa û Harûn kir û got: «Rabin! Hûn hemû ji nav gelê min derkevin! Herin û wek ku we gotibû, xizmetê ji Xudan re bikin. Pezê xwe û dewarên xwe jî bibin û herin! Û min jî pîroz bikin!»

Misriyan li gel teng kir ku ew bi lez ji welêt derkevin; ji ber ku gotin: «An na, emê hemû bimirin!» Gelê Îsraêl jî, hê hevîrê wan tirş nebûyî, teknên hevîr li cilan pêçayî li ser milên xwe

hilgirtin, birin. Wek ku Xwedê ji Mûsa re gotibû, wan (weha) kir û tiştên zîv û zêr û cil ji Misriyan xwestin. Û Xudan kerem li gel kir, ew di çavên Misriyan de şêrîn kirin û Misriyan tiştê ku wan xwest, dan wan. Bi vî awayî wan Misrî talan kirin.

Hingê gelê Îsraêl, yanî li dor şeş sed hezar mêr bi jin û zarokên xwe ve ji bajarê Ramsêsê bar kirin û bi peyatî çûn Sukotê. Pez û dewar û keriyên heywanan bi wan re zehf bûn û gelek xelkê din jî bi wan re derket. Ji wî hevîrê ku ji Misrê biribûn, wan nanê şkeva pehtin; ew hê tirş nebûbû, çimkî ew ji Misrê hatin derxistin û wextê wan nebû ku ji xwe re xwarinê amade bikin.

Wek ku Xwedê ji Birahîm re gotibû, gelê Îsraêl demeke dirêj li Misrê rûnişt. Lê di dawiya çar sed û sî salan de, wî ew ji tengahî û zordariyeke mezin rizgar kirin û tevahiya gel bi şahiyeke mezin ji welatê Misrê derket.

## Gelê Îsraêl di Deryaya Sor re derbas dibe

(Derketin 14)

Xudan ji Mûsa re got: «Ji gelê Îsraêl re bêje, bila vegerin û li ber lêva deryayê deynin. Firewn wê li ser gelê Îsraêl bêje: ‹Wan di nav welêt de riya xwe şaş kiriye, çolê hawirdora wan girtiye.› Ezê dilê Firewn hişk bikim û ewê bikeve pey we. Firewn û hemû ordiya wî wê hêz û rûmeta min bibînin û Misrî wê bizanin ku Xudan ez im.» Û wan wusa kir.

Çaxê ji padîşahê Misrê re hat gotin ku gel reviya, Firewn û xulamên wî fikirîn, gotin: «Me çi kir ku me gelê Îsraêl ji xulamtiya xwe berda?»
Firewn erebeya xwe ya şer da amadekirin û ordiya xwe bi xwe re bir û şeş sed erebeyên bijare û hemû erebeyên Misrê yên şer rakirin. Û Xudan dilê padîşahê Misrê Firewn hişk kir û ew ket ser pişta gelê Îsraêl; lê gelê Îsraêl bi cesaret derket. Lê Misrî û hemû hespên Firewn û erebeyên wî yên şer û siwarên wî û ordiya wî ketin ser pişta wan; û çaxê gelê Îsraêl li ber lêva deryayê danîbû, gihîştin wan.

Gava Firewn nêzîk bû, Îsraêliyan çavên xwe hildan û va ye, Misrî li pey wan dihatin; gelê Îsraêl gelek tirsiya û hawar kirin Xudan. Wan ji Mûsa re got: «Ma ji ber ku li Misrê gor nebûn, te em anîn çolê, da ku em bimirin? Ev çi ye ku te anî serê me, te em ji Misrê deranîn? Ma ev ne ew e ku me li Misrê ji te re digot: ‹Dev ji me berde, em xulamtiyê ji Misriyan re bikin.› Çimkî me xulamtî ji Misriyan re bikira, wê ji me re çêtir bûya. Çima em li çolê bimirin?»

Lê Mûsa ji gel re got: «Netirsin, bêpêjin bin û hûnê xilasiya ku Xudan îro wê ji bo we bike, bibînin; çimkî ev Misriyên ku hûn îro dibînin, êdî hûn tu caran wan nabînin. Xudan wê ji bo we şer bike û hûnê bisekinin.»

Û Xudan ji Mûsa re got: «Çima tu hawar dikî min? Ji gelê Îsraêl re bêje, bila pêşve herin. Şivdarê xwe bilind bike û destê xwe li ser deryayê dirêj bike û wê ji hev veke û gelê Îsraêl wê di nav deryayê re di ser erdê zuwa re derbas bibe. Heçî ez im, ezê dilê Misriyan hişk bikim û ewê li pey wan bikevin nav deryayê û ezê li ser Firewn û hemû ordiya wî, li ser erebeyên wî yên şer û li ser siwarên wî, hêz û rûmeta xwe nîşan bidim. Hingê Misrî wê bizanin ku Xudan ez im.»

Li ser vê yekê milyaketê Xwedê yê ku li pêşiya ordiya Îsraêl diçû, cihê xwe guhert û li pey wan rêve çû; stûna ewr jî li pêşiya wan cihê xwe guhert û li pişt wan sekinî, hat navbera ordiya Misriyan û gelê Îsraêl. Loma li aliyê Misriyan ewr û tarî hebû, lê li aliyê din ronahî hebû; û tevahiya şevê, ordiya Misriyan nêzîkî gelê Îsraêl nebû.

Hingê Mûsa destê xwe ser deryayê re dirêj kir û Xudan tevahiya şevê bi bayê xurt yê rojhilat derya bi şûn de vegerand û derya kir bej û av ji hev vebû. Tevahiya gelê Îsraêl di erdê zuwa re ketin nav deryayê: Av li milê wan ê rastê û li milê wan ê çepê ji wan re bû dîwar.

Misrî jî ketin ser pişta wan û hemû hespên Firewn û erebeyên wî û siwarên wî li pişt wan de ketin nav deryayê.
Lê di nobeta sibehî de Xudan ji stûna êgir û ewr, li ordiya Misriyan nêrî û ordiya Misriyan tevlihev kir. Wî tekerên erebeyên wan xewirandin û wan ew bi zorê ajotin. Çaxê wan ev yek dît, Misriyan got: «Em ji ber Îsraêliyan birevin, çimkî Xudan ji bo wan şer dike.»

Lê Xudan ji Mûsa re got: «Destê xwe li ser deryayê dirêj bike, da ku av li ser Misriyan û li ser erebe û siwarên wan vegere.»
Mûsa destê xwe li ser deryayê dirêj kir û ber destê sibehî derya vegeriya cihê xwe. Misrî ji ber wê reviyan, lê belê Xudan Misrî veweşandin, avêtin nav deryayê. Av vegeriya û erebeyên wan û siwar û hemû ordiya Firewn a ku li pey Îsraêl ketibû deryayê, nixumandin; leşkerekî tenê jî ji wan nema.

Lê heçî gelê Îsraêl bû, ew di nav deryayê de di erdê zuwa re rêve çûn; û av ji bo wan li milê wan ê rastê û çepê bû dîwar. Bi vî awayî Xudan di wê rojê de gelê Îsraêl ji destê Misriyan xilas kir û çaxê gelê Îsraêl karê destê Xudan ê mezin dît, ew ji Xudan tirsiyan û wan ji Xudan û ji xulamê wî Mûsa bawer kir.

# Av û Manna

(Derketin 15-16)

Mûsa gelê Îsraêl ji Deryaya Sor pêş ve bir û ew derketin çola Şûrê.

Di çola Şûrê de xelk riya sê rojan çû, lê av nedîtin. Hingê ew hatin ser kaniya Marayê, lê belê li wir jî nikaribûn wê avê vexwin, çimkî ew tehl bû; loma navê wê ‹Mara› (yanî ‹tehl›) hat gotin.
Û ji ber ku ew av tehl bû, gel li ber Mûsa kir pitepit û got: «Emê çi vexwin?» Mûsa jî hawar kir Xudan û Xudan darikek nîşanî wî da, wî ew avêt nav avê, av şêrîn bû û hemûyan têr vexwar.

Li Marayê Xwedê qanûn û rêz û tertîb dan wan û li wê derê ew ceribandin û got: «Eger hûn qenc guhdariya peyva Xwedayê xwe Xudan bikin û hûn tiştên ku di çavê wî de rast in bikin û guhê xwe bidin emrên wî û hemû qanûnên wî bigirin, ez yek ji wan nexweşiyên ku min dabûn Misriyan, nadim te; çimkî ez ew Xudan im ê ku te sax dike.»
Piştî çend rojan wan ji Marayê bar kir û hatin ser kaniyên Elîmê. Li wê derê diwanzdeh kaniyên avê û heftê darên xurmeyan hebûn û li wê derê li ba avê danîn.

Wan ji Elîmê jî bar kir û 35 rojan piştî ku ji Misrê derketin, ew hatin çola Sînê; ew di navbera Elîm û çiyayê Sînayê de ye. Li wê çolê jî hemû civîna gelê Îsraêl li ber Mûsa û Harûn kirin pitepit û ji wan re gotin: «Xwezî em bi destê Xudan li welatê Misrê bimirana; li wê derê em li ser sîtilên goşt rûdiniştin û me têr nan dixwar. Bi rastî jî, we em deranîne vê çolê, ku em hemû ji birçiya bimirin!»

Lê Xudan ji Mûsa re got: «Va ye, ezê ji we re ji ezmanan nên bibarînim; û her roj bila gel derkeve û ji xwe re têra rojekê berhev bike, da ku ez wan biceribînim ka ewê li gor emir û tembîhên min bikin, an na. Û di roja şeşan de bila du qat berhev bikin û amade bikin.»

Hingê Mûsa û Harûn ji hemûyan re gotin: «Êvarê hûnê bizanin ku Xudan hûn ji welatê Misrê deranîne û sibehî jî hûnê rûmeta Xudan bibînin. Êvarê Xudan wê goşt û sibehî jî wê nên bi firehî bide we û hûnê bizanin ku ew Xudan e.
Xudan pitepita we bihîstiye; em bi xwe çi ne ku hûn li hember me dikin pitepit? Pitepita we ne li hember me ye, lê belê li hember Xudan e.»

Û Mûsa ji Harûn re got: «Ji civîna hemû gelê Îsraêl re bêje: ‹Werin ber Xudan, çimkî wî pitepita we bihîst.›» Hemû jî civiyan û wan ber bi çolê ve nêrî û va ye, rûmeta Xudan di ewrekî de xuyabû.
Xudan bi Mûsa re peyivî û got: «Min pitepita gelê Îsraêl bihîst; ji wan re bêje: ‹Ber destê êvarê hûnê goşt bixwin û sibehî hûnê têr nan bixwin û hûnê bizanin ku Xwedayê we Xudan, ez im.›»

Çaxê bû êvar, ebdal (carna ji wan re sûsik an jî zerzûl tê gotin) derketin û warê gel nixumandin. Xelkê ew ber hev kirin û xwarin.
Sibehî li hawirdora war xûnav ketibû. Û çaxê ew xûnav rabû, va ye, li ser rûyê çolê, li ser axê libên biçûk ên ku mîna xwîsê hebûn.

Xelkê ev dîtin û ji hevdû re gotin: «Ev çi ye?» Mûsa ji wan re got: «Ev ew nanê Xudan e yê ku wî ji bo xwarinê daye we. Tiştê ku Xudan emir kiriye ev e: ‹Bila her yek ji we li gor xwarina xwe ji wî berhev bike; serê mirov mûçikekê, yanî kêm û zêde du lîtreyan, berhev bikin; li gor hijmara nefsên xwe, bila her yek ji bo wan ên ku di konê wî de ne berhev bike.›»

Hingê Mûsa ji wan re got: «Heta sibehî bila tu kes ji wî nehêle.» Lê belê wan guhê xwe neda Mûsa û hinekan ji wî heta sibehî hişt; lê belê kurm ketinê û bîhn pê ket. Çaxê ku Mûsa ev yek bihîst, bi wan re enirî.

Îcar her serê sibê her yekî li gor xwarina xwe ji wî berhev kir; lê di roja şeşan de, wan ji her yekî re du qat nan berhevkirin.
Çimkî Mûsa ji wan re gotibû: «Sibe roja Şemiyê ye, roja bîhnvekirinê ye û ew roj ji Xudan re pîroz e. Tiştê ku hûn bixwazin bipijînin, bipijînin û tiştê ku hûn bixwazin bikelînin, bikelînin û tiştê ku ji ber bimîne, ji xwe re hilînin, bihêlin sibe, çimkî roja Şemiyê hûn tiştekî li çolê nabînin.»
Wek ku Mûsa gotibû, ew hilanîn heta sibehî; û bîhn neketê û kurmî nebû.

Lê dîsa jî di roja heftan de hinek ji gel ji bo berhevkirinê derketin, lê nedîtin. Loma Xudan ji Mûsa re got: «Ma heta kengê hûn qet naxwazin emir û qanûnên min bigirin? Va ye, ji ber ku Xudan roja Şemiyê daye we, ew di roja şeşan de nanê du rojan dide we; bila her kes bimîne di cihê xwe de, di roja heftan de, bila tu kes ji cihê xwe dernekeve.» Loma gel di roja heftan de bîhna xwe vekir.

Gelê Îsraêl navê wê xwarinê kir ‹Manna›. Ew wek tovê gijnîjê spî bû û tama wî wek nanê duta yê ku bi hingiv tê çêkirin bû.

Xwedê ji Mûsa re got: «Divê hûn şerbikekî Manna ji bo nifşên xwe hilînin, da ku ew vî nanê ku min li çolê daye we, bibînin.»
Û wek ku Xudan li Mûsa emir kiribû, Harûn (wusa) kir.

Gelê Îsraêl, heta hat welatê sozdayî Kenanê, çil salan Manna xwar; heta ku ew hatin sînorê welatê Kenanê, wan Manna xwar.

Hingê tevahiya gelê Îsraêl li gor emrê Xudan ji çola Sînê bar kir, ji qonaxê çûn qonaxê û li Refîdîmê danîn. Lê ji bo gel ava vexwarinê nebû. Loma wan bi Mûsa re devjenî kir û gotin: «Avê bide me, ku em vexwin!» Lê Mûsa ji wan re got: «Çima hûn bi min re devjeniyê dikin? Çima hûn Xudan diceribînin?»

Lê belê gel li wê derê tî bû û li ber Mûsa kirin pitepit û gotin: «Çima te em ji Misrê deranîn? Ma te em deranîn ku em û zarokên xwe û heywanên xwe ji tîbûnê bimirin?»
Mûsa hawar kir Xudan û got: «Ez çi bi vî gelî bikim? Hindik maye ewê min bidin ber keviran!»

Xudan ji Mûsa re got: «Bikeve pêşiya gel û çendan ji rihspiyên Îsraêl bi xwe re bibe; ew şivdarê ku te pê li Çemê Nîlê xist, bigire dest xwe û here. Va ye, ezê li wir, li Horebê, li ser latê, li ber te bisekinim; li latê bixe û av wê jê derkeve, da ku gel vexwe.»

Mûsa li ber çavên rihspiyên Îsraêl wusa kir û av derket. Û wî navê wî cihî kir ‹Massa› (yanî ‹Ceribandin›) û ‹Merîba› (yanî ‹Devjenî›), çimkî gelê Îsraêl devjenî kir û wan Xudan ceriband, pirs kirin: «Ma bi rastî Xudan di nav me de ye, an ne?»

## Emrên mezin

(Derketin 19-20)

Xudan gelê Îsraêl rizgar kir, ji Misrê deranî û di çolê de av û xwarin da wan. Lê belê diviyabû ku gelê Îsraêl hê gelek tiştên din li ser Xwedê hîn bibûya. Loma Xwedê berdewam dikir ku xwe bide eşkerekirin.

Piştî derketina gelê Îsraêl ji welatê Misrê bi sê heyvan, ew hatin çola Sînayê û li wê derê li pêşberî Çiyayê Sînayê danîn.
Xudan ji çiyê gazî Mûsa kir û jê re got: «Weha ji mala Aqûb re bêje û bi gelê Îsraêl weha bide zanîn: ‹We dît ku min çi bi Misriyan kir û min çawa hûn li ser baskên eyloyan hilgirtin û min hûn ji xwe re anîn. Û niha eger hûn bi rastî guhdariya peyva min bikin û hûn peymana min bigirin, hingê ji hemû gelan hûnê bibin gelê min ê xumal – çimkî hemû dinya ya min e – û hûnê ji min re bibin padîşahiya kahînan û miletê pîroz û veqetayî.› Ew peyvên ku tê ji gelê Îsraêl re bêjî, ev in.»

Tevahiya gel bi hev re bersîv da û gotin: «Hemû tiştên ku Xudan gotine, emê bikin.» Û Mûsa gotinên gel birin ber Xudan.

Xudan ji Mûsa re got: «Here ba gel û îro û sibe bila ew xwe pîroz bikin û bila cilên xwe bişon û ji bo roja sisiyan bila amade bibin; çimkî di roja sisiyan de Xudan wê li ber çavê hemû gel bê ser Çiyayê Sînayê.»

Xwedê ji Mûsa re got ku ew xwe paqij bikin û xwe ji her tiştên qirêjî veqetînin û cilên xwe bişon. Ev nîşanî gelê Îsraêl da, ku çiqas pêwist e ew ji gunehên xwe paqij bibin. Şuştinê bi xwe ew ji guneh paqij nekirin.
Piştî gelek sedsalan, hozanê mezin Celaledînê Rûmî ev yek qenc fêm kir û weha nivîsî: «Duaya rast divê weha be: Ya Xwedê, min paqij bike. Destê min dikare bedena min bişo, lê destê min nikare ruhê min paqij bike. Ez bi xwe dikarim bedena xwe bişom, lê bi tenê tu dikarî min paqij bikî.»
Eger derveyê mirov paqij be, ev nayê wê manê ku hundirê wî jî paqij bûye. Destên paqij nikarin dil paqij bikin. Destên paqij û dilê paqij ne eynî tişt e.

Îsraêliyan cilên xwe şuştin û ev bû mînaka vê yekê ku ew li ber Xwedê paqij û xurû bûn; lê dîsa jî vê şuştinê ew ji gunehên wan paqij nedikir. Şuştina cilan alîkariya wan dikir ku fêm bikin paqijbûna ruhanî rastiyeke girîng e.

Hingê Xwedê ji Mûsa re got: «Ji bo gel sînor li hawirdora çiyê deyne û ji wan re bêje: ‹Hay ji xwe hebin, dernekevin çiyê û destê xwe li quntara wî jî nedin; her kesê ku dest çiyê bide, eseh wê bê kuştin.»

Ew sînor mînaka wê yekê bû ku çaxê mirov guneh kir, jihevqetîn ket navbera wî û Xwedê. Bi vê yekê mirov hat hişyarkirin ku nêzîkî Xwedê nebe, çimkî Xwedê pîroz e û mirovê gunehkar nikare derkeve pêşberî wî. Bi vî awayî dihat bîranîn ku mirin ji guneh derket.

Û di roja sisiyan de çaxê bû sibe, xurexura ewran û birûsk çêbûn, li ser çiyê ewreke reş sekinî û dengê bilind ê boriyê hat bihîstin û hemû gel di war de lerizî.

Lê Mûsa gel ji war deranî da ku biçin pêşiya Xwedê û li ber quntara çiyê sekinîn. Ji tevahiya Çiyayê Sînayê dû diçû, ji ber ku Xudan di nav êgir de daketibû ser wî. … Mûsa peyivî û Xwedê bi dengekî bilind bersîva wî da.

> Alîkariya berçav a dawî tirsehêz bû: Xurexura ewran, birûsk, ewrekî reş, dengê boriyê yê hêzdar, dûman û agir. Hemû mirov lerizîn! Bi rastî, heqê mirovê gunehkar hebû ku li ber Xwedayê pîroz bilerize.
>
> Hingê Xwedê wê bi peyvên xwe bi gelê xwe bida fêmkirin ku mana peyvên ‹pîroz› û ‹rast› çi ye. Xwedê wê ji wan re bigota: «We bi çavên xwe dît ku ez Xwedê me û ez xema we dixwim. Beriya niha min evqas zelal neda fêmkirin, lê niha ez ji we re eşkere dibêjim: Eger hûn li gor van deh emrên ku ez ji we re bidim, bikin, hingê hûnê bibin miletekî pîroz, miletekî taybetî; wê têkiliya we bi min re hebe û hûnê bibin miletê min ê xumal. Hûnê bizanin ku çawa bi awayekî sazkar û lihevker bi hev re bijîn. Hemû xelk û miletên din wê vê rastiyê bibînin û ewê hîn bibin ku çawa baweriyê bi min bînin. Ew jî wê bi ya min bikin û rast bibin.»

Piştre Xwedê peyivî û emrê pêşî got:

> **Ez Xudan Xwedayê te me … Divê li pêşberî min tu xwedayên te yên din nebin!**

Bi vî emrî Xudan got ku divê mirov qet neperizin kesekî an tiştekî din. Sedemê vê zelal e:

Xwedê bi xwe dibêje: «Xudan ez im, yekî din tune; ji min pê ve Xwedê tune.» (Îşaya 45:5)

Bi tenê yek Xweda heye ku bê bilindkirin. Xwedê dibêje ku mirov pişta xwe bi tenê bi wî Xwedayî ve girê bide yê ku yek e û rast e. Yên ku dixwazin bibin mirovên rast, divê bi tenê biperizin Xudan.

Ev emir ne bi tenê li hember pûtan dibêje. Eger mala te, dost û hevalên te, rêberên ruhanî, kar û xebat, pere, kêf û şahî an tiştekî mîna van ji te re ji Xwedê girîngtir be, hingê te ev emir şkênandiye.

> Hingê Xwedê emrê diduyan got:
>
> **Ji xwe re qet pûtekî çêneke, ne di şiklê tiştekî li jor li ezmanan an li jêr li ser erdê, an jî di bin erdê de di deryayê de! Li ber wan xwe netewîne û neperize wan!**

Emrê diduyan dide zanîn ku mirov qet neperize heykelekî an jî şiklekî Xwedê an pûtan. Ji ber ku Xwedê ruh e, qet ne lazim e û çênabe jî ku dîtina wî ya bedenî bê çêkirin. Tiştekî ku ji aliyê mirov ve hatibe çêkirin, tu caran ne hêjayî perizînê ye. Bi tenê Xwedayê rast hêjayî vê yekê ye. Wî got:
«Xudan **ez** im; navê min ev e. Ez rûmeta xwe nadim yekî din û pesnê ku ji min re tê dayîn, nadim pûtan.» (Îşaya 42:8)

Ji bo ku mirov ji aliyê Xwedê ve bê qebûlkirin, divê ku ew neperize tu tiştê ku di mînaka Xwedê de ye û neperize tu sûretê wan tiştên ku Xwedê afirandine.

> Ev e emrê sisiyan:
>
> **Navê Xudan Xwedayê xwe badîhewa neyne ser devê xwe! Çimkî Xudan wî yê ku navê wî badîhewa tîne ser devê xwe, bê ceza nahêle.**

Xwedê got ku divê mirov her dem siyaneta wî bigirin. Ji ber ku ew, Xwedayê tenê ye, divê **navê wî** jî badîhewa neyê bikaranîn. Ew hukumdarê tevahiya dinyayê ye, loma ew hêjayî siyaneta xweser e. Ew bi tenê hêjayî hurmeta herî mezin e.
Emrê sisiyan zelal e: Ji bo ku mirov rastdar bibe, divê mirov siyaneta Xwedayê Herî Bilind bigire.
Eger tu navê Xwedê ji bo çêrê bi kar bînî, tu vî emrî dişkênî. Dema tu li ser emrê Xwedê nefikirî û tu hergav bêjî: «Înşallah, ezê vê yekê bikim», hingê tu dîsa navê Xwedê bêsiyanet dikî û tu li gor vî emrê Xwedê nakî.
Eger hûn eseh bizanin ku we sûc kiriye û hûn bêjin: «Ez bi navê Xwedê sond dixwim ku min wusa nekiriye», hingê hûn navê Xwedê ji bo xerabiyê bi kar tînin.

Hingê Xwedê emrê çaran got:

**Divê roja Şemiyê li bîra te be, da ku ew ji te re veqetayî û pîroz be!**
**Şeş rojan kar bike û hemû xebata xwe bike, lê belê roja heftan ji Xudan Xwedayê te re roja Şemiyê ye. Di wê rojê de qet kar neke.**

Xwedê ji Îsraêliyan re digot ku roja heftan, yanî roja Şemiyê (yanî roja Sebtê), nexebitin. Vê roja taybetî, wê nîşanî mirovên din bida ku Xwedê bi gelê Îsraêl re têkiliyeke taybetî daniye. Kitêba Pîroz weha dibêje:

«Ji gelê Îsraêl re bêje: Rojên min ên Şemiyê bigirin, çimkî ew di nav min û we de ji bo hemû nifşên we nîşanek e, da ku hûn bizanin Xudanê ku we pîroz dike, ez im.» (Derketin 31:13)

Ji bo ku gelê Îsraêl pîroz bibûya, Xwedê dixwest ew bibînin ku roja Şemiyê nîşana cihêtiyeke taybetî ye.

Hingê Xwedê emrê pêncan got:

**Qedirê dê û bavê xwe bigire!**

Xwedê dibêje ku divê zarok hurmetê ji dê û bavê xwe re bikin. Di maleke normal de divê ne dijminahî, lê silamet hebe.
Divê zarok hurmetkar bin û bi ya dê û bavê xwe bikin. Ji aliyê din ve, ji dê û bavan jî tê xwestin ku ew ji bo feyda mala xwe çavdêriyê bikin.

Heçî pîrozî ye, Xwedê ji hemû zarokan re dibêje, divê ew siyaneta dê û bavê xwe bigirin. Xwedê naxwaze ku mal bibe cihê tevlihevî û hêrsê, lê dixwaze ku bibe cihê serûberî û hurmetkariyê.

Xwedê bi emrê şeşan berdewam kir, got:

**Nekuje!**

Xwedê jiyan daye mirovan. Ji lewre xelet e ku mirovek dawiyê li jiyana yekî din bîne.
Lê Xwedê bi vê yekê ne tenê ji bo kuştinê, lê herweha li ser fikrên dil jî dibêje. Kitêba Pîroz weha dibêje:

Xwedê «dîwana niyet û ramanên dil dike. Her tişt li ber çavê wî yê ku divê em hesab bidinê, tazî û vekirî ye.» (Îbranî 4:12+13)

Ji ber ku Xwedê li dil dinêre, ew kuştinê ji me bêtir bi awayekî fireh şîrove dike. Xwedê çend cûreyên hêrsketinê wek kuştinê hesab dike.

«We bihîstiye ku ji pêşiyan re hatiye gotin: ‹Nekuje! Kî ku bikuje, wê bê dîwankirin!› Lê ez ji we re dibêjim, her kesê ku li birayê xwe hêrs bibe, wê bê dîwankirin. Û kî ku ji birayê xwe re bêje: ‹Bêmejî!› wê li ber Dîwana Bilind bê kişandin pirsyarê. Û kî ku bêje: ‹Ehmeq!› ewê agirê dojehê heq bike.» (Metta 5:21+22)

Yanî ji bo ku mirov bigihîje pîvana rastdariyê ya Xwedê, divê ew hêrs nekeve.

Xwedê hat ser emrê heftan û got:

**Zînayê neke!**

Xwedê dibêje ku têkiliya jinê û mêr bi tenê piştî ku bizewicin, tê qebûlkirin. Ew dikarin vê têkiliya taybetî bi awayekî rast bi tenê bi hev re bikin. Lê peyva Xwedê hê gaveke din jî pêş ve diçe û dibêje:

«We bihîstiye ku hatiye gotin: ‹Zînayê neke!› Lê ez ji we re dibêjim, her kesê ku bi dilxwazî li jinekê binêre, ji xwe wî di dilê xwe de bi wê re zîna kiriye.» (Metta 5:27+28)

Dema mirov bi dilxwazî li yekê an li yekî ku ne jina wî, an ne mêrê wê ye binêre, ew vî emrî dişkêne. Çimkî heçî pîrozî ye, divê hem dil û hem jî kirinên mirov paqij bin.

Piştre emrê heştan got:

**Nedize!**

Yê ku heq dide her mirovî ku bibe xweyîmal, Xwedê ye. Dizîkirin li hember Xudan neguhdarîkirin e û mirovê ku bidize, nikare rastdar bê qebûlkirin.

Tu dixwazî bila di azmûnê de be, tu dixwazî bila di dabaşa bacê de be, di dizîkirinê de her gav xapandin heye.

Xwedê emrê nehan jî da û got:

**Li hember cîranê xwe şahidiya derewîn neke!**

Divê mirov her dem durust be. Çimkî tu têkiliya Xwedê, bi hîlekariyê re tune. Berî niha me dît ku Îblîs derewkar û hîlebaz e, çimkî xweheyiya wî weha ye. Xwedê tam bervajiyê wî ye. Rastî di şexsê Xwedê û di xasîtiya wî de ye.

Dema ku Xwedê tiştekî ji me re bêje, em dikarin piştrast bin ku ew rast e, çimkî «nabe ku Xwedê derewan bike» (Îbranî 6:18). Îblîs bavê derewan e û her kesê ku derewan bike, li pey Îblîs dikeve û karê wî dike. Li gor emrê Xwedê, paşgotinî, sûcdarkirinên bê sedem, buxtan û dadbarkirin guneh in.

Emrê dehan jî weha ye:

**Çavê xwe neavêje mala cîranê xwe! Çavê xwe neavêje pîreka cîranê xwe, an xulamê wî, an navmaliya wî, an gayê wî, an kerê wî, an tu tiştê wî!**

Divê mirov çavnebariyê nebe malê hinekên din, nebe jêhatiniya wan, dîtina wan, an jî tu tiştên wan. Îblîs weha nekir û got: «Ezê xwe bikim wek Xwedayê Herî Bilind.» Lê belê çavnebarî û timahî guneh in û ji aliyê Xwedê ve qet nayên qebûlkirin. Ev yek riya Îblîs e.

Bi vî awayî dayîna deh emran temam bû. Belkî Xwedê ew li ser nivîsdekên kevir nivîsîn, da ku mirov qenc fêm bike ku emrên wî nayên guhertin.

Êdî mirovan dizanî ku çi û çi di çavê Xwedê de guneh in. Peyva Xwedê ev yek şîrove dikir.

«Eger Şerîet nebûya, minê nezanibûya ku guneh çi ye. Çimkî eger Şerîetê negota: ‹Çavê xwe neavêjê tiştekî!›, minê nezanibûya ku çavavêtin çi ye.» (Romayî 7:7)

# Çend Qanûnên din

Piştî ku Xwedê ew deh emrên mezin ji gel re gotin, wî gazî Mûsa kir ku ew hilkişe çiyayê Sînayê.

Li ser çiyê, Mûsa ji aliyê Xwedê ve ji bo jiyana rojane ya gelê Îsraêl gelek emir û tembîh standin. Xwedê dixwest ku gelê wî bi awayekî rast bijî û di silametê de be.

Xwedê bi qanûnên xwe nîşanî gel kir ku divê jiyana mirov bê parastin. Di nav mirovan de zû şer û pevçûn derdikevin û carna demeke dirêj dikişînin.

Mesele çaxê yek di pevçûnê de birîndar dibû, piraniya caran maliyên wî heyfa xwe distandin û ji mala yê sûcdar, an mirovek birîndar dikirin, an jî dikuştin. Hingê wan jî heyfa xwe distand û eger mirov bi vî awayî bike, dawiya xwînrijandinê nayê.

Xwedê hînî gelê xwe kir ku kuştinahî ne rast e. Diviya ku yê sûcdar li gor rastî û dadperweriyê bihata cezakirin û bi vî awayî pirsgirêk çareser bibûya.

Xwedê hînî gelê xwe kir û ji wan re got ku ez bi xwe xema mirovên belengaz û bêhêz dixwim. Wî ji bo xatirê xerîb, sêwî, jinebî, xulam û koleyan qanûnên qenc û rast danîn.
Çimkî Xwedê dizane ku herdem alîkarî ji yên weha re lazim e û dixwaze ku ew bên parastin.

Mesele di Şerîeta Xwedê de ya ku daye Mûsa, weha dibêje:

«Divê tu di doz û dîwana feqîrên nav xwe de, heqê wan nexwî. Divê tu ji derewê dûr bî û mirovekî rast û bê sûc nedî kuştin; çimkî ez yê xerab bêsûc dernaxim.»

«Divê tu bertîlê nestînî; çimkî bertîl çavên mirovên ku dibînin kor dike û peyvên mirovên rast badide (yanî: xwehr dike).» (Derketin 23:6-8)

«Neheqiyê li yê xerîb neke û zordariyê li wî neke, çimkî hûn bi xwe di welatê Misrê de xerîb bûn.»

«Qet jineke jinebî û yê sêwî neêşîne. Eger tu wan biêşînî û ew hawar bikin min, eseh ezê hawara wan bibihîzim û xezeba min wê wek agir û pêtê rabe; ezê we bi şûr bikujim û jinên we wê bibin jinebî û zarokên we wê bibin sêwî.»

«Eger tu bi deyn peran bidî yekî ku di nav gelê min de belengaz e, divê tu ji wî re nebî selefxwer; fayîzê jê nestîne. Eger tu ebayê cîranê xwe ji gerewê re bigirî, hê roj neçûyî ava, wî bi şûn de bide wî; çimkî tiştê ku ew xwe pê binixumîne, tenê ew e, ji bo bedena wî cilê wî ev e; an nexwe ewê bi çi raze? Û çaxê ku hawar bike min, ezê bibihîzim; ji ber ku ez bi rehm im.» (Derketin 22:21-27)

Qanûnên din ên wek van hebûn, digotin:

«Çaxê ku hûn zeviyên xwe bidirûn, heta bi tenişta zeviyê hemûyê nedirûn û simbilên ku bikevin erdê berhev nekin. Rezên xwe bi tevahî neçinin û ranehêjin ûşiyên ku ketine erdê. Bila ew, ji belengaz û ji xerîban re bimînin. Ez Xwedayê we Xudan im.» (Qanûnên Kahîntiyê 19:9-10)

«Eger tu rastî ga an kerê varîbûyî yê dijminê xwe bêyî, eseh divê tu wî lê vegerînî.»

«Eger tu bibînî ku kerê xêrnexwazê te di bin bar de ketiye, wî nehêle di halê wî de, lê belê arî wî bike û kerê wî xilas bike.» (Derketin 23:4-5)

Li gor emrê Xwedê, Mûsa gel jî hişyar kir ku ew dûrî sêrbazî, falvekirin, remildarî û tiştên weha bin û got:

«Divê di nav we de yên ku zarokên xwe didin şewitandin, an falveker, pêşbêj, an remildar, an cinvan, an sêrbaz, an berdevkê cinan, an nivîştîçêker, an jî mirîşêwir nebin.

Ew miletên ku hûn welatê wan bistînin, guhdariya sêrbaz û falvekeran dikin; lê belê Xudan Xwedayê we, nahêle ku hûn tiştên weha bikin.

Xudan Xwedayê we wê ji nav we, ji nav birayên we, ji bo we pêxemberekî wek min derîne; divê hûn guh bidin wî. Xudan wê peyvên xwe bixe devê wî û ewê her tiştê ku Xudan li wî emir bike, ji we re bêje. Yê ku guh nede wan peyvên Xwedê yên ku ewê bi navê Xwedê bêje, Xwedê wê hesab ji wî bixwaze.» (Dubarekirina Şerîetê 18:10-15. 19)

Di **Zebûra 19**an de Dawid li ser Şerîeta Xwedê weha dibêje:

Şerîeta Xudan bê kêmahî ye û dilê mirovan nû dike
Şahidiya Xudan ewledar e û şehrezayiyê dide yê aqilê wî kêm.
Tembîhên Xudan rast in û dil şa dikin.
Emrê Xudan pak e û çavan ronahî dike.
Tirsa Xudan paqij e û her û her dimîne.
Hukumên Xudan rast in, ew hemû dadperwer in.
Ew ji zêr û ji zêrê xas hêjatir in ,
Ji hingiv û ji hingivê palandî şêrîntir in.
Xulamê te jî bi wan hay ji xwe dimîne.
Di pêkanîna wan emran de xelateke mezin heye.
Ma kî dikare xeletiyên xwe bizane?
Gunehên veşartî li min negire.
Xulamê xwe ji gunehên ku bi zanîn tên kirin jî biparêze.
Nehêle ku ew li min serweriyê bikin;
Hingê ezê bêkêmahî bim
Û ji neguhdariya mezin bêm parastin.
Ya Xudan, lata min û xilaskarê min,
Gotinên devê min û fikrên dilê min bila bi dilê te bin.

# Konê Perizînê (Konê Peymanê)

(Derketin 25-27)

Di çolê de gelê Îsraêl di konên xwe de rûdiniştin. Û çaxê ku Xwedê hemû qanûn û tembîhên xwe dan Mûsa, wî emir lê kir ku ew ji Xwedê re jî konekî taybetî çêkin. Ewê di navenda konên Îsraêliyan de bihata danîn û bibûya cihê ku gel biperiziya Xwedê û qurban û gorî serjêbikirana. Xwedê di vî konî de nêzîkî gelê xwe dibû û bi wan re dida û distand.

Xwedê ji Mûsa re hûr û kûr got ku divê ew kon çawa bê çêkirin û mirovên jêhatî jî hilbijartin ku li ser vî karî bixebitin.

Kon bi xwe ji depên zêrkirî û ji terîşên çermîn û ji terîşên xirarî hatibû çêkirin. Ew li dor 15 metre dirêj û 5 metran fireh bû.

Di kon de du ode hebûn: Di odeya pêşî de, yanî di Cihê Pîroz de gorîgeha bixûrê, maseya nanê pêşberiyê û çiradank hebû. Gorîgeh û mase ji dar hatibûn çêkirin û ji her aliyî ve zêrkirî bûn. Çiradank ji zêrê xas bû.

Gorîgeh ji bo şewitandina bixûrê bû.

Li ser maseya zêrîn diwanzdeh nan li pêşberî Xudan dihatin rêzkirin. Her roja Şemiyê kahînan diwanzdeh nanên şkeva yên nû li ser masê datanîn û yên ji heftiya din mayî dixwarin.

Di odeya hundir de, yanî di Cihê Herî Pîroz de, Sindoqa Peymana Xudan hebû. Ew Sindoq jî ji dar hatibû çêkirin û ji her aliyî ve zêrkirî bû. Di Sindoqê de herdu nivîsdekên peymanê û şerbikekî Manna hebû. Li ser Sindoqê devikekî zêrîn hebû û li ser devik du xêrûbên zêrîn bi perên xwe Sindoq dinixumandin. Navê wî devikî ‹bexşîngeh› bû.

Di nav wan herdu odeyan de perdeyeke pirr spehî hebû û ji Serokkahîn pê ve destûra tu kesî nebû, ku bikeve Cihê Herî Pîroz û Serokkahîn jî salê carek tenê diçû wir.

Li ber kon hewşek hebû; ew li dor 50 metre dirêj û 25 metran fireh bû. Di hewşê de gorîgeheke mezin ji bo şewitandina gorî û qurbanan hebû û sîtileke mezin a avê jî hebû.

# Gorî

(Qanûnên Kahîntiyê 16)

Ji bilî emir, tembîh û qanûnên ji bo jiyana rojane, Xwedê li ser gorî, qurban û pêşkêşan jî li Mûsa emir kir.

Ew gorî li hewşa Konê Perizînê dihatin serjêkirin û carna piştî serjêkirinê dihatin şewitandin jî.

Her roj sibê zû û ber êvarê, kahînan goriyeke şewitandinê pêşkêşî Xwedê dikir, yanî wan berxekî yeksalî yê ku bêqusûr û bêleke bû, serjêdikirin û li ser gorîgehê bi hinekî ardê xas, dohnê zeytê û bi şerabê re ji Xwedê re dişewitandin. Di roja Şemiyê de, du berx weha dihatin qurbankirin.

Di cejnan de jî gelê Îsraêl li gor emrê Xwedê bizin, beran, berx û conega dikirin gorî, lê diviya ku ew jî bêqusûr û bêleke bûna.

Wan goriyan dianî bîra gelê Îsraêl ku her tiştê wan ji destê Xwedê hatiye û yê wî ye, yanî ew gorî nîşana şikirdariya wan bûn.

Lê belê goriyên din jî hebûn:

Çaxê ku yekî guneh bikira, diviya ku wî bizin an berxek, an jî eger ew belengaz bûya, diviya cotek kevok bianîna dergehê hewşa Konê Peymanê (yanî Konê Perizînê). Yek ji Lêwiyan, yanî yek ji alîkarên kahînan, ew qebûl dikir hewşê û hingê yê ku guneh kiribû destên xwe datanîn ser serê berxê xwe. Ev dihat wê manê ku gunehê wî mirovî ketiye ser wî berxî û ji ber ku guneh niha li ser berx bû, diviya ku berx bimira. Çimkî cezayê guneh mirin e.

Hingê yê gunehkar bi xwe bizin an berx li rex gorîgehê serjêdikir; ev jî dihat wê manê ku berx ji dêla gunehê wî mirovî ve miriye.
Hingê kahîn dihat, bi tiliya xwe ji xwînê hildida û li strûhên gorîgehê dida û xwîna mayî li gorîgehê direşand. Bezê qurbanan li ser gorîgehê ji Xwedê re dihat şewitandin.
Bi vî awayî kahîn kefaret dida kirin (yanî guneh dida bexişandin); Xwedê ew gorî qebûl dikir û gunehê wan dihat afûkirin.

Salê rojekê li hemû gunehên gelê Îsraêl dihat bihûrtin. Ji bo vê yekê di destpêka meha dehan de, yanî di destpêka Cotmehê de, hemû gel ji bo Roja Kefaretê (yanî ji bo Roja Gunehbexşandinê) diciviya.

Karê Serokkahîn bû ku ji bo gunehên hemû gel kefaretê bike. Ji bo vê yekê wî cilên xwe yên xizmetê ji xwe dikir, xwe di sîtila avê ya ku di hewşa Konê Peymanê de bû dişuşt û di Cihê Pîroz ê Kon de kirasê keten ê pîroz werdigirt.
Piştre wî ji ber gunehên xwe û yên mala xwe conega gorî dikir û li ser gorîgeha mezin dişewitand. Wî hinekî xwîna conega, bixûr û pelên êgir ji gorîgehê dibirin pişt perdê, yanî dibirin Cihê Herî Pîroz. Li wir wî bi tiliya xwe ji xwînê li berê bexşîngehê direşand û li ber wê li erdê jî direşand.
Li ber Konê Peymanê du nêrî amade dikirin û serokkahîn yek ji wan li gorîgehê serjêdikir û ji bo gunehên gel dikir goriya gunehan û piştre careke din diket Cihê Herî Pîroz û xwîna nêrî li berê bexsîngehê direşand û li Cihê Pîroz jî direşand.
Derveyî Kon, wî xwîna conega û xwîna nêrî li gorîgehê direşand.
Hingê wî destên xwe datanîn ser serê nêriyê diduyan û hemû sûcên gelê Îsraêl û hemû neheqî û gunehên wan eşkere dikirin; bi vî awayî Serokkahîn gunehên gel dixistin ser nêrî; piştî vê yekê, ew nêrî dihat berdan nav çolê û ev dihat wê manê ku nêrî hemû sûcên wan li ser xwe hildigirtin û ew dibirin cihekî bêpêjin.

Hingê Serokkahîn vedigeriya Cihê Pîroz, kirasê xwe yê pîroz ji xwe dikir, xwe dîsa dişuşt û cilên xwe yên xizmetê li xwe dikirin.
Wî careke din beranek ji bo gel û beranekî din ji bo xwe gorî dikir û dişewitandin û bi vî awayî ji bo xwe û ji bo gel guneh dida bexşandin.
Goşt û eyar û her tiştên din ên ku ji conega û nêriyê qurbankirî diman, li derveyî war dihat şewitandin.

Di wê rojê de ji bo hemû gel kefaret dihat kirin, da ku ew di çavên Xwedê de ji gunehên xwe paqij bibûna.

Bi wan qanûnan Xwedê dianî bîra gelê xwe ku ew Xwedayê pîroz û paqij e; tu tiştê bi guneh nikare nêzîkî wî bibe. Guneh her mirovî ji Xwedê vediqetîne. Ji ber vê yekê destûra tu kesî tunebû ku bikeve Cihê Herî Pîroz, yanî wî cihê ku Xwedê hilbijartibû ku nêzîkî gelê xwe be.
Ji bo ku afûbûn bistanda jî, Serokkahîn bi tenê salê carekê derbasî wî cihî dibû, lê bêyî wê xwîna ku di ber wî û di ber gunehên gel de bihata pêşkêşkirin, wî jî nikaribû biketayê.

Ev afûbûna di Roja Kefaretê de her sal ji nû ve lazim bû, çimkî xelkê dîsa guneh dikirin. Ji xwe xwîna berx, nêrî an conega nikare gunehan afû bike an tune bike. Di Încîlê de dibêje: «Diyarî û goriyên ku tên pêşkêşkirin, nikarin wijdana mirovê ku diperize paqij bikin.»

Lê dîsa jî Xwedê soz dabû ku wê çavên xwe li gunehên wan bineqandan. Çimkî her cara ku Îsraêliyan li gor emrê Xwedê bi dilekî rast gorî pêşkêş dikirin, wan bi gorîkirina heywanan baweriya dilê xwe eşkere dikir.
Û ji ber ku cezayê guneh mirin e, goriyan dida kifşkirin ku «bê rijandina xwînê li gunehan nayê bihûrtin.» (Îbranî 9:22)

Ev ji bo gelê Îsraêl ne tiştekî nû bû: Wan dizanibû ku Habîl, Nuh, Birahîm, Îshaq, Aqûb û mirovên din ên ku ji Xwedê ditirsiyan, bi vî awayî nêzîkî Xwedê dibûn.
Dîsa jî lazim e ku em li ser vê yekê bifikirin: Ma îro jî lazim e ku mirov qurban û goriyan pêşkêşî Xwedê bike?

Me dît ku gorî nikarin wijdana mirov paqij bikin, yanî xwîna berxan nikare dilê mirov biguhere, an jî nû bike. Guneh bi vî awayî nayê rakirin û qeweta wî bi vî awayî nayê şkênandin.
Încîl dibêje ku Mesîh «ne bi xwîna nêrî û golikan, lê belê bi xwîna xwe, bi carekê ket Cihê Herî Pîroz û rizgariya herheyî peyda kir.»
Cezayê guneh mirin e, lê belê Serokkahîn ne xwîna xwe bi xwe dida, lê wî xwîna berx, conega an nêriyan dida, yanî wî ne jiyana xwe dida, lê heywanek serjêdikir.
Îsa Mesîh weha nekir. Wî got: Ez nehatime ku ji min re xizmet bê kirin, lê ez hatime ku ez xizmetê bikim û di ber gelekan de canê xwe berdêl bidim. (Marqos 10:45)
Yanî Mesîh jiyana xwe da, wî xwîna xwe rijand. Ne ji ber ku wî guneh kir, wî canê xwe da, lê di ber gunehên me de bû gorî.
Wek ku berê berxekî bêqusûr ji dêla yê gunehkar dimir, li gor plana Xwedê diviya ku yekî bê guneh û bê sûc ji dêla me bimira.
Çaxê Yûhennayê imadkar (yanî Yahya) Îsa dît, wî bi pêxemberîtiyê got: «Va ye! Berxê Xwedê yê ku gunehên dinyayê radike.» (Yûhenna 1:29)
Cihûyan mana vê gotinê qenc fêm dikir. Wan dizanibû ku berx di ber gunehan de dibe gorî.

Erê, îro Xwedê goriyên heywanan naxwaze. Xêr û qurbanên me jê re ne lazim in. Ew dilê me dixwaze.
Samûêl pêxember got: «Ma Xwedê wek ku ji guhdarîkirina peyvên xwe hez dike, ji qurban û ji goriyên şewitandinê hez dike? Bi rastî, guhdan ji qurbanê çêtir e û îtaetkirin ji bezê beranan çêtir e» (Samûêl I, 15:22).

# Golikê zêrîn

(Derketin 32)

Mûsa demeke dirêj li ser serê çiyayê Sînayê ma û çaxê gel dît ku ew dereng ma, wan ji Harûn re got: «Rabe û ji bo me xwedayekî çêke da ku ew li pêşiya me here. Em nizanin ku çi hat serê Mûsayê ku em ji Misrê deranîne.»
Harûn jî ji wan re got: «Guharên xwe yên zêrîn ji min re bînin!» Jinên wan, keç û kurên wan guharên xwe derxistin û anîn ba Harûn. Wî ew helandin, teşe da zêr û kir golikek. Xelkê got: «Va ye, Xwedayê ku em ji welatê Misrê deranîne ev e!»
Çaxê Harûn ev yek dît, wî li ber golik gorîgeh çêkir û got: «Sibe cejna Xudan e!»
Dotira rojê gel sibê zû rabû û qurban û goriyên şewitandinê pêşkêş kirin. Xelk rûnişt, wan xwar û vexwar û bi harîtî kêf û şahî kirin.

Li ser serê çiyê Xwedê ji Mûsa re got: «Dakeve jêr, çimkî hişê gelê te yê ku te ji welatê Misrê deraniye, xera bû. Ew zû ji rê derketin û wan zû emrê min şkênand. Wan ji zêr ji xwe re golikek çêkir, perizîn wî û gorî pêşkêşî wî kirin û gotin: ‹Va ye Xwedayê ku em ji welatê Misrê deranîne ev

e!› Min ev gel dît û bi rastî, ew miletekî serhişk e. Niha bihêle ku ez xezeba xwe birijînim ser wan û wan helak bikim. Ezê te bi xwe bikim miletekî mezin.»

Lê Mûsa lavlav li ber Xwedayê xwe Xudan kir û got: «Ya Xudan çima tu dixwazî hêrsa xwe li ser gelê xwe rakî, yê ku te ji welatê Misrê bi qeweta mezin û bi destê xurt deraniye? Ma çima Misrî bêjin: ‹Wî ew ji bo xerabiyê deranîn ku wan li çiyan helak bike!› Ji hêrsa xwe vegere û belayê neyne ser gelê xwe.

Xulamên xwe Birahîm, Îshaq û Aqûb bîne bîra xwe; te ji wan re sond xwar û got: ‹Ezê dûndana we wek stêrên ezmên zêde bikim û ezê tevahiya vî welatî bidim wan û ewê her û her mîrasa wan be.›»

Û Xwedê dev jê berda û ev bela neanî ser gelê xwe.

Çaxê Mûsa dadiket ku vegere ba gel, herdu nivîsdekên peymanê di destê wî de bûn. Nivîsîna li ser wan, nivîsîna destê Xwedê bû. Çaxê Yêşû deng û qîrîna xelkê bihîst, wî ji Mûsa re got: «Dengê şer ji war tê.» Lê Mûsa got:

«Ev ne dengê serfiraziyê
Û ne jî dengê binketinê ye,
Ez dengê stranan dibihîzim.»

Gava Mûsa nêzîkî war bû û golik dît û reqsa wan dît, hêrsa wî rabû û nivîsdekên peymanê avêtin ser latê û şkênandin. Wî rahişt golikê ku wan çêkiribû û ew şewitand, hûr hûr kir, toza wî reşand ser avê û ew av bi gel da vexwarin.

Mûsa ji Harûn re got: «Xelkê çi bi te kiriye ku te sûcekî evqas mezin anî ser wan?»

Wî got: «Li min hêrs nakeve. Tu vî gelî nas dikî, xerabî ser dev û rûyê wan e. Wan ji min re got: ‹Ji me re xwedayekî ku li pêşiya me here çêke, çimkî em nizanin ku çi hat serê Mûsayê ku em ji Misrê deranîne.› Min ji wan re got: ‹Zêrê xwe bînin!› û min ew avêt nav êgir û ev golik derket.»

Mûsa dît ku xelk serberedayî ye, ji ber ku Harûn ew serberdayî hiştibûn, wusa ku ew ji dijminên xwe re bûn pêkenok.

Loma Mûsa li ber dergehê war sekinî û got: «Kî ji aliyê Xwedê be, bila bê ba min!»

Û hemû Lêwî li ba wî civiyan. Wî ji wan re got:

«Xwedayê Îsraêl Xudan weha dibêje: ‹Bila her kes şûrê xwe girê bide û di war de ji dergeh heta dergeh here û her kes birayên xwe û hevalên xwe û cîranên xwe bikuje.›»

Lêwiyan li gor gotina Mûsa kirin û di wê rojê de bi qasî 3000 mirov ketin.

Hingê Mûsa ji wan re got: «Xwedê îro hûn ji bo xizmeta xwe veqetandin, ji ber ku we kur û birayên xwe neparastin. Bi vî awayî wî hûn bereket kirin.»

# Nêrevanên bêbawer

(Hijmartin 13-14)

Piştî demekê ew gihîştin çola Paranê, cihekî çiya yê ku raserî welatê sozdayî bû. Ji wir Mûsa ji diwanzdeh eşîrên Îsraêl diwanzdeh nêrevan şandin Kenanê û ji wan re got: «Bi zirav bin û netirsin, li welêt binêrin, rewşa xelkê wê derê hîn bibin, ka ew bi hêz in an lawaz in, ka cihê wan asê ye an rihet e. Û binêrin ka fêkiyê wê derê çawa ye, darên fêkî hene an tune? Û ji fêkiyê wê derê bînin!»

Hingê nêrevan çûn û derbasî welêt bûn, li cihên nizim û bilind nêrîn, li zevî, mêrg û deştan, li mil û giran nêrîn û piştî 40 rojan dîsa vegeriyan.

Wan hinar û hêjîr û ûşiyek tirî jî bi xwe re anîn. Ûşiyê tirî ewqas mezin bû ku du zilaman ew li ser rûtikekî hilgirtibûn.

Ew li ser tiştên ku wan li Kenanê dîtibûn, peyivîn: «Binêrin, fêkiyê vî welatî çiqas spehî ye. Bi rastî şîr û hingiv ji wî welatî diherike. Lê belê xelkê ku li wê derê ne, xurt û bihêz in û bajarên wan asêgehên mezin in.»

Çaxê ku xelkê ev bihîst, wan dest bi pitepitê kirin. Lê dido ji nêrevanan, Yêşû û Kalêb, ziravê gel qayîm kirin û gotin: «Ji wî xelkî netirsin! Eger dilê Xwedê ji me xweş be, em dikarin wî welatî vegirin.»

Lê belê her deh nêrevanên din gotin: «Na, ew welat, welatekî wusa ye ku xelkê xwe dixwe. Ew mirov ji me meztir û girtir in. Me li wê derê kurên Anaq, yanî eshabe, mirovên pirr mezin û gir, dîtin. Li hember wan, em di çavên xwe de wek kuliyan bûn û di çavên wan de jî em wusa bûn.»

Li ser vê yekê, xelkê bi dengekî bilind kir qîr û got: «Ax, xwezî em li Misrê an li vê çolê bimirana. Niha em hemû, emê bi şûr bên kuştin û jin û zarokên me wê bibin xenîmet. Werin, em ji xwe re yekî bikin rêber û vegerin Misrê.»

Li ser vê yekê Mûsa û Harûn li ber hemû gel deverû çûn erdê û dua kirin; lê belê gel xwest ku Yêşû û Kalêb bidin ber keviran. Hingê rûmeta Xudan li ser Konê Perizînê li gelê Îsraêl xuya bû û Xwedê ji Mûsa re got: «Ma heta kengê ezê vî gelê serhişk ragirim û li wan sebir bikim? Wan kerametên min li Misrê û di çolê de dîtin, lê dîsa jî bawer nakin. Ji ber vê yekê ezê ceza bidim wan. Ji mezinan tu kes wî welatê ku min soz daye, mîras nastîne. Hemû mirovên ku emrê wan di ser 20 salan re ye, wê di çolê de bimirin. Bi tenê Yêşû û Kalêb wê bikevin welatê Kenanê, çimkî ruhekî din di wan de heye.

We got: ‹Zarokên me wê bibin xenîmet!› Lê belê ez ji we re dibêjim: ‹Zarokên we wê bigihîjin welatê sozdayî yê ku we kêm dît.›

Lê heçî hûn in, divê ku hûn li gor rojên ku we çavdêriya welêt kir, ji bo her rojê salekê, li vê çolê bigerin. Hûnê çil salan li vê çolê cezayê gunehên xwe bikişînin.»

Û Xwedê li wan deh nêrevanên bêbawer xist û ew mirin.

Niha diviya ku gelê Îsraêl çil salan di çolê de bigeriyan. Carna şer di navbera wan û miletekî din de derdiket, carna nedikarîn derbasî welatên din bibûna û diviya ku riya xwe biguhertana. Û di rê de hin bi hin yên kal û pîr dimirin.

## Mûsa li gor gotina Xwedê nake

(Hijmartin 20-21)

Gelê Îsraêl hat çola Tsînê û li aliyê Kadêşê danîn. Rojekê wan nikaribû av ji xwe re peyda bikirana. Wan dîsa di serê Mûsa de kir pitepit û gotin: «Te çima em anîn vî cihê xerab? Xwezî em bi birayên xwe re bimirana! Ev der ne cihê çandinê û ne jî cihê darên fêkî ye. Hêjîr, rez û hinar tune û av jî li vir tune.»

Mûsa û Harûn çûn ber devê Konê Peymanê, li ber Xwedê deverû çûn erdê û rûmeta Xwedê li wan xuya bû. Xwedê ji Mûsa re got: «Bi birayê xwe Harûn re here û li ber tevahiya gel ji latê re bêjin ku ava xwe bide gel. Weha ji latê ji gel re avê derxin.»

Mûsa û Harûn jî gel li ber latê civandin, lê ne li gor daxwaza Xwedê kirin û ji gel re gotin: «Hûn guhdariyê bikin, hey neguhdarno! Ma em ji vê latê ji we re avê derxin?» Û Mûsa bi şivdarê xwe du caran li latê xist. Hingê gelek av ji latê derket û mirov û heywanan vexwar.

Lê piştre Xwedê ji Mûsa û Harûn re got: «Ji ber ku we baweriya xwe bi min neanî û we li ber çavê vî gelî ez pîroz nekirim, hûn vî gelî nabin welatê sozdayî.»

Ne gelek piştî vê yekê birayê Mûsa Harûn mir û tevahiya gel, sî rojan şîna wî girt. Piştî mirina Harûn kurê wî Eleazar bû serokkahîn.

* * *

Rojekê çaxê gelê Îsraêl di çolê de diçû, ew gelek westiyan û hew dixwestin pêşve herin. Wan dîsa li hember Xwedê û Mûsa kir pitepit û gotin: «We çima em ji Misrê anîn vir? Ma ji bo vê yekê ku em li vir bimirin? Nan û av tune û em ji vê xwarinê kêsîre bûne, yanî dilê me ji vê xwarinê reş bûye.»

Li ser vê yekê Xwedê marên jandar şandin nav gel, maran bi wan ve dan û gelek ji wan mirin. Gel hat ba Mûsa û jê lavlav kirin û gotin: «Me li hember Xwedê û li hember te sûc kir. Ji kerema xwe li ber Xwedê dua bike, da ku maran ji nav me derxe.»

Û Mûsa ji bo gel hêvî kir. Xwedê duaya wî bihîst û emir li Mûsa kir, jê re got: «Ji tûnc marekî di şiklê marê jandar de çêke û wî deyne ser rûtikekî. Û ew mirovên ku mar bi wan ve daye, çaxê ku li wî marî binêrin, wê sax bibin.»

Mûsa wusa kir û ew mirovên ku mar bi wan ve dabû, çaxê ku li wî marî binêriyana, sax dibûn. Lê yên ku li vî marî nenêrîna, dimirin.

# Mirina Mûsa – Yêşû

(Dubarekirina Şerîetê 31)

Ew çil salên ku diviya gel di çolê de bigeriya, li ber xilasbûnê bûn. Gel nêzîkî sînorê welatê sozdayî bûbû. Tevahiya wî nifşê ku Xwedê gotibû ku wê li çolê bimirin, mirin, ji bilî Yêşû û Kalêb.

Hingê Xwedê ji Mûsa re got: «Hilkişe ser çiyayê Nêboyê û li tevahiya welêt binêre. Tê ji dûr ve vî welatî bibînî, lê tu naçiyê. Piştre tê wek birayê xwe Harûn bimirî û beşdarî bav û kalên xwe bibî, ji ber ku çaxê te û Harûn ji gel re ji latê av deranî, we li ber çavê gelê Îsraêl rûmet neda min.»
Mûsa ji Xwedê xwest got: «Nexwe tu yekî di pêşiya gelê xwe de bike rêber, ku wan derbasî wî welatî bike.»

Û Xwedê got: «Here û kurê Nûn Yêşû hilde ba xwe û li ber çavê serokkahîn Eleazar û li ber çavê tevahiya civînê destên xwe deyne ser wî û desthilatiya xwe bide wî, wî bike cihgirê (paşewarê) xwe. Divê hemû gelê Îsraêl li gor peyva wî bike, çimkî ewê wan derbasî Çemê Urdunê bike û bibe welatê sozdayî.»

Hingê Mûsa xatir ji gel xwest û ji wan re got: «Ez niha sed û bîst salî me û demê min xilas bûye. Xwedê nexwest ku ez derbasî welatê sozdayî bibim, lê belê ewê bi we re be!
We di çolê de peyvên bereketê û peyvên nifirê, peyvên jiyanê û peyvên mirinê bihîstin. Ji ber vê yekê bereket û jiyanê hilbijêrin û baweriya xwe bi Xwedê bînin! Piştrast bin û li gor gotina Xwedê bikin, hingê hûnê li welatê sozdayî bimînin. An na, hûnê ji ser welêt bên ajotin nav miletên din.»
Piştre Mûsa gazî Yêşû kir, destên xwe danîn ser wî û jê re got: «Bi zirav be û hêzdar be, çimkî tê vî gelî bibî welatê sozdayî! Xwedê wê bi te re be û ew qet te bernade. Ji ber vê yekê netirse!»

Û Mûsa eşîrên gelê Îsraêl yek bi yek pîroz û bimbarek kirin. Piştre ew hilkişiya çiyayê Nêboyê yê ku nêzîkî Erîhayê ye. Li wir Xwedê, welatê sozdayî ji başûr heta bakur, behra li rojava, erdên şîn ên li ber Çemê Urdunê û Erîha (yanî bajarê darqespan), nîşanî wî da. Û Xwedê jê re got: «Ev e ew welatê ku min ji Birahîm, Îshaq û Aqûb re soz daye. Niha te bi çavên xwe ew dît û tu gihîştî armanca xwe.»

Îcar Mûsayê xulamê Xwedê mir û Xwedê ew veşart. Tu kes cihê ku ew lê hatiye veşartin nizane. Û gelê Îsraêl sî rojan şîna wî kirin.

Di Îsraêl de pêxemberekî din wek Mûsa, yê ku Xudan rû bi rû naskiribe, derneket. Tu kesî wek wî li welatê Misrê li hember Firewn û li hember hemû xulamên wî û li hemû welêt nîşan û keramet nekirin. Û tu kes wek wî nehat ku bi destê xurt, li ber çavên hemû gelê Îsraêl wusa karên bihêz, nedîtî û tirsdar kiribe.

Çaxê Mûsa mir, ew 120 salî bû, lê belê çavên wî tarî nebûn û qewet û hêza wî kêm nebû.
Ew, ew pêxember e yê ku ji gelê xwe re gotibû:
«Xudan Xwedayê we wê ji nav we, ji nav birayên we, ji we re pêxemberekî wek min derîne; divê hûn guh bidin wî. Ev e, ya ku we li Çiyayê Sînayê (Horebê), di roja civînê de, ji Xudan Xwedayê xwe xwest; we got: ‹Bila em careke din dengê Xudan Xwedayê xwe nebihîzin û êdî em vî agirê mezin nebînin, ku em nemirin.› Hingê Xudan ji min re got: ‹Wan qenc got. Ezê ji bo wan, pêxemberekî wek te ji nav birayên wan derînim. Ezê peyvên xwe bixim devê wî û ewê her tiştê ku ez li wî emir bikim, ji wan re bêje. Yê ku guh nede wan peyvên min ên ku ewê bi navê min bêje, ezê hesab ji wî bixwazim.›»

Piştî mirina Mûsa, Xudan bi xizmetkarê Mûsa, Yêşûyê kurê Nûn re peyivî û got: «Xulamê min Mûsa mir. Tu rabe û bi tevahiya vî gelî ve derbasî vî Çemê Urdunê bibe; herin vî welatê ku min ji gelê xwe re soz daye. Her cihê ku hûnê lingên xwe bavêjinê, wê bibe yê we. Netirse û hêzdar be! Tê wî welatî li vî gelî leva bikî.
Bi tenê şev û roj li ser Şerîeta min bifikire û ne li aliyê çepê jê derkeve û ne jî li aliyê rastê û her gav li gor wê bike. Hingê hûnê riya xwe vekin û hûnê bi ser kevin. Ka çawa ez bi Mûsa re bûm, ezê bi te re bim jî.»

# SERHATIYA YÊŞÛ

## Yêşû di cihê Mûsa pêxember de dibe serwerê gel

(Yêşû 1)

Piştî mirina Mûsa, Xudan bi xizmetkarê Mûsa, Yêşûyê kurê Nûn re peyivî û got: «Xulamê min Mûsa mir, niha rabe, tu û tevahiya vî gelî di Çemê Urdunê re derbasî wî welatî bibin ê ku ez didim gelê Îsraêl. Wek ku min ji Mûsa re gotibû, her dera ku hûnê lingê we bavêjinê, min daye we. Di hemû rojên jiyana te de, tu kes nikare xwe li ber te bigire. Ka çawa ez bi Mûsa re bûm, wusa ezê bi te re bim jî; ez te nahêlim û ez dev ji te bernadim. Hêzdar be û bi zirav be, çimkî tê wî welatê ku min ji bav û kalên wan re sond xwariye ku ez bidim wan, bi mîrastî li vî gelî leva bikî. Bi tenê hêzdar be û gelek bi zirav be û hay jê hebe ku tu li gor tevahiya Şerîeta ku xulamê min Mûsa li te emir kiriye, bikî. Bi milê rastê, an jî bi milê çepê ve ji wê dernekeve, da ku li her dera ku tu biçiyê, tu bi ser kevî.»

## Nêrevan

(Yêşû 2)

Hingê Yêşûyê kurê Nûn ji Şîtîmê bi dizî du nêrevan şandin û ji wan re got: «Herin, li welêt binêrin, bi taybetî li bajarê Erîhayê.»

Ew jî çûn û ketin mala fahîşeyeke ku navê wê Rexab bû û wê şevê li wir man. Di vê navê de ji padîşahê Erîhayê re hat gotin: «Va ye, îşev hin mirovên Îsraêlî hatin welêt, ku casûsiyê bikin.» Loma padîşahê Erîhayê xeber ji Rexabê re şand, got: «Wan mirovên ku hatine ba te û ketine mala te ji me re derîne, çimkî ew hatine ku di hemû welêt de casûsiyê bikin.»

Lê jinikê ew herdu mirov veşartibûn û got: «Rast e, ew mirov hatin ba min, lê ez nizanim ew ji ku derê ne. Çaxê bû tarî, berî ku dergehên bajêr bên girtin, ew derketin. Ez nizanim ew bi ku derê ve çûn. Eger hûn zû zû li pey wan bikevin, hûnê bigihîjin wan.»

Li ser vê yekê zilamên padîşah di riya ku diçe bûriyên Çemê Urdunê de li pey wan ketin û dergeh piştî wan hatin girtin.

Lê belê Rexabê nêrevan derxistibûn ser bên û di bin qirşê kitanê de veşartibûn.

Berî ku nêrevan razin, Rexab hilkişiya ba wan û ji wan re got: «Ez dizanim ku Xudan ev welat daye we û tirsa we ketiye dilê me. Ji tirsa we çokên hemû xelkê welêt dilerizin. Me bihîst çaxê ku hûn ji Misrê derketin, Xudan çawa ava Deryaya Sor li ber we zuwa kir; em dizanin we li aliyê din ê Çemê Urdunê çi anî serê herdu padîşahên Amoriyan, Sîxon û Og; we ew qir kirin. Çaxê me bihîst, ji tirsa we, ziravê hemûyan qetiya, çimkî Xudan Xwedayê we, li jor li ezmên û li jêr li ser erdê, Xudan ew e.

Niha, madem ku min keremdarî li we kir, ji kerema xwe, bi Xudan ji min re sond bixwin ku hûn jî, hûnê qenciyê li mala bavê min bikin. Ji min re nîşaneke rast û durust bidin ku hûnê dê û bavê min, xwişk û birayên min û hemû maliyên wan sax bihêlin û me ji mirinê xilas bikin.»

Wan jê re got: «Jiyana me di ber jiyana we de. Eger hûn vî karê me eşkere nekin, çaxê Xudan vî welatî bide me, emê keremdariyê li te bikin û soza xwe bînin cih.»

Hingê Rexabê nêrevan bi werîs di pencerê re daxistin xwar, çimkî mala ku ew tê de rûdinişt di sûra bajêr de bû. Û wê ji wan re got: «Herin nav çiyan; nexwe yên ku li pey we ketine, wê rastî we bên. Sê rojan li wir bimînin heta ku ew vegerin û hingê di riya xwe de herin.»

Wan mirovan jê re got: «Eger tu li gor peyvên me nekî, emê ji wê sonda ku te bi me daye xwarin, bêrî bin: Çaxê em bikevin vî welatî, tu vê şûtika sor bi vê pencera ku te em tê re daxistine xwar ve girê bide. Dê û bavê xwe, birayên xwe û hemû mala bavê xwe li ba xwe di vê malê de bicivîne. Eger yek ji deriyê mala te derkeve, em bêsûc in, xwîna wî wê di stûyê wî de be; lê hemûyên ku li ba te, di mal de bin û yek destê xwe dirêjî yek ji wan bike, xwîna wî wê di stûyê me de be. Lê eger tu vî karê me eşkere bikî, emê ji sonda ku te bi me daye xwarin, bêrî bin.»
Wê got: «Bila li gor peyvên we be.»

Li ser vê yekê wê ew şandin û ew çûn. Jinikê jî şûtika sor bi pencerê ve girêda. Nêrevan rabûn çûn nav çiyan û sê rojan li wir man, heta ew ên ku li pey wan ketibûn vegeriyan. Hingê ew herdu zilam ji nav çiyan hatin xwar, di çem re derbas bûn û vegeriyan ba Yêşûyê kurê Nûn û çi qewimîbû, jê re gotin. Wan ji Yêşû re got: «Bi rastî, Xudan ew hemû welat daye destê me. Çokên hemû xelkê wî welatî ji tirsa me dilerizin.»

## Bajarê Erîhayê

(Yêşû 6)

Dergehên Erîhayê ji ber zarokên Îsraêl hatibûn dadan; ne kesek derdiket û ne kesek diket hundir.
Hingê Xudan ji Yêşû re got: «Binêre, min Erîha, padîşah û mêrxasên wê dan destê te. Hûn hemû şervan, yanî mirovên çekdar, hûn carekê li hawirdora bajêr bizivirin. Şeş rojan weha bike. Li ber Sindoqa Peymanê divê heft kahîn heft boriyên ji strûhê beranan hilgirin. Lê roja heftan, heft caran li hawirdora bajêr bizivirin û bila kahîn li boriyan bixin. Çaxê hûn bibihîzin ku ew bi dengê dirêj li boriyên ji strûhê beranan bixin, bila tevahiya xelkê bi dengekî bilind bike qîrîn; hingê dîwarê bajêr wê di cihê xwe de bikeve û xelk, her kes ber bi pêş xwe ve, bila bikeve nav.»

Wek ku Xwedê jê re gotibû, Yêşûyê kurê Nûn gazî kahînan kir û ji wan re got: «Sindoqa Peymanê hildin û bila heft kahîn heft boriyên ji strûhê beranan li ber Sindoqa Xudan hilgirin.» Û ji xelkê re got: «Pêş ve herin, li dora bajêr bizivirin û bila pêşeng (çekdarên bijare) di pêşiya Sindoqa Xudan de herin.»
Wek ku Yêşû ji xelkê re got, (wusa) kirin; heft kahîn li ber Xudan heft boriyên ji strûhê beranan hilgirtin, pêş ve çûn û li boriyan xistin û Sindoqa Xudan di pey wan de diçû. Pêşeng, yanî çekdarên bijare di pêşiya kahînên ku li boriyan dixistin de diçûn; paşeng di pey Sindoqê de çû û bê rawestan dengê boriyan hat.
Yêşû emir li xelkê kiribû, gotibû: «Nekin qîrîn, dengê xwe nedin bihîstin û divê peyvek ji devê we dernekeve heta wê roja ku ez ji we re bêjim: ‹Bikin qîr!› Hingê bikin qîr.»

Bi vî awayî Sindoqa Xudan carekê li hawirdora bajêr zivirî û xelk hat ordîgehê û şeva xwe li wir derbas kirin. Serê sibê zû Yêşû rabû û kahînan Sindoqa Xudan hilgirtin. Ew heft kahînên ku heft boriyên ji strûhên beranan hildigirtin di pêşiya Sindoqa Xudan de diçûn û li boriyan dixistin. Pêşeng di pêşiya wan de diçûn û paşeng di pey Sindoqa Xudan de diçûn û bê rawestan dengê boriyan dihat. Di vê roja diduyan de ew carekê li dora bajêr zivirîn û vegeriyan ordîgehê. Şeş rojan weha kirin.

Di roja heftan de, sibê zû ew rabûn û bi vî awayî heft caran li dora bajêr zivirîn. Tenê wê rojê ew heft caran li dora bajêr zivirîn. Di cara heftan de, gava kahînan li boriyan xist, Yêşû ji xelkê re got: «Bikin qîrîn, çimkî Xudan bajar da destê we. Bajar û her tiştê ku tê de ye, ji Xudan re ji bo helakê hatiye veqetandin. Bi tenê bila Rexaba fahîşe û hemûyên ku bi wê re di hundir de ne, bên parastin, çimkî wê ew nêrevanên ku me şandibûn, veşartin. Lê hay ji xwe hebin ku hûn xwe ji tiştê veqetandî bidin paş, da ku bi standina tiştê veqetandî, helakbûn neyê ser we. An na, hûnê nifirê û tengahiyê bînin ser ordîgeha Îsraêl. Hemû zîv, zêr, firaxên tûnc û hesin ji Xudan re pîroz in; ewê bikevin xezîna Xudan.»

Hingê xelkê kir qîrîn û kahînan li boriyan xistin; çaxê xelkê dengê boriyan bihîst, wan bi dengekî bilind kir qîrîn û dîwar di cihê xwe de hilweşa û her kes ber bi pêş xwe ve çû û xelk ketin bajêr û bajar standin, yanî vegirtin. Wan, hemûyên ku di bajêr de bûn, jin û mêr, xort û pîr, ga û mî û ker, dan ber devê şûr, bi tevahî qir kirin.

Piştre Yêşû ji herdu mirovên ku di welêt de nêrevanî kiribûn re got: «Bikevin mala fahîşeyê û wek ku we jê re sond xwariye, wê û hemû maliyên wê, ji wir derînin.» Ew nêrevanên xort jî ketin hundir, Rexab û dê û bavê wê, birayên wê û hemû yên ku di mala wê de bûn û hemû mirovên wê deranîn û ew birin cihekî derveyî warê Îsraêl.

Hingê wan bajar û her tiştê ku tê de bû şewitandin; bi tenê zîv û zêr û tiştên tûnc û hesin xistin xezîna mala Xudan. Lê Yêşû Rexaba fahîşe û xelkê mala bavê wê û hemû mirovên wê hiştin sax, çimkî wê ew mirovên ku Yêşû ji bo nêrevaniyê şandibûn Erîhayê, veşartibûn. Hingê Yêşû sond xwar, got: «Bila li ber Xudan nifir li wî mirovî be, yê ku rabe û vî bajarê Erîhayê ava bike.
Heqê danîna bingehê wî, wê nixuriyê wî be
Û heqê lêxistina dergehên wî, wê biçûkê wî be.

Û Xudan bi Yêşû re bû û nav û dengê wî li tevahiya welêt belav bû.

# Peyman tê qayîmkirin
(Yêşû 24)

Piştî ku gelê Îsraêl bajarê Erîha vegirt, ew hin bi hin ketin bajar û gundên din ên welêt.
Wek ku Xwedê soz dabû Yêşû, ew bi wan re bû û rê li ber wan vekir, heta ku welat ket bin destê wan. Hingê her eşîrê mîrasa xwe stand.
Ji wan mirovên ku ji Misrê derketibûn, bi tenê Kalêb û Yêşû hê sax bûn û mîrasa xwe standin: Bajarê Tîmnat-Serahê bû mîrasa Yêşû û bajarê Hevronê bû mîrasa Kalêb.

Ber bi dawiya jiyana xwe ve, Yêşû gelê Îsraêl, yanî rihspî, serwer, hukumdar û serdar civandin û ji wan re got:
«Ez pîr bûme û rojên min derbas bûne. We bi çavên xwe tiştên ku Xwedayê we Xudan anî serê miletên wî welatî, dîtin. Çimkî Xwedê bi xwe ji bo we şer dikir.
Bînin bîra xwe ku min bi pişk mîrasa her eşîrê dayeyê û Xwedê wê li gor soza xwe miletên mayîn jî ji ber we derxe.
Niha gelek hişyar bin ku hûn her tiştê ku di Kitêba Şerîeta Mûsa de nivîsî ye, bikin. Bi milê rastê, an jî bi milê çepê ve ji wê dernekevin. Neperizin xwedayên miletên mayîn, xwe li ber wan netewînin û bi wan sond nexwin. Wek ku heta îro we kir, xwe bi Xwedayê xwe Xudan bigirin.
Lê belê eger hûn pişta xwe bidin wî û dev jê berdin, Xwedê miletên mayîn ji ber we dernaxe. Ewê ji we re bibin xefik û wê di newqa we de bibin zixt û di çavên we de bibin stirî, heta ku hûn ji vî welatê qenc bên avêtin û helak bibin.

«Hûn qenc dizanin ku ji hemû soz û gotinên Xwedê yek jî pûç derneket. Her soza ku wî dabû we, hat cih. Lê belê wek ku wî hemû peyvên qenc anîn cih, wusa jî ewê hemû belayan bîne serê we heta ku we ji vî welatî derxe û helak bike: Eger hûn peymana ku Xwedê daye we bişkênin û ji xwedayên din re xizmetê bikin û biperizin wan, hêrsa Xwedê wê li we rabe û hûnê zû ji vî welatê qenc bên birrîn û hûnê helak bibin.»

Û Yêşû ji tevahiya gel re got: «Xudan Xwedayê Îsraêl weha dibêje: ‹Ji berê ve bav û kalên we li wî aliyê Çemê Firat diman û ji xwedayên din re xizmet kirin. Bavê Birahîm Têrah jî di nav wan de bû. Lê min bavê we Birahîm ji wî aliyê çêm hilda û min ew di tevahiya welatê Kenanê de gerand û

dûndana wî zêde kir. Min Îshaq da wî û min Aqûb û Esaw dan Îshaq. Min çiyayên Sêyîrê bi mîrasî dan Esaw, lê Aqûb û kurên xwe daketin Misrê.

‹Hingê min Mûsa û Harûn şandin û bi karên xwe yên ku min di nav Misriyan de kirin, min li wan xist û piştre min hûn deranîn. Min bav û kalên we ji Misrê deranîn û hûn hatin ber deryayê û Misrî bi erebe û siwaran ve heta bi Deryaya Sor li pey we ketin. Çaxê wan hawara xwe gihandin min, min di nav we û Misriyan de taristanî danî; min derya anî ser wan û ew nixumandin. Tiştê ku min anî serê Misriyan, we bi çavê xwe dît.

‹Hingê hûn ji bo demeke dirêj di çolê de man. Min hûn anîn welatê Amoriyan yên ku li rojhilata Çemê Urdunê rûdiniştin; wan bi we re şer kir, lê min ew dan destê we û we erdê wan stand; min ew ji ber we helak kirin.

‹Piştre hûn derbasî Çemê Urdunê bûn û hatin ber Erîhayê. Xelkê Erîhayê li hember we şer kir û wusa jî Amorî, Perîzî, Kenanî, Hîtît, Gîrgaşî, Hîvî û Yebûsiyan li hember we şer kirin, lê belê min ew dan destê we. Min di pêşiya we de tirs û xof şandin û wan ew ji ber we avêtin. Ev ne bi saya şûrê we an kevanê we çêbû.

‹Min ev welatê ku we tê de keda xwe nedaye û bajarên ku we ava nekirine, dan we û hûn di wan de rûdinin û ji rez û darên zeytûnên ku we neçandine dixwin.›

Hingê Yêşû ji tevahiya gel re got:

«Loma ji Xudan bitirsin û ji dil û can xizmetê jê re bikin. Wan Xwedayên ku bav û kalên we li wî aliyê Çemê Firat û li Misrê perizîn wan, bavêjin û ji Xudan re xizmetê bikin. Lê eger di çavê we de ne qenc be ku hûn ji Xudan re xizmetê bikin, hingê ji xwe re hilbijêrin ka hûn dixwazin ji kê re xizmetê bikin: Ma hûn dixwazin biperizin wan xwedayên ku bav û kalên we li wî aliyê çêm xizmet ji wan re kirin, an hûn dixwazin ji xwedayên Amoriyên ku hûn niha di welatê wan de rûdinin re xizmetê bikin? Lê heçî ez im, ez û mala xwe, emê ji Xudan re xizmetê bikin.»

Hingê xelkê bersîv da û got: «Dûrî me be ku em dev ji Xudan berdin û ji xwedayên din re xizmetê bikin. Çimkî Xwedayê me Xudan em û bavên me ji Misrê, ji mala koletiyê deranîn. Wî ew nîşanên mezin li ber çavên me kirin û di hemû rêwîtiya me de û di nav hemû miletên ku em di nav wan re derbas dibûn de em xweyî kirin. Xudan hemû milet û Amorî jî yên ku berê li vir rûdiniştin, ji ber me derxistin. Loma em jî, emê ji Xudan re xizmetê bikin, çimkî Xwedayê me ew e.»

Lê Yêşû ji gel re got: «Hûn nikarin ji Xudan re xizmetê bikin, çimkî ew Xwedayekî pîroz e, ew Xwedayekî hesûd e. Ew li neheqî û gunehên we nabihûre. Eger hûn dev ji Xudan berdin û ji xwedayên din re xizmetê bikin, ewê bizivire û li hember we rabe û piştî wê qenciya ku li we kiriye, wê belayan bîne serê we û wê we helak bike.»

Lê gel ji Yêşû re got: «Na, emê ji Xudan re xizmetê bikin.»

Yêşû ji gel re got: «Hûn bi xwe ji xwe re şahid in ku we ji xwe re Xudan bijartiye, ku hûn jê re xizmetê bikin.»

Wan got: «Erê, em şahid in.»

Yêşû ji wan re got: «Madem ku wusa ye, niha xwedayên din ên ku di nav we de ne, bavêjin û dilê xwe bidin Xwedayê Îsraêl Xudan.»

Gel ji Yêşû re got: «Emê ji Xwedayê xwe Xudan re xizmetê bikin û guhê xwe bidin peyvên wî.»

Wê rojê Yêşû li Şexemê ji bo gel peyman girêda û ji bo wan qanûn û tembîh danîn. Wî ev peyv di Kitêba Şerîeta Xwedê de nivîsandin û kevirekî mezin hilda û di bin darmaziya li rex pîrozgeha Xudan de çikiland.

Û Yêşû ji hemû gel re got: «Va ye, bila ev kevir li hember me şahid be, çimkî wî hemû peyvên ku Xwedê ji me re gotine, bihîstin. Loma, eger hûn Xwedayê xwe înkar bikin, ewê li hember we bibe şahid.»

Hingê Yêşû gel berda û her kes vegeriya mîrasa xwe.

Piştî wan tiştan xulamê Xudan, Yêşûyê kurê Nûn, mir; emrê wî sed û deh sal bû. Wan ew di milkê wî de li Tîmnat-Serahê veşart.

Hestiyên Ûsiv jî yên ku wan ji Misrê deranîbûn, li Şexemê di para zeviya Aqûb de, veşartin; ew para mîrasa kurên Ûsiv bû.

Û di hemû rojên Yêşû de û di hemû rojên rihspiyên ku hemû karên mezin ên ku Xudan ji bo Îsraêl kirin, dîtibûn de, gel ji Xudan re xizmet kir.

Piştî mirina Yêşû, demê hukumdaran dest pê kir; yek ji wan Gîdeyon, bû.

# Serhatiya Gîdeyon

(Hukumdar 6-8)

Di hemû rojên Yêşû de û di hemû rojên rihspiyên ku hemû karên mezin ên ku Xudan ji bo Îsraêl kirin, dîtibûn de, gel xizmet ji Xudan re kir.

Û xulamê Xudan Yêşûyê kurê Nûn sed û deh salî mir û ew hemû nifş jî çûn ba bav û kalên xwe û nifşekî din rabû yê ku Xudan nas nedikir û bi karên ku wî ji bo Îsraêl kiribûn, nizanibûn.

Di wê demê de gelê Îsraêl dest pê kir, tiştê ku di çavê Xudan de xerab bû, kirin û perizîn Baalan, yanî pûtan. Wan dev ji Xudan Xwedayê bav û kalên xwe yê ku ew ji welatê Misrê deranîbûn, berda û li pey xwedayên din çûn, yanî ew li pey xwedayên miletên ku li hawirdora wan bûn, ketin û xwe li ber wan tewandin. Weha wan hêrsa Xudan rakir, çimkî wan dev ji wî berda û perizîn Baal û Aşêreyan.

Loma Xudan ew dan destê nijdevanan û wan ew talan kirin. Wî ew firotin dijminên li hawirdora wan û êdî nikaribûn li ber wan bisekinin. Wek ku Xudan ji wan re sond xwaribû, her cara ku derdiketin cengê, destê Xudan li hember wan bû ku bi ser nekevin û ew ketin tengahiyeke mezin.

Hingê Xudan hukumdar rakirin û wan ew ji destê talankeran rizgar kirin. Lê dîsa wan guhê xwe neda hukumdarên xwe jî û ew zû ji riya bavên xwe yên ku guhê xwe dabûn emrên Xudan, derketin. Lê her cara ku Xudan ji bo wan hukumdar radikir, ew bi wî re bû û heta ku ew hukumdar sax bû, wî ew ji destê dijminên wan rizgar dikir. Lê dema ku hukumdar dimir, ew vedigeriyan ser riya xwe û ji bavên xwe hê bêtir xerabî dikirin, li pey xwedayên din diketin, diperizîn wan û xwe li ber wan ditewandin; wan qet dev ji karên xwe û ji riya rikdariyê bernedan.

Yek ji wan hukumdarên ku Xwedê ji gelê xwe re derdianîn, Gîdeyon bû.

Gelê Îsraêl di çavê Xudan de ya xerab kirin û Xudan heft salan ew dan destê Midyaniyan. Destê Midyaniyan li hember Îsraêl xurt bû; Îsraêliyan ji rûyê Midyaniyan ji xwe re cihên xweveşartinê di çiya, şkeft û asêgehan de çêkirin. Gelê Îsraêl kengê çandînî biçandana, Midyanî, Amalekî û xelkên din ji rojhilatê dihatin, li hember wan derdiketin, konên xwe li hember wan datanîn û li seranserê welêt berê erdê xera dikirin û di nav Îsraêl de tiştekî ku abora xwe pê bikin nedihiştin, ne pez, ne dewar û ne jî ker. Çimkî ew bi heywan û konên xwe ve derdiketin û bi zehfî wek kuliyan dihatin; hijmara wan û deveyên wan nebû û gelê Îsraêl ji ber Midyaniyan gelek hatibû belengazkirin. Loma Îsraêliyan hawara xwe gihandin Xudan.

Çaxê ku wan ji ber Midyaniyan hawara xwe gihandin Xudan, wî pêxemberek ji gel re şand û ji wan re got: «Xudan Xwedayê Îsraêl weha dibêje: ‹Min hûn ji Misrê derxistin û min hûn ji diyarê xulamtiyê derxistin. Min hûn ji destê Misriyan û ji destê wan hemûyên ku tengahî didan we, rizgar û azad kirin. Min milet ji ber we derxistin û min welatê wan da we.› Û min ji we re got: ‹Ez Xudan Xwedayê we me; hûn ji xwedayên wan Amoriyên ku hûn di nav wan de rûdinin, netirsin.› Lê we guh neda peyva min.»

Hingê milyaketê Xudan hat û di bin dara mazî ya li bajarê Ofraya Yoaşê Abîezrî de rûnişt. Kurê wî Gîdeyon di mahserê de genim diperkutand, da ku genim ji ber Midyaniyan veşêre.
Milyaketê Xudan xwe nîşanî wî da û jê re got: «Ey mêrxasê bi zirav, Xudan bi te re ye!»
Lê Gîdeyon got: «Ax, mîrzayê min, eger Xudan bi me re be, naxwe çima ev hemû tişt hatin serê me? Ew karên ecêb ên ku bav û kalên me ji me re digotin, li ku derê ne? Ma Xudan em ji Misrê derneanîn? Bi rastî Xudan niha dev ji me berda û em dan destê Midyaniyan.»
Xudan li wî zivirî û got: «Bi vê hêza xwe here û Îsraêl ji destê Midyaniyan xilas bike! Ez bi xwe te dişînim.»
Gîdeyon jê re got: «Ax Xweyiyê min, çawa ez Îsraêl rizgar bikim? Malbata min di eşîra Minaşe de ya herî kêm e û ez di mala bavê xwe de yê herî biçûk im.»
Lê Xudan ji wî re got: «Ezê bi te re bim û tê wek ku zilamek bin, li Midyaniyan bixî.»
Gîdeyon jê re got: «Eger niha min di çavê te de qencî dîtibe, nîşanekê bide min ku yê bi min re dipeyive, tu yî. Ji kerema xwe, heta ku ez vegerim ba te û diyariya xwe derxim û deynim ber te, ji vir veneqete.»
Wî got: «Heta ku tu vegerî, ezê bimînim.»

Hingê Gîdeyon ket hundir, karikek û nanê şkeva amade kir. Wî goşt xist selikekê û ava goşt xist qoçxanê û anî ba wî bin dara mazî û pêşkêşî wî kir.
Milyaketê Xwedê ji wî re got: «Rahêje goşt û nanên şkeva û deyne ser vê latê û ava goşt birijîne.» Gîdeyon wusa kir û milyaketê Xudan bi serê şivdarê ku di destê wî de bû li goşt û li nanên şkeva xist. Û ji latê agir derket û goşt û nanên şkeva xwar, xilas kir. Û milyaketê Xudan ji ber çavê wî winda bû.
Hingê Gîdeyon fêm kir ku ew milyaketê Xudan bû û got: «Wey li min, ya Xudan Xweyî! Min milyaketê Xudan rû bi rû dît.»
Lê Xudan jê re got: «Silamet li te be! Netirse, tu namirî.»
Li ser vê yekê Gîdeyon li wê derê gorîgehek ji Xudan re çêkir û navê wê ‹Yahwe-Şalom› (yanî ‹Xudan aştî ye›) danî.

Eynî wê şevê, Xudan ji wî re got: «Rahêje gayê bavê xwe, gayê diduyan ê ku heft salî ye. Gorîgeha bavê xwe ya ji bo pûtê Baal hilweşîne û pûta Aşêrayê ya li rex wê bibire. Li ser vî girî ji Xudan Xwedayê xwe re gorîgehekê çêke û rahêje gayê diduyan û bi darê Aşêraya ku tê bibirî, goriya şewitandinê pêşkêş bike.»
Gîdeyon ji xulamên xwe deh birin û wek ku Xudan jê re gotibû kir. Lê ji tirsa mala bavê xwe û mirovên bajêr ev bi şev kir.

Dotira rojê zilamên bajêr sibê zû rabûn û va ye, gorîgeha Baal hilweşiya bû û Aşêraya li rex wê hatibû birrîn û li ser gorîgeha ku hatibû çêkirin, gayê diduyan hatibû pêşkêşkirin.
Xelkê ji hev re got: «Kê ev tişt kiriye?»
Ew lê geriyan û wan lê kolî û gotin: «Gîdeyonê kurê Yoaş ev tişt kiriye.»
Û zilamên bajêr ji Yoas re gotin:«Kurê xwe derxe ku bimire, çimkî gorîgeha Baal hilweşand û Aşêraya ku li rex wê bû birî.»
Lê Yoaş ji wan hemûyên ku li hember wî rabûbûn re got: «Ma hûnê li doza (heqê) Baal bipirsin? An ma hûnê wî rizgar bikin? Yê ku li doza wî bipirse kî be, sibehî wê bê kuştin. Eger ew xwedê be, ji bo ku yekî gorîgeha wî hilweşand, bila ew bi xwe li doza xwe bipirse.»

* * *

Hingê hemû Midyanî û Amalekî û xelkên din ji rojhilatê li cihekî kom bûn. Û derbas bûn, di geliyê Yîzreêl de ordîgeh danîn. Îcar Ruhê Xudan hat ser Gîdeyon û wî li boriyê xist û zilamên Abîezerî li dor wî civiyan. Wî qasid rêkirin pey tevahiya eşîreta Minaşe jî û ew jî li dor wî civiyan. Û qasid rêkirin pey eşîrên Aşêr, Zebûlon û Neftelî û ew derketin ku beşdarî wan bibin.

Gîdeyon ji Xwedê re got: «Eger wek ku te got, tu Îsraêl bi destê min rizgar bikî, va ye, ezê hirya liva deynim ser bênderê; eger xûnav bi tenê li ser livayê be û li ser tevahiya axê zuwayî be, hingê ezê bizanim wek ku te gotiye, tê Îsraêl bi destê min rizgar bikî.» Û weha çêbû. Sibê zû Gîdeyon rabû û liva guvaşt û ji livayê, piyanek tije xûnav derket.
Lê wî ji Xwedê re got: «Bila hêrsa te li hember min ranebe û ezê bi tenê vê carê bêjim. Ez lavan dikim, bi tenê ez vê carê bi livayê biceribînim. Niha bila zuwayî li ser livayê be û li ser tevahiya axê xûnav hebe.» Û wê şevê Xwedê weha çêkir. Zuwayê bi tenê li ser livayê bû û li ser tevahiya axê xûnav hebû.

Sibê zû Gîdeyon û hemû gelê ku pê re bû rabûn û li ba serkaniya Harodê artêşgeh, yanî ordîgeh, danîn. Û artêşgeha Midyaniyan li aliyê wan ê bakur li ba mila Morê di newalê de bû.
Hingê Xudan ji Gîdeyon re got: «Ji bo ku ez Midyaniyan bidim destê wan, hijmara gelê ku li ba te ye zêde ye, an nexwe Îsraêlî wê bêjin: ‹Destê me em xilas kirin!› û wê li ber min pesnê xwe bidin. Loma bi wan bide bihîstin û bêje: ‹Yê ku ditirse û dilerize, bila bizivire û ji çiyayê Gîleadê bila bi şûn de here.›»
Hingê bîst û du hezar ji gel zivirîn û deh hezar man.
Lê Xudan ji Gîdeyon re got: «Dîsa hijmara gel zêde ye. Wan bibe ser avê ku ez wan ji bo te biceribînim. Eger ez ji te re bêjim: ‹Evê ha bila bi te re here›, ewê bi te re here; lê eger ez bêjim: ‹Evê ha bi te re naçe›, ew naçe.»
Û Gîdeyon gel bir ser avê û Xudan jê re got: «Wek ku kûçik bi zimanê xwe vedixwe, her zilamê ku bi zimanê xwe avê vexwe, wî bide aliyekî û her zilamê ku ji bo vexwarinê here ser çokên xwe jî bide aliyekî.»
Û hijmara wanên ku destên xwe birin ber devê xwe û bi zimanê xwe vexwarin, sê sed kes bûn. Lê yên din hemû çûn ser çokên xwe ku avê vexwin.

Xudan ji Gîdeyon re got: «Ezê we bi van sê sed kesên ku bi zimanê xwe vexwarin, rizgar bikim û ezê Midyaniyan bidim destê te. Û hemû gel, bila her kes here cihê xwe.»
Û wan rahişt xwarin û boriyên wan ên din û Gîdeyon hemû Îsraêlî, her kes şand çadira wî, lê ew sê sed kes dan aliyekî. Û ordiya Midyaniyan li aliyê wî yê jêr di newalê de bû.

Wê şevê Xudan ji wî re got: «Rabe, êrîşî ordîgeha wan bike, çimkî min ew dan destê te. Lê eger tu bitirsî, pêşî bi xulamê xwe Pûra ve berjêrî ordîgehê bibe; hingê tê bibihîzî ku çi ji hev re dibêjin. Û piştî wê yekê destên te wê hêzdar bibin û tê êrîşî wan bikî.»

Gîdeyon bi xulamê xwe Pûra ve berjêr bû, çû nêzîkî wan leşkerên ku li tenişta ordîgehê nobedarî dikirin. Midyanî û Amalekî û hemû kurên Rojhilat bi zehfî wek kuliyan ketibûn newalê. Û hijmara deveyên wan wek seylaka li ber lêva deryayê bûn.
Çaxê Gîdeyon hat û nêrî va ye, zilamekî, xewn ji hevalê xwe re digot, got: «Min xewnek dît, va ye, simonek ji nanê cehî ber bi ordîgeha Midyaniyan ve gindirî û heta bi çadirê hat, li wê xist û ew hilweşand, ew serûbino kir û çadir li ser erdê pehn bû.»
Hingê hevalê wî jê re got: «Bê şik mana vê ev e: Ev şûrê Gîdeyonê kurê Yoaşê Îsraêlî ye. Xwedê Midyan û hemû ordî daye destê wî.»

Çaxê Gîdeyon gotin û şîrovekirina xewnê bihîst, perizî Xwedê. Ew vegeriya ordîgeha Îsraêl û got: «Rabin, çimkî Xwedê ordiya Midyaniyan da destê we.»
Û wî her sê sed zilamên xwe kirin sê birr - û borî, şerbikên vala û di şerbikan de çira dan destê hemûyan - û ji wan re got: «Li min binêrin û wusa bikin. Û binêrin çaxê ez bêm tenişta ordîgehê, de hingê ez çi bikim, hûn jî hûnê wusa bikin. Ez û hemûyên bi min re, eger em li boriyê bixin, hûn jî li hawirdora tevahiya ordîgehê li boriyan bixin, biqîrin û bêjin: ‹Ji bo Xudan û ji bo Gîdeyon!›»

Gîdeyon û ew sed zilamên ku li ba wî bûn, di destpêka nobeta navê de, çaxê ku nû nobedar danîbûn, gihîştin tenişta ordîgehê. Wan li boriyan xist û ew şerbikên ku di destên wan de bûn,

şkênandin. Û her sê birran jî li boriyê xistin û şerbik şkênandin û çira di destê xwe yê çepê de û ji bo ku lêxin borî di destê xwe yê rastê de girtin. Û qîriyan, gotin: «Şûrê Xudan û şûrê Gîdeyon!»
Her kes di cihê xwe de li hawirdora ordîgehê rawesta. Û hemû ordiya Midyaniyan di nav hev de bezî, kirin qîrîn û bazdan. Çaxê li sê sed boriyan xistin, Xudan di nav Midyaniyan de şûrê her yekî li hember hevalê wî û li hember tevahiya ordiyê rakir. Û ordiya Midyaniyan ji ber Gîdeyon û zilamên wî şkest, reviya. Û zilamên Îsraêl ji eşîrên Neftelî, Aşêr û ji tevahiya Minaşe civiyan û ketin pey Midyaniyan.

Îcar Gîdeyon qasid şandin tevahiya çiyayê Efrayîm û got: «Dakevin, li hember Midyaniyan rawestin û heta bi Beyt-Barayê bûriyên rûbaran û bûriyên Çemê Urdunê li ber wan bigirin.»
Û hemû Efrayîmî civiyan û bûriyên rûbaran û bûriyên Çemê Urdunê girtin. Û du serdarên Midyaniyan Orêb (yanî ‹Qirik›) û Zeêb (yanî ‹Gur›) girtin û kuştin.

Piştî şer, zilamên Îsraêl ji Gîdeyon re gotin: «Tu li ser me serweriyê bike û bila kurê te û kurê kurê te jî serweriyê bike!»
Lê Gîdeyon ji wan re got: «Ez nabim serwerê we û kurê min jî nabe serwer, lê belê Xwedê wê serwerê we be!
Daxwaza min bi tenê ev e: Bila her kes ji talanê ku standiye guharekî bide min.»
Wan gotin: «Emê wan bi dilxweşî bidin te!»
Wan kincek li ser erdê raxist û her kesî guharek avêt wir. Kêm û zêde 20 kîlo zêr ji wan derket. Hingê Gîdeyon ji wî zêrî heykelek çêkir û ew li bajarê xwe, li Ofrayê danî. Û hemû gelê Îsraêl li wir perizî wî heykelî û pûtperestî kirin.

Ev yek ji Gîdeyon û ji mala wî re bû xefik ku ew ji rewşa xwe bikevin.

Çaxê ku Gîdeyon mir, gelê Îsraêl ji xwe re Baal kirin xwedê û li pey wî pûtî ketin. Wan êdî Xudan Xwedayê xwe yê ku ew ji destê hemû dijminan rizgar kiribûn, neanî bîra xwe û li gor emrên wî nekirin.

# SERHATIYA SAMÛÊL

## Hana

(Samûêl I, 1)

Gîdeyon yek ji panzdeh hukumdarên gelê Îsraêl bû. Wan hemû hukumdaran kêm û zêde 150 salan serwerî li gelê Îsraêl kirin, çimkî di wê demê de padîşahên gelê Îsraêl nebûn û pêxember jî kêm bûn.

Lê piştî van salan, Xwedê pêxemberek bijart ku navê wî Samûêl bû.

Ev serhatiya Samûêl pêxember e:

Mirovek hebû ku ji çiyayên Efrayîm bû; navê wî Elkana bû. Du jinên wî hebûn, navê yekê Hana û navê ya din Penîna bû; zarokên Penîna hebûn, lê belê zarokên Hanayê nebûn.

Elkana her sal ji bajarokê xwe diçû Şîloyê, cihê ku Konê Perizînê lê bû û li wir diperizî Xudanê Ordiyan, yanî Xwedayê rast û jê re gorî serjêdikir. Di wê demê de Êlî û herdu kurên wî, Hofnî û Pînhas, li Şîloyê kahîn bûn.

Di roja gorîkirinê de, Elkana par didan jina xwe Penîna û hemû kur û keçên wê. Lê belê ji Hanayê re du par didan, çimkî ji wê hez dikir. Loma Penîna ew diqehirand, da ku hêrsa wê rake, çimkî Xudan malzaroka Hanayê girtibû. Her sal weha bû; çi cara Hana hildikişiya mala Xudan, Penîna weha ew diqehirand, ew jî digirî û xwarin nedixwar. Mêrê wê Elkana jê re digot: «Hana, çima tu digirî? Çima tu naxwî û çima dilê te xemgîn e? Ma ez ji te re ji deh kuran ne çêtir im?»

Carekê piştî ku wan li Şîloyê xwar û vexwar, Hana rabû. Êlî li ber rexderiyê Perestgeha Xudan li ser kursî rûniştî bû. Hanayê bi dilê kul li ber Xudan dua dikir û pirr digirî.

Wê nedrek kir û got: «Ya Xudanê Ordiyan, eger bi rastî tu li rebeniya cêriya xwe binêrî û min bînî bîra xwe, eger tu cêriya xwe ji bîr nekî û tu kurekî bidî cêriya xwe, ezê wî di hemû rojên jiyana wî de bidim Xudan; û gûzan li serê wî nakeve.»

Çaxê wê li ber Xudan di dua xwe de berdewam dikir, Êlî li devê wê dinêrî. Hanayê di dilê xwe de digot, bi tenê lêvên wê dilebitîn, lê dengê wê nedihat bihîstin. Loma Êlî guman kir ku ew serxweş e û jê re got: «Ma tê heta kengê serxweş bî? Dev ji şerabê berde!»

Hanayê bersîv da û got: «Ne wusa ye, mîrzayê min; ez jineke ruh bi keder im, min şerab an vexwarinên giran venexwarine, lê min dilê xwe li ber Xudan vala kir. Guman neke ku cêriya te jineke xerab e; ez pirr xemgîn im û dilê min bi kul û kovan e, ji lewre min heta niha got.»

Hingê Êlî jê re got: «Bi silamet here û bila Xwedayê Îsraêl li gor daxwaza te bide te.»

Wê got: «Bila cêriya te di çavên te de qenciyê bibîne.»

Hingê ew vegeriya û xwarin xwar. Û êdî xemgînî li ser rûyê wê nemabû.

Serê sibê zû ew rabûn û perizîn Xudan û hingê vegeriyan, hatin Ramayê mala xwe. Elkana çû ba jina xwe Hanayê û Xudan ew anî bîra xwe. Hana bi zaro bû û çaxê wê kurek anî, wê got: «Min ew ji Xudan xwest», loma navê wî ‹Samûêl› danî.

Wê salê Hana bi mêrê xwe re neçû Şîloyê; wê ji Elkana re got: «Heta ku zarok ji şîr neyê vekirin, ez hilnakişim. Ezê hingê wî bibim û pêşkêşî Xudan bikim û ewê her dem li wê derê be.»

Mêrê wê jê re got:«Çi di çavê te de qenc be, bike; li malê bimîne heta ku tu wî ji şîr vekî. Bi tenê bila Xudan peyva xwe bîne cih.»

Çaxê ku Hanayê Samûêl ji şîr vekir, wê conegayekî sê salî, çapek ard û meşkek şerab hilda û bi zarok ve hilkişiya Şîloyê mala Xudan. Zarok jî hê biçûk bû. Piştî ku conega serjêkirin, wan zarok anîn ba Êlî.
Hanayê got: «Mîrzayê min, bi jiyana te, ew jina ku li vê derê li ba te sekinî bû û li ber Xudan dua dikir, ez im. Min ji bo vî zarokî dua kir û Xudan li gor daxwaza min da min. Min jî ew ji Xudan re kir diyarî; di hemû rojên jiyana xwe de, ew ji Xudan re diyarî ye.»

# Êlî û kurên wî

(Samûêl I, 2)

Elkana bi mala xwe ve vegeriya Ramayê, lê zarok dest pê kir ku li ber kahîn Êlî xizmetê ji Xudan re bike.
Heçî kurên Êlî bûn, ew mirovên sernizim û xerab bûn; wan Xudan nas nedikir û ji qurbanan çi dixwestin, ji xwe re hildibijartin û heta bi darê zorê jî ji xwe re distandin. Loma gunehê wan xortan li ber Xudan pirr mezin bû, çimkî wan qurbanên Xudan kêm didîtin.

Samûêl di nav wan de li ber Xudan xizmet dikir; ew hê zarokek bû, lê cilê kahînan werdigirt. Diya wî her sal jê re ebayek biçûk çêdikir û çaxê ji bo pêşkêşkirina goriya salane bi mêrê xwe re dihat, jê re dianî. Êlî Elkana û jina wî pîroz kirin û got: «Ji dêla vî zarokê ku jina te ji Xudan xwest û wê niha daye wî, bila Xudan ji vê jina te zarokên din jî bide te.»
Xwedê kerem li Hanayê kir, ew bizaro bû û sê kur û du keç anîn.

Di vê navê de Samûêlê zarok mezin dibû.

Êlî gelek bi nav salan ve çûbû; wî li ser hemû tiştên xerab ên ku kurên wî dikirin, dibihîst û wî dizanibû ku ew bi cêriyên ku li ber deriyê Konê Perizînê xizmet dikirin re radizan.
Loma wî ji wan re got: «Çima hûn tiştên weha dikin? Ez ji her kesî kirinên we yên xerab dibihîzim. Ev çênabe, kurên min. Eger mirov li hember mirovekî din guneh bike, Xwedê wê ji bo wî navberiyê bike; lê eger mirov li hember Xudan guneh bike, kî wê ji bo wî mehderê bike?»
Lê belê wan guhdariya gotina bavê xwe nekir, çimkî daxwaza Xudan ew bû ku wan bikuje. Di vê navê de Samûêlê xort çiqas dihat mezin dibû û li ber Xudan û li ber mirovan keremdar bû.
Hingê zilamekî Xwedê hat ba Êlî û jê re got: «Xudan weha dibêje: ‹Çaxê ku mala bavkalê te li Misrê ji mala Firewn re koletî dikir, ma min xwe ji wan re eşkere nekir? Ji hemû eşîrên Îsraêl min ew bi kahîntî ji xwe re hilbijart, da ku derkeve gorîgeha min, bixûrê bişewitîne û li ber min kahîntiyê bike. Çima hûn gorî û pêşkêşa min kêm dibînin? Çima tu siyaneta kurên xwe ji ya min bêtir digirî û dihêlî ku ew xwe bi parçê herî qenc ê hemû qurbanên gelê min qelew bikin?
Ji ber vê yekê Xudan Xwedayê Îsraêl dibêje: ‹Erê, min gotibû ku mala te û mala bavkalê te wê her û her li ber min xizmetê bike.› Lê belê niha Xudan dibêje: ‹Ev yek ji min dûr be! Çimkî ez siyaneta wan digirim ên ku siyaneta min digirin û yên ku min kêm dibînin, wê bên biçûk kirin. Va ye, roj wê bên ku di mala te de mirovekî pîr nebe û hemû dûndana mala te hê ciwan wê bimire. Tiştê ku wê bê serê herdu kurên te, Hofnî û Pînhas, wê ji te re bibe nîşan: Herdu jî wê di eynî rojê de bimirin.›
Ezê ji xwe re kahînekî dilsoz rakim; ewê li gor daxwaza dilê min bike û ezê mala wî qayîm bikim û ewê di hemû rojan de li ber meshkiriyê min xizmetê bike.»

# Xudan ji Samûêl re xuya dibe

(Samûêl I, 3)

Samûêlê xort li ber Êlî xizmet ji Xudan re dikir. Di wan rojan de peyivîna Xudan kêm bû.

Di wê demê de Êlî şevekê li cihê xwe razabû; çavên wî tarî bûbûn û êdî nikaribû bidîta. Hê çiradanka Xwedê netemirî bû û Samûêl di Perestgeha Xudan de radiza. Hingê Xudan gazî Samûêl kir û Samûêl got: «Va me ez.»

Û ew bezî, çû ba Êlî û got: «Va me ez; te gazî min kir.»

Lê Êlî got: «Min gazî te nekir, here raze.» Û Samûêl çû, raza.

Lê Xudan dîsa gazî wî kir, got: «Samûêl!»

Samûêl jî rabû û bezî ba Êlî, got: «Va me ez, te gazî min kir.»

Lê wî got: «Kurê min, min gazî te nekir, here raze.»

Xudan cara sisiyan gazî Samûêl kir, ew rabû, çû ba Êlî û got: «Va me ez, te gazî min kir.»

Hingê Êlî fêm kir ku Xudan gazî xortik kiriye. Loma wî ji Samûêl re got: «Here raze û eger ew gazî te bike, bêje: ‹Ya Xudan, bêje; xulamê te guhdarî dike.›»

Li ser vê yekê Samûêl çû û li cihê xwe raza. Hingê Xudan hat û wek berê gazî wî kir û got: «Samûêl! Samûêl!»

Samûêl got: «Bêje; xulamê te guhdarî dike.»

Xudan ji Samûêl re got: «Va ye, ezê di Îsraêl de tiştekî bikim û her kesê ku vê yekê bibihîze, herdu guhên wî wê bikin çingîn. Di wê rojê de ezê her tiştê ku min li hember mala Êlî gotiye bikim – ji destpêkê heta dawiyê. Çimkî min bi wî da zanîn ku ezê ji ber wî gunehê ku ew pê dizane, her û her dîwana mala wî bikim; kurên wî nifir anîn ser xwe û ew ji wan re nebû asteng. Ji ber vê yekê min sond xwar ku ji bo gunehê mala Êlî tu caran bi gorî an pêşkêşan kefaret tune.»

Samûêl heta sibê raza û hingê herdu milên dergehê mala Xudan vekirin. Ew tirsiya ku ji Êlî re bêje, lê Êlî gazî wî kir û got: «Samûêl, kurê min. Wî çi ji te re got? Ji min tiştekî veneşêre!»

Hingê Samûêl her tişt jê re got û tiştekî ji wî veneşart. Piştre Êlî got: «Ew Xudan e, bila ew, tiştê ku di çavê wî de qenc e bike.»

Piştî demekê Filistîniyan êrîşî gelê Îsraêl kir û di şer de gelek zilamên Îsraêlî ketin. Xelk gelek tirsiya û wan biryar da ku Sindoqa Peymanê ji Şîloyê bibin ordîgeha xwe. Her du kurên Êlî, Hofnî û Pînhas bi Sindoqê re çûn ordîgehê. Lê dîsa jî Filistînî bi ser ketin, Sindoqa Peymanê hat standin û gelek Îsraêlî hatin kuştin; herdu kurên Êlî Hofnî û Pînhas jî hatin kuştin.

Hê di eynî rojê de zilamekî ji ber ordiya Filistîniyan reviya, hat û xeber da Êlî, jê re got: «Îsraêl ji ber Filistîniyan reviyaye û her du kurên te hatin kuştin û Sindoqa Peymanê jî hat standin.»

Çaxê zilam behsa Sindoqa Xwedê kir, Êlî li ber derî ji kursiyê xwe ber bi paş ve ket û stûyê wî şkest û ew mir.

Emrê Êlî not û heşt sal bû û wî çil salî hukumdariya Îsraêl kiribû.

Heçî Samûêl bû, ew mezin bû û Xudan bi wî re bû û nehişt ku ji hemû peyvên xwe yek pûç derkeve. Hemû gelê Îsraêl fêm kir ku Samûêl pêxemberê dilsoz ê Xudan e. Û Xudan li Şîloyê peyva xwe ji Samûêl re eşkere dikir.

Heçî Sindoqa Peymanê bû, Xwedê belayên giran anîn serê Filistîniyan heta ku wan biryar da ku wê vegerînin ba gelê Îsraêl. Sindoq ji bo bîst salan li bajarê Kiryat Yearîmê ma û hemû gelê Îsraêl bêriya Xudan kir. Loma Samûêl ji wan re got: «Eger hûn bixwazin bi dil û can li Xwedê vegerin, xwedayên xerîb ji nav xwe bavêjin û bi tenê ji Xudan re xizmetê bikin. Hingê ewê we ji destê Filistîniyan rizgar bike.»

Samûêl hemû gel civand, wan rojî girt û bi eşkereyî gotin: «Me li hember Xudan guneh kir» û Samûêl ji bo wan mehder kir.

Çaxê Filistîniyan bihîst ku hemû gelê Îsraêl civiya, mîrên wan derketin ku êrîşî wan bikin. Tirseke mezin ket dilê Îsraêliyan û wan ji Samûêl re got: «Dev ji hawarkirin û ji duakirinê bernede, da ku Xudanê me, me ji destê Filistîniyan rizgar bike.»
Li ser vê yekê Samûêl berxikek gorî kir û li ber Xudan dua kir û Xudan bersîva wî da. Lê çaxê ku Samûêl gorî pêşkêş dikir, ordiya Filistîniyan ji bo cengê nêzîk bû. Hingê Xwedê xurexura mezin a ewran da bihîstin û tirs û xof ket dilê Filistîniyan û ew reviyan. Leşkerên gelê Îsraêl li pey wan ketin û li wan xistin.

Hingê Samûêl kevirek rahişt û di nav bajarokên Mîtspa û Şênê de çikiland û navê wî kevirî ‹Eben-Ezer› danî (yanî ‹Kevirê Alîkariyê›) û got: «Çimkî heta bi vir Xudan alîkariya me kir.»
Êdî Filistînî heta ku Samûêl sax bû careke din neketin nav sînorên Îsraêl.

Samûêl pêxember di hemû rojên jiyana xwe de hukumdariya gelê Îsraêl dikir. Sal bi sal ew digeriya, diçû her çar bajarên girîng û li wan deran li gor emir û qanûnên Xwedê hakimtî dikir.

Çaxê ew kal û pîr bû, wî kurên xwe li ser gelê Îsraêl danîn, da ku ew li Bîrşêbayê bibin hakim û hukumdar. Lê belê kurên wî di riya wî de neçûn; ew ketin pey qezenca nerast, wan bertîl distand û di dîwankirinê de rastî û edalet xera dikirin.
Loma hemû rihspiyên gel civiyan û hatin ba Samûêl û gotin: «Tu pîr bûyî û kurên te di riya te de naçin. Ji ber vê yekê, li ser me padîşahekî deyne, da ku ew serweriyê li me bike, da ku em bibin wek miletên din.»

Lê belê ev gotin di çavê wî de xerab xuya bû û wî li ber Xwedê dua kir. Xwedê jê re got: «Di her tiştê ku ew ji te re dibêjin de, guhdariya wan bike. Wan ne tu red kiriyî, lê belê wan ez red kirime. Ji roja ku min ew ji Misrê deranîn û heta îro wan weha li min kiriye û ew niha li te jî dikin: Wan dev ji min berda û li pey xwedayên din ketin. Guhdariya wan bike, lê wan hişk hişyar bike û ji wan re bêje ka heq, qanûn û mafên padîşah wê çi bin.»

Samûêl hemû ev gotinên Xwedê ji wan re gotin. Got: «Padîşah wê kurên we bibe û wan bike siwar û wan deyne ser erebeyên xwe û ewê di pêşiya wî de bibezin; ewê wan bike serleşker; ewê erdê wî cot bikin û wê dexlê wî biçînin; ewê keçên we bibe û wê bibin xwarinpêj û nanpêj û wê melhemên bîhnxweş çêkin. Ewê zevî û rez û zeytûnên we yên herî qenc bide xulamên xwe. Ewê dehyeka berê zevî û rezên we rahêje û bide karmend û xulamên xwe. Ewê xulam û cêriyên we, heywan û kerên we ji xwe re hilde. Ewê dehyeka keriyên we bistîne û hûnê bibin koleyên wî. Hingê hûnê ji ber padîşahê we hawar bikin û di wê rojê de Xudan wê bersîvê nede we.»

Lê belê gel nexwest guhê xwe bide Samûêl û gotin: «Em padîşahekî dixwazin! Bila ew li ser me be, da ku em jî wek miletên din bin. Padîşahê me wê hukumdariya me bike û di pêşiya me de bikeve cengê.»
Samûêl hemû ev gotinên gel ji Xudan re gotin û Xudan got: «Guhdariya wan bike. Padîşahekî deyne ser wan.»

# SERHATIYA ŞAWÛL

## Şawûl dibe padîşah

(Samûêl I, 9-11)

Di eşîra Binyamîn de mirovek hebû, navê wî Kîş bû. Ew mêrxasekî bi zirav bû. Kurekî wî yê xort û xweşlaw hebû, navê wî Şawûl bû. Di nav gelê Îsraêl de xortekî ji wî çelengtir nebû; ji milê xwe bi jor ve ser hemû gel diket.

Rojekê Xwedê ji Samûêl pêxember re got: «Sibe di vî wextî de ezê ji herêma Binyamîn zilamekî bişînim ba te; wî li ser gelê min Îsraêl mesh bike. Ewê gelê min ji destê dijminan xilas bike. Çimkî min li hal û rewşa gelê xwe nêrî û hawara wan gihîşt ba min.»

Dotira rojê, çaxê Samûêl Şawûl dît, Xudan ji wî re got: «Va ye, ew zilamê ku min li ser wî ji te re gotiye, ev e! Ev wê hukumdariyê li ser gelê min bike.»

Samûêl jî rahişt firaxa xwe ya rûn û bi serê wî de rijand, ew ramûsa û got: «Xudan tu li ser mîrasa xwe mesh kirî, da ku tu bibî rêberê gelê wî.»

Piştî vê yekê, Samûêl gelê Îsraêl li Mîtspayê li ber Xudan kom kir û ji wan re got: «Xudan Xwedayê Îsraêl weha dibêje: ‹Ji Misrê min Îsraêl derxist; ji destê Misriyan û ji destê hemû padîşahiyên ku hûn dan tengiyê, min hûn azad kirin.›

Lê belê we îro ew Xwedayê xwe yê ku hûn ji hemû bela û tengahiyên we xilas kirine, red kir û ji wî re got: ‹Padîşahekî deyne ser me.› Îcar niha li gor eşîre û bavikên xwe, li ber Xudan rawestin.»

Û Samûêl hemû eşîrên Îsraêl anîn pêş û pişk li eşîra Binyamîn ket. Wî eşîra Binyamîn li gor malbatên eşîrê anî pêş û pişk li malbata Matriyan ket. Îcar pişk li kurê Kîş Şawûl ket, lê çaxê li wî geriyan, ew xuya nebû. Wan careke din ji Xudan pirsî: «Ma hê kesekî din ê ku bê vir heye?»

Xudan got: «Va ye, wî xwe di nav pergalan de veşartiye.»

Îcar ew bezîn çûn, ew ji wir anîn û çaxê ew di nav gel de rawesta, ew ji milê xwe bi jor ve ser hemû gel diket.

Hingê Samûêl ji tevahiya gel re got: «We ew zilamê ku Xudan bijartiye, dît? Di nav tevahiya gel de hemberê wî tune.»

Û tevahiya gel kir qîrîn û gotin: «Bijî padîşah!»

Piştî vê yekê Samûêl rêz û tertîbên padîşahtiyê ji gel re got û di kitêbê de nivîsî û kitêb danî Perestgeha Xudan.

Lê belê hin mirovên bêkêr hebûn, digotin: «Ma ew zilam çawa wê me rizgar bike?» Lê Şawûl guh neda wan û tiştek negot.

* * *

Piştî demekê padîşahê Amoniyan Nahaş li hember gelê Îsraêl derket û ordîgeha xwe li ber bajarê Yabêşê danî û li dora wî girt. Xelkê Yabêşê jê re got: «Ji me re sond bixwe ku tu me sax bihêlî û emê xwe teslîmî te bikin.»

Nahaş ji wan re got: «Şertê min ev e: Ezê çavê rastê yê we hemûyan derxim, da ku ji gelê Îsraêl re bibe şerm.»

Li ser vê yekê rihspiyên bajêr gotin: «Heft rojan bide me, ku em qasidan bişînin Îsraêl û eger yekî ku me xilas bike tunebe, hingê emê xwe teslîmî te bikin.»

Nahaş qebûl kir û qasid derketin, hatin bajarê Şawûl û wan mesele ji gel re got. Çaxê xelkê bihîst, hemû bi dengekî bilind giriyan.

Şawûl li pey gayên xwe ji zeviya xwe vedigeriya û pirsî: «Çima ew hemû digirîn?»
Wan jê re got û çaxê wî bihîst, Ruhê Xwedê bi hêz hat ser wî û hêrsa wî rabû. Wî cotek ga parçe parçe kir û bi destê qasidan şandin hemû herêmên Îsraêl. Qasidan li her derê digot: «Her kî ku li pey Şawûl û li pey Samûêl dernekeve, gayên wî jî wusa wê bên parçe parçe kirin.»

Tirsa Xwedê ket ser gel û ew hemû bi hev re derketin ba Şawûl û Samûêl. Wan ji qasidên bajarê Yabêşê re got: «Sibe gava roj germ bibe, hûnê rizgar bibin.»
Gava qasidan ev yek ji xelkê Yabêşê re got, hemû şa bûn. Wan ji Nahaş re got: «Sibe emê xwe teslîmî we bikin û hûn çi bixwazin, bi me bikin.»
Dotira rojê, Şawûl zilam kirin sê birr û li ber destê sibehî ket nav ordîgeha Amoniyan û heta nîvro li wan xistin û ji wan ên ku reviyan, dido bi hev re neman.

Piştî vê yekê, xelkê got: «Ew kî ne, yên ku digotin: ‹Ma bi rastî Şawûl wê li ser me bibe padîşah?› Wan bînin vir û emê wan bikujin!»
Lê belê Şawûl got: «Îro tu kes neyê kuştin, çimkî Xudan îro gelê xwe rizgar kir.»

# Şawûl li gor emrê Xwedê nake – Amalekî

(Samûêl I, 13 + 15)

Piştî demekê Filistînî kom bûn ku bi Îsraêl re şer bikin; sê hezar erebeyên şer û şeş hezar siwar û wek seylaka ber lêva deryayê gelek leşker derketin û ordîgeh danîn. Çaxê Îsraêliyan dît ku ew di talûkê de ne, wan xwe di şkeftan û di nav deviyan de, di latan û di celx û çalan de veşart. Şawûl hê li Gîlgalê bû û hemû gel di pey wî de, dilerizî.

Samûêl ji Şawûl re gotibû, ku li benda wî bimîne û Şawûl li gor wî wextê ku Samûêl kifş kiribû, heft rojan li benda wî ma, lê belê Samûêl nehat Gîlgalê. Û leşker ji ba Şawûl diçûn. Hingê wî got: «Heywanên ji bo goriya şewitandinê û ji bo pêşkêşên aştiyê ji min re bînin.»
Û wî goriya şewitandinê pêşkêş kir.

Tam gava ku wî pêşkêşkirina goriyê xilas kir, Samûêl hat. Şawûl çû pêşiya wî ku silavê bideyê.
Lê Samûêl got: «Te çi kir?»
Şawûl got: «Çaxê min dît ku leşker ji dora min diçin û di roja kifşkirî de tu nehatî û Filistînî civiyan, min got: ‹Niha Filistînî wê êrîşî me bikin, lê min kerema Xudan hê nexwestibû.› Loma min zor li xwe kir, min goriya şewitandinê pêşkêş kir.»
Lê Samûêl ji Şawûl re got: «Te bêaqilî kir. Te ew emrê ku Xudan Xwedayê te li te kiribû negirt; eger te bigirta, wiyê padîşahtiya te ji bo her û her qayîm bikira. Lê niha padîşahtiya te ji te re namîne. Xudan ji bo xwe li zilamekî li gor dilê xwe geriya û Xudan ew danî ser gelê xwe ku bibe rêber; çimkî te emrê Xudan negirt.»

* * *

Careke din Samûêl hat ba Şawûl û jê re got: «Xwedê ez şandibûm ku ez te mesh bikim, bikim padîşahê gelê wî. Niha guhê xwe bide gotinên wî:
‹Xudanê ordiyan weha dibêje: Min tiştê ku gelê Amalekiyan li gelê min kir, ji bîr nekir. Çaxê ew ji Misrê derketin, wan riya gelê min birî û li hember wan rabûn, şer kirin. Niha here, bi Amalekiyan re şer bike û yek ji wan mirovên sûcdar an heywanên wan qet nehêle. Hemûyan bikuje.›»

Şawûl gazî leşkerên xwe kir û derket, çû ba paytextê Amalekiyan. Wî ji gelê Keniyan re got: «Ji nav Amalekiyan derkevin, nebe ku hûn bi wan re bên kuştin. Çimkî çaxê gelê me ji Misrê derket, we qencî li wan kir.» Hingê Kenî ji herêma Amalekiyan derketin.

Piştre Şawûl êrîşî Amalekiyan kir û li wan xist. Wan, hemû gelê Amalekiyan dan ber devê şûr û ew bi tevahî qir kirin. Lê belê Şawûl û leşkerên wî padîşahê Amalekiyan Agag girtin û ew nekuştin û ji pez û dewaran jî yên qenc û qelew nekuştin; bi tenê tiştên lawaz û bêqîmet qir kirin.

Li ser vê yekê peyva Xudan ji Samûêl re hat û Xwedê jê re got: «Ez poşman im ku min Şawûl kir padîşah. Ew êdî ji min dûr ket û wî li gor emrên min nekir.»

Çaxê ku Samûêl ev bihîst, ew gelek aciz bû û tevahiya şevê li ber Xudan dua dikir.

Dotira rojê ew sibê zû rabû, çû ku Şawûl bibîne û hat bajarokê Gîlgalê.

Şawûl jê re got: «Xwedê te pîroz bike. Min emrê Xwedê pêk anî.»

Lê Samûêl got: «Madem ku wusa ye, ev çi qarîna miyan û qorîna dewaran e, tê guhên min?»

Şawûl got: «Xelkên min ew anîn. Wan pez û dewarên herî qenc parastin, da ku wan ji Xwedayê te Xudan re bikin gorî. Her tiştê din me qir kir.»

Samûêl jê re got: «Bisekine û guhê xwe bide wan gotinên ku Xudan şeva din ji min re gotin.»

Wî jî got: «Bêje.»

Samûêl got: «Ma tu nebûyî serokê eşîrên Îsraêl î? Rast e, te xwe hêja nedît, lê Xudan tu mesh kirî û tu li ser Îsraêl kirî padîşah.

Xudan tu şandî û ji te re got: ‹Here, wan mirovên xerab, Amalekiyan qir bike.› Çima te li gor emrê Xwedê nekir? Çima te destê xwe dirêjî malê talanbûyî kir? Te di çavê Xwedê de tiştê xerab kir.»

Şawûl jê re got: «Min li gor emrê Xwedê kir. Ez derketim û min bi Amalekiyan re şer kir û ew qir kirin. Min padîşahê wan girt û anî vir. Xelkê min ji talanî pez û dewarên herî qenc anîn vir, da ku wan ji Xudanê te re bikin gorî.»

Lê belê Samûêl jê re got: «Tu çawa difikirî:

Ma Xudan wek ku ji guhdarîkirina peyva xwe hez dike, ji gorî û pêşkêşan hez dike?

Va ye, îtaetkirin ji qurbanê û guhdarîkirin ji bezê beranan çêtir e.

Çimkî serîhildan wek sêrbaziyê ye û serhişkî wek pûtperestiyê ye.

Ji ber ku te emrê Xwedê red kir, wî jî tu red kirî ku êdî tu nikarî padîşah bimînî.»

Li ser vê yekê Şawûl ji Samûêl re got: «Min guneh kir. Min guhê xwe neda emrê Xudan û peyvên te. Ez ji xelkê tirsiyam û min guhê xwe da dengê wan. Ez rica dikim, li gunehê min bibihûre û bi min re vegere ku ez biperizim Xudan.»

Lê belê Samûêl got: «Ez bi te re venagerim, çimkî te emrê Xwedê red kir û wî tu red kir ku êdî tu nikarî padîşah bimînî.»

Û çaxê Samûêl zivirî ku here, Şawûl bi kirasê wî girt û kiras çiriya. Hingê Samûêl jê re got: «Îro Xudan padîşahiya gelê Îsraêl ji ser te çirand û ew daye yekî ku ji te qenctir e. Xwedê derewan nake, ne jî poşman dibe. Ew ne mirov e ku poşman bibe.»

Şawûl got: «Min guneh kir; lê ez hêvî dikim, li ber rihspiyên gel û li ber Îsraêl hurmetê ji min re bike; bi min re vegere, da ku ez biperizim Xudan.»

Û Samûêl bi wî re vegeriya û Şawûl perizî Xudan.

Di wê rojê de Samûêl li ber Xudan padîşahê Amalekiyan Agag kuşt. Hingê ew vegeriya Ramayê mala xwe û Şawûl çû Gîbeyayê mala xwe.

Ji wê rojê û heta ku mir, Samûêl careke din neçû ba Şawûl û wî careke din ew nedît.

# SERHATIYA DAWID PADÎŞAH

## Hilbijartina Dawid

(Samûêl I, 16)

Xudan ji Samûêl re got: «Ma heta kengê tê ji bo Şawûl xemgîn bibî? Min ew red kiriye ku êdî li ser Îsraêl padîşahiyê neke. Strûhê rûn ê xwe tije bike û here ba Yêşayê Beytlehmî; min di nav kurên wî de ji xwe re padîşahek bijart.»

Samûêl got: «Çawa ez biçim? Şawûl bibihîze, wê min bikuje.» Xudan jê re got: «Nogirekê bi xwe re bibe û ji min re bike gorî. Yêşa jî gazî goriyê bike û hingê ezê ji te re bêjim ku divê tu kê mesh bikî.»

Çaxê Samûêl hat Beytlehmê, rihspiyên bajêr bi lerizîn ew pêşwazî kirin û gotin: «Ma xêr e?» Wî got: «Xêr e! Ez hatim ku goriyê pêşkêşî Xudan bikim.» Û wî Yêşa û kurên wî jî gazî goriyê kirin.

Çaxê hatin, Samûêl li Êliyab nêrî û ji xwe re got: «Bi rastî meshkiriyê Xudan ev e.»

Lê Xudan ji Samûêl re got: «Li dîtina wî û li bejin û bala wî nenêre, çimkî min ew red kir. Xudan ne wek dîtina mirovan dibîne; çimkî mirov li rû dinêrin, lê Xudan li dil dinêre.»

Hingê Yêşa gazî Abînadab kir û ew di ber Samûêl re derbas kir. Lê Samûêl got: «Xudan ev jî hilnebijart.»

Yêşa weha heft ji kurên xwe di ber Samûêl re derbas kirin, lê Samûêl ji Yêşa re got: «Xudan evên ha hilnebijartin. Ma kurên te hemû ev in?»

Yêşa got: «Hê yê biçûk heye, ew li ber miyan e.»

Samûêl got: «Rêke pey wî, wî bîne; heta ew neyê vir, em rûnanin ser sifrê.»

Çaxê Dawid hat, Xudan ji Samûêl re got: «Rabe, wî mesh bike; çimkî ev ew e.» Samûêl jî ew di nav birayên wî de mesh kir.

Êdî ji wê rojê ve Ruhê Xudan bi hêz hat ser Dawid, lê ew ji Şawûl veqetiya û ji aliyê Xudan ve ruhekî xerab Şawûl reht dikir. Loma xulamên wî jê re gotin: «Ruhekî xerab te reht dike. Em li mirovekî ku qenc li çengê, yanî li muzîkê dixe, bigerin; çaxê ku ruhê xerab bê ser te, ewê li çengê bixe û tê qenc bibî.»

Şawûl razî bû û yekî ji xortan got: «Min kurekî Yêşayê Beytlehmî dît ku ew qenc li çengê dixe. Ew mêrxasekî bi zirav e, mêrê cengê ye, yekî aqilmend û mirovekî taze ye. Û Xudan bi wî re ye.»

Li ser vê yekê Şawûl şand ba Yêşa û got: «Kurê xwe Dawid ji min re bişîne.»

Bi vî awayî Dawid hat ba Şawûl û bû xizmetkarê wî. Şawûl jî gelek ji Dawid hez kir û ew bû çekhilgirê wî. Loma Şawûl ji Yêşa re xeber şand û got: «Bihêle ku Dawid di xizmeta min de bimîne, çimkî dilê min bi wî xweş e.» Û weha çêbû; dîsa jî Dawid gelek caran vedigeriya mala xwe, da ku li Beytlehmê miyên bavê xwe biçêrîne. Lê çaxê ji aliyê Xwedê ve ruhê xerab dihat ser Şawûl, Dawid radihişt çengê û lê dixist. Hingê Şawûl rihet û qenc dibû û ruhê xerab ji wî vediqeta.

## Zebûr 23 (ji aliyê Dawid ve hat nivîsîn)

1 Xudan şivanê min e,
Tiştek ji min kêm nabe.
2 Ew min li nav mêrga nû dide mexel
Û li ber ava rihet rêve dibe.
3 Ew dilê min nû dike
Û ji bo navê xwe, di riya rast de rêberiya min dike.

4 Erê, ez di geliyê siya mirinê de bigerim jî,
Ez ji xerabiyê natirsim,
Çimkî tu bi min re yî.
Gopal û şivdarê te dilgeşiyê didin min.
5 Li pêş dijminên min, tu sifrê datînî ber min.
Tu dohn li serê min didî.
Fincana min tije ye, ser re diavêje.
6 Erê, di hemû rojên jiyana min de
Qencî û kerem wê bi min re bin
Û di hemû rojan de ezê di mala Xudan de rûnim.

# Dawid û Golyat

(Samûêl I, 17)

Carekê Filistîniyan ordiya xwe civand û Şawûl jî zilamên xwe li hev civandin û ordîgeh danîn. Sê kurên Yêşa yên mezin bi Şawûl re çûbûn cengê û rojekê Yêşa ji Dawid re got: «Çapek genimê qelatok û deh nanên simon ji birayên xwe re bibe û here, li hal û rewşa wan bipirse!»

Çaxê ew hat ordîgehê, ordî hildikişiya meydana şer û Îsraêlî û Filistînî ber bi hev ve pehn bûn. Dawid tiştên xwe dan destê berevanekî û bezî hat ba rêzê û li hal û rewşa birayên xwe pirsî. Û çaxê ew bi wan re dipeyivî, va ye, wek her gav pêlewanê Filistînî Golyat ji rêzên Filistîniyan derket.

Bejna wî sê metre bû; li ser serê wî kumzirxê tûnc hebû û zirxê polkirî li xwe kiribû. Li ser ranên wî zirxên tûnc hebûn û ser navmilên wî sîxekî tûnc hebû. Destiyê rima wî wek singê tema tevnkeran bû û serê rima wî yê hesin heft kîlo bû.

Wî qîrek da rêzên Îsraêl û ji wan re got: «Çima hûn derketin ku hûn ji bo cengê bibin rêz? Ma ez ne Filistînî me û hûn jî ne xulamên Şawûl in? De ji bo xwe zilamekî hilbijêrin, bila ew bê ba min. Eger ew bikare min û min bikuje, hingê emê bibin xulamên we. Lê eger ez wî bikujim, hingê hûnê xulamtiyê ji me re bikin. Zilamekî bişînin ku em li hember hev şer bikin!»

Û hemû Îsraêlî gelek tirsiyan. Wan got: «We ev zilam dît? De vêca kî wî bikuje, padîşah wê wî pirr dewlemend bike û wê keça xwe bide wî û wê mala bavê wî ji bacdayînê serbest bike.»

Hingê Dawid ji hinan pirsî û got: «Yê ku vî pêlewanî bikuje û şermê ji ser Îsraêl rake, çi wê jê re bê kirin? Ev Filistîniyê bêsinet kî ye ku meydanê ji ordiya Xwedayê zindî re bixwîne?»
Û wan soza padîşah jê re got.

Çaxê birayê wî yê mezin bihîst ku Dawid bi zilaman re dipeyive, hêrsa wî rabû û wî got: «Çima tu hatî? Te mî li çolê li ba kê hiştin? Ez quretî û xerabiya te dizanim, bê guman tu hatiyî da ku tu şer bibînî.»
Lê Dawid got: «Ma ez nikarim bipirsim?» Û ji ba wî vegeriya, eynî pirs ji yekî din re got. Û xelkê wek berê bersîv da wî.

Peyvên Dawid hatin bihîstin, gihîştin ba Şawûl û wî rêkir pey wî û ew anî. Dawid jê re got: «Ji ber wî zilamî bila tu kes netirse; xulamê te wê here û bi viyê Filistînî re şer bike.»
Lê Şawûl got: «Tu nikarî li hember vî şer bikî; tu zarokek î, lê ew ji xortaniya xwe ve zilamê şer e.»
Lê Dawid ji Şawûl re got: «Xulamê te miyên bavê xwe diçêrandin. Çaxê şêr an jî hirç dihat û berxek ji kerî dibir, min lê dixist û berx ji devê wî rizgar dikir. Xulamê te hem şêr û hem hirç kuştiye û ev Filistîniyê bêsinet jî wê bibe wek yekî ji wan. Ew Xudanê ku ez ji nav lepên şêr û hirçê xilas kirime, wê min ji destê vî Filistîniyî jî xilas bike.»
Hingê Şawûl got: «Here û bila Xudan bi te re be.»
Şawûl cil û çekên xwe li Dawid kirin û Dawid xebitî ku rêve here, lê jê re giran bû. Loma wî ew cil û çek ji xwe xistin, rahişt şivdarê xwe û ji gelî pênc kevirên biçûk ji xwe re bijartin û ew xistin berîka xwêdanka xwe. Berkaniyê wî di destê wî de bû û weha ber bi yê Filistînî ve çû.

Yê Filistînî jî ber bi Dawid ve dihat û xulamê ku mertalê wî hildigirt, li pêşiya wî bû. Çaxê yê Filistînî dît ku Dawid xort e, ew kêm dît û jê re got: «Ma ez kûçik im ku tu bi dar ser min de têyî?»
Û yê Filistînî bi navê pûtên xwe nifir li Dawid kir û got: «Were ba min, da ku ez goştê te bidim teyrên ezmanan û heywanên çolê.»
Lê Dawid got: «Tu bi şûr, bi rimê û bi sîxan ser min de têyî; lê belê ez bi navê Xudan Xwedayê ku tu meydanê jê re dixwînî, ser te de têm. Îro Xudan wê te bide destê min û ezê serê te jêkim. Ezê îro kelaşên ordiya Filistîniyan bidim teyrên ezmanan û heywanên çolê û her kes wê bizane ku di nav Îsraêl de Xwedê heye. Û hemû mirovên civiyayî wê bizanin ku Xudan bi şûr û bi rimê xilas nake; çimkî ceng ya Xudan e û ewê we bide destê me.»

Çaxê yê Filistînî ber bi wî ve hat, Dawid bi lez derket pêşberî wî. Û Dawid kevirek derxist, bi berkanî daweşand û li eniya yê Filistînî xist. Kevir çû di eniya wî de û pêlewan deverû ket erdê.
Dawid bezî çû, li ser yê Filistînî sekinî, şûrê wî ji kalan kişand û bi şûrê wî, serê wî jêkir.

* * *

Gava Dawid li pêlewanê Filistînî xist û ew kuşt, Filistînî hemû reviyan, vegeriyan cihê xwe.
Çaxê ordiya gelê Îsraêl ji şer vegeriya, jin ji hemû bajarên Îsraêl bi erbaneyan, bi şahî û bi tembûran, bi lavijeyan û bi reqsê derketin, ku Şawûl pêşwazî bikin. Û çaxê jin direqisîn, wan distrand û digotin:
«Şawûl kuşt hezarên wan,
Dawid jî deh hezarên wan.»
Şawûl gelek hêrs ket û ev peyv di çavê wî de xerab bû û got: «Deh hezar dan Dawid, bi tenê hezar dan min. Êdî bi tenê padîşahî jê kêm maye.» Û ji wê rojê ve Şawûl bi çavê xerab li Dawid nêrî.

# Dawid ji ber Şawûl direve

(Samûêl I, 18 + 24)

Dotira rojê ji aliyê Xwedê ve ruhekî xerab bi hêz hat ser Şawûl û di nava malê de harîtî dikir. Dawid jî wek ku her roj dikir, bi destê xwe li çengê dixist. Di destê Şawûl de rim hebû û wî ji xwe re got: «Ezê Dawid bi dîwêr ve bizeliqînim» û rim avêtê. Lê belê Dawid ji ber wî du caran xwe da aliyekî.

Û Şawûl ji Dawid tirsiya, çimkî Xudan bi Dawid re bû û ji Şawûl veqetiyabû. Loma Şawûl êdî nexwest ku Dawid nêzîkî wî be û ew kir serdar. Û Dawid bi leşkeran ve derdiket û ew di her tiştê ku wî dikir de, şehreza û serfiraz bû, çimkî Xudan bi wî re bû. Şawûl ev dît û hê bêtir jê ditirsiya. Lê hemû gel ji Dawid hez dikir.

Piştî demekê Şawûl ji kurê xwe Yonatan û ji hemû xulamên xwe re got, ku ew Dawid bikujin. Lê kurê Şawûl Yonatan ji Dawid pirr hez dikir. Loma Yonatan ev bi Dawid da zanîn û jê re got: «Bavê min li kuştina te digere, hay ji xwe hebe!»

Û wî bi qencî li ser Dawid ji bavê xwe re digot. Got: «Bila padîşah li hember xulamê xwe Dawid sûc neke. Wî li hember te sûc nekiriye û kirinên wî ji bo te gelek qenc in. Wî kuştina xwe da ber çavên xwe û yê Filistînî kuşt û Xudan ji bo hemû Îsraêl xilasiyeke mezin çêkir. Te dît û tu şa bûyî; çima tu dixwazî bê sedem Dawid bikujî?»

Şawûl guh da gotina Yonatan û sond xwar got: «Bi navê Xudanê zindî, ew nayê kuştin.»

Hingê Yonatan gazî Dawid kir û ev peyvên ha hemû jê re gotin. Û Yonatan Dawid anî ba Şawûl û ew wek berê li ber padîşah bû.

Lê piştî demekê, Şawûl dîsa dixwest ku Dawid bikuje, rima xwe avêtê û Dawid ji ba Şawûl reviya û venegeriya.

Ji bo gelek salan Dawid ji ba Şawûl direvî, ji cihekî diçû cihê din û di çolê de dima. Hin bi hin zilamên din li ba wî civiyan û bûn dostên wî.

Carekê Dawid xwe li çola En-Gedî veşart. Ev ji Şawûl re hat gotin û ew bi 3000 leşkeran ve hat ku li Dawid û li zilamên wî bigere. Şawûl bi serê xwe ket şkeftekê ku here destavê.

Dawid û çend zilamên wî, eynî di vê şkeftê de, di aliyê hundir de bûn û Şawûl dîtin. Wan ji Dawid re got: «Bi rastî, îro Xwedê dijminê te daye destê te.»

Dawid jî rabû, ji paş ve nêzîkî Şawûl bû û bi dizî parçeyek ji dawa ebayê Şawûl birî. Û ji ber ku wî parçeyek birî, dilê wî ew sûcdar kir û ji zilamên xwe re got: «Xwedê neke ku ez tiştekî li hember meshkiriyê Xudan bikim, an destê xwe dirêjî wî bikim, çimkî ew meshkiriyê Xudan e.»

Bi van peyvan, Dawid pêşiya zilamên xwe girt û nehişt ku ew li hember Şawûl rabin. Û Şawûl ji şkeftê rabû û bi riya xwe ve çû.

Piştre Dawid jî rabû, ji şkeftê derket û bi dengekî bilind gazî Şawûl kir, got: «Mîrzayê min padîşah!» Şawûl li pey xwe nêrî û Dawid dît. Dawid xwe tewand û deverû çû erdê.

Wî ji Şawûl re got: «Çima tu guhê xwe didî peyvên wan mirovên ku dibêjin: ‹Va ye, Dawid li zirara te digere.›?

Îro te bi çavê xwe dît, Xudan di şkeftê de çawa tu dayî destê min. Ji min re gotin ku ez te bikujim, lê min got: ‹Ez li hember mîrzayê xwe destê xwe ranakim, çimkî ew meshkiriyê Xudan e.›

Binêre, ey bavo, erê, li dawa ebayê xwe yê ku di destê min de ye binêre. Ji vê yeka ku min tu nekuştî, bizane û bibîne ku di destê min de xerabî û serhildan tune. Tu li canê min digerî ku tu min bikujî, lê dîsa jî min li hember te xerabî nekir.

Bila di navbera min û te de Xudan dîwanê bike û bila Xudan heyfa min ji te bistîne; lê belê destê min li hember te ranabe. Wek gotina pêşiyan dibêje: ‹Ji xeraban xerabî derdikeve›, lê destê min li hember te ranabe.
Bila Xudan li doza min binêre û min ji destê te xilas bike.»

Çaxê Dawid ev peyvên ha ji Şawûl re gotin, Şawûl got: «Dawid kurê min, ma ev dengê te ye?» Û Şawûl bi dengekî bilind giriya.
Wî ji Dawid re got: «Tu ji min rastdartir î, çimkî min bi xerabî li te vegerand, lê te bi qencî li min vegerand û te ez nekuştim. Çimkî eger mirov, dijminê xwe bibîne, ma wê wî bi qencî bi riya wî ve bişîne? Ji bo vî tiştê ku te îro ji min re kir, bila Xudan bi qencî li te vegerîne. Û va ye, niha ez dizanim ku eseh tê bibî padîşahê Îsraêl û padîşahiya Îsraêl wê bi destê te bisekine. Loma ji min re bi navê Xudan sond bixwe ku tu dûndana min nabirî û tu ji mala bavê min navê min ranakî.»
Li ser vê yekê Dawid ji Şawûl re sond xwar.
Hingê Şawûl çû mala xwe û Dawid û zilamên xwe hilkişiyan asêgehê.

# Şawûl diçe ba jineke sêrbaz – Mirina Şawûl
(Samûêl I, 28 + 31; Samûêl II, 1)

Piştî demekê Filistînî li hember Şawûl û gelê Îsraêl civiyan ku şer bikin. Şawûl ji Xudan pirsî, lê belê Xwedê qet bersîv neda wî, ne bi xewnan û ne jî bi pêxemberan.

Ji dêla ku Şawûl tobe bikira, ew çû ba jineke sêrbaz, da ku li falê binêre. Gelê Îsraêl qenc dizanibû ku Xwedê emir dabû wan ku neçin ba sêrbazan û li falê nenêrin - û Şawûl jî dizanibû.
Dîsa ew bi şev çû mala jina sêrbaz û wê wusa kir ku Samûêl pê re bipeyive û wî weha jê re got:
«Xudan padîşahtî ji destê te stand û ew da Dawid. Ji ber ku te guh neda peyva Xudan, wî ev yek li te kir. Xwedê wê gelê Îsraêl bide destê Filistîniyan û sibe tu û kurên xwe, hûnê bimirin.»
Li ser vê yekê Şawûl di cih de ket erdê û pirr tirsiya.

Filistîniyan li hember Îsraêl şer kirin û Îsraêliyan ji ber Filistîniyan bazdan û yên ku hatin kuştin li çiyayê Gîlboayê ketin. Û Filistînî ketin pey Şawûl û kurên wî û wan kurên Şawûl Yonatan, Abînadab û Melkîşûya kuştin. Şer li hember Şawûl germ bû û tîravêjan ew dît û ew birîndar kirin. Hingê Şawûl ji çekhilgirê xwe re got: «Şûrê xwe bikişîne û wî li min bixe, an nexwe ev mirovên bêsinet wê bên û ewê li min bixin û wê bi min bileyizin.»
Lê belê çekhilgir nexwest, çimkî ew gelek tirsiya. Loma Şawûl rahişt şûrê xwe û xwe bi ser wî de berda. Û çaxê çekhilgirê Şawûl dît ku ew mir, wî bi xwe jî xwe bi ser şûrê xwe de berda û bi wî re mir. Bi vî awayî Şawûl û sê kurên wî, çekhilgirê wî û gelek zilamên wî di wê rojê de bi hev re mirin.

* * *

Çaxê Dawid bihîst ku Şawûl û Yonatan di şer de hatin kuştin, wî cilên xwe çirandin û hemû zilamên ku li ba wî bûn jî wusa kirin. Wan ji bo Şawûl, ji bo kurê wî Yonatan û ji bo gelê Îsraêl şîn girtin û giriyan û heta êvarê rojî girtin, çimkî ew bi devê şûr ketibûn. Û Dawid li ser Şawûl û kurê wî Yonatan lorand û got:

Şawûl û Yonatan di jiyana xwe de şêrîn û hezkirî bûn,
Di mirina xwe de jî ji hev veneqetan.
Ji eyloyan siviktir û ji şêran hêzdartir bûn.
Ey keçên Îsraêl, li ser Şawûl bigirîn.
Wî qumaşê hêja yê sor li we kir, xemla zêr danî ser cilên we.
Di şer de mêrxas çawa ketin!

Ey birayê min Yonatan, ez li ser te dil bi êş im,
Tu ji bo min gelek şêrîn bûyî.
Hezkirina te ji bo min tiştekî ecêb bû, ji hezkirina jinê zêdetir bû.
Mêrxas çawa ketin û çekên şer çawa wêran bûn!

## Dawid dibe padîşah

(Samûêl II, 2; 5-7)

Piştî mirina Şawûl, Dawid çû bajarê Hevronê û li wê derê li ser eşîra Cihûda bû padîşah; lê belê eşîrên din hê ew qebûl nedikirin û ji bo du salan kurê Şawûl Îşboşet bû padîşahê wan.
Piştî ku Îşboşet hat kuştin, çaxê ku Dawid heft sal û şeş mehan li Hevronê rûnişt, hemû rihspiyên gelê Îsraêl li ba wî civiyan û Dawid li Hevronê bi wan re peyman girêda, bû padîşahê hemû gelê Îsraêl.

Piştî demekê Dawid bi leşkerên xwe ve derket çû bajarê Orşelîmê (yanî Qudsê) û ew vegirt, ji destê Yebûsiyan stand û wî li Orşelîmê qesra xwe da avakirin û ev bajar ji xwe re kir paytextê gelê Îsraêl.
Wî çaxî ew bi zilamên xwe ve derket û Sindoqa Peymanê anî Orşelîmê. Dawid pirr dixwest ku ji Xudan re perestgeheke mezin û spehî bide avakirin jî, lê belê Xudan ji Natan pêxember re got:

«Ma Dawid wê ji min re xaniyekî ava bike ku ez tê de rûnim? Va ye, ji roja ku min gelê Îsraêl ji Misrê deranî û heta îro jî, ez di xaniyekî de rûneniştime; ez her gav di kon de di nav we de bûm. Ma min ji we re got: ‹Çima hûn ji min re xaniyekî ji darên erz çênakin?›
Loma weha ji xulamê min Dawid re bêje: ‹Min ji kovîçêrê, ji pey miyan rahişt te, ku tu li ser gelê min ê Îsraêl bibî padîşah. Li her cihê ku tu diçûyiyê, ez bi te re bûm û min hemû dijminên te ji ber te ji qurm ve rakirin; ezê navê te bikim wek navê wan mezinên ku li ser erdê ne. Û ezê ji bo gelê xwe cihekî amade bikim û ezê wan bi cih bikim û ewê li cihê xwe rûnin û êdî venaleqin. Û wek berê, wek ji rojên ku min li ser gelê xwe hukumdar danîn ve, kurên xerabiyê êdî cefayê nadin wan. Ezê serê hemû dijminên te li ber te bitewînim û ezê nîşanî te bidim ku Xudan wê ji bo te malekê çêke.
Çaxê rojên te temam bibin û tu herî ku tu bikevî nav bav û kalên xwe, ezê dûndana te, yek ji kurên te rakim û ezê padîşahiya wî qayîm bikim. Ewê ji min re xaniyekî çêke û ezê textê wî her û her qayîm bikim. Ezê ji wî re bibim bav û ewê ji min re bibe kur. Ezê wî di mala xwe de û di padîşahiya xwe de her û her bisekinînim û textê wî wê her û her bimîne. Mala te û padîşahiya te wê her û her li ber min bisekinin û textê te wê her û her bimîne.›»

Natan hemû peyvên Xwedê ji Dawid re gotin û padîşah ket Konê Sindoqa Peymanê, dua kir û got:

«Ya Xudan Xwedê, ez kî me û mala min çi ye ku te ez heta bi vir anîm?
Ya Xudanê min, ma ev di çavê te de tiştek biçûk xuya bû ku te li ser mala xulamê xwe ji bo paşerojê jî got?
Ez hê dikarim çi ji te re bêjim? Çimkî tu bi xulamê xwe dizanî, ya Xudan.
Di ber peyva xwe de û li gor dilê xwe, te tiştekî evqas mezin kir, ku tu vê bi xulamê xwe bidî zanîn.
Ji bo vê yekê, tu mezin î, ya Xudan. Çimkî li gor her tiştê ku me bi guhên xwe bihîstiye, tu kes wek te tune û ji te pê ve Xwedê tune.
Di dinyayê de wek gelê te kîjan milet heye, ku Xwedê bê, wî rizgar bike û ji xwe re bike gel û nav û dengê xwe derîne? Te ew ji xwe re ji Misrê, ji miletan û ji xwedayên wan xilas kir. Te ji bo wan û ji bo welatê xwe, li ber çavên wan, karên mezin û tirsehêz kirin. Te gelê xwe danî ser bingehekî qayîm ku ji bo her û her bibe gelê te. Ya Xudan, tu bûyî Xwedayê wan.

Ya Xudan Xwedê, wek ku te ji bo xulamê xwe û ji bo mala wî gotiye, bike, da ku navê te her û her bilind bibe. Û bila mala xulamê te Dawid li ber te nelebte be. Çimkî tu, Xudanê ordiyan, te guhê xulamê xwe vekir û got: ‹Ezê ji bo te malekê çêkim›.
Loma vî xulamê te cesaret dît, ku vê duayê bike.
Û niha ya Xudan, tu Xwedê yî û peyvên te rast in û te ev tiştê qenc ji xulamê xwe re soz da. Bila niha li te xweş bê ku tu mala xulamê xwe pîroz bikî, da ku her û her li ber te be.»

## Dawid û kurê Yonatan Mefîboşet

(Samûêl II, 9)

Dawid ji dostê xwe Yonatan re soz dabû ku ewê her gav mal û dûndana wî biparêze.

Loma çaxê Dawid padîşah li Orşelîmê rûdinişt, wî got: «Gelo ji mala Şawûl hê kesekî ku sax e heye? Ji bo xatirê Yonatan, ezê qenciyê li wî bikim.»
Wan gazî xulamekî mala Şawûl kir, navê wî Sîba bû û wî ji padîşah re got: «Hê kurekî Yonatan dimîne, lingên wî seqet in.» Dawid jê re got: «Ew li ku derê ye?» Wî got: «Ew li mala Maxîrê kurê Amiyêl e.»

Li ser vê yekê Dawid padîşah rêkir pey wî, ew anî. Û kurê Yonatanê kurê Şawûl Mefîboşet hat ba Dawid û çû ser çokan, deverû xwe avêt erdê.
Dawid jê re got: «Mefîboşet!»
Û wî got: «Va me ez, ez xulamê te me!»
Hingê Dawid ji wî re got: «Netirse, çimkî ji bo xatirê bavê te Yonatan eseh ezê qenciyê li te bikim û ezê hemû erdê bavê te Şawûl bi şûn de bidim te. Û tê her dem ji sifra min bixwî.»
Mefîboşet xwe tewand û got: «Ezxulam, ez kî me ku tu rûyê xwe ber bi min ve, ber bi kûçikekî mirî ve bizivirînî?»

Hingê padîşah gazî xizmetkarê Şawûl Sîba kir û jê re got: «Her tiştê ku berê yê Şawûl û yê mala wî bû, min da kurê mîrzayê te. Loma tu û kurên xwe û xulamên xwe, hûnê ji bo wî erdê hilkin û tê berê wê bînî ku xwarina kurê mîrzayê te hebe. Lê belê kurê mîrzayê te Mefîboşet, wê her dem ji sifra min bixwe.»
Sîba ji padîşah re got: «Xulamê te wê her tiştê ku mîrzayê min padîşah li xulamê xwe emir kiriye, bike.»
Hingê padîşah got: «Heçî Mefîboşet e, wek yek ji kurên padîşah wê li ser sifra min bixwe.» Û Mefîboşet di Orşelîmê de rûnişt, çimkî herdem li ser sifra padîşah dixwar.

## Dawid û Batşêba

(Samûêl II, 11-12)

Di biharê de, di demsala ku padîşah derdikevin cengê de, Dawid serdarê xwe Yoab û hemû ordiya Îsraêl şandin, wan Amonî helak kirin û hawirdora paytextê Amoniyan Raba girtin. Lê Dawid di Orşelîmê de ma.
Êvarekê Dawid rabû û li ser banê qesrê ser xwe digeriya. Ji ser bên jineke ku xwe dişuşt dît û jinik bi dîtina xwe gelek spehî bû. Dawid hin şandin û li ser jinikê pirsyar kirin. Û gotin: «Ma ev jinik ne Batşêba jina Ûriyayê Hîtît ye?»
Dawid qasid şandin pey wê ew anî. Jinik hat ba Dawid, Dawid bi wê re raza û jinik vegeriya mala xwe. Û jinik bi zaro bû û ji Dawid re xeber şand û jê re got: «Ez bi zaro me.»

Li ser vê yekê Dawid xeber ji Yoab re şand, got: «Ûriyayê Hîtît bişîne ba min.» Dema Ûriya hat ba Dawid, Dawid jê pirsî got: «Yoab çawa ye, gel çawa ye û ceng di çi rewşê de ye?» Hingê Dawid ji Ûriya got: «Dakeve mala xwe ba jina xwe.» Loma Ûriya ji mala padîşah derket û padîşah diyarî li pey wî şand.

Lê belê Ûriya di deriyê qesra padîşah de, bi hemû xulamên padîşah re raza û daneket mala xwe. Çaxê ji Dawid re gotin ku Ûriya daneket mala xwe, wî ji Ûriya re got: «Ma tu ne ji rê hatiyî? Çima tu daneketî mala xwe?» Ûriya jê re got: «Sindoqa Peymanê û leşkerên Îsraêl di bin kolikan de rûdinin; mîrzayê min Yoab û xulamên padîşahê min cihê xwe danîne çol û beyran. Ma ez çawa dakevim mala xwe, da ku ez bixwim, vexwim û bi jina xwe re razim? Hema bi jiyana te, ez vê yekê nakim.»

Dawid ji Ûriya re got: «Baş e, îro jî li vê derê bimîne, sibê ez te bişînim.» Dawid ew vexwend û Ûriya li ber wî xwar û vexwar û Dawid ew serxweş kir. Û êvarê ew derket, da ku di nav nivînên xwe de di nav xulamên padîşahê xwe de raze, lê belê ew daneket mala xwe.

Sibehî Dawid ji Yoab re nameyek nivîsî û bi destê Ûriya şand. Di namê de got: «Di şerê germ de Ûriya bixin rêza pêşî û xwe ji ba wî bidin aliyekê ku ew bê kuştin.» Loma çaxê Yoab dor li bajêr girtibû, Ûriya li hember wî cihê ku dizanî mêrxas lê ne, danî. Û zilamên bajêr derketin û bi Yoab re şer kirin; û ji xulamên Dawid hinek ketin û Ûriyayê Hîtît jî hat kuştin. Hingê Yoab xeber ji Dawid re şand û li ser şer hemû tişt jê re got. Yoab emir li qasid kir, got: «Çaxê ku tu li ser şer hemû tiştî ji padîşah re bêjî, gotina xwe xilas bikî, belkî padîşah wê hêrs bikeve û ji te re bêje: ‹Çima hûn di cengê de ewqas nêzîkî sûra bajêr bûn? Ma we nedizanî ku ewê di ser dîwêr re bavêjin?› Hingê bêje: ‹Xulamê te Ûriya jî mir.›»

Qasid hat û hemû tişt ji Dawid re gotin. Got: «Tîravêjan ji dîwêr avêtin ser xulamên te û hin ji xulamên padîşah mirin û xulamê te Ûriyayê Hîtît jî mir.»

Hingê Dawid jê re got: «Ji Yoab re bêje bila ew ji bo vê yekê neqehire; şûr carna vî, carna jî wî dixwe.› Jê re bêje: ‹Tu li hember bajêr şer bişidîne û wî hilweşîne!›»

Çaxê jina Ûriya bihîst ku mêrê wê mir, wê şîna wî girt. Û dema şîna wê derbas bû, Dawid rê kir pey wê û ew anî mala xwe û ew bû jina wî û jê re kurek anî. Lê belê tiştê ku Dawid kiribû di çavê Xudan de xerab bû.

Ji ber vê yekê Xudan Natan pêxember şand ba Dawid û wî jê re got:

«Di bajarekî de du zilam hebûn, yek dewlemend û yê din belengaz bû. Pez û dewarên zilamê dewlemend zehf gelek hebûn. Lê yê belengaz ji berxikeke ku kirrîbû û xweyî kiribû pê ve tiştekî wî nebû. Û berxik li ba wî û bi zarokên wî re mezin bûbû û ji pariyê wî dixwar, ji piyana wî vedixwar û di berê wî de radiza û wek keça wî bû.

Rêwiyek hat ba zilamê dewlemend û wî dil neda ku ji miyên xwe, an ji dewarên xwe hilde û ji mêvan re amade bike. Lê wî berxika zilamê belengaz stand û ew ji bo mêvanê xwe amade kir.»

Hêrsa Dawid li hember wî zilamî gelek rabû û ji Natan re got:

«Hema bi navê Xudanê zindî, ew zilamê ku ev yek kiriye, yê kuştinê ye. Ji ber ku wî ev yek kiriye û dilê wî lê neşewitiye, divê ew berxikê çar qet bi şûn de bide.»

Natan ji Dawid re got: «Ew zilam tu yî.

Xudan Xwedayê Îsraêl, weha dibêje: ‹Min tu bi padîşahtî li ser Îsraêl mesh kirî. Min tu ji destê Şawûl xilas kirî û min mala mîrzayê te da te. Û eger ev hindik bûna, minê hê çiqas din bida te. Çima te, ya ku di çavê Xudan de xerab e kir û peyva wî kêm dît?

Bi şûrê leşkerên Amoniyan te Ûriyayê Hîtît da kuştin û te jina wî ji xwe re anî. Ji bo vê yekê şûr tu caran ji mala te dernakeve, çimkî te ez kêm dîtim û te jina Ûriyayê Hîtît ji xwe re anî.›

Xudan weha dibêje: ‹Va ye, ezê ji mala te bi xwe, ji te re xerabiyê derxim. Û ezê li ber çavên te rahêjim jinên te û bidim cîranê te û li ber çavê vê rojê, ewê bi jinên te re raze. Çimkî te bi dizî kir, lê belê ezê vî tiştî li ber çavên hemû Îsraêl û li pêşberî tavê bikim.›»

Hingê Dawid ji Natan re got: «Min li hember Xudan guneh kir.»

Natan ji Dawid re got: «Xudan gunehê te paqij kir, tu namirî. Lê belê ji ber ku te bi vê kirinê fersendeke mezin da dijminên Xudan, da ku çêran bikin, ew kurê ku ji te re çêbûye, eseh wê bimire.»

Û Xudan li wî zarokê ku ji jina Ûriya ji Dawid re çêbûbû xist û zarok gelek nexweş bû. Dawid ji bo zarok li Xwedê digeriya û rojî digirt û bi şev li ser erdê radiza. Rihspiyên mala wî rabûn û li ber wî rawestan, da ku wî ji erdê rakin. Lê belê wî nexwest û bi wan re nan nexwar. Û di roja heftan de zarok mir.

Lê xulamên Dawid tirsiyan ku mirina zarok jê re bêjin, çimkî wan got: «Hê hinga ku zarok sax bû, me jê re got, lê guh neda peyva me; niha çawa emê bêjin zarok mir? Belkî ew tiştekî bi xwe bike.»

Gava Dawid dît ku bi hev re dikin pis-pis, wî fêm kir ku zarok mir; wî ji xulamên xwe re got: «Ma zarok mir?» Û wan got: «Erê, mir.»

Hingê Dawid ji ser erdê rabû, xwe şuşt û rûn li xwe da û cilên xwe guhertin. Ew ket mala Xudan, çû ser çokan û perizî. Hingê ew vegeriya mala xwe xwarin xwest, wan danîn ber wî û wî xwar. Û xulamên wî ji wî re gotin: «Ev tiştê ku te kir çi ye? Hinga ku zarok hê sax bû, te ji bo wî rojî girt û tu giriyayî. Û dema zarok mir, tu rabûyî û te nan xwar.»

Wî got: «Çaxê ku zarok hê sax bû, ez fikirîm: ‹Kî dizane, belkî Xwedê keremê li min bike û zarok bijî.› Lê belê niha ew mir; çima ezê rojiyê bigirim? Ma êdî ez dikarim wî bi şûn de bînim? Ezê biçim ba wî, lê ew venagere ba min.»

Dawid di ber dilê jina xwe Batşêbayê de hat û çû ba wê. Û wê kurek anî û navê wî ‹Silêman› danî. Xudan ji wî hez kir û bi destê Natan pêxember navê wî ‹Yedîdya› – yanî ‹Hezkiriyê Xudan› – danî.

Piştî vê serhatiyê Dawid **Zebûra 51ê** nivîsand û tê de weha got:

1 Ya Xwedê, li gor dilovaniya xwe
Keremê li min bike;
Li gor rehma xwe ya gelek
Zêdegaviyên min xîş bike.
2 Min ji sûcê min yekser bişo
Û min ji gunehê min paqij bike.
3 Çimkî ez zêdegaviyên xwe dizanim
Û gunehê min hergav li ber min e.
4 Li hember te, bi tenê li hember te min guneh kir
Û di çavê te de min tiştê xerab kir.
Wusa ku tu di gotinên xwe de dadperwer bî
Û çaxê tu hukum bikî, tu rast bî.

5 Va ye, gava ez ji dayik bûm, di hevênê min de guneh hebû
Û hê ez di malzaroka diya xwe de, ez bi guneh bûm.
6 Erê, tu di dil de rastiyê dixwazî
Û tu di hundirê min de şehrezayiyê bi min didî zanîn.

7 Min bi gûrizê paqij bike û ezê paqij bibim;
Min bişo û ezê ji berfê jî spîtir bibim.
8 Şahî û dilgeşiyê bi min bide bihîstin,
Ew hestiyên ku te perçiqandine, bila şa bibin.
9 Li hember gunehên min rûyê xwe binixumîne
Û hemû sûcê min xîş bike.

10 Ya Xwedê, di hundirê min de dilê paqij biafirîne
Û di dilê min de ruhê rast nûvejen bike.
11 Min ji ba xwe neavêje
Û Ruhê xwe yê pîroz ji min nestîne.
12 Şahiya xilasiya xwe ji min re vegerîne
Û ruhekî dilxwaz bide min, ku min xweyî bike.
13 Hingê ezê riyên te hînî xerabkaran bikim
Û gunehkar wê li te vegerin.
14 Min ji sûcê xwînrijandinê xilas bike,
Ya Xwedê, Xwedayê xilasiya min,
Û devê min wê pesnê edaleta te bide.
15 Ya Xudan, lêvên min veke
Û devê min wê pesnê te bide bihîstin.

16 Qurban li xweşê te naçin,
An nexwe minê bidana;
Goriyên şewitandinê ne bi dilê te ne.
17 Qurbanên Xwedê, ruhê şkestî ye;

Ya Xwedê, dilekî şkestî û poşman tu kêm nabînî.

Di **Zebûra 32an** de Dawid li ser eşkerekirin û afûbûna gunehan weha dibêje:

1 Xwezî bi wî yê ku li neheqiyên wî hatiye bihûrtin,
Û gunehê wî hatiye nixumandin.
2 Xwezî bi wî mirovê ku Xudan ji wî re xerabiyê hesab nake
Û di dilê wî de hîle tune.

3 Çaxê ku min gunehên xwe eşkere nekirin,
Tevahiya rojê hestiyên min ji nalîna min lewaz bûn.
4 Ji ber ku şev û roj destê te li ser min giran bû;
Terbûniya min bû wek zuwayiya havînê.

5 Min gunehê xwe ji te re got
Û neheqiya xwe veneşart.
Min got: «Ezê zêdegaviya xwe ji Xudan re eşkere bikim»
Û tu li sûcê gunehê min bihûrtî.

6 Ji bo vê yekê heta ku tu hazir î,
Bila her kesê ku ji Xwedê ditirse, li ber te dua bike.
Bi rastî dema pêlên avên mezin bifûrin, nagihîjin wî.
7 Cihê min ku ez xwe tê de hiltînim, tu yî;
Ji tengahiyê tu min diparêzî.
Tu bi stranên xilasiyê hawirdora min radipêçî.

# Abşalom

(Samûêl II, 13-14)

Ji ber gunehê Dawid Xwedê jê re got: «Va ye, ezê ji mala te bi xwe, ji te re xerabiyê derxim. Û weha jî çêbû.

Abşalom û Amnon kurên Dawid bûn, ew ji bav ve bira bûn. Tamar jî keça Dawid bû û xwişka Abşalom bû.

Wusa çêbû ku dilê Amnon ket Tamarê; lê ew pirr bêhêvî bû çimkî Tamar keçik bû û wî tu rê nedît ku tiştekî bi wê bike. Piştî demekê wî bi hîle xwe nexweş kir, Tamar gazî ba xwe kir ku xwarinê bide wî û çaxê ew bi serê xwe bûn, bi zorê bi wê re raza û ew bextreş kir.

Lê di cih de wî gelek ji wê nefret kir, keçik derxist derve. Wê xwelî li ser serê xwe reşand û cilên xwe çirandin, destê xwe danî ser serê xwe û derket û kir qîrîn.

Birayê wê Abşalom rastî wê hat û hal û rewşa wê dît; wî fêm kir ku çi çêbûye. Wî ew anî mala xwe û ji wê rojê ve ew di mala birayê xwe de ma.

Piştî vê yekê Abşalom ne qenc ne xerab, tiştek ji Amnon re negot çimkî wî pirr ji Amnon nefret kir, ji ber ku Amnon rûyê xwişka wî Tamarê reş kiribû.

Piştî du salan, Abşalom fersend dît, bi hîle birayê xwe Amnon da kuştin.

Dawid padîşah û kurên wî û hemû xulamên wî jî zehf gelek giriyan û Dawid her roj ji bo kurê xwe şîn digirt.

Lê belê Abşalom reviya, çû ba bavê diya xwe û sê salan li wê derê ma. Lê dilê Dawid padîşah dixwest ku here ba Abşalom, çimkî li ser Amnon rihetdilî standibû, wî dît ku êdî ew miriye.

Serdarê Dawid Yoab fêm kir ku dilê padîşah li ser Abşalom e û bi destûra Dawid çû, Abşalom anî Orşelîmê. Lê dîsa jî Dawid nehişt ku Abşalom rûyê wî bibîne.

Hingê di nav gelê Îsraêl de zilamekî wek Abşalom spehî tunebû. Ji binê lingê wî û heta bi şilka serê wî qusûr li wî nebû. Û salê carekê, çaxê giran dihat, wî pora xwe dida qusandin.

Piştî ku Abşalom vegeriya, ew du salan li Orşelîmê rûnişt, lê belê rûyê padîşah nedît. Hingê wî zilamek şand ba Yoab, da ku wî bişîne ba bavê xwe Dawid, lê Yoab nexwest ku bê ba wî. Abşalom dîsa şand û Yoab dîsa nehat. Loma Abşalom ji xulamên xwe re got: «Binêrin, zeviya Yoab nêzîkî ya min e. Herin û agir berdin cehê wî.»

Li ser vê yekê Yoab rabû, hat mala Abşalom û jê re got: «Çima xulamên te agir berdan zeviya min?» Wî got: «Binêre, min rêkir pey te û got: Were ku ez te bişînim ba bavê xwe, di cihê min de jê re bêje: ‹Çima ez vegeriyame? Ez heta niha li wê derê bûma, wê ji bo min çêtir bûya.› Niha ez dixwazim padîşah bibînim; eger sûcê min hebe, bila min bikuje.»

Hingê Yoab çû ba padîşah û her tişt jê re got. Û Dawid gazî kurê xwe Abşalom kir û ew hat û li ber padîşah deverû çû erdê û padîşah Abşalom ramûsa.

# Abşalom li hember bavê xwe Dawid radibe

(Samûêl II, 15-18)

Piştî demekê, Abşalom ji xwe re erebe bi hespan ve û pêncî zilam amade kirin ku di pêşiya wî de bibezin.

Û Abşalom sibê zû radibû û di tenişta riya dergeh de disekinî. Wî her zilamê ku ji bo dîwankirinê biçûya ber padîşah, gazî ba xwe dikir û digot: «Binêre, kirinên te qenc û rast in, lê belê ji aliyê

padîşah ve kesekî ku guh bide te tune.» Û digot: «Xwezî ez di welêt de bikirama dadger û her mirovê ku doza wî heyî bihata ba min û min dadperwerî li wî bikira!»
Û çaxê mirovekî xwe li ber wî ditewand, wî destê xwe dirêj dikir, ew digirt û radimûsa.
Bi vî awayî Abşalom dilê zilamên Îsraêl dizî.

Di dawiya çar salan de Abşalom ji padîşah re got: «Ez hêvî dikim ku ez herim bajarê Hevronê. Çimkî xulamê te got: ‹Bi rastî eger Xudan min vegerîne Orşelîmê, ezê li Hevronê biperizim Xudan û min nedir kir.›»

Padîşah jê re got: «Bi silamet here.» Abşalom jî rabû çû Hevronê û casûs şandin ba hemû eşîrên Îsraêl û got: «Dema hûn dengê boriyê bibihîzin, bêjin: ‹Abşalom li Hevronê bû padîşah.›» Û Abşalom şand pey şêwirdarê bavê xwe Dawid Ahîtofel û ew ji bajarê wî anî. Û komela gêrûfenkeran bi hez bû, çimkî ew xelkê ku bi Abşalom re bû, çiqas dihat zêde dibû.

Hingê zilamek hat ba Dawid agahî da û got: «Dilê xelkê Îsraêl li pey Abşalom çû.» Li ser vê yekê Dawid ji hemû xulamên xwe re got: «Rabin, em birevin, an nexwe kesek ji ber Abşalom nareve, xilas nabe. Bilezînin, em herin, an nexwe ewê bajêr bide ber devê şûr.»
Loma padîşah û hemû xelkê mala wî di pey wî de derketin. Lê Dawid ji cêriyan deh jin hiştin ku bimînin ber malê. Û padîşah û di pey wî de gel derket û hemû xulam û parêzgerên wî pê re çûn.

Serekkahîn Sadoq jî bi hemû Lêwiyên ku Sindoqa Peymanê hildigirtin re hat. Wan Sindoqa Xwedê danîn erdê û heta ku hemû xelk derbas bû, Evyatar gorî pêşkêş kirin. Hingê padîşah ji Sadoq re got: «Sindoqa Xwedê vegerîne bajêr, eger ez li ber Xudan keremê bibînim, ewê min bi şûn de vegerîne û ewê cihê wê nîşanî min bide. Lê eger Xwedê bêje: ‹Dilê min ji te ne xweş e, bila ew tiştê ku di çavê wî de qenc e, bi min bike.›»
Û got: «Tu û kurê te Yonatan û Evyatar û kurê wî Ahîmeas, hûn bi aştî vegerin bajêr. Heta ku hûn ji min re xeberê bişînin, ezê li ba bûriyên di çolê de bimînim.»
Hingê wan Sindoqa Xwedê vegerandin Orşelîmê û ew li wê derê man.

Dawid ber bi çiyayê Zeytûnê ve hildikişiya û digiriya. Serê wî nixamtî bû û ew pêxas rêve diçû. Û hemû xelkê ku pê re bû, her kesî serê xwe nixamtibû û ew digiriyan. Û çaxê Dawid bihîst ku Ahîtofel alîkariya Abşalom dike, wî got: «Ya Xudan, ez lavan ji te dikim, tu şîreta Ahîtofel pûç derxe.»

Dema Dawid hat serê çiyê, Hûşayê Arqî cilên wî qetiyayî û ax li serê xwe kirî, hat pêşiya wî. Dawid jê re got: «Eger tu bi min re bêyî, tê ji min re bibî bargiranî. Lê eger tu vegerî bajêr û ji Abşalom re bêjî: ‹Ey padîşah, çawa berê ez bûbim xulamê bavê te, wusa ezê niha bibim xulamê te›, hingê tê ji bo min şîreta Ahîtofel xerab bikî. Serekkahîn Sadoq û Evyatar jî di bajêr de ne. Her tiştê ku tu di qesra padîşah de bibihîzî, ji Sadoq û Evyatar re bêje! Li ba wan du kurên wan hene û her tiştê ku hûn bibihîzin, bi destê wan bi min bidin zanîn.»

Îcar gava dostê Dawid Hûşay ket bajêr, Abşalom jî ket Orşelîmê.

* * *

Dawid padîşah hat bajarokê Baxûrîmê û va ye, ji eşîreta malbata Şawûl zilamek derket, navê wî Şîmeyî bû. Wî nifir dikirin û kevir diavêtin ser padîşah û ser hemû xulamên wî û digot: «Derkeve, derkeve hey zilamê dest bi xwîn! Hemû xwîna mala Şawûl, Xudan vegerand ser te û Xudan padîşahtî da destê kurê te Abşalom. Va ye, tu di xerabiya xwe de hatî girtin, çimkî tu zilamekî dest bi xwîn î.»
Hingê Abîşay ji padîşah re got: «Çima ev kûçikê mirî nifiran li padîşahê min dike? Ez herim û serê wî bifirînim.»

Lê Dawid got: «Te çi ji min e? Bihêle, bila ew nifiran li min bike. Eger Xudan jê re gotibe: ‹Nifiran li Dawid bike!›, hingê kî wê bêje: ‹Çima tu weha dikî?›»
Û Dawid ji Abîşay û ji hemû xulamên xwe re got: «Wî bihêlin, bila nifiran li min bike, çimkî Xudan emir li wî kiriye. Belkî Xudan li neheqiya ku li min dibe binêre û îro di cihê van nifiran de, Xudan bi qencî li min vegerîne.»

Û Dawid û zilamên xwe rêve diçûn.

Di vê navê de Abşalom bi zilamên xwe ve hat Orşelîmê û şîretkarê Dawid Ahîtofel bi wî re bû.
Dostê Dawid Hûşay jî hat ba Abşalom û jê re got: «Bila padîşah bijî!»
Lê Abşalom jê re got: «Ma qenciya te ji bo dostê te ev e? Çima tu bi wî re neçûyî?»
Hûşay got: «Ezê bibim ê wî zilamê ku Xudan û hemû gelê Îsraêl bijartine. Min li ber bavê te çawa xizmet kiribe, ezê li ber te jî wusa bim.»

Hingê Abşalom ji Ahîtofel re got: «Şîreta xwe bêje, ka em çi bikin?»
Ahîtofel got: «Here ba van jinên ku bavê te hiştine ber malê. Hingê hemû Îsraêl wê bibihîze ku tu ji bavê xwe re mekruh bûyî û destên zilamên te wê hêzdar bibin.»
Loma wan li ser bên kon vegirtin û li ber çavê hemûyan, Abşalom çû ba jinên bavê xwe.

Hingê Ahîtofel ji Abşalom re got: «Bihêle ku ez diwanzdeh hezar kesan bibjêrim û îşev bikevim pey Dawid. Û hê ew westiyayî û destên wî bêhêz ez bigihîjim ser wî; hingê hemû wê birevin û ezê padîşah tenê bikujim. Ezê hemû gel vegerînim ba te û hemû wê di aştiyê de bimînin.»
Ev peyv di çavê Abşalom û di çavê hemû rihspiyên wî de qenc bû.

Lê Abşalom got: «Niha gazî Hûşay bikin, em guhdariya gotina wî jî bikin.» Hûşay jî hat û Abşalom jê re got: «Ahîtofel weha got, ma em li gor peyva wî bikin? Eger ne wusa be, tu bêje.»
Hûşay got: «Vê carê şîreta Ahîtofel ne qenc e. Tu dizanî ku bavê te û zilamên wî cengewêr in û zilamên kezeb şewitî ne. Bavê te zilamê cengê ye û bi gel re di eynî cihî de şevê derbas nake.
Û çaxê di destpêkê de hin ji zilamên me bikevin, her kes wê bibihîze û bêje: ‹Di nav xelkê Abşalom de qirbûn heye!› Hingê ziravê mêrxasan wê bi carekê biqete.
Loma şîreta min weha ye: Bila tevahiya Îsraêl bicive û tu bi xwe bi wan re here cengê. Emê bi ser wî de bigirin û emê ne wî û ne jî zilamekî ji ordiya wî bihêlin.»

Abşalom û hemû zilamên wî gotin: «Şîreta Hûşay ji şîreta Ahîtofel çêtir e.» Çimkî Xudan weha kir ku şîreta Ahîtofel xera bike.

Hûşay jî ji kahîn Sadoq û Evyatar re got: «Di cih de xeberê bişînin û ji Dawid re bêjin: ‹Îşev li ba bûriyan nemîne, lê eseh derbas bibe, an nexwe padîşah û hemû xelkê wî wê bên daqurtandin.›»

Di cih de Yonatan û Ahîmeas çûn û xeber dan Dawid û padîşah bi hemû xelkê xwe ve rabû û ew ji Çemê Urdunê derbas bûn.

Di vê navê de Abşalom li diyarê Gîleadê ordîgeh danî.

Dawid jî xelkê xwe hijmart û serhezar û sersed danîn ser wan. Wî bi xwe jî dixwest bi wan re bikeve şer, lê belê xelkê nehişt. Loma ew li tenişta dergeh sekinî û tevahiya ordiyê bi sedan û bi hezaran derketin. Û padîşah ji her sê serdarên xwe re, ji Yoab, Abîşay û ji Îtay re got: «Ji bo xatirê min, li hember Abşalom nerm bin.» Û hemû leşkeran ev emrê padîşah bihîst.
Hingê ew li hember ordiya Îsraêl derketin çolê û şer di nizarê Efrayîm de çêbû. Gelê Îsraêl li wir li ber xulamên Dawid şkest û qirbûneke mezin çêbû.
Abşalom li hêstirê siwar bûbû û hêstir çû binê dareke mazî ya ku têr çiqil bû û Abşalom ji serê xwe bi dara mazî ve hat girtin û di navbera erd û ezmên de daleqandî ma. Û hêstira ku di bin wî de bû, bazda çû.

Zilamekî ew dît û ji Yoab re got: «Va ye, min Abşalom bi dareke mazî ve daleqandî dît.»

Yoab jê re got: «Madem ku te ew dît, çima te ew li erdê nexist? Minê deh perçe zîv û piştênkek bidana te.»
Lê wî zilamî ji Yoab re got: «Tu hezar perçe zîv bixî kefa destê min jî, ez destê xwe dirêjî kurê padîşah nakim, çimkî me bi guhê xwe bihîst ku padîşah emir li te, li Abîşay û li Îtay kir û got: ‹Hay jê hebin, bila tu kes dest Abşalom nede.›»
Lê Yoab sê rim girtin destê xwe, çû, Abşalom di nav dara mazî de hê sax dît û rim di dilê wî re kirin. Piştî vê yekê Yoab li boriyê xist û ceng sekinî. Wan rahişt Abşalom û ew avêtin çala mezin û li ser wî şikêreke mezin a keviran çêkirin.
Û tevahiya Îsraêl, her kes reviya, çû çadira xwe.

Hingê kurê Sadoq Ahîmeas got: «Ez herim mizgîniyê bidim padîşah ku niha Xudan heqê wî ji destê dijminên wî stand.»
Lê Yoab jê re got: «Îro tu nabî mizgînvan, çimkî kurê padîşah miriye.»
Û Yoab yekî din şand. Lê Ahîmeas qebûl nekir û destûr stand ku ew jî here. Ew bi lez çû, riyeke din bijart û ji yê din bihûrî.

Dawid di dergeh de rûniştî bû û nobedar derket ser banê dergeh û ji dûr ve dît ku zilamek bi serê xwe dibeze. Nobedar gazî kir û haya padîşah pê xist. Dawid got: «Eger ew bi serê xwe be, wê mizgîniyê bide.»

Ahîmeas hat, xwe li ber padîşah tewand û got: «Bila navê Xwedayê te Xudan pîroz be; wî ew zilamên ku destên xwe li hember mîrzayê min padîşah rakirin, dan destê te.»
Dawid pirs kir, got: «Ma Abşalom di aştiyê de ye?»
Ahîmeas got: «Çaxê Yoab ez şandim, min qerqeşûneke mezin dît. Lê belê min fêm nekir ku çi ye.»
Padîşah got: «Xwe bide aliyekî û li vir raweste.»

Yê din jî hat û got: «Mizgînî li mîrzayê min padîşah, çimkî îro Xudan heqê te ji destê wan hemûyên ku li hember te rabûne, stand.»
Dawid pirs kir, got: «Ma Abşalom di aştiyê de ye?»
Yê din got: «Bila dijminên mîrzayê min padîşah û hemûyên ku ji bo xerabiyê li hember te rabûne, wek wî xortî bin.»
Li ser vê yekê padîşah gelek lerizî, derket odeya li ser dergeh û giriya. Û dema diçû weha digot: «Kurê min Abşalom, kurê min, kurê min Abşalom! Xwezî ji dêl te ve ez bimirama, ey Abşalom, kurê min, kurê min!»

## Rojên dawî yên Dawid padîşah

(Samûêl II, 22; Padîşah I, 1)

Dawid padîşah ji bo kurê xwe Abşalom gelek digirî û şîn girt. Zilamên wî ev yek bihîstin û serketina wê rojê ji hemûyan re bû şîn. Çimkî padîşah rûyê xwe nixamt û wî bi dengekî bilind kir qîr, got: «Kurê min Abşalom, ey Abşalom, kurê min, kurê min!»
Hingê Yoab hat ba padîşah, lê hilat û got: «Îro te da zanîn ku serwerên te û xulamên te di çavê te de ne tiştek in. Çimkî îro ez fêm dikim, eger Abşalom sax û em hemû îro mirî bûna, wê di çavê te de rast bûya. Niha rabe, derkeve û dilê xulamên xwe xweş bike. Ez bi navê Xudan sond dixwim, eger tu dernekevî, îşev tu kes li ba te namîne.»
Dawid guhê xwe da peyvên wî û di dergeh de rûnişt.
Heçî zilamên Abşalom bûn, her kes reviyabû çadira xwe. Û di nav hemû eşîrên Îsraêl de xelkê devjenî dikir, digot:

«Dawid padîşah em ji destê dijminên me û ji destê Filistîniyan xilas kirin. Lê niha diviya ew ji rûyê Abşalom ji welêt bireviya. Heçî Abşalom e, ew di şer de mir. Ma hûn çima li ser vegerandina padîşah bêdeng dimînin?»

Bi vî awayî Dawid vegeriya Orşelîmê, hat qesra xwe û wek berê bû padîşahê gelê Îsraêl.
Û wek berê ew derdiket, bi zilamên xwe ve li hember dijminan şer dikir û gelê xwe diparast.

Çaxê ku Xudan Dawid ji destê hemû dijminên wî û ji Şawûl xilas kir, Dawid peyvên vê lavijeyê ji Xudan re strand û got:

«Xudan lata min û kelha min e, erê Xilaskarê min e.
Xwedê lata min e, ez xwe bispêrim wî.
Mertalê min û strûhê xilasiya min,
Asêgeha min a bilind, cihê ku ez xwe dispêrimê û xilaskarê min ew e;
Tu min ji zordariyê xilas dikî.
Ezê gazî Xudan dikim, ew hêjayî pesindanê ye

Wî ji jor destê xwe dirêj kir, ez girtim;
Wî ez ji nav gelek avê derxistim.
Wî ez ji dijminê min ê hêzdar, ji wan ên ku ji min nefret dikirin rizgar kirim,
Çimkî ew ji min xurttir bûn.
Di roja min a qafilqedayê de, ew derketin pêşiya min,
Lê belê Xudan ji min re bû piştevan.
Wî ez derxistim cihê fireh.
Wî ez xilas kirim, çimkî ez li xweşê wî çûm.

Xudan sax e û bila lata min pîroz be!
Lata xilasiya min Xwedê, bila bilind be!
Xwedayê ku heyfa min standiye,
Serê miletan li ber min datanî
Û ez ji navenda dijminên min deranîme, ew e.
Erê, te ez li ser wan ên ku li hember min rabûn, bilind kirim.
Te ez ji mirovê zordar azad kirim.
Ji bo vê yekê, ya Xudan, ezê di nav miletan de ji te re şikir bikim;
Ezê ji navê te re lavijeyan bistrînim.
Xudan serketinên mezin dide padîşahê xwe
Û her û her kerem û dilovaniyê li meshkiriyê xwe,
Li Dawid û li dûndana wî dike.» (Samûêl II, 22)

* * *

Dawid pirr dixwest ku ji Xudan re perestgeheke mezin û spehî ava bike, lê Xwedê jê re got: «Kurê te wê xaniyekî ji min re çêke.»
Loma Dawid ji xwe re got: «Kurê min Silêman xort e û xeşîm e û ew mala ku ji Xudan re bê çêkirin, divê gelek mezin û di hemû welatan de bi nav û deng û bi rûmet be. Ji bo vê yekê ezê ji bo wî amadekariyê bikim.»
Û Dawid ji beriya mirina xwe gelek amadekarî kir, zîv û zêr û darên erz û kevirên hêja peydakirin ku ji bo avakirina perestgeha Xwedê amade bin.

* * *

Hin bi hin Dawid kal û pîr dibû, lê hê ji gelê Îsraêl re ne kifş bû ku di nav kurên wî de kî wê bibe padîşah.

Hingê careke din yek ji kurên Dawid rabû, derket pêş û dixwest bibe padîşah; navê wî Adoniya bû.

Wê gavê serdarê Dawid Yoab û serekkahîn Evyatar jî piştgirtiya Adoniya kirin ku bibe padîşah.

Lê belê diya Silêman Batşêba û Natan pêxember hatin ba Dawid û agahî dan wî.

Li ser vê yekê Dawid emir da Natan, serekkahîn Sadoq û serdar Benaya û ji wan re got:

«Bi xulamên min ve herin, kurê min Silêman li hêstira padîşah siwar bikin û li derveyî bajêr wî mesh bikin, wî bikin padîşah. Li boriyê bixin û bêjin: ‹Bijî padîşah Silêman!› Di pey de bi wî ve vegerin û hingê Silêman wê li ser textê min rûne.»

Wan tam li gor van emrên Dawid kir û wê rojê Silêman di cihê bavê xwe Dawid de bû padîşahê gelê Îsraêl.

* * *

Dawid 40 salan padîşahtî kir û peyvên wî yên dawî ev in:

«Ruhê Xudan bi devê min got û peyva wî li ser zimanê min bû.  
Xwedayê Îsraêl got, lata Îsraêl ji min re got:  
‹Yê ku bi edaletê li ser mirovan hukumdariyê bike,  
Ew wek ronahiya sibî ye, çaxê ku roj sibeheke bê ewr derdikeve;  
Ew wek biriqîna piştî barana ku ji erdê giyayê nû şîn dike ye.›  
Ma mala min bi Xwedê re ne tam wusa ye?  
Ma wî peymaneke herheyî bi min re girê neda ya ku ji her aliyî ve serrast û piştrast e?  
Ma ew tevahiya xilasiya min û hemû daxwazên min peyda nake?  
Lê belê heçî yên xerab in, ew hemû wê bibin wek stiriyên ku tên avêtin.  
Û ewê di cihê xwe de bi êgir bi carekê bên şewitandin.» (Samûêl II, 23:2-7)

# Gotinên Dawid ên li ser Mesîh

Bi rastî, Dawid padîşahekî mezin bû. Xwedê ew di xortaniya wî de bijart û kir padîşah. Wî sozeke mezin dabû Dawid, jê re gotibû: «Mala te û padîşahiya te wê her û her li ber min bisekinin û textê te wê her û her bimîne.»

Lê Dawid ne tenê padîşah bû, ew pêxember bû jî. Wî di Zebûran de gelek pêxemberîtî kirin û heta îro ew di Kitêba Zebûrê de nivîsandî ne.

Di Zebûran de Dawid gelek caran li ser yekî ku di halekî pirr giran de ye dinivîse û dibêje:

«Ez kurmê axê me, ne mirov im;  
Mirovan ez bêhurmet kirim û xelkê ez kêm dîtim.  
Hemû yên ku min dibînin, tinazên xwe bi min dikin;  
Ew min şermezar dikin û serê xwe dihejînin.» (Zebûr 22:6-7)

«Heta dostê min jî, yê ku ez lê ewle bûm,  
Wî yê ku nanê min dixwar,  
Pehniya xwe li hember min rakir.» (Zebûr 41: 9)

«Cilên min di nav xwe de leva kirin,  
Û ji bo xiftanê min, pişk avêtin.» (Zebûr 22:18)

«Gava ez tî bûm, wan sihik da min.» (Zebûr 69:21)

Ew dibêjin:
«Ew xwe dispêre Xudan,
Bila Xudan wî xilas bike.
Eger ew ji wî hez bike,
Bila niha wî xilas bike.» (Zebûr 22:8)

Lê di cihekî din de dibêje:
Xwedê «hemû hestiyên wî diparêze,
Yek ji wan nayê şkandin.» (Zebûr 34:20)

«Dilê min şa dibe û canê min dilgeş e;
Bedena min jî di ewlehiyê de rihet e.
Çimkî tu canê min li diyarê miriyan nahêlî
Û tu nahêlî ku Pîrozê te rizîbûnê bibîne.» (Zebûr 16:9)

Qet şik tune ku Dawid padîşah jî wek hemû mirovên din mir û rizîbûn dît;
Lê belê ew li vir li ser yekî ji xwe meztir dibêje ku wê bê, yanî li ser Mesîh pêxemberîtiyê dike.
Çaxê ku Dawid bi Ruhê Xwedê ev peyv gotin, mana wan a kûr hê nedihat fêmkirin, lê belê dema ku Mesîh hat, kifş bû ku ev peyv li ser wî bûn.

# SERHATIYA SILÊMAN

## Şehrezayiya Silêman

(Padîşah I, 3)

Çaxê Silêman bû padîşah û wî dijminên xwe yê mayîn bindest kirin, ew çû bajarokê Gîbeyonê ku goriyan bike, çimkî Konê Peymanê û Sindoqa Peymanê li wir bûn. Silêman li wê derê hezar heywan pêşkêşî Xwedê kirin.

Bi şev Xwedê di xewnê de jê re xuya bû û got: «Ji min re bêje ku tu dixwazî ez çi bidim te.»

Silêman got: «Te ji xulamê xwe, yanî ji bavê min Dawid re, dilovaniya mezin kir, çimkî ew mirovekî rast û dilsoz bû . Te jê re kurekî da, ku ew li ser textê wî rûne.
Û niha te xulamê xwe di cihê bavê min Dawid de kir padîşah, lê ez wek zarokek im û ez nizanim rêberiyê bikim. Ev gelê te yê ku te bijartiye, miletekî evqas mezin e ku nayê bijmartin. Loma dilekî fêmdar bide xulamê xwe, da ku ew bi edalet hukumdarî û serweriya gelê te bike û ew ya qenc û ya xerab ji hev derxe. Çimkî ne wusa be, kî dikare rast û rast hukumdariya gelê te yê mezin bike?»

Ev gotina Silêman di çavê Xudan de qenc bû û Xwedê ji Silêman re got:
«Ji ber ku te ev tişt xwest û jiyaneke dirêj, an dewlemendî, an jî helakbûna dijminên xwe nexwestin, ji ber vê yekê ezê li gor daxwaza te bikim û ezê dilekî fêmdar û şehreza bidim te. Wusa ku beriya te, yek wek te çênebûye û tu caran yekî din wê wek te nebe jî.
Û bi ser de, ezê hem dewlemendî û hem jî rûmetê bidim te û di hemû rojên jiyana te de tu padîşah wek te mezin nabe.
Eger tu wek bavê xwe Dawid di riya min de herî û li gor qanûn û emrên min bikî, ezê rojên te dirêj bikim.»

Hingê Silêman hişyar bû û fêm kir ku ew xewn bû.
Ew vegeriya Orşelîmê û li ber Sindoqa Xudan sekinî û gorî pêşkêşkirin.
Û wî ji bo hemû mezin û karbidestên xwe ziyafet da.
Piştî demekê du fahîşe hatin ba padîşah û li ber wî sekinîn.
Yekê ji wan got: «Efendî! Ez û eva ha, em di eynî malê de rûdinin. Çaxê ez bi wê re di malê de bûm, min zarokek anî. Piştî du, sê rojan, wê jî zarokek anî. Em herdu bi serê xwe bûn, tu kesî li ba me nebû. Bi şev kurê wê mir, çimkî ew li ser wî raza bû.
Nîvê şevê ew rabû û çaxê ez razam, wê kurê min ji rex min rahişt û ew xist himbêza xwe; lê kurê xwe yê mirî xist himbêza min.
Sibehê, çaxê ez rabûm ku şîr bidim kurê xwe, va ye, ew mirî bû. Lê gava min lê nêrî, min dît ku ew ne kurê min e.»
Lê fahîşa din got: «Na, bi rastî yê mirî kurê te ye û yê zindî kurê min e.»
Û herduyan devjenî kir.

Li ser vê yekê Silêman padîşah got: «Eva ha dibêje ku ‹Zarokê zindî kurê min e!› û ya din dibêje: ‹Na, ew yê min e!›»
Di pey de wî got: «Şûrekî ji min re bînin!»
Wan şûrek anî û padîşah got: «Kurê zindî bikin du perçe û nîvî bidin vê jinê û nîvê din bidin ya din.»

Lê dilê fahîşa ku diya kurê sax bû, bi kurê wê şewitî û wê ji padîşah re got: «Mîrzayê min, bila kurê zindî bidin wê, wî nekuje!»

Lê belê ya din got: «Bila ew ne yê min û ne jî yê te be, bila wî bikin du perçe!»

Hingê Silêman padîşah biryara xwe da û got: «Kurê zindî bidin jina pêşî. Kurê wê nekujin, çimkî diya wî ew e.»

Çaxê hemû Îsraêl li ser biryara padîşah bihîst, ji wî tirsiyan, çimkî wan dît ku bi şehrezayiya Xwedê hukumdarî kir.

Û Xwedê wek seylaka ber behrê şehrezayî û fêmdarî da Silêman û şehrezayiya wî ji ya hemû mirovên rojhilatê meztir bû.
Wî sê hezar metelok yanî mamik gotin û hijmara stranên wî 1005 bûn. Û mirov ji miletên din jî hatin, ku şehrezayiya wî bibihîzin.

Ev çend gotinên Silêman in:

Destpêka şehrezayiyê, tirsa Xudan e
Û naskirina wî fêmdarî ye. (Gotinên Silêman 9:10)

Di hemû kirinên xwe de, Xwedê bîne bîra xwe
Û ewê riyên te rast bike. (Gotinên Silêman 3:6)

Qurbanên mirovên xerab ji Xudan re mekruh in,
Lê duaya mirovên rast li xweşê wî diçe. (Gotinên Silêman 15:8)

Jina hêjabilind, taca mêrê xwe ye. (Gotinên Silêman 12:4)

Xanî û dewlemendî mîrasa ji bav e,
Lê jina fêmdar ji Xudan e. (Gotinên Silêman 19:14)

Zarokek jî bi kirinên xwe tê naskirin;
Tê dîtin ka karên wî rast û pak in, an ne. (Gotinên Silêman 20:11)

Zarok li gor riya ku divê pê ve biçe perwerde bike,
Ew di pîrîtiya xwe de jî ji wê dernakeve. (Gotinên Silêman 22:6)

Şeş tişt hene ku Xudan ji wan nefret dike,
heft tişt hene ku jê re mekruh in:
Çavên qure,
Zimanê derewîn,
Destên ku xwîna bêsûc dirijînin,
Dilê gêrûfenker
Lingên ku ji bo xerabiyê dilezînin,
Şahidê derewîn ê ku derewan belav dike,
Mirovê ku cihêtiyê dixe nav birayan. (Gotinên Silêman 6:16-19)

Bi ketina dijminê xwe kêfxweş nebe;
Û bi terpilîna wî dilgeş nebe. (Gotinên Silêman 24:17)

Nebêje: «Wî çi li min kiribe, ezê wusa li wî bikim,
Ezê li gor kirinên wî lê vegerînim.» (Gotinên Silêman 24:29)

Bersîva nerm hêrsê disekinîne
  Lê belê gotina hişk xezebê radike.
Zimanê mirovê şehreza, zanînê dixemilîne
  Lê belê ji devê mirovê bêaqil dînîtî dipijiqe.
Çavên Xwedê li her derê ne,
  Çavnêriya qenc û xeraban dikin.
Zimanê şifabexş dara jiyanê ye
  Lê zimanê xwehr ruh dişkêne.
Mirovê bêaqil hişyarkirinên bavê xwe kêm dibîne,
  Lê yê ku guhdariya lêhilatinê dike, fêmdar e.
Mala mirovê rast xezîneyeke mezin e,
  Lê derameta mirovê xerab çavkaniya tengahiyê ye.
Lêvên mirovê şehreza zanînê belav dikin,
  Lê belê dilê bêaqilan ne wusa ye. (Gotinên Silêman 15:1-7)

Du Zebûr jî ji aliyê Silêman padîşah ve hatine nivîsîn. Yek ji wan ev e:

Eger Xudan xanî ava neke,
  Hosta badîhewa dixebitin;
Eger Xudan bajêr neparêze,
  Nobedar badîhewa hişyar dimînin.
Badîhewa hûn sibê zû radibin
  Û dereng rihet rûdinin.
Û nanê xwe bi kedê dixwin;
  Çimkî Xwedê xewê dide hezkiriyên xwe.

Erê, zarok ji ba Xudan mîras in;
  Berê zikê jinê xelat e.
Kurên xortaniyê
  Wek tîrên di destê mêrxas de ne.
Xwezî bi wî zilamê
  Ku tîrdanka wî bi wan tije ye.
Çaxê ew di dergeh de bi dijminên xwe re gotûbêjê dikin,
  Ew şerm nabin. (Zebûr 127)

# Silêman ji Xwedê re perestgehekê ava dike
(Padîşah I, 5-6; 8)

Me dît ku Silêman gelekî şehreza bû. Niha emê bibihîzin ku Silêman wek ku Xwedê gotibû, Perestgeha Xwedê ava kir.

Beriya ku Silêman ji xwe re qesreke mezin û spehî ava bike, wî dest bi avakirina Perestgeha Xwedê kir. Bi hezaran xelk xebitîn; pispor ji Lubnanê hatin ku alîkariya xebatkarên wî bikin û piştî heft salan Perestgeh temam bû.

Ew ji kevirên mezin hat avakirin û 30 metre dirêj, 10 metre fireh û 15 metre bilind bû. Dîwarên hundir ên Cihê Pîroz bi darên hêja xemilandî bûn û dîwarên hundirê Cihê Herî Pîroz hemû zêrkirî bûn.

Çaxê her tişt amade bû, Silêman cejneke mezin çêkir û wî hemû rihspî, mîrên eşîrên Îsraêl û hemû mezinên gel civandin; kahînan Sindoqa Peymanê bi nivîsdekên Emrên Mezin ve û her tiştê ku di Konê Peymanê de bû, anîn û danîn Perestgehê.
Silêman û hemû gel li derve gorî pêşkêşî Xudan kirin û çaxê kahîn ji Perestgehê derketin, ewr mala Xwedê tije kir û xelkê fêm kir ku Xwedê ji nû ve di vê Perestgehê de di nav wan de rûnişt. Çimkî Xwedê di dema Mûsa de jî weha kiribû û ji Silêman re gotibû:
«Heçî Perestgeh e ya ku tu ava dikî: Eger tu li gor qanûn û emrên min bikî, ezê soza xwe ya ku min daye bavê te Dawid, bi destê te bînim cih. Ezê di nav we de rûnim û dev ji gelê xwe bernadim.»

Çaxê gel dît ku rûmeta Xwedê Perestgeh tije kir, ew hemû rabûn û Silêman ew pîroz kirin. Piştre ew çû ser çokan, wî destên xwe ber bi ezmên ve bilind kirin, dua kir û got:

«Ya Xudan!
Wek te, ne li jor li ezmên û ne jî li jêr li ser erdê Xwedê heye.
Te ji xulamên xwe re peyman û dilovaniya xwe girt û ji bavê min re got: ‹Eger zarokên te li ber min rêve herin, hingê tu caran zilamek ji te kêm nebe ku li ser textê te rûne.› Loma tu vê peyva xwe bîne cih.

«Lê belê, ma Xwedayê rast li ser erdê rûdine? Bi rastî, ezman û hemû ezmanên ezmên ji bo te biçûk in. Loma ev xanî çawa dikare ji te re bibe cih?

«Ya Xwedê, berê xwe bide xulamê xwe û duaya min bibihîze: Bila çavên te bi şev û roj ber bi vî xaniyî ve vekirî bin, çimkî te li ser vî cihî got: ‹Navê min wê li vir bimîne.› Loma li ezmên guhdariya duaya min û duaya gelê xwe bike û dema tu bibihîzî, li me bibihûre!

«Eger mirovek li hember cîranê xwe guneh bike û bê ber vê gorîgehê, da ku sond bixwe, hingê li ezmên guhdariya wî bike û dîwana xulamên xwe bike: Yê bi sûc sûcdar derxe û xerabiya wî vegerîne ser wî û yê bê sûc rast derxe.

«Eger gelê te li hember te guneh bike û dijmin bê, li wan bixe û eger hingê ew vegerin ba te û navê te eşkere bikin û li vir li ber te dua bikin, hingê ji ezmên guhdariya wan bike û gunehê gelê xwe afû bike û wan vegerîne welatê ku te soz dabû bav û kalên wan.

«Eger yek ji gelê te di derdê dilê xwe de dua bike û destên xwe ber bi vî xaniyî ve bilind bike, hingê ji ezmên guhdariya wî bike; li wî bibihûre û alî wî bike!
Ji her kesî re li gor kirinên wan bide, çimkî tu tenê bi dilê hemû mirovan dizanî. Hingê ewê her gav ji te bitirsin.

«Eger yekî xerîb ê ku li ser navê te yê mezin û li ser zendê te yê hêzdar bihîstiye, ji welatekî dûr bê û li vir dua bike, hingê ji ezmên guhdariya wî bike û ew çi ji te bixwaze, bide wî, da ku hemû miletên dinyayê navê te bizanin û ji te bitirsin.
Hingê hemû wê fêm bikin ku ev xanî yê te ye.»

Di pey vê duayê de Silêman rabû, gel pîroz kir û bi dengekî bilind ji wan re got:

«Xudanê ku li gor sozên xwe rihetî daye gelê xwe, pîroz be!
Wî sozên qenc dan xulamê xwe Mûsa û ji wan sozan, peyvek jî pûç derneket.
Bila Xudan Xwedayê me wek ku bi bav û kalên me re bû, bi me re be jî.
Bila ew tu caran me nehêle û dev ji me bernade.
Bila ew dilê me li xwe vegerîne, da ku em di hemû riyên wî de herin
Û em hemû emir û qanûnên ku wî dane bav û kalên me, bigirin.
Û bila ev peyvên min şev û roj li ber wî bin, da ku roj bi roj
Wek ku lazim e, ew xulamê xwe û gelê xwe biparêze.
Hingê hemû miletên dinyayê wê bizanin ku Xudan Xwedê ye û yekî din tune.
Loma bi hemû dilê xwe bi Xudan Xwedayê me re bin,

Da ku em li gor emrên wî bijîn û li gor qanûnên wî bikin.»

Piştre Silêman padîşah û hemû gel li ber Xudan gorî serjêkirin. Û ji bo heft rojan wan cejneke mezin çêkir û xelkê padîşah pîroz kir; hingê her kes vegeriya mala xwe û ew bi her tiştê qenc ê ku Xwedê ji Dawid û ji gel re kiribû, pirr şa û dilgeş bûn.

## Şahbanûya Herêma Şebayê

(Padîşah I, 9-10)

Piştî vê yekê Xwedê careke din ji Silêman re xuya bû û jê re got:

«Min duaya te bihîst û min ev xaniyê ku te ji min re ava kiriye, pîroz kir.

Dilê min û çavên min wê her û her li vir bin. Û eger tu wek bavê xwe ji dil û can li ber min rêve biçî û li gor hemû emir û qanûnên min bikî, ezê textê padîşahiya te li gor soza xwe her û her qayîm bikim.

Lê eger hûn û zarokên xwe ji min dûr kevin û li gor emir û qanûnên min nekin û ji xwedayên din re xizmetê bikin, hingê ezê we ji welatê we bavêjim, helak bikim. Ezê vî xaniyê ku min ji xwe re pîroz kiriye, red bikim û gelê min wê bibe tinaz û pêkenok.

Û xelk wê bipirse, bêje: ‹Çima Xudan weha bi vî xaniyî û bi vî gelî kir?›

Hingê ewê bersîvê bidin û bêjin: ‹Ji ber ku wan dev ji Xudanê xwe Xwedê, yê ku ew ji Misrê deranîn, berdan û li pey xwedayên din ketin û ji wan re xizmet kirin. Loma Xudan ev hemû belayên ha anîn serê wan.›»

* * *

Mirov ji dûr hatin ku şehrezayiya Silêman bibihîzin û Şahbanûya herêma Şebayê jî di nav wan de bû. Şeba îro li aliyê Yêmenê ye, li başûrê Siûdî Erebistanê ye.

Wê şahbanûyê li ser rûmeta Silêman bihîst û hat ku şehrezayiya wî biceribîne. Ew bi gelek deveyên ku barên wan biharat, zêr û kevirên hêja bûn, ve hat Orşelîmê.

Ew bi Silêman re peyivî û li ser her tiştê ku di hişê wê de bû, jê re got. Û Silêman bersîva hemû pirsên wê da û jê re şîrove kir.

Çaxê şahbanûyê, qesra Silêman û xwarina sifra wî û xaniyên xulamên wî û cilên wan û goriyên ku di Perestgehê de pêşkêş dikirin dît, ew matmayî ma û ji padîşah re got:

«Gotina ku min li ser şehrezayî û dewlemendiya te bihîstibû, rast e. Heta ku ez nehatim û min bi çavên xwe nedît, min bawer nekir. Bi rastî, nîvê wê jî ji min re nehatiye gotin.

Xwezî bi xelkê te û xwezî bi xulamên te yên ku her gav li ber te disekinin û şehrezayiya te bibihîzin. Xudan Xwedayê te yê ku tu daniyî ser text, pîroz be. Ji ber ku Xudan her û her ji Îsraêl hez dike, wî tu kiriyî padîşah, da ku tu bi edaletê û li gor rastiyê hukumdariyê bikî.»

Şahbanûyê li dor çar hezar kîlo zêr û gelek biharat û kevirên hêja dan wî û Silêman jî her tiştê ku wê dixwest da wê û hingê ew vegeriya welatê xwe Şebayê.

# Silêman û pûtên jinên wî

(Padîşah I, 11)

Silêman padîşahê Îsraêl ê herî şehreza û dewlemend bû. Xwedê bi wî re peyivî û çend caran jê re got ku divê ji riya rast dernekeve. Lê belê Silêman guhê xwe neda van peyvên Xwedê.

Silêman bi Firewnê Misrê re peymanek girêda û keça Firewn ji xwe re anî. Ji xeynî wê, wî gelek keçên padîşahên din ji bajarê Saydayê, ji nav Moabî, Amonî, Edomî û Hîtîtan, yanî ji nav miletên hawirdor, ji xwe re anîn û ji wan hez kir.

Lê belê Xudan li ser wan miletan weha gotibû: «Keçên wan ji xwe re neynin û keçên xwe jî nedin wan, çimkî eseh ewê dilê we li pey pût û xwedayên xwe bizivirînin.»
Dîsa jî Silêman ew ji xwe re anîn û pirr ji wan hez kir. Heft sed jinên wî, keçên mîr û padîşahan bûn û sê sed jinên wî yên din jî hebûn û wan dilê wî ji Xudan zivirand.

Çaxê ku Silêman pîr bû, êdî wî xwe ji dil û can neda Xwedê û dilê wî ne wek dilê bavê wî Dawid bi Xwedê re bû. Ew li pey pût û xwedayên din ket û wî li ser çiyayê pêşberî bajarê Orşelîmê ji Aşêrayê re û ji Milkom re cihê perizînê da avakirin.
Di wê demê de Aşêra pûta bajarê Saydayê û Milkom jî pûtê miletê Amoniyan bû.
Û Silêman ji bo pûtên jinên xwe yên din jî weha kir, çimkî wan jî dixwest ji pûtên xwe re qurbanan serjêkin û bixûrê bişewitînin.

Ji ber vê yekê hêrsa Xudan li Silêman rabû. Çimkî du caran Xudan Xwedayê Îsraêl jê re xuya bû û li ser van tiştan jê re got, lê dîsa jî dilê Silêman ji Xwedê dûr ket û wî bala xwe neda gotinên Xwedê.

Loma Xudan ji Silêman re got: «Ji ber ku te bi vê yekê dizanî û te peymana min negirt û te li gor emrên min nekir, eseh ezê padîşahtiyê ji destê te bikişînim û bidim yek ji xulamên te. Lê ji bo xatirê bavê te Dawid, ez vê yekê niha nakim; ezê padîşahtiyê ji destê kurê te bikişînim. Û ji bo xatirê bavê te Dawid, ez hemû padîşahtiyê ji destê wî nakişînim; ezê bajarê Orşelîmê û du eşîran jê re bihêlim.»

Di wê demê de Xudan li hember Silêman padîşah dijmin rakirin:
Yê pêşî mîr Hadad ji miletê Edomiyan bû. Ew di dema Dawid de xort bû û ji ber Yoab reviyabû, çûbû Misrê. Ew vegeriya û li hember Silêman derket.
Yê diduyan Reson, xulamê padîşahê Soabê bû. Wî ji xwe re rêbir civandin û bû padîşahê Aramiyan û li hember Silêman rabû.
Yê sisiyan kurê Nebat Yêrovam ji eşîra Efrayîm bû; ew mirovekî jêhatî bû û bû karmendê Silêman. Wî jî destê xwe li hember Silêman rakir.

Ev yek weha çêbû:
Carekê Yêrovam ji bajarê Orşelîmê derket û Ahiya pêxember rastî wî hat. Ew herdu bi serê xwe bûn û Ahiya ebayê xwe yê nû ji xwe kir, ew çirand û kir diwanzdeh perçe.
Wî ji Yêrovam re got: «Deh parçeyan ji xwe re hilde! Va ye, Xudan Xwedayê Îsraêl weha dibêje: ‹Ezê padîşahtiyê ji mala Silêman bikişînim û ezê deh eşîran bidim te. Lê ji bo xatirê bavê wî Dawid, Silêman wê di hemû rojên jiyana xwe de bimîne padîşah. Lê ji destê kurê wî ezê padîşahtiyê bikişînim. Dîsa jî, ji bo xatirê xulamê xwe Dawid, ezê du eşîran bidim kurê Silêman, lê ezê te bikim padîşahê deh eşîrên mayîn. Eger tu guhdariya hemû emrên min bikî û wek xulamê min Dawid di riya min de bimeşî û ya ku di çavên min de rast e bikî û li gor qanûn û emrên min bikî, hingê ezê mala te ava bikim û qayîm bikim.
Bi vê yekê ezê dûndana Dawid nizim bikim, lê tenê ji bo demekê.›»

Çaxê Silêman bi vê yekê hesiya, ew li kuştina Yêrovam geriya. Lê Yêrovam reviya çû Misrê ba Firewn û heta mirina Silêman li wir ma.

Silêman çil salan li Orşelîmê, bû padîşahê gelê Îsraêl. Çaxê ew mir, ew li bajarê Dawid hat veşartin û di pey wî de kurê wî Rêhavam bû padîşah.

## Du padîşahî: Îsraêl û Cihûstan

(Padîşah I, 12)

Çaxê Yêrovam bihîst ku Silêman miriye û Rêhavam bû padîşahê gelê Îsraêl, ew ji Misrê vegeriya.
Ew bi civîna mezinên gelê Îsraêl ve hat û ji Rêhavam re got: «Bavê te nîrê me giran kir. Niha barê me sivik bike, hingê emê ji te re xulamtiyê bikin.»
Rêhavam ji wan re got: «Piştî sê rojên din vegerin û ezê bersîva we bidim.»

Hingê ew bi rihspiyên ku li ber bavê wî Silêman sekinî bûn, şêwirî.
Wan got: «Eger tu îro guhê xwe bidî gelê xwe û ji wan re peyvên qenc bêjî, hingê ewê her gav xulamtiyê ji te re bikin.»
Lê Rêhavam şîreta wan red kir û bi hevalên xwe yên ku wek wî ciwan bûn, şêwirî, got: « Em çi bersîvê bidin vî xelkî?»
Hevalên wî jê re gotin: «Weha ji wan re bêje: ‹Bavê min nîrê we giran kir, lê ezê nîrê we hê girantir bikim. Bavê min hûn bi qamçiyan edeb kirin, lê ezê we bi dûpişkan edeb bikim.›»

Piştî sê rojan Yêrovam û gel hatin ber padîşah. Wî hişk ji wan re got û şîreta rihspiyan red kir û ji wan re got: «Bavê min nîrê we giran kir, lê ezê nîrê we hê girantir bikim. Bavê min hûn bi qamçiyan edeb kirin, lê ezê we bi dûpişkan edeb bikim.»
Bi vî awayî padîşah guhê xwe neda gel; ev çêbû, da ku çawa Xudan bi devê Ahiya pêxember ji Yêrovam re gotibû, wusa derkeve.

Çaxê hemû gel dît, ku padîşah Rêhavam guhê xwe neda wan, wan jê re got: «Te çi ji me ye? Di mîrasa kurê Yêşa Dawid de, para me tune. Ey Îsraêlîno, vegerin çadirên xwe! Bila Dawid li mala xwe binêre!»

Bi vî awayî mala Îsraêl ji mala Dawid veqetiya. Rêhavam li ser eşîra Cihûda û Binyamîn bû padîşah û Yêrovam bû padîşahê her deh eşîrên mayîn.
Ji wê rojê ve ji bo demeke dirêj li Îsraêlê du padîşahî hebûn: Li başûr padîşahiya Cihûstanê û li bakur jî padîşahiya Îsraêlê.
Orşelîm paytextê padîşahên Cihûstanê bû û padîşahên Îsraêlê li bajarê Şexemê û li bajarê Tîrsayê rûniştin û piştre bajarê Sameryayê ji xwe re ava kirin.

Piştî demekê Yêrovam di dilê xwe de got: «Eger gelê min here Orşelîmê, ku li Perestgehê qurban û goriyan pêşkêş bikin, hingê dilê wan wê li Rêhavam padîşah vegere û wê min bikujin.»
Ji ber vê yekê wî du golikên zêrîn da çêkirin û ji xelkê re got: «Ji we re pirr zehmet e ku hûn herin Orşelîmê. Va ye, xwedayên we yên ku hûn ji Misrê deranîn, ev in.»
Wî golikek li bajarê Beyt-Êlê û yê din li bajarê Danê da sekinandin.
Wî li ser serê çiyayan jî cihên perizînê dan avakirin û kahînên ku ne ji mala Harûn bûn li ser wan danîn û wî bi xwe jî li ser gorîgehê li ber golikan qurban pêşkêş kirin.

Ev hemû tişt di çavê Xudan de gunehekî mezin bû. Loma Xwedê pêxember şand ku wî hişyar bike, lê Yêrovam ji riya xwe ya xerab venegeriya û ev ji mala wî re bû guneh û bû sedemê helakbûna wan. Erê, Xwedê bi devê pêxember Ahiya jê re got: «Heçî dûndana Yêrovam e, yê ku li bajêr bimire, wê ji aliyê kûçikan ve bê xwarin û yê ku li çolê bimire, wê ji aliyê teyran ve bê xwarin.»

# SERHATIYA ÊLYAS PÊXEMBER

## Xelaya dijwar

(Padîşah I, 17)

Me dît ku di dema kurê Silêman Rêhavam de li Îsraêlê du padîşahî çêbûn.
Padîşahiya Cihûstanê li başûr bû û padîşahiya Îsraêlê li bakur bû.
Lê belê hem piraniya padîşahên Cihûstanê û hem jî yên Îsraêlê dev ji Xudan berdan û guhê xwe nedan peyvên wî.

Yek ji padîşahên Îsraêlê kurê Omrî Ahab bû. Wî 22 salan li Sameryayê serweriya gel kir, lê kirinên wî di çavê Xudan de xerab bûn û wî li gor gunehên Yêrovam kir; wî ji hemû padîşahên ku beriya wî hatibûn bêtir ya ku di çavê Xudan de xerab bû kir.

Ahab li gor daxwaza Xudan nekir, rabû û Îzebêla keça padîşahê Saydayê Etbaal ji xwe re anî. Îzebêl ne ji gelê Îsraêl bû û pûtperest bû.
Yanî Ahab wek Silêman padîşah kir û jinek ji miletên pûtperestan ji xwe re anî.
Li gor Şerîeta Mûsa pêxember ev çênedibû, lê dîsa Ahab peyva Xwedê şkênand û ji serhatiya Silêman tiştek hîn nebû, çû keça padîşahê Saydayê Îzebêl ji xwe re anî.
Bi vî awayî Îzebêl bû şahbanû; ew jineke gelek xerab bû û zalim bû û ji Ahab padîşah hê gelek xerabtir bû.

Heçî xelkê Saydayê bû, navê xwedayê wan, yanî pûtê wan, Baal bû. Û ji ber ku Îzebêl, yanî şahbanû, diperizî wî pûtî, Ahab padîşah bi xwe jî dest pê kir, li pey Baal çû. Wî li Sameryayê ji Baal re perestgeh û gorîgeh dan avakirin û gorî ji wî pûtî re serjêkirin û padîşah li ber Baal çû ser çokan, perizî wî.

Hingê Xudan Êlyas pêxember şand ba Ahab û wî jê re got: «Bi navê Xudanê zindî yê ku ez jê re xizmetê dikim, heta ez nebêjim di van salan de wê ne xûnav û ne jî baran bibare.»
Û sê sal û şeş mehan baran nebarî û li welêt xelayeke dijwar çêbû.
Hingê Xudan ji Êlyas re got: «Ji vê derê here, berê xwe bide rojhilat û xwe li rojhilata Çemê Urdunê li geliyê Kerîtê veşêre. Ji gelî avê vexwe û min emir li qirikan kir ku te li wê derê xweyî bikin.»
Êlyas li gor peyva Xudan kir, çû geliyê Kerîtê û li wir ma. Û wek ku Xwedê gotibû, qirikan sibehan nan û goşt ji wî re dianîn û êvaran nan û goşt ji wî re dianîn û wî ji gelî av vedixwar. Lê piştî demekê gelî zuwa bû, çikiya, çimkî li welêt baran nebû.

Hingê peyva Xudan ji Êlyas re hat: «Rabe, here herêma Saydayê, bajarê Sarêfatê û li wê derê rûne. Min li wir li jinebiyekê emir kiriye ku te xweyî bike.»
Êlyas pêxember jî rabû, çû Sarêfatê û çaxê gihîşt ber dergehê bajêr, dît ku jinebiyekê li wir êzing berhev dikirin. Wî gazî jinikê kir û got: «Ez hêvî ji te dikim, di firaxekê de ji min re firek av bîne ku ez vexwim.»
Û çaxê jinik çû ku bîne, gazî wê kir û got: «Ez hêvî ji te dikim, ji bo min pariyek nan jî bîne.»
Lê wê got: «Bi navê Xudan Xwedayê te yê zindî, şkevayê min tune, bi tenê di cêr de kulmek ard û di şerbik de hinek rûn heye. Ez niha du ta êzing berhev dikim û ezê herim hundir, ezê ji xwe û kurê xwe re wî bipêjim û emê bixwin û piştre bimirin.»
Li ser vê yekê Êlyas ji wê re got: «Netirse. Here û wek ku te got bike. Lê pêşî nanikekî ji bo min çêke û ji min re bîne û piştre ji bo xwe û kurê xwe çêke. Çimkî Xudan Xwedayê Îsraêl weha dibêje:

‹Heta wê roja ku Xudan baranê li ser erdê bibarîne, di cêr de ard xilas nabe û di şerbik de rûn kêm nabe!›»
Jinik çû, li gor gotina Êlyas kir û Êlyas û jinikê û maliyên wê gelek rojan xwarin. Wek ku Xudan bi devê Êlyas gotibû, di cêr de ard xilas nebû û di şerbik de rûn kêm nebû.

Piştî van tiştan kurê wê jinebiyê nexweş ket. Nexweşiya wî gelek giran bû, wusa ku bîhna wî çikiya. Loma jinikê ji Êlyas re got: «Ey zilamê Xwedê, ma min çi bi te kiriye? Ma tu hatiyî ba min ku tu gunehê min bînî bîra min û kurê min bikujî?»
Êlyas ji wê re got: «Kurê xwe bide min.»
Wî ew ji himbêza wê stand û hilkişiya jor, ket oda xwe û ew li ser nivîna xwe dirêj kir.

Êlyas gazî Xudan kir û got: «Ya Xudan Xwedayê min, ma tu bi kuştina kurê vê jinebiya ku ez li ba wê mêvan im, belayê tînî serê wê jî?»
Û sê caran xwe li ser zarok dirêj kir û gazî Xudan kir, got: «Ya Xudan Xwedayê min, ez lavan ji te dikim, bila canê vî zarokî lê vegere.»
Xudan dengê Êlyas bihîst, canê zarok lê vegeriya û zarok vejiya.
Êlyas ji jinikê re got: «Binêre, kurê te sax e!»
Li ser vê yekê wê ji Êlyas re got: «Niha ez dizanim ku tu zilamekî Xwedê yî û peyva Xudan di devê te de rast e.»

## Êlyas û pêxemberên Baal li ser çiyayê Qarmêlê

(Padîşah I, 18)

Di sala sisiyan a xelaya dijwar de Xudan ji Êlyas re got: «Here, xwe nîşanî Ahab bide, çimkî ezê baranê bibarînim.»
Êlyas jî ket rê, ber bi welatê Îsraêlê ve çû.

Di vê navê de li Sameryayê xela pirr giran bû. Loma Ahab gazî şahneyê xwe Obedya kir û jê re got: «Li seranserê welêt bigere, here hemû çavkanî û geliyan. Belkî em ji bo hesp û hêstiran giya bibînin, da ku em nehêlin ku ew bimirin.»
Û Ahab di riyekê de çû û Obedya di riyeke din de çû.
Heçî Obedya bû, ew ji Xwedê tirsiya û çaxê Îzebêlê pêxemberên Xudan dan kuştin, wî pêncî pêncî sed pêxemberên Xudan di şkeftan de veşartin û ew bi nan û avê xweyî kirin.

Êlyas di riya xwe de rastî Obedya hat, Obedya ew nas kir û Êlyas jê re got: «Here ba padîşah Ahab û jê re bêje: ‹Êlyas li vê derê ye.›»
Lê belê Obedya gelek tirsiya û jê re got: «Bi navê Xudanê zindî, miletek û welatek nema ku padîşah mirov neşandin nav wan ku li te bigerin. Û çaxê digotin: ‹Ne li vir e›, sond bi wan dida xwarin ku wan tu nedîtiyî. Dema ez ji ba te herim, belkî Ruhê Xudan te bibe cihekî ku ez nizanim û dema ew te nebîne, ewê min bikuje.»
Lê Êlyas jê re got: «Bi wî Xudanê zindî ku ez li ber wî radiwestim, eseh îro ezê xwe nîşanî padîşah bidim.»

Li ser vê yekê Obedya çû pêşiya Ahab û ji wî re got.
Ahab jî çû ku rastî Êlyas bê û çaxê wî Êlyas dît, jê re got: «Hey zilamê ku Îsraêl xistiye derdan, ma ev tu yî?»
Êlyas got: «Ne min Îsraêl xist derdan, lê te û mala bavê te, we dev ji emrên Xudan berda û we gel xist derdan û tu li pey Baal çûyî. Niha rêke pey hemû gel û pey çar sed û pêncî pêxemberên Baal û pey çar sed pêxemberên Aşêrayê û wan hemûyan li çiyayê Qarmêlê ji bo min kom bike.»

Ahab padîşah li gor gotina Êlyas pêxember gelê Îsraêl û pêxemberên Baal li çiyayê Qarmêlê civandin.

Êlyas li ber wan hemûyan rawesta û ji wan re got: «Heta kengê hûnê li ser herdu aliyan bikulin? Eger Xudan Xwedê be, li pey wî herin, lê eger Baal Xwedê be, li pey wî herin!»

Xelk bêdeng ma û qet tiştek negot. Hingê Êlyas got: «Pêxemberê Xudan tenê ez mame, lê pêxemberên Baal çar sed û pêncî ne. Niha bila du conegayan ji me re bînin û bila pêxemberên Baal ji bo xwe conegayekî bibijêrin û wî bikin parçe parçe. Û bila wî deynin ser êzingan û bila agir danenin ser. Ez jî, ezê conegayê din amade bikim, deynim ser êzingan û ez agir dananim ser. Hingê hûn gazî navê xwedayê xwe bikin, ez jî, ezê gazî navê Xudan bikim. Û kîjan bi êgir bersîvê bide, Xwedê ew e.»

Hemûyan bersîv da, gotin: «Ev peyv qenc e.»

Hingê Êlyas ji pêxemberên Baal re got: «Conegayekî ji bo xwe bibijêrin û pêşî wî amade bikin, çimkî hûn gelek in. Û gazî navê xwedayê xwe bikin, lê êgir danenin ser.»

Wan jî rahişt conegayekî û ew amade kirin. Û ji sibehî heta nîvro gazî navê Baal kirin, gotin: «Ya Baal, bersîva me bide!» Lê belê deng nehat û yekî ku bersîv bida nebû. Û pêxemberên Baal li hawirdora gorîgeha ku çêkiribûn, xwe di ser hev re qevastin.

Çaxê bû nîvro, Êlyas tinaz bi wan kirin û got: «Bi dengê bilindtir gazî wî bikin, çimkî ew xwedayek e. An ew ketiye ramanên kûr, an jî ew derketiye, rêwîtiyê dike; belkî ew di xewê de ye û divê bê hişyarkirin.»

Hingê bi dengê bilind qîriyan û li gor adetên xwe heta ku xwîn ji bedena wan herikî, xwe bi şûr û sîxan birîndar kirin.

Nîvro derbas bû û heta dema ku di Konê Peymanê de diyarî tê pêşkêşkirin, pêxemberan harîtî kir. Lê deng nehat û yê ku bersîv bida nebû û yê ku guhdarî bikira jî nebû.

Li ser vê yekê Êlyas ji tevahiya xelkê re got: «Werin, nêzîkî min bibin.» Û hemû nêzîkî wî bûn.

Pêşî Êlyas gorîgeha Xudan ya hilweşayî çêkir û li gor hijmara eşîrên gelê Îsraêl rahişt diwanzdeh keviran û bi wan ji Xudan re gorîgeh çêkir. Wî li hawirdora gorîgehê xendekek jî çêkir û li ser gorîgehê êzing nijilandin û conega kir parçe parçe û danî ser êzingan.

Di pey de wî got: «Çar ceran tije av bikin û birijînin ser goriya şewitandinê û ser êzingan.»Wan weha kir, lê wî got: «Ducare bikin!» Wan ducare kir. Û got: «Sêcare bikin!» û wan sêcare kir. Û av herikî hawirdora gorîgehê û xendek jî tije av kir.

Çaxê ku di Konê Peymanê de diyarî tê pêşkêşkirin, Êlyas pêxember li ber gorîgehê sekinî û got: «Ya Xudan Xwedayê Birahîm, Îshaq û Îsraêl! Bila îro bê zanîn ku tu di nav gelê Îsraêl de Xwedê yî û bila bê zanîn ku ez xulamê te me û min ev tiştên ha hemû bi gotina te kirine. Bersîva min bide, ya Xudan, bersîva min bide! Ya Xudan, bila ev gel bizane ku tu Xwedê yî û dilê wan bi şûn de vedigerînî.»

Li ser vê yekê agirê Xudan ket û goriya şewitandinê, êzing, kevir û ax xwarin, xilas kirin û ava di xendekê de jî alîst.

Gava hemû gel ev yek dît, xwe deverû avêtin erdê û gotin: «Xudan Xwedê ye, Xudan Xwedê ye!»

Êlyas ji wan re got: «Pêxemberên Baal bigirin, bila tu kes ji wan nereve û xilas nebe.»

Wan jî ew girtin û Êlyas ew daxistin geliyê Kîşonê û li wir ew kuştin.

Piştre Êlyas ji Ahab re got: «Derkeve, bixwe û vexwe; çimkî dengê baraneke giran tê.»

Ahab ji bo xwarin û vexwarinê derket. Lê Êlyas hilkişiya ser serê çiyayê Qarmêlê, çû ser çokan û dua kir.

Wî ji xizmetkarê xwe re got: «Here û bi aliyê deryayê ve binêre!» Ew jî derket, nêrî û got: «Tiştek tune.»

Êlyas heft caran ji wî re got: «Dîsa here!» Û di cara heftan de xizmetkar got: «Niha ji deryayê ewrek biçûk derdikeve, wek kulma mirov.»

Êlyas got: «Here, ji Ahab re bêje: ‹Ereba xwe bikişîne û dakeve ku baran te negire.›»
Di vê navê de ezman bi ewran û bi bayê tarî bû û baraneke pirr mezin barî. Ahab siwar bû û çû Yîzreêlê. Û destê Xudan li ser Êlyas bû; wî piştênka xwe girêda û heta bi Yîzreêlê di pêşiya Ahab de bezî.

# Êlyas pêxember direve

(Padîşah I, 19)

Ahab her tiştê ku Êlyas kiribû û wî çawa hemû pêxember bi şûr kuştibûn, ji Îzebêlê re got. Îzebêl pirr hêrs bû û bi qasid xeber ji Êlyas re şand û got: «Sibê di eynî demê de, wek ku te ev pêxember kuştin, eseh ezê te jî bikujim.»
Çaxê Êlyas ev yek bihîst, ji bo canê xwe reviya çû başûr heta bajarê Bîrşêbayê û xizmetkarê xwe li wir hişt. Ew bi xwe rêwîtiya rojekê çû çolê û hat li binê deviyekê rûnişt. Wî xwest ku bimire û got: «Bes e, ya Xudan, niha canê min bistîne, çimkî ez ji bav û kalên xwe, ne çêtir im.»
Wî xwe li binê deviyê dirêj kir û bi xew ve çû.

Ji nişkê ve milyaketekî destê xwe li wî da û jê re got: «Rabe, bixwe.»
Wî nêrî, va ye, li ber serê wî, li ser kevirekî germ nanikekî pehtî û şerbikek av hebû. Wî xwar û vexwar û dîsa raza. Milyaketê Xudan cara diduyan hat û destê xwe li wî da, got: «Rabe, bixwe, çimkî riya te dûr e.»
Ew rabû, xwar û vexwar û bi hêza wê xwarinê çil şev û çil rojan heta bi çiyayê Xwedê Horebê, yanî heta bi çiyayê Sînayê, rêve çû.
Li wir ew ket şkeftekê û li wê derê şeva xwe derbas kir.

Li wir peyva Xudan jê re hat û Xwedê ji wî re got: «Êlyas, tu li vir çi dikî?»
Wî got: «Ez ji bo Xwedayê Ordiyan Xudan gelek çavnebar bûm. Gelê Îsraêl dev ji peymana te berda, gorîgehên te hilweşandin û pêxemberên te bi şûr kuştin. Û bi tenê ez mame û niha li canê min jî digerin ku min bikujin.»
Xudan got: «Derkeve û li çiyê li ber Xudan raweste, çimkî ezê derbas bibim.»

Bayê mezin û xurt çiya dikelaştin û li ber Xudan lat difelişandin; lê Xudan ne di bayê de bû. Û piştî bayê erdhejîn çêbû; lê Xudan ne di erdhejînê de bû. Piştî erdhejînê agir hat; lê Xudan ne di êgir de bû. Û piştî êgir dengekî nerm û hêdî hêdî hat. Çaxê ku Êlyas ev bihîst, rûyê xwe bi ebayê xwe nixumand û derket, di devê şkeftê de rawesta. Dengekî ji wî re got: «Êlyas, tu li vir çi dikî?»
Wî got: «Ez ji bo Xwedayê Ordiyan Xudan gelek çavnebar bûm. Gelê Îsraêl dev ji peymana te berda, gorîgehên te hilweşandin û pêxemberên te bi şûr kuştin. Û bi tenê ez mame û niha li canê min jî digerin ku min bikujin.»

Xudan ji wî re got: «Here, vegere Şamê û li wir Hazayêl li ser Sûriyê bi padîşahtî mesh bike. Kurê Nimşî Yêhû jî li ser Îsraêlê bi padîşahtî mesh bike. Û kurê Şefat Êlîşa mesh bike, di cihê xwe de bike pêxember.
Lê belê di nav Îsraêl de min heft hezar mirovên dilsoz hiştine: Wan çokên xwe li ber Baal netewandine û wan ew ranemûsandiye.»

Êlyas ji wir çû û Êlîşayê kurê Şafat dît; wî bi diwanzdeh cot ga, cot dikir. Êlyas derbasî wî çû û ebayê xwe avêt ser wî. Êlîşa jî dev ji gayan berda û li pey Êlyas çû û got: «Destûrê bide min / Bihêle ku ez herim, xatirê xwe ji dê û bavê xwe bixwazim.» Êlyas jê re got: «Here û vegere!»
Êlîşa cotek ga rahişt, çû, wan serjêkirin, goştê wan keland û da xelkê. Piştre ew rabû, li pey Êlyas çû û jê re xizmet kir.

Lê belê heçî Ahab û jina wî Îzebêl bûn, wan dev ji riyên xwe yên xerab bernedan.

# Ahab û Nabot

(Padîşah I, 21)

Me dît ku Xudan li ser çiyayê Qarmêlê çawa kifş kir ku Xwedayê rast ew e û qet tu hêz û qeweta pûtan tune.

Dîsa jî Ahab û jina wî Îzebêl guhê xwe nedan emrên Xwedê û dev ji Baal û pûtên din bernedan.

Li bajarê Yîzreêlê, li ba qesreke Ahab padîşah, rezekî Nabotê Yîzreêlî hebû. Ahab bi Nabot re peyivî, jê re got: «Rezê xwe bide min, bila ji min re bibe werz, yanî bostan, çimkî ew nêzîkî mala min e. Ezê ji dêla wî ve rezekî ji wî çêtir bidim te, an jî tu bixwazî, ezê bihayê wî bi zîv bidim te.»

Lê Nabot ji Ahab re got: «Xudan min ji wê yeka ku ez mîrasa bav û kalên xwe bidim te, biparêze.»

Ji ber ku Nabot jê re gotibû: «Ez mîrasa bav û kalên xwe nadim te», Ahab bi xeyd û hêrs vegeriya mala xwe. Wî xwe li ser nivîna xwe dirêj kir û rûyê xwe bada û tiştek nexwar.

Jina wî Îzebêl jê re got: «Çima ruhê te xeyidiye û tu naxwî?»

Wî jê re got: «Ji ber ku ez bi Nabotê Yîzreêlî re peyivîm û min jê re got: ‹Rezê xwe bi zîv bide min, an jî tu bixwazî ezê di cihê wî de rezekî din bidim te.› Lê wî got: ‹Ez rezê xwe nadim te.›»

Lê Îzebêlê got: «Ma tu padîşahê Îsraêl î, an na? Rabe, xwarinê bixwe û bila dilê te xweş be. Ezê rezê Nabotê Yîzreêlî bidim te.»

Wê li ser navê Ahab çend name nivîsîn û ew bi mora wî mor kirin. Wê ew name ji rihspî û giregirên bajarê Nabot re şandin.

Di nameyan de weha nivîsî, got: «Rojiyekê bidin bihîstin û Nabot li cihê gel ê sereke rûnînin. Û du zilamên bêkêr li pêşberî wî rûnînin û bila ew li hember wî şahidiyê bikin bêjin: ‹Te çêrî Xwedê û padîşah kiriye.› – Hingê wî derxin derve û bidin ber keviran ku bimire.»

Zilamên bajarê Nabot, ew rihspî û giregirên ku di bajarê wî de rûdiniştin, wek ku Îzebêlê di wan nameyan de ji wan re nivîsîbû, kirin. Wan rojî dan bihîstin û Nabot li cihê gel ê sereke rûnandin. Hingê du zilamên bêkêr hatin û li pêşberî wî rûniştin û van zilamên xerab li ber xelkê li hember Nabot şahidî kirin, gotin: «Nabot çêrî Xwedê û çêrî padîşah kiriye.» Hingê ew derxistin derveyî bajêr û dan ber keviran û ew mir.

Rihspiyan agahî da Îzebêlê, gotin: «Nabot hat kevirkirin û mir.»

Li ser vê yekê Îzebêlê ji Ahab re got: «Rabe, here Yîzreêlê, rezê Nabot ê ku wî nexwest bi zîv bide te, ji xwe re bike milk, çimkî Nabot mirî ye.»

Û çaxê ku Ahab bihîst ku Nabot miriye, ew daket wê derê, da ku rezê Nabotê Yîzreêlî ji xwe re bike milk.

Hingê ev peyva Xudan ji Êlyas re hat: «Rabe, dakeve pêşiya padîşahê Îsraêlê Ahab. Va ye, ew di rezê Nabot de ye; ew daket wê derê, da ku wî ji xwe re bike milk. Jê re bêje: ‹Xudan weha dibêje: Ma te kuşt û tu ji xwe re dikî milk jî?›

Û bi wî re bipeyive, jê re bêje: ‹Xudan weha dibêje: Li dera ku kûçikan xwîna Nabot alîst, li wê derê kûçik wê xwîna te jî bialîsin.›»

Êlyas daket û çaxê Ahab ew dît, ji Êlyas re got: «Hey dijminê min, ma te ez dîtim?»

Êlyas got: «Min tu dîtî, çimkî te xwe firot da ku tu di çavê Xudan de ya xerab bikî. Xwedê dibêje: ‹Va ye, ezê belayê bînim ser mala te: Xulam be an azad be, ezê ji mala Ahab her mêrî bibirim, helak bikim. Ji ber ku te ez hêrs kirim û te guneh bi Îsraêl da kirin, ezê mala te bikim wek mala Yêrovam.»

Ji bo Îzebêlê jî Xudan peyivî, got: «Kûçik wê li rexê dîwarê bajarê Yîzreêlê laşê Îzebêlê bixwin. Yên ku ji mala Ahab di bajêr de bimirin, kûçik wê bixwin û yên ku di çolê de bimirin, teyrên ezmên wê bixwin.»

Bi rastî tu kesî wek Ahab xwe nefirot ku di çavê Xudan de ya xerab bike; jina wî Îzebêl ew radikir ser piyan, yanî nav li wî dida. Wek wan Amoriyên ku Xudan ji ber gelê Îsraêl derxistibûn, Ahab jî li pey pûtan ket û tiştên kirh kirin.

Çaxê Ahab ev peyvên ha bihîstin, cilên xwe çirandin û xirarî li xwe kir û rojî girt û di nav xirarî de raza û bi nefsbiçûkî rêve çû.

Hingê ev peyva Xudan ji Êlyas re hat: «Te dît ku çawa Ahab li ber min nizim bû? Madem ku wî xwe li ber min nizim kir, ez belayê di rojên wî de naynim. Ezê di rojên kurê wî de belayê bînim ser mala wî.»

Wek ku Xwedê gotibû, weha çêbû jî.

Ahab padîşah di şer de hat kuştin û çaxê xulamên wî ereba wî li bajarê Sameryayê şuştin, kûçikan xwîna wî alîst.

Piştî çend salan Yêhû yê ku ji aliyê Êlyas pêxember ve bi padîşahtî hatibû meshkirin, li hember kurê Ahab Yoram rabû û bû padîşah. Yêhû hat Yîzreêlê û wî emir kir ku Îzebêl bê kuştin û wek ku Xwedê gotibû, kûçikan laşê wê xwar.

# Hilkişîna Êlyas

(Padîşah II, 2)

Rojekê, çaxê Êlyas û Êlîşa ji bajarokê Gîlgalê derketin, Êlyas ji Êlîşa re got: «Li wir bimîne, çimkî Xudan ez şandim Beyt-Êlê.»

Lê belê Êlîşa jê re got: «Bi navê Xudanê zindî û bi jiyana te, ez te bernadim.»

Îcar ew daketin Beyt–Êlê. Û şagirtên pêxemberan ên ku li Beyt–Êlê bûn, derketin ba Êlîşa û jê re gotin: «Ma tu dizanî ku îro Xudan wê mîrzayê te ji ser serê te rake?»

Wî got: «Ez jî dizanim; hûn deng nekin.»

Îcar Êlyas careke din ji Êlîşa re got: «Ey Êlîşa, li vir bimîne, çimkî Xudan ez şandim Erîhayê.»

Lê wî got: «Bi navê Xudanê zindî û bi jiyana te, ezê te bernadim.»

Îcar ew daketin Erîhayê. Li wir kurên pêxemberan ên ku li Erîhayê bûn, nêzîkî Êlîşa bûn û jê re gotin: «Ma tu dizanî ku îro Xudan wê mîrzayê te ji ser serê te rake?»

Wî got: «Ez jî dizanim, hûn deng nekin.»

Îcar Êlyas ji Êlîşa re got: «Li vir bimîne, çimkî Xudan ez şandim Çemê Urdunê.»

Lê wî wek berê got: «Bi navê Xudanê zindî û bi jiyana te, ez te bernadim.»

Îcar herdu jî çûn. Pêncî mirov ji şagirtên pêxemberan jî li pey wan çûn û dûrî wan rawestan. Êlyas û Êlîşa jî li ba Çemê Urdunê rawestan. Êlyas rahişt ebayê xwe, ew li hev pêça û li avê xist. Di cih de av bi vî milî ve û bi wî milî ve bû du şeq û herdu jî di erdê zuwa re derbas bûn. Çaxê ku ew derbas bûn, Êlyas ji Êlîşa re got: «Bixwaze, beriya ku ez ji ba te bêm standin, ez çi ji te re bikim?»

Êlîşa got: «Ez hêvî dikim, bila ji ruhê te, min du par hebin.»

Êlyas jê re got: «Te tiştekî zehmet xwest, lê çaxê ku ez ji ba te bêm standin, eger tu min bibînî, wê weha ji te re çêbe. Û wekî din çênabe.»

Îcar wusa çêbû, çaxê ku ew rêve diçûn û dipeyivîn, ji nişkê ve erebeyeke ji êgir û hespên ji êgir ew ji hev veqetandin û Êlyas di nav bablîsokê de hilkişiya ezmanan. Êlîşa ew dît û kir qîrîn, got: «Bavo, ey bavo, erebeya Îsraêl û siwarên wî!» Û êdî ew nedît.

Hingê wî ebayê xwe girt û kir du qet û wî ew xiftanê Êlyas ê ku ji ser wî ketibû hilda û şûnde vegeriya û li ber Çemê Urdunê sekinî. Wî rahişt xiftanê Êlyas, li avê xist û got: «Xudan Xwedayê

Êlyas li ku derê ye?» Û çaxê wî jî li avê xist, av bi vî milî ve û bi wî milî ve bû du şeq û Êlîşa derbas bû.

Şagirtên pêxemberan ên ku li Erîhayê bûn, ew ji aliyê din dîtin û gotin: «Ruhê Êlyas danî ser Êlîşa.» Ew hatin ku wî pêşwazî bikin û heta bi erdê xwe li ber wî tewandin. Wan ji wî re got: «Va ye, pêncî zilamên xurt li ba van xulamên te hene. Bihêle, bila ew herin û li mîrzayê te bigerin; belkî Ruhê Xudan ew hildaye û avêtiye ser çiyayekî an newalekê.»

Lê wî got: Rênekin.» Lê belê wan ewqas zor li wî kir ku wî fihêt kir, got: «Rêkin.» Wan jî ew pêncî zilam rêkirin û ew sê rojan lê geriyan, lê ew nedîtin. Îcar çaxê ku ew vegeriyan Erîhayê ba Êlîşa, wî ji wan re got: «Ma min ji we re negot: Neçin?»

# DAWIYA PADÎŞAHIYÊN CIHÛSTAN Û ÎSRAÊLÊ

Wek Ahab hê gelek padîşahên din jî hebûn û piraniya wan li pey pûtan çûn û guhê xwe nedan peyvên Xwedê. Gelê Îsraêl dît ku padîşahên wan çi kirin û ew jî li pey pûtan ketin, perizîn wan.

Xwedê gelek caran pêxember şandin ku gel û padîşah hişyar bikin, lê belê kêm caran wan guhdariya zilamên Xwedê kir û ew ji riyên xwe yên xerab venegeriyan.

Wan hê bêtir li gor gotinên pêxemberên derewîn dikir, çimkî van pêxemberên derewîn her xerabî qebûl dikir û her gav ji xelkê re digot: «Xwedê ji we razî ye û wê we biparêze.»

Xelk jî difikirî, digot: «Perestgeha Xwedayê me li Orşelîmê heye, ji ber vê yekê dijmin çiqas xurt be jî, tu caran nikare bikeve bajarê me.»

Lê belê ew ji Xwedê bêtir li mirovan ewle bûn û çaxê dijmin hatin, li Xwedê venegeriyan û hêviya xwe bi alîkariya padîşahên Misrê ve girêdan.

Xwedê çiqas ji wan re got jî, wan qet guhê xwe neda wî.

Loma Xwedê pêşî Aşûrî li hember gelê xwe rakirin. Ew bi ordiyeke mezin ve hatin, ketin bakurê welêt û deh eşîrên padîşahiya Îsraêlê bindest kirin.

Wan paytextê padîşah Samerya hilweşand û gelek mirov sirgûn kirin, ew anîn herêmên Sûriye, Aşûr û Babîlê.

Bi vî awayî ji bo kêm û zêde 140 salan bi tenê padîşahiya Cihûstanê ya li hawirdora Orşelîmê ma.

Dîsa jî padîşahên Cihûstanê tobe nekirin û guhê xwe nedan peyvên pêxemberên Xwedê.

Loma di sala 586an berî hatina Mesîh de, padîşahê Babîlê Nebûkadnetsar bi ordiya xwe ve hat û Orşelîm vegirt. Wî sûra bajêr û Perestgeha Xwedê ya ku Silêman padîşah ava kiribû, xera kir, şewitand û gelek mirov hatin kuştin.

Nebûkadnetsar jî gelek Cihû sirgûn kirin, anîn herêma Babîlê.

Bi vî awayî peyva Xwedê hat cih û ji bo heftê salan gelê Îsraêl ji welatê xwe dûr ma. Lê belê di wê demê de jî Xwedê pêxemberên dilsoz û rast şandin ba wan û mizgîniya hêviyê dida wan.

# SERHATIYA DANIYÊL

## Daniyêl li Babîlê

(Daniyêl 1)

Daniyêl kêm û zêde 600 salan beriya hatina Îsa Mesîh, yanî beriya 2600 salan li Cihûstanê dijiya. Li ser zaroktiya wî em tiştekî nizanin, lê ew ji eslê xwe ji maleke esilzade bû.

Di wê demê de Yehoyakîm li Orşelîmê padîşahê Cihûyan bû. Çaxê Yehoyakîm bû padîşah, ew 25 salî bû û wî ji bo 11 salan padîşahî kir. Ew ji dûndana Dawid û Silêman bû, lê belê wî qet guhê xwe neda peyva Xwedê. Wî pêxemberek da kuştin û carekê nivîsareke Yêremya pêxember da şewitandin, çimkî gotinên wî pêxemberî ne bi dilê wî bûn. Wî li gor fikrên dilê xwe yê xerab padîşahtî dikir û Xwedê êdî nexwest li gunehên wî bibihûre.

Loma di sala sisiyan ya padîşahiya Yehoyakîm de, Xwedê padîşahê Babîlê, yanî padîşahê Kildaniyan Nebûkadnetsar bi ordiyeke mezin ve şand Orşelîmê. Wan dora bajêr girt, êrîşî wî kirin, ketin nav bajêr, Perestgeha Xwedê şewitandin û Yehoyakîm padîşah bi gelek mezinên xwe ve ket destê wî. Nebûkadnetsar ew û gelek Cihûyên din ajotin Babîlê, ew sirgûn kirin nav gelê Kildaniyan.

Daniyêlê xort jî di nav wan de bû, ew hingê bi dîlîtî hat Babîlê. Li wir padîşahê Kildaniyan Nebûkadnetsar li serwerê karmendên qesra xwe Aşpenaz emir kir ku xortên Cihû yên herî jêhatî û şehreza bîne qesrê û ziman û nivîsandina Kildaniyan hînî wan bike. Ew xort hemû ji mala padîşahê Cihûyan û ji malên esilzade bûn, ew ji dîtina xwe ve spehî bûn û di her şehrezayiyê de fêmdariya wan hebû, ew zane û hunermend bûn. Daniyêl û sê hevalên wî Henanya, Mîşayêl û Azarya di nav van xortan de bûn. Ji ber ku navên wan li gor zimanê Cihûyan bû, navên wan li Babîlê hatin guhertin: Henanya bû Şadrax, Mîşayêl bû Mêşax û Azarya bû Abêd-Nego.

Padîşah ji serwerê xwe Aşpenaz re got ku sê salan wan xortên hilbijartî perwerde bike, qenc li wan binêrin wan û wan amade bikin, da ku piştre ji padîşah re xizmetê bikin.
Padîşah emir kiribû jî ku ew xort ji xwarina wî bixwin û ji şeraba wî vexwin. Lê Daniyêl bi her sê hevalên xwe ve xist dilê xwe ku xwe bi xwarinên padîşah yên xweş murdar neke. Çimkî Xwedê bi devê Mûsa ji gelê Îsraêl re rast û rast gotibû, kîjan xwarin û vexwarin ji wan re helal û paqij e û kîjanê ew nikarin bixwin. Û Daniyêl dixwest di welatê sirgûnê de jî li gor wan emrên Xwedê bike.

Loma wî ji serwerê karmendên qesrê re got: «Ez hêvî ji te dikim, ji kerema xwe ji xwarina padîşah û ji şeraba wî nede me.»
Lê serwer jê re got: «Padîşah li ser xwarin û vexwarina we biryar daye û ez ji wî ditirsim. Eger ew bibîne ku hûn ji xortên din zeyîftir in, ewê serê min jêke.»

Daniyêl jê re got: «Ez ji te hêvî dikim, deh rojan me biceribîne, bila ji bo xwarinê pincar, yanî şînayiyê û ji bo vexwarinê avê bidin me. Bila piştî wan deh rojan hem li rûyê me û hem jî li rûyê xortên ku ji xwarina padîşah xwarine, binêrin û hingê biryara xwe bide.»
Xwedê di çavê Aşpenaz de kerem da Daniyêl û wî qebûl kir ku vê yekê biceribîne.
Piştî deh rojan rûyê Daniyêl û hevalên wî ji rûyê wan hemûyên din spehîtir bû û bedena wan jî ji yên din xurtir û qelewtir bû.
Loma serwer xwarina padîşah ya xweş û şeraba wî rakir û pincar, yanî şînayî û av da Daniyêl û hevalên wî.
Xwedê jî şehrezayî û zanastî da wan ku ji her tiştî, qenc fêm bikin.

Çaxê dema perwerdekirina wan temam bû, serwerê qesrê ew birin hundir ba padîşah û Nebûkadnetsar bi wan re ket hevpeyvînê û dît ku di nav hemûyan de yekî wek Daniyêl û her sê hevalên wî şehreza nebû. Loma wan dest pê kir, ji padîşah re xizmet kir.
Û di her pirsa ku padîşah bi wan re dişêwirî de, wî dît ku ew ji hemû sêrbaz û falvekerên padîşahiyê deh caran şehrezatir in.

# Xewna Nebûkadnetsar

(Daniyêl 2)

Di wê demê de şevekê Nebûkadnetsar xewn dît. Xewn wusa bû ku ruhê wî gelek reht bû û xewa wî reviya. Sibê zû padîşah rabû û emir da ku hemû sêrbaz, falveker û zanayên Kildanî bên û li ber wî bisekinin, da ku xewna wî jê re bêjin.
Ew jî hatin û padîşah ji wan re got: «Min xewn dît û ruhê min reht bû û ez dixwazim mana wê bizanim.»
Wan ji padîşah re got: «Bila padîşah her û her bijî, xewna xwe ji me re bêje, ku em şîrove bikin.»
Lê padîşah got: «Min biryara xwe daye: Eger hûn ji min re xewna min nebêjin û şîrove nekin, hûnê bên parçe parçe kirin û xaniyên we wê bibin sergo, yanî wê bibin cihê kavilê. Lê eger hûn xewna min û mana wê ji min re bêjin, hûnê ji min diyariyan, xelatan û rûmeteke mezin bistînin.»

Ji xwe di nav Kildaniyan de tu kesî nikaribû xewnê û mana wê ji padîşah re bêje. Loma wan careke din ji padîşah re got: «Bila padîşah xewna xwe ji me re bêje û emê wê şîrove bikin.»
Lê padîşah got: «Ez vê yekê qenc fêm dikim: Ji ber ku hûn dibînin ku ez li ser ya xwe me, hûn dixwazin ji xwe re dem bi dest bixin. Hûn li hev hatin ku ji min re tiştên çewt û xerab bêjin, heta ku hal bê guhertin. Niha xewnê ji min re bêjin û bi vê yekê ezê bizanim ku hûn dikarin mana wê jî şîrove bikin.»
Li ser vê yekê Kildaniyan got: «Li ser hemû rûyê erdê mirovek tune ku bikare vî tiştî ji padîşah re bêje û tu caran jî padîşahekî tiştek weha ji sêrbaz, falveker û zanayên xwe nexwestiye. Ev tişt ji destê mirovan nayê; bi tenê ew xwedayên ku cihê wan ne di nav mirovan de ne dikarin xewnê û mana wê ji padîşah re şîrove bikin.»

Nebûkadnetsar li ser vê gotina wan evqas hêrs ket, ku wî ferman derxist û emir da ku hemû zanayên Babîlê bên kuştin.
Ji ber vê yekê li Daniyêl û li hevalên wî jî geriyan ku wan bi şehrezayên Babîlê re bikujin.
Lê Daniyêl bi şehrezayî û bi mêrxasî ji serokê parêzgerên padîşah Aryox re got: «Çima ev fermana padîşah evqas hişk e?»

Wî mesele ji Daniyêl re got û Daniyêl ket hundir û rica ji padîşah kir ku wext bide wî, da ku xewnê û mana wê ji wî re bêje.

Padîşah qebûl kir û Daniyêl çû mala xwe. Wî her tişt ji hevalên xwe re got ku dua bikin, da ku Xwedê vê sirê ji wan re veke û ew bi zanayên Babîlê re neyên kuştin.
Û bi şev, di peyxamê de, ev sir ji Daniyêl re vebû.

Daniyêl şikir ji Xwedê re kir û got:
«Bila navê Xwedê ji destpêkê û heta her û her pîroz be.
Çimkî şehrezayî û qewet yên wî ne.
Yê ku wext û zemanan diguhere, ew e
Ew padîşahan radike û wan tîne xwar.
Yê ku şehrezayiyê dide şehrezayan
Û fêmdariyê dide zanayan ew e.
Ew, tiştên kûr û veşartî vedike

Û bi tiştên ku di tariyê de ne dizane.
Ew di ronahiyê de rûdine.
Ya Xwedayê bav û kalên min, ez şikir ji te re dikim,
Çimkî te şehrezayî û qewet da min
Û niha te tiştê ku me ji te xwest, bi min daye zanîn:
Te xewna padîşah û şîroveya wê bi me da zanîn.»

Piştre Daniyêl çû ba Aryox û jê re got: «Zanayên Babîlê nede kuştin; min bibe ber padîşah, ezê xewna wî şîrove bikim.»

Di cih de Aryox ew anî ba padîşah û jê re got: «Min di nav Cihûyên sirgûnkirî de yek dît ku dikare xewna padîşah şîrove bike.»

Padîşah ji Daniyêl re got: «Ma bi rastî tu dikarî xewnê û mana wê ji min re şîrove bikî?»

Daniyêl got: «Zane, sêrbaz, falveker û stêrnas nikarin sira ku padîşah pirsiye bêjin, lê li ezmanan Xwedayek heye ku ew sir û nependiyan vedike. Xwedê ji padîşah re da zanîn ku di rojên dawî de çi wê çêbe.

Xewna te weha bû:

Tu difikirî ku ji niha pê ve çi wê çêbe û fikir hatin hişê te. Û yê ku siran vedike şanî te da ku wê çi çêbe. Heçî ez im jî, ne ji ber ku ez ji hemûyan şehrezatir im, lê ji bo ku sir ji padîşah re bê şîrovekirin, sir ji min re vebû.

Ya padîşah, te dît ku va ye, heykelekî mezin. Ev heykelê gelek mezin û şewqdar li ber te disekinî û dîtina wî tirsehêz bû. Serê heykel ji zêrê xas bû, sing û zendên wî ji zîv, zik û kemaxên wî ji tûnc, teşkên wî ji hesin û lingên wî parek ji hesin û parek ji heriyê bûn. Te lê nêrî û dît ku kevirek ji cihê xwe qeta, bêyî ku destek lê bikeve. Wî kevirî li lingên heykel yên ji hesin û ji heriyê xist û ew kir perçe perçe.

Di cih de hesin, herî, tûnc, zîv û zêr, tev bûn wek tozê, wek kaya hûr a bênderên havînê. Bayê ew birin û tiştek ji wan nema. Lê ew kevirê ku li heykel xistibû, bû çiyayekî mezin û hemû dinya dagirt.»

Piştre Daniyêl dest bi şîrovekirina xewnê kir, wek ku tu ta bi derziyê ve bikî, her tişt ji padîşah re got.

Got: «Ya padîşah, tu padîşahê padîşahan î; Xwedê padîşahî, hêz, yanî qewet, pêkarîn û rûmet daye te. Serê heykel ê ku zêr e, tu yî.

Piştî te, padîşahiyeke ji te kêmtir wê bê û padîşahiya sisiyan ya ji tûnc wê bê, ku ewê li ser hemû dinyayê hukumdariyê bike. Û padîşahiya çaran wê wek hesin bi hêz be, çimkî hesin her tiştî dike parçe parçe û dişkêne. Wê wek wî hesinê ku wan hemûyan hûr dike, wan bike parçe parçe û biperçiqîne.

Te dît ku parek ji ling û tiliyên wî ji herriya cerçêkeran û parek ji hesin bû û hesin û herî tevlihev bû. Ev tê vê manê ku padîşahî wê parvekirî be û wê hem bi hêz û hem jî bê hêz be. Xelkên wê wê tevlihev bibin, lê li hev nakin û nabin yek.

Di rojên wan padîşahan de, Xwedayê ezmanan wê padîşahiyeke ku tu caran xera nebe damezrîne. Û hukumdariya wî wê bi destê miletekî din ve neyê berdan. Ewê hemû padîşahiyên din perçe parçe bike, lê ew bi xwe wê her û her bimîne. Mana kevirê ku te dît, ev e. Xewn rast e û şîroveya wê ewledar e.»

Çaxê padîşah ev tişt bihîst, deverû ket erdê û ji Daniyêl re çû ser çokan.Wî emir kir ku jê re gorî bên pêşkêşkirin û got: «Bi rastî, Xwedayê we, Xwedayê xwedayan û Xudanê padîşahan e. Yê ku siran vedike, ew e, ji ber ku wî ji te re ew xewn û mana wê şîrove kir.»

Û Nebûkadnetsar Daniyêl li ser hemû herêma Babîlê û li ser hemû mirovên xwe yên şehreza û zana kir serekwezîr.

Ev padîşahiyên ha jî wek ku Daniyêl ji Nebûkadnetsar re got, rabûn, mezin û bi qewet dibûn. Padîşahiya pêşî ya Nebûkadnetsar bi xwe, yanî padîşahiya Babîlê bû. Ya diduyan padîşahiya Med û Farsan bû, ya sisiyan ya Yûnaniyan bû û ya çaran jî ya Romayiyan bû. Û ew padîşahiya ku tu caran xera nabe, ew padîşahiya Îsa Mesîh e, yanî Padîşahiya Ezmanan e; ewê bimîne heta hetayê.

## Heykelê mezin

(Daniyêl 3)

Heçî Nebûkadnetsar bû, me dît çaxê ku hukumê Xwedê ji wî re dihat gotin, wî xwe li ber Xwedê dişkênand, yanî xwe li ber Xwedê nizim dikir. Wî pesnê Xwedê dida û spasî ji wî re dikir. Piştî ku Daniyêl xewna wî ji wî re şîrove kir, wî fêm kir ku her tişt di destê Xwedê de ye.

Lê dîsa rojekê ew rabû û heykelekî zêr da çêkirin û li herêma Babîlê di deşta Dûrayê de çikiland; heykel sî metreyan bilind û sê metreyan fireh bû.

Hingê padîşah Nebûkadnetsar satrap, walî û mîr, şîretkar, xiznedar, dadger û serwer, yanî hemû mezinên herêman ji bo merasima heykel da civandin.

Gazîker, yanî denghildêr bi dengekî bilind bang kir: «Ya mirovên ji hemû gel, milet û zimanan! Emir ji bo we ev e: Gava hûn dengê borî, zirne, ûd, tembûr, çeng, ney û her cûreyê dengê haletên muzîkê bibihîzin, divê hûn deverû xwe bavêjin erdê û biperizin heykelê zêr ê ku Nebûkadnetsar padîşah çikilandiye! Her kî ku xwe neavêje erdê û neperize, wê di cih de bê avêtin nav firna êgir!»

Li ser vê yekê gava hemû xelkê dengê borî, zirne, ûd, tembûr, çeng û her cûreyê haletên muzîkê bihîstin, wan xwe deverû avêt erdê û perizîn heykelê zêr.

Lê her sê hevalên Daniyêl Şadrax, Mêşax û Abêd-Nego li ser piyan sekinîn û li ber heykel neçûn ser çokan.

Li ser vê yekê hinek Kildanî hatin pêş û giliyê Cihûyan kirin û ji padîşah Nebûkadnetsar re gotin: «Ya padîşah, her û her bijî! Ya padîşah, te fermaneke weha da: ‹Her mirovê ku dengê borî, zirne, ûd, tembûr, çeng, dehol û her cûreyê dengê haletên muzîkê bibihîze, divê xwe deverû bavêje erdê û biperize heykelê zêr. Û eger yek xwe neavêje erdê û neperize, wê bê avêtin firna êgir.›

Lê hin Cihû hene, Şadrax, Mêşax û Abêd-Nego, van zilaman tu nehesibandî; te ew danîne ser karê herêma Babîlê, lê ew ji xwedayên te re xulamtiyê nakin û naperizin heykelê zêr ê ku te çikilandiye!»

Nebûkadnetsar bi hêrs û xezebê emir da, ku Şadrax, Mêşax û Abêd-Nego bînin. Nebûkadnetsar ji wan re got: «Hey Şadrax, Mêşax û Abêd-Nego, ma rast e ku hûn xulamtiyê ji xwedayên min re nakin û naperizin heykelê min ê zêr ê ku min çikilandiye?
Niha çaxê hûn dengê borî, zirne, ûd, tembûr, çeng, ney û her cûreyê dengê haletên muzîkê bibihîzin, eger hûn amade bin ku deverû xwe bavêjin erdê û biperizin heykelê ku min çikilandiye, qenc e. Lê eger hûn neperizin, hûnê di cih de bên avêtin nav firna êgir. Ma ew xwedayê ku we ji destê min xilas bike, kî ye?»

Şadrax, Mêşax û Abêd-Nego lê vegerandin, gotin: «Ya Nebûkadnetsar, ji me re ne lazim e ku em li ser vê yekê bersîva te bidin. Eger wusa bibe, Xwedayê me yê ku em jê re xulamtiyê dikin, dikare

me ji firna êgir xilas bike û wê me ji destê te xilas bike! Lê eger nebe jî, bila tu bizanî, ya padîşah, em ji xwedayên te re xulamtiyê nakin û em neperizin heykelê zêr ê ku te çikilandiye!»

Erê, wan bi hurmet û bi awayekî zelal ji padîşah re gotin, ku eger ev kar bigihîje wê rewşê, Xwedayê me yê ku em xulamtiyê jê re dikin wê me ji agirê firnê xilas bike û wê me ji destê te rizgar bike. Lê eger me ji agirê firnê xilas neke û em bişewitin jî, dîsa em naperizin heykelê te.

Hingê Nebûkadnetsar bi hêrsê tije bû û rengê rûyê wî hat guhertin. Wî emir kir, got ku firnê ji adetê heft caran zêdetir sor bikin.

Û wî emir da çend mêrxasên ordiya xwe, da ku Şadrax, Mêşax û Abêd-Nego girêbidin û wan bavêjin nav firna êgir. Her sê zilam bi şalwar, şaşik, xiftan û cilên wan ên din ve hatin girêdan û avêtin nav firna êgir.

Û ji ber ku emrê padîşah pirr hişk û firne pirr har bû, pêta êgir ew mêrxasên ku Şadrax, Mêşax û Abêd-Nego girtin û birin, şewitandin, kuştin.

Lê ev her sê zilam, Şadrax, Mêşax û Abêd-Nego girêdayî ketin nav firna êgir.

Ji nişkê ve padîşah Nebûkadnetsar şaş û heyirî ma û bi lez rabû ser piyan; ew bi şîretkarên xwe re peyivî û ji wan re got: «Ma me ne **sê** zilamên girêdayî avêtin nav êgir?»

Wan li padîşah vegerand û gotin: «Rast e, ya padîşah!»

Lê wî got: «Va ye, ez çar kesên vekirî dibînim, ew di hundirê agir de diçin û tên û tu zirar li wan nebûye. Dîtina yê çaran jî mîna kurê xwedayekî ye!»

Nebûkadnetsar nêzîkî devê firna êgir bû, gazî kir û got: «Ya xulamên Xwedayê Bilind, Şadrax, Mêşax û Abêd-Nego, derkevin derve û werin vir!»

Li ser vê yekê Şadrax, Mêşax û Abêd-Nego ji nav êgir derketin û satrap, walî, mîr û şîretkarên padîşah li dor wan civiyan û dîtin ku li ser bedena her siyan hêza êgir tune bû, porê serên wan nekizirî bû, şalwarên wan neşewitî bûn û bîhna qimandinê yanî bîhna êgir jî neketibû cilên wan.

Nebûkadnetsar got: «Bila Xwedayê Şadrax, Mêşax û Abêd-Nego pîroz be! Wî milyaketê xwe şand û xulamên xwe yên ku li wî ewle bûn, xilas kirin. Ew ji gotina padîşah derketin û bedena xwe dan, çimkî wan nexwest ku ji Xwedayê xwe pê ve ji xwedayekî din re xulamtiyê bikin û biperizinê!

Loma ez fermanê didim, ku di her gel, milet û zimanî de mirovê ku li dijî Xwedayê Şadrax, Mêşax û Abêd-Nego gotineke bêrêz bêje, wê bê perçiqandin û xaniyê wî wê bibe sergo; ji ber ku xwedayekî din ê ku wusa rizgar bike, tune.»

Hingê padîşah, rutbeya Şadrax, Mêşax û Abêd-Nego li welatê Babîlê bilindtir kir.

# Daniyêl û Belşatsar

(Daniyêl 5)

Piştî mirina Nebûkadnetsar kurê wî bû padîşah, lê piştî du salan ew hat kuştin. Piştî demekê neviyê Nebûkadnetsar bû padîşah, lê belê ew jî piştî neh mehan hat kuştin.

Di cihê wî de Nabonîd bû padîşah. Ew ne ji mala Nebûkadnetsar bû û piştî pênc salan padîşahê Farsan Koreş li hember wî rabû. Nabonîd kurê xwe yê nixurî Belşatsar li Babîlê hişt û ew bi xwe çû Erebistanê û deh salan li wir ma.

Çaxê Koreş bi ordiya xwe ve li ber bajarê Babîlê bû, Belşatsar bi şev di qesra xwe de ji mezinên xwe re ziyafeteke mezin çêkir.

Çaxê wan şerab vexwar, wî emir da, ku firaxên zîv û zêr ên ku Nebûkadnetsar ji Perestgeha Xwedê a li Orşelîmê anîbûn Babîlê, bînin, da ku bi wan vexwin. Wan ew anîn û padîşah, mezinên wî û jinên wî bi wan vexwarin û pesnê pûtên xwe yên zêr û zîv û tûnc û hesin û dar û kevir dan.
Lê ji nişkê ve tiliyên destekî xuyabûn û li ser dîwarê qesra padîşah nivîsîn. Padîşah ew dît û tirseke mezin ket dilê wî, ew lerizî û çokên wî li hev ketin. Wî bi dengekî bilind gazî kir ku sêrbaz, stêrnas û zaneyên Kildanî bînin. Ew jî hatin û padîşah ji wan re got: «Yê ku bikare vê nivîsarê bixwîne û mana wê ji min re bêje, wê cilekî binefşî û gerdeniyeke zêrîn bistîne û di padîşahiyê de bibe yê sisiyan.»
Lê hem wan nikaribû vê nivîsarê bixwînin û hem jî nikaribûn mana wê ji padîşah re bêjin.
Li ser vê yekê padîşah hê bêtir tirsiya û mezinên wî matmayî man.

Çaxê şahbanûyê li ser vê yekê bihîst, ew ket odeya ziyafetê û got: «Bila padîşah her û her bijî. Bila padîşah netirse. Di padîşahiya te de zilamek heye ku ruhê xwedayên pîroz bi wî re ye. Di rojên bapîrê te Nebûkadnetsar de, fêmdarî û şehrezayiya wek ya xwedayan li ba wî hat dîtin. Bapîrê te Nebûkadnetsar padîşah, ew kiribû mezinê hemû zanayên Kildaniyan. Çimkî ji bo şîrovekirina xewn û siran di wî de ruhekî zehf qenc û fêmdar û şehreza hebû. Navê wî Daniyêl e. Loma bila gazî wî bikin, ewê mana vê yekê ji te re bêje.»
Li ser vê yekê Daniyêl anîn ber padîşah.

Padîşah jê re got: «Ma ew Daniyêlê ku bavê min di nav Cihûyên sirgûnkirî de ji Cihûstanê aniye vir, tu yî?
Min bihîst ku ruhê xwedayan di dilê te de rûdine û şehrezayî û fêmdariya herî mezin li ba te peyda dibe. Ew zana û cinbaz hatin ber min, da ku vê nivîsarê bixwînin û ji min re mana wê bêjin, lê ew nikarin. Lê heçî tu yî, min bihîst ku tu dikarî şîrove bikî. Loma, eger tu bikarî vê nivîsarê bixwînî û mana wê ji min re bêjî, tê cilên binefşî li xwe bikî û gerdeniyeke zêrîn bistînî û di padîşahiyê de bibî yê sisiyan.»

Hingê Daniyêl jê re got: «Bila diyariyên te ji te re bin û xelatên xwe bide yekî din. Dîsa jî ezê vê nivîsarê ji bo padîşah bixwînim û mana wê jê re bêjim.
Ya padîşah! Xwedayê Herî Bilind padîşahtî, mezinahî, siyanet û rûmet dan bavê te. Ji ber mezinahiya ku Xwedê dabû wî, hemû gel, milet û ziman ji wî ditirsiyan. Wî yê ku bixwesta dikuşt û yê ku bixwesta sax dihişt, yê ku bixwesta bilind dikir û yê ku bixwesta nizim dikir. Lê çaxê dilê wî pozbilind bû û ruhê wî ser xwe çû, ew ji textê xwe hat avêtin, siyaneta wî nema û ew ji nav mirovan hat derxistin, ew bû wek heywanekê. Ji bo xwarinê giya dan wî û bedena wî bi xûnava ezmên şil bû heta ku wî fêm kir ku yê bi qewet Xwedayê Herî Bilind e; ew di ser padîşahiyên mirovan re ye û li gor daxwaza xwe serweran datîne ser wan. Û tu, kurê Nebûkadnetsar Belşatsar, te ev hemû dizanî, lê dîsa jî te dilê xwe nizim nekir. Tu li hember Xudanê ezmanan rabûyî û firaxên Perestgeha wî anîn ber te, da ku tu û mezinên xwe û jinên xwe bi wan şerabê vexwin; te pesnê xwedayên zêr û zîv û tûnc û hesin û dar û kevir da. Lê belê ew qet nabînin û qet nabihîzin û qet tiştekî fêm nakin. Lê belê te qet pesnê Xwedayê ku ruhê te û hemû riyên te di destê wî de ne, neda. Loma wî ev dest şand û ev nivîsar nivîsî.

Nivîsar bi xwe ev e: «Mene, Mene, Tekel û Parsîn. Mana van peyvan jî ev e:
Mene: Xwedê rojên padîşahtiya te **hijmart** û dawî lê anî.
Tekel: Tu di şihînê de hatiyî **kişandin** û tu kêm derketî.
Peres: Padîşahiya te hat **parvekirin** û ji Med û **Farsan** re hat dayîn.»

Hingê Belşatsar emir kir ku cilên binefşî li Daniyêl bikin, gerdeniya zêrîn bixin stûyê wî û ew di padîşahiyê de yê sisiyan hat diyarkirin.
Lê belê padîşahê Kildaniyan Belşatsar vê şevê li Babîlê hat kuştin û di cihê wî de Dariyusê Med bû padîşah.

# Daniyêl di kortala şêran de

(Daniyêl 6)

Dariyus qenc dît ku sed û bîst satrapan, yanî mîran, deyne ser padîşahiyê, ku li hemû welêt serweriyê bikin û sê wezîran deyne ser wan. Yek ji wan her siyan Daniyêl bû. Satrapan hesab didan wan wezîran ku zirar negihîje padîşah.

Daniyêl ji wezîr û satrapan çêtir derket, ji ber ku di wî de ruhekî qenc hat dîtin û padîşah dixwest ku wî deyne ser hemû padîşahiyê.

Ev ne bi dilê satrap û wezîrên din bû, loma ew li fersendê geriyan ku ji sedemê karên welêt giliyê Daniyêl bikin. Lê Daniyêl mirovekî dilsoz bû û ne xeletî û ne jî sûcê wî peyda bû û wan nikaribû sûc an sedemê gilîkirinê bibînin. Loma van zilaman got: «Eger em ji ber Şerîeta Xwedayê wî tiştekî nebînin, em li hember vî Daniyêlî fersenda gilîkirinê nabînin.»

Hingê wezîr û satrap bi hev re çûn ba padîşah û jê re weha gotin: «Ya Dariyus padîşah, her û her bijî! Hemû wezîrên welêt, qeymiqam û satrap, şîretkar û walî bi hev şêwirîn û li hev hatin ku emir û fermaneke padîşah weha bê derxistin û mecbûrkirin:

‹Her kî heta sî rojan ji te pê ve ji mirovekî din, an ji xwedayekî tiştekî bixwaze, ya padîşah, bila bê avêtin kortala şêran.›

Niha ya padîşah, li gor Qanûna Med û Farsan a ku nayê guhertin, fermaneke weha binivîse û destxet bike, ku neyê guhertin!»

Padîşah Dariyus jî ev ferman destxet kir.

Di mala Daniyêl de, di odeya wî ya jor de, pencereyan li Orşelîmê nêrî. Çaxê Daniyêl bihîst ku qanûn hat destxetkirin, ew çû mala xwe û di wê odê de wek ku berê dikir, rojê sê caran çû ser çokan, dua kir û ji Xwedayê xwe re şikir kir.

Wê gavê ew zilam bi hev re çûn û dîtin ku Daniyêl li ber Xwedayê xwe dua û lavan dike. Ew bi lez çûn ber padîşah û weha gotin: «Ya padîşah! Ma te fermaneke weha destxet nekir a ku dibêje: ‹Her kî heta sî rojan ji te pê ve ji mirovekî din, an jî ji xwedayekî xwestekekê bixwaze, bila bê avêtin kortala şêran.›?»

Padîşah bersîv da û got: «Li gor Qanûna Med û Farsan a ku nayê guhertin, ev rast e.»

Li ser vê yekê wan got: «Ya padîşah! Daniyêl, yek ji sirgûnên Cihûstanê, hem te û hem fermana te nahesibîne û rojê sê caran duaya xwe dike.»

Dema padîşah ev bihîst, gelek qehirî û dixwest ku Daniyêl xilas bike û heta roj çû ava, xebitî ku wî rizgar bike.

Lê zilam bi hev re çûn ber padîşah û jê re gotin: «Ya padîşah! Bizane ku li gor Qanûna Med û Farsan, tu fermana padîşah nayê guhertin.»

Loma padîşah emir da û wan Daniyêl anîn û avêtin kortala şêran.

Padîşah ji Daniyêl re got: «Bila Xwedayê te yê ku bêrawestin tu jê re xizmetê dikî, te xilas bike!»

Hingê wan kevirekî anîn û danîn ber devê kortalê û padîşah bi gustîlka xwe ya morê û bi gustîlka morê ya mezinên xwe kevir mor kir, da ku ji bo Daniyêl tu tişt neyê guhertin. Hingê padîşah çû qesra xwe û xwarin nexwar; bêyî ku kêf û şahiyê bide kirin, şev derbas kir û xewa wî reviya.

Serê sibê zû padîşah rabû û bi lez çû kortala şêran. Dema ew nêzîkî kortalê bû, wî bi dengekî dilbiqul gazî Daniyêl kir û got: «Ya Daniyêl, xulamê Xwedayê zindî! Xwedayê te yê ku tu her gav jê re xizmetê dikî, dikaribû ku te ji pencên şêran xilas bike?»

Daniyêl ji padîşah re got: «Ya padîşah, her û her bijî! Xwedayê min milyaketê xwe şand û devê şêran girt; wan ez neêşandim. Çimkî li ber wî sûcê min tune û min li hember padîşahê xwe jî tiştekî xerab nekiriye!»

Çaxê padîşah ev bihîst, ew bi şahiyeke mezin dilgeş bû û emir da ku Daniyêl ji kortalê derxin. Û qet xermûçkek li ser wî nehat dîtin, çimkî ew li Xwedayê xwe ewle bûbû.
Padîşah emir da û wan ew mirovên ku giliyê Daniyêl kiribûn anîn û ew û jin û zarokên wan avêtin kortala şêran û hê beriya ku ew bigihîjin binê kortalê, şêran lepên xwe avêtin wan û hemû hestiyên wan şkandin.
Hingê Dariyus padîşah ji mirovên hemû gel, milet û zimanên li seranserê dinyayê re nivîsand:

«Bila silameta we zêde be!
Ez fermanê didim ku di hemû padîşahiya min de mirov li her derê
bila ji Xwedayê Daniyêl bitirsin û bilerizin, çimkî ew Xwedayê zindî ye û her û her dimîne.
Padîşahiya wî xera nabe û serweriya wî her û her dikişîne.
Ew xilas dike û rizgar dike; ew li ezmanan û li erdê nîşan û kerametan dike;
Yê ku Daniyêl ji lepên şêran xilas kiriye, ew e.»

Û di padîşahtiya Dariyus û di padîşahtiya Koreşê Fars de karên vî Daniyêlî qenc çûn.

# PÊXEMBERÊN XWEDÊ

Heta niha em çend caran li ser pêxemberên Xwedê peyivîn û niha em dixwazin li ser wan û li ser karbidestiya wan bisekinin.

Ji destpêkê ve pêxember hebûn. Kitêba Pîroz ji me re dibêje ku Nuh pêxember ‹peyvbêjê rastiyê› bû. Birahîm jî pêxember bû û heçî Mûsa bû, wî ji Xwedê her deh Emrên Mezin, gelek qanûn û tembîh û tevahiya Şerîetê jî standin û da gelê Îsraêl ku her gav li gor wan bikin û guhê xwe bidin wan peyvên Xwedê.

Birayê Mûsa **Harûn** û xwişka wî **Miryam** pêxember bûn û çend jinên din jî di nav pêxemberan de bûn, mesele **Debora**, **Hûlda** û **Hana**.

Lê belê pirraniya pêxemberan di dema padîşahên gelê Îsraêl de rabûn. Di wê demê de **Samûêl** yê pêşî bû; wî padîşahê pêşî Şawûl mesh kir û çend caran xebera Xwedê jê re got.

Çaxê Dawid padîşah guneh kir, Xwedê **Natan** pêxember şand û ew hişyar kir.

**Êlyas** û **Êlîşa** di dema Ahab û kurên wî de pêxember bûn û li pey wan gelekên din jî hatin.

Carna pêxember tam bi serê xwe bûn, lê carna komelên biçûk ên pêxemberan jî hebûn û carna jî nivîskarê pêxember hebû. Mesele Barûx nivîskarê **Yêremya** pêxember bû û wî gotinên wî hê ku pêxember sax bû, rast û rast nivîsîn.

Heçî pêxember bûn, ew wek nobedarên ku li ser gel hatibûn danîn, bûn:
Xwedê gazî wan kir, da ku ew xelkê hişyar bikin, gunehên wan ji wan re bêjin û bi vî awayî riya tobekirinê bi wan bidin zanîn.
Ji bo demeke dirêj gelê Xwedê li pey pûtan ket û perizîn Baal û Aştarteyê. Ji ber vê yekê pêxemberan her gav dengê xwe bilind kir û li hember padîşah û mezinên wan jî rabûn, ew hişyar kirin ku bibin mînakeke qenc û vegerin ba Xwedayê rast.
Pêxemberan gelek caran li ser dîwana Xwedê ya ku wê bê, digotin. Wan dizanibû ku Roja Xudan wê bê û hingê Xwedê wê ji her kesî re li gor kirinên wî bide.

Xwedê ji Mûsa pêxember re gotibû ku wî gelê Îsraêl bijart ku bi taybetî bibe gelê wî. Loma Îsraêlî carna difikirîn: «Em gelê Xwedê ne, dîwana me nayê kirin.»

Lê belê **Amos** pêxember di Kitêba pîroz de weha gotiye:

«Wey li wanên ku dixwazin Roja Xudan bê.
Ka çawa dema mirov ji ber şêr direve û rastî hirçê tê,
Ew roj jî ne ronahî ye, lê belê taristanî ye.

Ez ji cejnên we nefret dikim,
  Ez wan kêm dibînim û ez ji civînên we hez nakim.
Eger hûn qurban û pêşkêşên xwe pêşkêşî min bikin jî,
  Ez li wan nanêrim.
Şemateya lavijeyên xwe ji min dûr bixin;
  Ez guhê xwe nadim dengê çengên we.
Lê belê bila edalet wek rûbar û rastî û wek çemê xurt biherike. (Amos 5:18-24, kurtvebirîn)

**Hezekiyêl** pêxember di Kitêba Pîroz de weha gotiye:

«Xwedê weha dibêje:
‹Yê ku guneh bike, ew e yê ku bimire:
  Gunehê bav nakeve stûyê kur
  Û gunehê kur nakeve stûyê bav.
Rastdariya mirovê rast li ser wî bi xwe dimîne
  Û xerabiya mirovê xerab jî li ser wî bi xwe dimîne.
Lê belê eger mirovê xerab ji hemû gunehên ku kirine, vegere
  Û hemû qanûnên min bigire, ya heq û rast bike,
Eseh ew namire, lê ewê bijî.
  Û qet yek ji gunehên wî, li hember wî nayê bîranîn.
Ewê di wê rastdariya ku kiriye de, bijî.

Ma kêfa min ji mirina mirovê xerab re tê?
  Ma ne hê bêtir ji vê yekê re tê ku ew ji riyên xwe vegere û bijî?

Vegerin û dev ji hemû xerabiyên xwe berdin,
  Da ku neheqiya we nebe sedemê helakbûna we.
Wan hemû neheqiyên ku we kirine,
  Ji ser xwe bavêjin û ji xwe re dilekî nû û ruhekî nû çêkin.
Çima hûn dixwazin bimirin?
  Çimkî kêfa min ji mirina mirov re nayê.
Loma vegerin û bijîn!›» (Hezekiyêl 18: 20-23; 30b-32, kurtvebirîn)

**Îşaya** pêxember weha gotiye:

«Hê ku Xudan tê dîtin, lê bigerin,
  Hê ku ew nêzîk e, gazî wî bikin!
Bila yê neheq dev ji riya xwe berde
  Û yê xerabkar ji fikrên xwe vegere ba Xudan
  Û ewê rehmê li wî bike.
Bila ew li Xwedayê me vegere,
  Çimkî ew gelek afû dike.» (Îşaya 55:6-7)

Peyvên pêxemberan zelal bûn; wan ji gel re digot: Eger hûn guhdariya Xwedê nekin û ji gunehên xwe venegerin, hûn nikarin ji dîwana Xwedê birevin. Kêfa Xwedê ne ji gelek qurban û pêşkêşan re tê, lê ji dilekî safî û paqij re tê.

Di jiyana gelek padîşahên gelê Îsraêl de, rastiya van gotinan derket meydanê û çaxê gelê Îsraêl ji welatê xwe hat derxistin, sirgûn bû, her kesî dît ku peyva Xwedê pûç dernakeve.

Ev sirgûn ji bo gelê Îsraêl cezayekî pir dijwar bû, lê dîsa jî Xwedê dev ji gelê xwe berneda. Pêxemberan bi mizgîniya gotinên Xwedê hêviya nû didan wan.

**Yêremya** pêxember weha got:

«Xudan weha dibêje:
‹Çaxê ji bo Babîlê heftê sal temam bibin,
Ezê we vegerînim welatê we.
Çimkî nêt û fikrên min ên ji bo we ne xerabî, lê aştî ne;
Ezê hêvî û paşeroja qenc bidim we.
Hûnê gazî min bikin û hûnê bên, li ber min dua bikin
Û ezê guhdariya we bikim.
Eger hûn ji dil û can li min bigerin, hûnê min bibînin
Û ezê xwe bi we bidim dîtin.
Ezê we ji hemû miletan vegerînim vî welatê ku min daye bav û kalên we.›»
(Yêremya 29: 10-14; 16:15; kurtvebirî)

Heta ku ev tiştên ha çêbin, Xwedê weha ji gelê xwe re got:

«Ez, Xudanê Ordiyan, Xwedayê Îsraêl, ji hemûyên ku min ji Orşelîmê sirgûnî Babîlê kirine re, weha dibêjim:
‹Ji xwe re xaniyan ava bikin û tê de rûnin,
Ji xwe re baxçeyan biçînin û fêkiyên wan bixwin.
Jinê ji xwe re bînin û bibin bavê kur û keçan;
Ji kurên xwe re jî jinan bînin û keçên xwe jî bidin mêr
Ku zarokên wan hebin û hûn kêm nebin, lê zêde bibin.
Li aştî û qenciya bajêrê ku min hûn sirgûn kirineyê, bigerin
Û ji bo bajêr li ber Xudan dua bikin;
Çimkî eger bajar di aştiyê de be, hûn jî, hûnê di aştiyê de bin.›» (Yêremya 29:4-7)

Xwedê dev ji gelê xwe berneda û wî dixwest ku ew bêhêvî nebin. Wî peymana xwe ya bi Birahîm û bi Dawid re anî bîra xwe û gelê xwe di welatê sirgûnê de jî xweyî kir.

Ji ber ku perestgeha Xwedê hatibû xerakirin, Cihû di wê demê de di xaniyên din de diciviyan, da ku Şerîeta Mûsa û nivîsarên din ên pîroz xwendin û dua kirin. Navê wan xaniyên taybetî kirin ‹kinîşt›, yanî ‹sînagog›. Di kinîştan de gorîgeh tunebûn û qurban û gorî jî nedihatin pêşkêşkirin.

Di wê dema sirgûnê de jî gelê Îsraêl qenc fêm kir ku divê bi tenê ew biperizin Xwedayê rast û ji wê demê ve wan dev ji pûtan berda û êdî heykel ji xwe re çênedikirin.

* * *

Pêxemberan li ser demeke nû digotin, digotin ku rojekê gel wê vegere welatê xwe. Lê belê wan li ser tiştekî din jî gelek tişt digotin: Rojekê Mesîh wê bê û halê hemû mirovan wê bê guhertin.

**Yêremya** pêxember weha nivîsiye:

«Xudan dibêje:
‹Va ye, roj wê bên ku ez ji Dawid re kiziyekî (terheke) rastdar rakim.
  Ewê padîşah be û wê bi aqilmendî padîşahiyê bike
Û wê di welêt de edalet û dadperweriyê bike.
  Di rojên wî de Cihûstan wê rizgar bibe
Û Îsraêl wê di ewledariyê de rûne.
  Û navê ku pê bê gazîkirin ev e: ‹Xudan rastdariya me ye›.»      (Yêremya 23:5-6)

**Îşaya** pêxember jî weha nivîsiye:

«Ew gelê ku di tariyê de rûdine
  Ronahiyeke mezin dît.
Li ser wanên ku li diyarê siya mirinê rûdinin,
  Ronahî derket.
Tu milet zehf dikî;
  Û şahiya wî zêde dikî;
Wek ku di dema dirûnê de kêfxweş dibin,
  Wek ku bi dilgeşî palûtê li xwe leva dikin,
Wusa ew li ber te şa dibin.

Çimkî wek di roja şkênandina Midyaniyan de
  Tu nîrê barê wan ê giran
Û darê li ser milê wan
  Û gopalê zordarên wan dişkênî.
Çimkî her cezma leşkeran
  Û her cilê di xwînê de gevizî
Yên şewitandinê ne,
  Wê bibin xwarina êgir.
Çimkî zarokek ji me re çêbû,
  Kurek ji me re hat dayîn;
Seroktî li ser milê wî ye.
  Navên wî wê ev bin:
‹Şîretkarê ecêb›, ‹Xwedayê hêzdar›,
  ‹Bavê herheyî›, ‹Serokê aştiyê›.
Dawiya zêdebûna aştî û serokatiya wî nayê;
  Ewê li ser textê Dawid rûne
Û li ser padîşahiya wî be;
  Ji niha û heta hetayê
Ewê wê bi edalet û rastdariyê
  Qayîm bike û biparêze.
Xîreta Xudanê Ordiyan wê vê yekê bike.»      (Îşaya 9:2-7)

Di cihekî din de **Îşaya** pêxember li ser Mesîh weha dibêje:

«Xudan bi xwe wê nîşanekê bide we:
  Va ye, keçik wê bizaro bibe û ewê kurekî bîne
Û wê navê wî ‹Îmanûêl› (yanî ‹Xwedê bi me re ye›) deyne.»      (Îşaya 7:14)

**Mîxa** pêxember li ser cihê bûyîna wî weha nivîsiye:

«Û tu, ey Beytlehma li welatê Cihûda!
  Bi ser ku tu di nav malbatên Cihûda de biçûk î,
Ew ê ku bibe serwerê Îsraêl

  Wê ji te ji bo min rabe!»      (Mîxa 5:2)

Lê belê ew kur ne bi tenê ji bo gelê Îsraêl ronahî û padîşah e, çimkî li ser vî xulamê Xwedê, **Îşaya** pêxember vê jî dibêje:

«Ji bo ku tu eşîrên Aqûb ji nû ve rakî
  Û Îsraêliyên ku hatine parastin, vegerînî
Tu xulamê min bî, têrê nake.
Loma ezê te bikim ronahiya miletan,
  Da ku heta bi kujê dinyayê yê herî dûr tu bibî xilaskar.»      (Îşaya 49:6)

**Îşaya** pêxember kifş kir jî ku hemû mirov Mesîhê Xwedê qebûl nakin lê dîsa jî ewê di ber gunehên mirovan de bimire û guneh, sûc û cezayê wan hilde ser xwe:

«Va ye, xulamê min wê bi ser keve;
  Ewê mezin, bilind û gelekî qedirbilind be.
Çawa ku gelek li wî heybetgirtî man
– çimkî dirûv û dîtina wî ewqas xera bûbû
  Ku êdî nedima mirov û kurê mirovan –,
Weha ewê ji bo paqijkirinê li gelek miletan bireşîne;
  Padîşah wê li ber wî devê xwe bigirin,
Çimkî tiştê ku ji wan re nehatiye gotin, wê bibînin
  Û tiştê ku nebihîstine, wê fêm bikin.
Ma kê bi xebera ku me da bawer kir?
  Zendê Xudan ji kê re hat xuyakirin?
Çimkî ew li ber wî wek terha ciwan
  Û wek rayê ku ji erdê zuwa dertê, derket.
Ne dirûv û ne jî spehîtiya wî hebû;
  Dîtina wî jî nebû ku dilê me biçûya wî.
Ew kêm hat dîtin û ji aliyê mirovan ve hat redkirin;
  Ew zilamê êşnas û yê janan bû;
Wek yekî ku mirov rûyê xwe jê dinixumîne,

Ew kêm hat dîtin û me ew hesab nekir.
Lê bi rastî wî êşên me kişandin
Û nexweşiyên me hildan ser xwe;
Me guman kir ku ew hat ceza kirin
Û ji aliyê Xwedê ve hat lêxistin û nizimkirin.
Lê belê ew ji ber neheqiyên me xurimî
Ew ji ber sûcên me hat perçiqandin;
Ew cezayê ku ji bo aştiya me bû, ket ser wî
Û bi birînên wî em sax bûn.
Me hemûyan wek miyan rê şaş kir,
Her yek ji me ket ser riya xwe;
Lê Xudan sûcê me hemûyan danî ser wî.
Zilim lê kirin û nizim kirin,
Lê wî devê xwe venekir;
Wek berxê ku ji bo serjêkirinê tê birin
Û wek miya ku li ber cewîzan bê ziman disekine,
Wî devê xwe venekir.
Bi bêrehmî dîwana wî hat kirin û ji holê hat rakirin.
Ma di nifşê wî de kî li ser vê yekê difikirî?
Çimkî ew ji diyarê zindiyan hat rakirin.
Ji ber neheqiya gelê min, li wî hat xistin.
Bi ser ku wî zordarî nekir
Û hîle di devê wî de peyda nebû jî,
Gora wî li ba xerabkaran çêkirin.
Lê dema ew mir, li ba mirovekî dewlemend bû.
Lê belê li Xudan xweş hat ku wî biperçiqîne û bixe cefayê.

Çaxê tu wî bikî goriya gunehan,
Ewê dûndana xwe bibîne û rojên emrê xwe dirêj bike.
Bi destê wî, daxwaza Xudan wê pêk bê.
Ji ber keda canê xwe, dilê wî wê bi tiştê ku bibîne, xweş bibe.
Bi fêmdariya xwe, yê rastdar, xulamê min, wê gelekan rastdar bike
Û ewê sûcên wan hilde ser xwe.
Ji bo vê yekê ezê bi mezinan re parê bidim wî
Û ewê bi yên xurt re palûtê li xwe leva bike.
Çimkî wî canê xwe rijand, da mirinê
Û bi xerabkaran re hat hesabkirin.
Lê wî sûcê gelekan hilgirt
Û ji bo xerabkaran navberî kir.» (Îşaya 52:13-53:12)

**Îşaya** pêxember weha jî li ser Mesîh gotiye:

«Xudan weha dibêje:
‹Va ye xulamê min,
Bijartiyê min ê ku bi dilê min e.
Ezê Ruhê xwe deynim ser wî
Û ewê edaletê ji miletan re derîne meydanê.
Ew gazî nake û naqîre
Û dengê xwe li kuçeyan nade bihîstin.

Ew çîtika perçiqandî naşkêne
Û fitîla ku dû dike natemirîne;
Bi dilsozî ewê edaletê derîne meydanê.

Heta ku li dinyayê edaletê bigihîne serketinê,
Ew qels nabe û naşkê.
Xelkên keviyên herî dûr wê li hêviya hîndariya wî bin.›»(Îşaya 42:1-4)

Yanî heta bi dema pêxemberan, mirovan bihîst ku yekî weha wê bê:

- Ewê serê mar, yanî serê Îblîs biperçiqîne, qeweta wî bişkêne,
- Ewê wek Mûsa pêxemberekî mezin be û peyvên Xwedê ji mirovan re bêje,
- Ewê ji gelê Îsraêl be,
- Ewê ji dûndana Dawid padîşah be,
- Ewê li gundê Beytlehmê bê dinyayê
- Padîşahiya wî wê her û her bidomîne,
- Navên wî, karbidestî û rûmeta wî kifş dikin:
  ‹Xwedê bi me re ye›, ‹Xwedayê hêzdar›, ‹Serokê aştiyê›,
- Bûyîna wî wê nîşaneke Xwedê be,
- Diya wî wê keçik be,
- Ruhê Xwedê wê li ser wî be,
- Ewê edaletê bi miletan bide zanîn,
- Ewê ne mirovekî zordar be, wê bê hîle be,
- Ewê bibe goriya gunehan,
- Ewê sûc û gunehên gelekan hilde ser xwe,
- Ewê ji bo hemû dinyayê bibe xilaskar, yanî xilaskarê Xwedê şandî
- Xwedê wê nehêle ku ew rizîbûnê bibîne

Li gor pêxemberîtiya **Hezekiyêl**, hingê mirov bi xwe jî wê nû bibin, yanî dilê wan wê bê guhertin û wê nû bibe:

«Ezê dilekî yekdil û ruhekî nû bidim wan
Û ezê dilê kevir ji hundirê wan derxim
Û dilekî ji goşt bidim wan.
Hingê ewê li gor qanûnên min rêve herin
Û tembîhên min bigirin ku bikin
Û ewê bibin gelê min û ezê bibim Xwedayê wan.» (Hezekiyêl 11:19-20)

Loma gelek mirov ji bo demeke dirêj ji dil li hêviya hatina Mesîhê Xwedê bûn.

# SERHATIYÊN EZRA Û NEHEMYA

Wek ku Xwedê bi devê Yêremya pêxember gotibû, piştî 70 salan padîşahiya Babîlê hatiye bindestkirin. Koreş bû padîşahê Farsan û wî bajarê Babîlê vegirt. Piştî demekê wî destûr da Cihûyan ku vegerin welatê xwe.

Wî weha da nivîsîn û got:

«Xwedayê ezmên Xudan hemû padîşahiyên dinyayê dan destê min û wî bi xwe emir li min kir ku ez li Orşelîma Cihûstanê jê re xaniyekî ava bikim.

Her kesê ku ji gelê wî be, Xwedayê wî bi wî re be, bila ew here Orşelîmê û Perestgeha Xudan, ava bike, çimkî ew Xwedayê Orşelîmê ye.

Û bila her kes alîkariya cîranên xwe yên Cihû bike û firaxên zêr û zîv û heywan û tiştên din û li gor dilê xwe diyariyan bide wan.»

Loma di sala 538an beriya hatina Mesîh de li dor pêncî hezar mirovan vegeriyan Orşelîmê. Koreş, firaxên Perestgehê jî yên ku Nebûkadnetsar anîbûn Babîlê û xistibûn perestgeha xwedayê xwe, dan wan.

Piştî çend mehan gelê ku vegeriyabû welatê Îsraêl ji gund û bajarên xwe ji bo civînekê hat Orşelîmê.

Hingê Yêşûya kahîn û Zerûbabel û birayên wan rabûn û gorîgeha Xwedayê Îsraêl çêkirin, da ku wek berê li gor Şerîeta Mûsa gorî bên pêşkêşkirin. Erê, ew ji miletên li hawirdor gelek ditirsiyan, lê dîsa jî wan gorîgeh çêkir û wek berê her sibê û her êvar goriyên şewitandinê pêşkêşî Xudan kirin.

Di wê demê de hê Perestgeha Xudan nebû, lê wan pere dan hostayan, da ku dest bi avakirina Perestgehê bikin û çaxê bingehê wê hat danîn, wan cejneke mezin çêkir û li gor tertîbên Dawid pesnê Xudan dan û stran gotin û ji Xwedê re şikir kirin.

Lê belê gelek kalepîrên ku Perestgeha ku Silêman ava kiribû, dîtibûn, bi dengekî bilind giriyan.

Çaxê xelkê welêt, yanî Sameriyan bihîst ku Cihûyan bingehê Perestgehê daniye, wan jî dixwest alîkariya wan bikin, lê Cihûyan ev yek qebûl nekir, çimkî baweriya wan ne yek bû. Ji wê rojê ve Samerî li hember Cihûyan rabûn û xebata avakirina Perestgehê gelek salan sekinî.

Hingê Hagay û Zekerya, du pêxemberên Xwedê, rabûn û cesaret dan gel ku careke din dest bi avakirina Perestgehê bikin.

Li ser vê yekê dijminên wan name ji padîşahê Farsan Dariyus re şandin. Dariyus li qesrê lêkolîn da kirin û çaxê fermana Koreş hat dîtin, wî avakirina Perestgehê qebûl kir û ew ferman jî erê kir.

Bi vî awayî Perestgeha Xudan temam bû û gel ew bi şahiyeke mezin, bi Cejna Derbasbûnê û bi gelek goriyan, pîroz kir.

Kêm û zêde piştî 60 salan bi rêberiya Ezra careke din komeleke biçûk a Cihûyan ji Babîlê vegeriya Cihûstanê. Ezra Şerîetzan bû, yanî pisporê Şerîeta Mûsa bû. Wî dît ku Cihûyan ji nav pûtperestan jin ji xwe re anîbûn û ji ber vê yekê wî dilbiqul weha li ber Xudan dua kir:

«Ya Xudan, ez şerm dikim û nawêrim ku çavên xwe bilind bikim,
Çimkî sûcê me digihîje heta bi ezmên.
Ji rojên bav û kalên me ve sûcê me mezin e
Û ji ber neheqiya xwe, em ketibûn destê padîşahên miletan.
Lê niha ji bo kêlîkekê kerem li me bûye,
çimkî te ji me re jêmayiyek hiştiye
Û te em anîne vî cihê xwe yê pîroz
Û me di çavê padîşahê Farsan de qencî dît.

Lê belê piştî van hemû tiştan, em çi bêjin?
Te emrên xwe bi devê pêxemberan ji me re gotibûn,

Lê me dev ji wan berda.

Te got: «Divê hûn keçên xwe nedin kurên welêt
Û keçên welêt jî ji kurên xwe re neynin!
Ma niha em dîsa emrên te bişkênin û bibin mirovên van pûtperestan?
Ma heta ku te em qirr bikirana, wusa ku tu kes nemabûya, tê li me hêrs nebûyayî?
Ya Xudan, tu dadperwer î;
Va ye, em sûcdar in û em nikarin li ber te bisekinin.»

Hingê wî gazî xelkê kir û bi hişkî ji wan re got ku weha nekin. Wan jî guhê xwe da gotinên wî, poşman bûn û dev ji wê yekê berdan.

* * *

Piştî hatina Ezra bi çardeh salan Nehemya jî bi komeleke Cihûyan ve vegeriya. Ew bi xwe meygerê padîşahê Farsan Artaxşasta bû û çaxê bihîst ku halê Orşelîmê xerab e, wî ji padîşah destûr xwest ku here Orşelîmê û sûra bajêr ava bike. Padîşah jî qebûl kir û di her tiştî de rê li ber wî vekir. Çaxê Nehemya hat Orşelîmê, wî ji mezinên gel re got: «Hûn halê Orşelîmê dibînin: Dergehên wê şewitandî ne û bajar hilweşayî ye, ne parastî ye. Rabin, em sûra bajarê xwe ava bikin!»

Di cih de wan dest pê kir, lê wek berê dijminên wan li hember wan rabûn. Loma nîvê xelkê xebitî û nîvê din bi çekan xebatkar parastin û xebatkar jî bi çek bûn.

Bi vî awayî wan di 52 rojan de sûra bajêr ava kir û piştre hemû gel di bajêr de li meydana li ber Dergehê Avê civiya. Wan ji Ezrayê nivîsyar re got ku nivîsara Şerîeta Mûsa ya ku Xwedê ji wan re daye, ku li gor wê bikin, bîne. Loma Ezra Şerîet anî ber civîna hemû jin û mêr û ber hemûyên ku dikaribûn wê fêm bikin.

Ew li ser mînbereke darîn rawesta, da ku hemûyan ew bidîta û li rex wî giregirên gel rawestan. Wî nivîsar vekir û hemû gel rabû ser piyan. Ezra, Xudan Xwedayê mezin pîroz kir û hemû gel destên xwe bilind kirin, gotin: «Amîn, Amîn!» Wan xwe tewand û ji Xudan re deverû çûn ser çokan.

Hingê Ezra ji sibê zû heta nîvro ji Şerîetê xwend û hemûyan qenc guhê xwe dan wê. Û çaxê hemû gel peyvên Şerîetê bihîstin, wan dest bi girînê kir. Lê Nehemya, Ezra û Lêwiyan ji wan re got: «Ev roj ji Xudan Xwedayê we re pîroz e. Şînê negirin û negirîn. Herin, xwarina xweş bixwin û vexwin û parê ji wan re bişînin ên ku tiştek amade nekirine. Xemgîn nebin, çimkî şahiya Xudan qeweta we ye.»

Hingê hemû gel çû, wan xwar û vexwar û par şandin û gelekî şa dibûn, çimkî wan peyvên ku ji wan re hatibûn xwendin û şîrovekirin, fêm kirin.

Di roja diduyan de rihspiyên hemû malbatên gel û kahîn û Lêwî li ba Ezrayê Şerîetzan civiyan ku guhê xwe bidin peyvên Şerîetê. Û wan dît ku di Şerîeta Mûsa de nivîsî ye ku gelê Îsraêl di cejna meha heftan de di holikan de rûne. Û wek ku nivîsandî bû, ev yek li seranserê bajarên xwe û li Orşelîmê dan bihîstin û bang kirin: «Hilkişin nav çiyan û ji bo çêkirina holikan çiqilên darên bi pel bînin.»

Gel jî derket û çiqil anîn û ji xwe re li ser xênî û di hewşên xwe de, di hewşên mala Xwedê û di meydanan de holik çêkirin. Hemû civîna wan ên ku ji sirgûnê vegeriyabûn, ji xwe re holik çêkirin û di wan de rûniştin. Ji rojên Yêşûyê kurê Nûn û heta wê rojê gelê Îsraêl weha nekiribû. Û şahiya wan gelek mezin bû. Her roj, ji roja pêşî heta roja dawî ya cejnê, Ezra ji nivîsara Şerîeta Xwedê xwend. Wan heft rojan cejin pîroz kir û li gor qanûnê di roja heştan de lihevcivîn çêbû.

* * *

Piştî van tiştan, çar sed salan pêxemberekî din ranebû û dengê Xudan li welatê Îsraêlê nehat bihîstin, heta ku wî milyaketê xwe şand ba gelê xwe, da ku ji bo hatina Mesîh amade bibin.

Ev serhatî di Încîlê de, yanî di Peymana Nû de nivîsî ye.